

**ZANÎNGEHA WAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

TEZA LÎSANS A BILIND



ZARGOTINA KURDAN Û ÇÎROKÊN HERÊMA DIYARBEKİRÊ

Cihat GÜNEY

Şêwirmend

Doç. Dr. Kemal EROL

WAN- 2019

**ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

TEZA LÎSANS A BILIND



ZARGOTINA KURDAN Û ÇÎROKÊN HERÊMA DIYARBEKİRÊ

Cihat GÜNEY

Şêwirmend

Doç. Dr. Kemal EROL

WAN- 2019

T.C.
Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

KÜRT FOLKLORU VE DIYARBAKIR YÖRESİ MASALLARI

Cihat **GÜNEY**

Tez Danışmanı

Doç. Dr. Kemal **EROL**

WAN-2019

ETİK BEYAN

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
 - Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
 - Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Cihat GÜNEY

01.01.2019

KURTE

Çîrok, di nava cûreyên zargotinê de cûreyeke pexşanî ya herî berbelav e. Bi alîkariya hin qalibên diyarkirî û hêzên asayî; yan derasayî bi awayeke awarte hizr û ramanên gel ên bi hezar salan ji nifşekî radigihîne nifşekî din; ango pira pêwendiyê ya di navbera nifşan de ye, ku hemû jiyan bi xwe bûye mijara wan. Armanca çîrokan yek jê dembihurandineke bi kêfxweşî be ya din jî pend û şîretên jiyanî ne. Ji ber wê çendê çîrok di pêvajoya mirovahiyê de her dem bûye amûra sereke ya perwerdehiyê.

Li hemû cîhanê di derbarê zargotin û geşedanên wê de, teorî dabeşkirin û belavbûna çîrokan de ji mêj ve xebatên pir giranbiha hatine kirin; ku me jî di vê xebatê de ji bo sûdwegitina tevî van xebatan û rê û rêbazên berhevkarîyê bi kurtasî hêlsengandin. Herwiha di qada berhevkarîyê de ji bo beralîkirina tevliheviyên berên zargotînî yên bi hev û din û bi çîrokan re, bi kurtasî hin cûreyên zargotînî hatine şîrovekirin û cudabûna wan hatine destnîşankirin.

Ji alî dirûv, naverok, hûnandin, şêwaza vegotinê ve her şaristanî, welat û herêm û herwiha her berek zargotînî û çîrok xwedî taybetmendiyan cihê cihê ne. Bi vê nêrînê çîrokên kurdan û bi taybetî çîrokên herêma Diyarbekirê ji alî şêwaz, dirûv, naverok, leheng û nîgaran ve hatine nirxandin. Bi wê ve girêdayî; şevbihêrk û rol û rista saziya dengbêjiyê û bandora wê ya di neqilkirina berên zargotînî de û bi taybetî li derdora çîrok û çîrokbêjiyê hatiye nirxandin.

Berhevkarîyên ji mej ve ji alî folklornas û dildarên folklorê ve hatine kirin li gor hin pîvanên zanistî hatine hêlsengandin û di çîrokbêjiyê de giringiya herêma Diyarbekir û çîrokên ku ji alî me ve li vê herêmê hatine berhevkarin li ser çend xalan hatine nirxandin û di dawiya teze de hatine bicihkirin.

Bêjeyên Sereke: Zargotina Kurdan, Dabeşkirina Çîrokan, Çîrok û perwerdehî, Berhevkarî, Dabeşkirina Çîrokên Herêma Diyarbekirê.

ÖZET

Masal, Halk edebiyatı ürünleri arasında en yaygın nesir türlerindedir. Yüzyıllar boyu halkın ortak fikir ve duygu dünyasının imbiğinden süzülüp gelen masallar, muhtelif kalıpların olağan ve olağanüstü güç ve kahramanların yardımıyla teşekkül ederler. Halkın ortak duygu ve düşün dünyasını aktarma görevini üstlenen bu anonim tür, çeşitli konularda hayat dersi vermektedir. Bundan dolayı masal, insanlık tarihinde her zaman eğitimin temel malzemesi olagelmıştır. Masalın amaçlarından biri güzel ve keyifli vakit geçirmek ise; diğeri de şüphesiz bazı yaşamsal konularda öğüt vermektir.

Halk Bilimi kapsamında masalların sınıflandırılması ve yayılışı alanında dünya ölçeğinde öteden beri çok değerli çalışmalar yapılmıştır. Biz de bu araştırmamızda söz konusu çalışmalarla birlikte, folklor ürünlerinin derlenip toparlanması konularına kısaca yer verdik. Bununla birlikte derleme çalışmalarında bazı folklor ürünlerinin kendi aralarında ve masallarla karıştırılmaması için bu türler hakkında kısa bilgiler vererek değerlendirmeye çalıştık. Bu minvalde karşılaştırmaya tabi tuttuğumuz edebi ürünleri birbirlerinden ayırdıkları noktalara vurgu yapmaya çalıştık. Genel olarak dünyada her toplumun folklor ürünlerinin ve masalarının anlatış tarzı üslubu, şekillenışı kendine özgüdür. Araştırmamızda bu bakış açısıyla genelde Kürt Halk edebiyatı, özelde de Halk edebiyatının önemli bir edebî mahsulü konumundaki masallar ile Diyarbakır Bölgesine ait masalların üslup, şekil, içerik, motif ve kahramanlarına ışık tutmaya çalıştık.

Kürt Halk Edebiyatında yer alan hoşça vakit geçirmek için “şevbihêrk” denilen gece toplanmaları ve ozanlık (dengbêj) geleneğinin misyonu ve vizyonu folklorik öğeleri ve masal aktarımı diğerk halklarınkinden farklılıklar gösterir. Bu bakımdan halk masal anlatıcısının ozanlık geleneğiyle sıkı bir ilişkisi vardır. Bu araştırmada gerek bazı Kürt folklorcuları ve gerekse bu alanın gönüllüleri tarafından daha önce yapılan derleme çalışmalarını, folklor biliminin ölçülerine göre değerlendirmeye çalıştık. Bununla birlikte sahada yaptığımız pek çok masal derlemelerinden bazı örneklerine de tezin sonunda örnek metin olarak yer verdik.

Anahtar Kelimeler: Krt Folkloru, Masal Tasnifi, Masal ve Eēitim İřlevi, Derleme, Diyarbakır Blgesi Masalları.



ABSTRACT

Fairy tales are prose and among the most common species of folk literature products. For centuries, the fairy tales passing through the filter of the idea and emotions of the people give life lessons some ordinary and extraordinary power of some moulds and with the help of the heroes and the subjects that serve to transfer this common feeling and think world of the people. Therefore, the tale has always been the essential material of education in the history of mankind and serves as a bridge. One of the objective of the tale is to have a nice and pleasant time; the other is undoubtedly to teach in some vital subjects.

In the field of classification and dissemination of folklore and its spread, many precious folk tales works have been carried out for a long time in the world. In this study, together with these studies, we have briefly included the collection of folklore products. In addition to this, we tried to give some brief information about these species in order to avoid confusing some folklore products among themselves and fairy tales by trying to highlight the points where they separate from each other. The shaping of the style of the narrative style of the folklore products and desks of every civilization, country and region in the world is unique in its own way, and in some respects differ. From this point of view, we tried to shed light on the style, shape, motifs and heroes of the tables of Kurdish tales of Diyarbakır region.

Night gatherings called *şevbihêrk* to spend time together, and the mission and vision of the tradition of the bardness (*dengbêj*) show the differences between folkloric elements and fairy tale transmission from other peoples and are distinctive. In this respect, it was observed that the folk poet had a close relationship with the tradition. Both the Kurdish folklorists and the compilation studies conducted by the volunteers of this area were tried to be evaluated according to the measures of folklore. At the same time, some examples of fairy tale collections made in the field for this study were given at the end of the thesis.

Key Words: Kurdish Folklore, fairy tale, education, compilation, fairy tale classification, Diyarbakir Dist

PÊŞGOTIN

Herçend çîrokên herêma Diyarbekirê ji mêj ve hatibin berhevkerin jî bi qasî ku em serwext in; em rastî xebateke akademîk ku bi tenê li ser çîrokên Diyarbekirê pêk hatiye; yan sînorkirî be nehatine. Herwiha berhevkarîyên ku heta niha hatine kirin jî ji ber kêmdarfetîyan di çarçoveya xebeteke akademîk de nehatine kirin.

Di zargotinê de berhevkarî ku herêm bi herêm were kirin, di encama lêkolînên zanistî de meriv bêtir xwe digihîne daneyên rasteqîn. Ji ber ku bandora herêmê ji her alî de li ser berên zargotinê heye. Dema ku me di qadê de berhevkarî dikir di navbera navçeyên Diyarbekirê de ji alî ziman, devok, gotinên ku di çîrokan de dihatin bikaranîn û di navberê van navçeyan de ji alî rewşa wan a civakî de cudahiyên gelek mezin hebûn. Weke mînak navçeya Çinarê herçiqaş 30 km dûrî Amedê be jî ji alî bikaranîna zimên û devokê ve bêtir nêzî Mêrdînê û binxetê ye, hêleke navçeya Çinarê jî xwe digihîne çiyayê Qerejdaxê ku ji ber rewşa wan a civakî bandora zimanê tirkî heta niha pir zêde li ser çênebûye; ango hê jî nehatine bişaftin. Ji ber van egeran li vê heremê hemû berên zargotinê hê jî pir zindî ne. Heta meriv dikare di hinek waran de li wê derê ji zarokan jî hinek berên zargotinê hilde.

Me bi mebesta vê xebatê derdora şêst çîrok berhev kirin, ev bi tena serê xwe gelek çîrokan ji wendabûnê xelas dike û êdî ev çîrok bi awayekê dikevin nav arşîva çîrokên Kurdan. Bi vî rengî ev çîrok jî ji mirinê xelas dibin û wê her zindî bin û bijîn. Herwiha xebata me bi tenê ji berhevkarîyên çîrokan jî pêk nayê; me ligel van berhevkarîyan ji dabeşaşkirina çîrokan bigire heta leheng û nîgarên wan heta li ser hemû hêmanên çîrokan ên girîng dahûrandin û nirxandinên xwe pêşkeş kirin. Ji ber van egeran em hêvî dikin ku ev xebat hindik be jî, ji van kêmasiyên me li jor rêz kirin, yekî yan duduyan ji wan çareser bike û ji bo berhevkarîyan bibe çavkaniyeke biçûk.

Me bi vê xebata xwe xwest ku van cerebe û pend û şîretên di çîrokan de hene neyên jibîrkerin û car din ji bo zarok û civakê ji wan sûd were girtin. Bêguman li herêma Diyarbekirê gelek kesan berhevkarîyên gelek hêja kirine; lê ji ber ku girîngiya çîrokan di nava civakê û heta di nava yên xwende de jî baş nehatiye famkirin

berhevkarîyên ku heta niha hatine kirin tam negihîştine armanca xwe. Herwiha berhevkarîyên heta niha hatine kirin, ji wan çend heb ne tê de, bi rê û rêbazeke akademîk nehatine berhevkirin. Gelek ji wan kengê, li ku, di kîjan şert û mercan de ji kê hatine girtin, tam nediyar in. Bi gelemperî ev çîrok ji zimanê xwe yê herêmî hatine bidûrxistin û bi zimanê nivîskî hatine nivîsîn; ango berhevkarîyan gelek caran hewl dane ku wan bi zimanekî standart binivîsîn. Berhevkarîyên ku hatine kirin bi gelemperî bi fikr û ramanên netewperweriyê ji alî endamên sazî û dezgehan ve bi dildarî hatine kirin. Ji ber kêma derfetîyan li ser berhevkarîyên ku heta niha hatine kirin dahûrandin û dabeşkirinên akademîk nehatine kirin.

Teza me bi giştî ji çar beşan pêk tê. Di beşa yekem de di bin serenava *Di Zargotîna Cîhanê de Cihê Çîrokan* de, pêşî em li ser pênase û naveroka zargotîne sekinîn, dûre jî destpêkirin û gêşedanên zargotîne yê li cîhane bi kurtasî hatin nirxandin. Di lîteratora cîhanê de derbarê berhemên nivîskî yê çîrokan de yê wek paçatantra, çîrokên 1001 Şevkê, Aisopos, La Fontaine kurte agahî hatin dayîn. Di xala sisêyan de di derbarê teoriyên belavbûna çîrokan de bi kurtasî hin agahî hatin pêşkeşkirin. Herwiha di xala çaran de di derbarê teoriya dabeşkirina çîrokan a Aarne-Thompson a V. Propp de çarçoveyek hat danîn. Di xala pêncan de jî em bi kurtasî li ser fonksiyonên çîrokan ên civakî û perwerdehiyê sekinîn.

Di beşa duyem a bi navê *Zargotîna Kurdan* de me di bin du sernavên sereke de vekolînên xwe kirin. Kesên wek lêkolîner, mîsyoner û gerzan ên ku rêya wan bi awayekî bi Kurdistanê ketine û li ser zargotîna kurdan xebitîne; ji çavkaniyên cûr be cûr di derbarê van xebat û nirxandinên wan ên li ser zargotîna kurdan hin agahî hatine parvekirin. Herwiha di xala duyem de ya ku bi navê “cûreyên zargotîna kurdan” de me derbarê çîrok, dastan, mîtolojî, efsane, zûgotinok û gotinên pêşîyan de hin agahiyên teorîk pêşkeş kirin. Ji ber ku di nav berên wek çîrok, dastan, mîtolojî û efsaneyan de di nava gel û berhevkarîyan de tevlihevî û gelemşeyeke mezin heye. Me xwest bi van agahî û mînakên hinek be jî ev tevlihevî bê beralîkirin.

Di beşa sêyem a bi navê *Di Zargotîna Kurdan de Çîrokan* de me bi giştî di heft sernavan de agahiyê xwe parve kirin. Di xala yekem de me qala dabeşkirina çîrokên kurdan kirin û bi vî rengî cudahiyên çîrokên kurdan ji yê cîhanê destnîşan kirin. Herwiha me di vê beşê de derbarê leheng û nîgarên çîrokên kurdan de agahiyê xwe

parve kirin. Me çîrokên kurdan ji alî ziman û teşeyên wan ve nirxandin û derbarê çanda şevbihêrk û dengbêjîyê de hin agahî pêşkeş kirin. Herwiha bîra çîrokbêjan bi hin daneyan hate şîrovekirin.

Di beşa çarem de jî di derbarê rê û rêbazên berhevkarîyê de û bi taybetî jî li ser qonaxa plansazî û destpêka berhevkarîyê me qala hin rê û rêbazên berhevkarîya zargotinê yê nê giştî kirin û me ev rewş bi taybetmendiyê civaka kurdan ve girêda. Herwiha çîrokên ku me berhev kiribûn, ji vana weke minak me di pêvekê de cih da deh heban û ji alî naverok, şêwaza vegotinê, peyam, dem, leheng, cih û hwd de nirxandin.



Cihat GÜNEY

Wan- 2019

SPASÎ

Ji derketin, pêşketin û kemilandina vê tezê heta kêliya dawîn şêwirmendê min ê birêz Doç. Dr. Kemal EROL, bi zanîna xwe ya kûr a akademîk û bi hest û ramanên xwe û bi sebr û sebata xwe ya bêdawî hertim ligel min bû. Di cihê ku ez tê de asê dimam, dixetimîm bi zanîna xwe rêya min ronî dikir û pêşiya min vedikir. Spas ji bo dilsozî û alîkariya Doç. Dr. Kemal EROL.

Spas ji bo mamoste, kedkar, dilsoz û dersdarê beşa kurdî, Dr. Nesim Sönmez ku her tim deriyê wî yê alîkariyê ji bo me vekirîbû. Herwiha spasiyên xwe ji bo mamoste Hikmettin Attî û Hacı Yılmaz re jî pêşkeş dikim ku di beşê de dersdariya me kirin û di ber me de gelek ked dan, di pêvajoya vê tezê de jî em bi tenê nehiştin bi hizr û raman û pêşniyazê xwe her li gel me bûn.

Spas ji bo keda xwarziya min Semra Güçlü ku ji alî rastnivîs û sererastkirinê de gelekî alîkariya min kir. Herwiha spasiya dê û bavê xwe dikim; ku em ji jiyana çîrokan a mîstîk bêpar nehiştin, em li keştiya çîrokan a xeyalî kirin û heta rojê îro anîn. Spas ji bo piştgirî û alîkarî û sebr û sebata wê ya bêdawî, ya heval û hevsera jiyana min. Spasiyên xwe yên taybet ji bo heval û hogirên ku di pêvajoya vê tezê de alîkariya min kirin û em bi tenê nehiştin. Spas ji bo wan çîrokbêjên ku ev çîrok heta roja îro di malzaroka xwe de parastin û diyariyê jiyana me kirin.

KURTEBÊJÊ

bnr. : Binêre

B. Z : Beriya zayînê

C. : Cild

h.b. : Heman berhem

hwd : Her wekî din.

K. T. : Komara Tirkiyê

r. : Rûpel

Weş. : Weşanxane

ûyd. : Ê yên din

vghz : veguhezêr

DESTPÊK

Wêje di qada navnetewî de, di nava hemû gelên cîhanê de, bi giştî di bin du serenavan de tê dabeşkirin. Yek jê wêjeya nivîskî ye; ku ji alî hin kesên nav û paşnavê wan diyar de hatiye afirandin û di heman demê de bi vî rengî derbasî ser rûpelên kaxizê bûye; ya din jî wêjeya gelêrî ye ku xwedî rabirdûyeke dêrîn e, dengê paşerojê digihîne pêşerojê. Bi sed hezar salan li bêjîng û serada demê û ya gel ketiye di encamê de afirîneriyên ku li ser vê bêjîngê mane û ji alî hişê hevpar ê civakê ve hatine pejirandin wek çîrok, dastan, efsane, mamik, zûgotinok, gotinên pêşiyar û biwêj bûne xeml û xêza jiyana me ya rojane.

Bêguman mijarên ku zanista zargotinê li ser radiweste bi wêjeya gelêrî ve ne sînordar in. Vê babetê Celadet Elî Bedirxan wisa şîrove dike; folklor, tevayiya edet, çîrok û stranên milletekî ye. Li gorî Villademîr Propp jî: Herçî afirîneriyên gelan bin, ew hemû folklor in (Rojhilat, 2016: 7-12).

Folklorîst Richard Dorson (2017: 22-28) mijarên folklorê di bin çar serenavan de dabeş dike:

1-Edebiyata devkî/gelêrî (Oral Literature): Berhemên ku ne diyar e ji alî kê ve hatine nivîsîn û gelêrî ne. Hemû cureyên wêjeya gelêrî yê wek dastan, efsane, çîrok, mamik, zûgotinok û hwd di bin vê beşê de cihê xwe digirin.

2- Çanda madî: Ev ji teknîk, bikêrî (skill), formûl û tarîfên ku ji nifşan bo yê din hatine veguhastin; ango li ser mîmariya xaniyan, cil û berg, sewalkarî, cotkarî û hwd dixebite bi kurtasî ev beş hemû afirîneriyên mirovî di nava xwe de dihevine.

3- Adetên gel ên civakî: Rîtûelên derbasbûnê (initiation rites), adetên têkildarî jidayikbûn, zewac, mirin û bîr û baweriyên gel di nav vê beşê de tên tomarkirin. Li gor Dorson ev beş di nava beşa wêjeya devkî û çanda madî de ye û bi herdu aliyar re têkildar e.

4- Bicihanîna (performing) hunerên gelêrî wek muzîka gelêrî, dans û şanoya gelêrî cureyên vê beşê ne.

Herçend Dorson, cureyên zagotinê di nava çar serenavan de dabeş kiribe jî bi xwe jî dibêje; bêguman hinek mijar li derveyê van beşan dimînin û wiha pê de diçe, gelo çawa meriv dikare bi xêzeke zexm mîhrîcan û hunerên îcrakirinê ji hevdu cuda bike? (Dorson, 2017: 28). Herwiha hinek zanyar jî mijarên zargotinê bi wêjeya gelêrî ve sînordar dikin. Bêtir li ser berhemên wêjeya gelêrî disekinin, wan bi tenê wek folklor dinirxînin. Lê weke ku Celedet, Dorson û Propp jî bi lêv kirine mijarên zargotinê bi wêjeya gelêrî ve ne sînordar in. Ji avahîsaziyê bigire heta xwarin û vexwarin, cil û berg û bîr û baweriyên wê civakê hemû dibin mijarên zanista zargotinê.

Xebatên li ser zargotinê û nirxdayîna wê bi xeşîmî û bê pergâlî be jî di sedsala 17. de li ewrûpayê bi bandora, ronakbîrên wek J.J. Rouseu (1712-1778), M. A Voltaire (1694-1788), Baron de Montesquieu (1689-1755), Bernard de Fontenelle (1657-1757) netewperwerên romantîk dest pê dike (Artun, 2017: 12-13).

Vîlademîr Proppê Rûsî jî li ser vê mijarê wiha dibêje: Folklor, zanistekê bîrdozî ye (Propp, 1998: 9-10). Aleqeya li hemberî folklorê û hişyarbûna netewî bi gelemperî di nava hevdu de bûye û gelek caran hevdu temam kirine. Xebatên ku di sedsala 19. de hatine kirin jî vê hizrê destnîşan dikin.

Wekî mînak Anne Marie Thiesse dibêje ku: Folklornasên Bûlxaî yê salên 1860î di heman demê de şerwanên azadiya Bûlxaîstanê bûn (Kadrî, Ramazan, Mustafa, 2013:14). Herwiha welatên weke Fînlandiya, Isvîçre û Almaniyayê jî li hember dagirkeriya çandî ya welatê din, serxwebûna xwe bi berhevkirina kel û pelên zargotinê, bi geşkirin û zindîbûna zimanê xwe bi dest xistine. Li gor Dorson (2017: 51-52) bi bandora hestên netewperî li Almaniyayê birayên Grimm, li Norwêcê Asbjornsen û Moe, li Finlandiyayê Khrons û Lönnrot, li Sirbîstanê Vuk Karadzîc, li Îrlandayê Douglas Hyde û zanyarên din ên bi nav û deng dest bi berhevkariyên berên folklorîk kirine.

Çîrok ji mêj ve amûra sereke ya perwerdehiyê bûye. Di hemû cîhanê de piştî ku teknoloji bi pêş dikeve xêzefilm û film dikevin dewsa çîrokan. Lê belê di gelek amûrên dîtbarî de bi gelemperî dembuharandin li pêş e, bala wan pir zêde li ser perwerdehiyê tune ye; ango bi vî awayî di hêla çîrokan a perwerdehiyê de valahiyek derdikeve holê. Bi vî rengî bi taybetî jiyana zarokan bi tûndiyê jahrdayî dibe û bi

geleşeyên civakî tê dorpekirin. Di encamê de jî ji nirxên xwe yên civaka xwe bi dûr ketin.

Çîrok di nava berên zargotinî de cûreya herî zêde ji alî civakê ve tên zanîn; ên herî berbelav in. Cûreyeke pexşanî ya gelerî ye, ku di herikîna dîrokê de hema em dikarin bibêjin li ser hemû mijarên jiyane hatiye vegotin. Ligel hêla wê ya dembihurîneke xweş; armanca wê ya sereke pend û şîretên derbarê jiyana rojane de ye. Em vê rol û rista wê ya perwerdehiyê hê di Paçatantraya Beydaba û di çîrokên Aisopos de jî dibînin. Di van herdu berhemana de jî ji bo ku pend û şîret cihê xwe bigire û ji bo ku çîrokbêj xwe ji xezeba serweran biparêze; bi gelemperî çîrokên xwe bi zarê lawiran vegotine. Bêguman armanca van vegotinan ne lawir û jiyana wan in; armanca wan jiyana me bi xwe ye. Ev pend û şîret û peyam di çîrokên din de serê wan nixamî bin jî heye; lê di cûreyê çîrokên lawiran de rasterast e û pir beloq e.

Pişî ku pedegogan ev hêla çîrokan a perwerdehiyê ferq kirin, di pirtûkên dersan de bêtir cih dan wan. Me bi xwe jî li dibistanan de, di dersan de ev tişt bi çavên serê xwe dîtin ku hezkirin û alaşya zarokan herî zêde ji bo çîrokan heye. Ji ber ku jiyana çîrokan jiyaneke efsûnî û mîstîk e. Zarok bi taybetî di qonaxa seretayî de her tiştî meraq dikin; cih warê perî, teyr, şêr, rovî û lawirên din ji wan re balkêş tên. Di vê serdemê de jiyana xeyalan a zarokan pir dewlemend e; her zarokek li keştiya xeyalan siwar e û li kesayeta xwe digere. Ji bo ku asoya xeyalên zarokan bêtir fireh bibe û kesayeta wan li ser bingehên baş were rûniştin, çîrok di vî warî de amûreke sereke ye û têr bikêrhatiye.

Ji ber vê çendê zarokên ku bi çîroka mezin bibin, di jiyane de bêtir li pey xeyalên xwe diçin û bêtir têkoşer in; ji ber ku bi sedan lehengên van çîrokan li hember astengiyan û neqenciyan hertim bi têkoşînê bi ser ketine, li pey xeyalê xwe çûne û çarenûsa xwe bi destê xwe diyar kirine. Bi vî rengî zarok her tiştî bi çarenûsa xwe ve girê nadin û bêtir li hember astengiyan li ber xwe didin. Yê bi çîroka mezin nebin ji vana hemûyan bêpar dimînin. Di gelek waran de mekanîk difikirin û li hember pirsgerêkan bê rih û giyan tevdigerin.

Çiya û newalên di nava nevî, bapîr û dapîran de, di nava nifşan de bi vegotina çîrokan bi tevahî ji holê ranebe jî, dê kêmtir bibe. Cerebe û xweşikbûna zimên a bi hezar salan

bi alîkariya çîrokan ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin. Bi vî rengî çîrok di navbera nifşan de dibin pira pêwendiyê.

Di qada zargotinê de li hemû cîhanê hin berên zargotinî yên wek efsane, çîrok, mîtolojî, dastan hene ku gelek caran tên tevlihevkin. Heçend pênase û naveroka van berên zargotinî gelek caran li gor nêrîna folklornasên Rojhilat û Rojava biguherin jî; lê li gor baweriya me di vî warî de kêmasiya sereke, kêmasiya agahiyên teorîk in. Ji bo beralîkirina van gelemşeyan em ê bi kurtasî li ser van berên zargotinî bisekinin. Carinan em ê sînore naveroka wan bi alîkariya folklornasên wek *William R. Bascom*, diyar bikin.

Di dabeşkirina çîrokan de nêrînen cûr be cûr hebin jî dabeşkirina herî berbelav, a ku edî li hemû cîhanê tê bikaranîn, dabeşkirina Aarne- Thompson e. Di vê dabeşkirinê de çîrok li gor asayîbûn, derasayîbûn, leheng û hin motîfên sereke di bin pênc serenavan de tên nirxandin. V. Proppê Rûsî li hember vê nêrînê derdikeve û teoriyeke din bi pêş dixe. Propp, li ser sed çîrokên derasayî yên Rûsî ji alî binyadgerî û dirûvî de xebateke berfireh dike. Di encamê de ji alî pêkhatina bûyeran ve xwe digihîne hin zagonên neguherbar; ku li gor wî ev zagon ji bo hemû çîrokên derasayî derbasdar in.

Herwiha em ê hewl bidin ku çîrokên Kurdan li gor taybetmendiya naverok û lehengên wan dabeş bikin. Di vî warî de mixabin ku em rastî xebatên berbiçav nehatin da ku jê sûdê wergirin. Di navberadabeşkirina çîrokên Kurdan û yên gelên din de wekhevî; an cûdabûn heye yan na, ku hebe ev di kîjan waran de ye? Em ê hewl bidin ku di beşa sêyem de bersiva van pirsan bidin.

Her cûreyeke wêjeyî û zargotinî xwediyê ziman û şêwaza vegotîneke cûda ye. Ziman û vegotina helbestê ji ya romanê; ya efsaneyan ji ya çîrokan cudatir e. Di çîrokan de di beşa destpêk, pêşketin û çareserî de hin zûgotinokên ku bi gelemperî edî hertim wek qalib tên bikaranîn diyar in. Di destpêkê de bi alîkariya van zûgotinokan zimanê çîrokê ji rastiyê bi dûr dike ve û ber bi jiyaneke efsûnî û razber ve dimeşe. Di vê meşê de jiyana asayî û derasayî her di nava hev û din de ye; lê guhdêr li ber vê rewşê namînin heyirî û wê weke hêmeyeke jiyana me ya rasteqîn dihesibînin. Ev taybetmendiya ziman û şêwaza vegotina çîrokan jî rê dide ku asoya çîrokan firehtir

bibe. Em ê di xala ziman û şêwaza vegotina çîrokan de hewl bidin ku vê mijarê hinekî din jî vekolin.

Di xebatên zanistî de ji bo encamên serkeftî û sûdewar rê û rêbaz diyardeyê sereke ye. Her zanist jî li gor pêdiviyên xwe rê û rêbazên cihê cihê dişopîne. Bêguman ev tişt ji bo zanista zargotinê jî derbasdar e. Di zanista zargotinê de em vê pêvajoyê dikarin weke plansazî, berhevkarî û nirxandin bi nav bikin, ji ber ku ev mijareke bi serê xwe ye û pir berfireh bi taybetî em ê li ser qonaxa plansaziyê rawestin. Lê bivê nevê di hin waran de em ê qala qonaxa berhevkarî û nirxandinê jî bikin. Herçend em di vê beşê de bi tenê li ser qonaxa plansaziyê bisekinin jî em ê bi kurtasî hin pîvanên berhevkarîyê jî destnîşan bikin.

Xebata me di esasê xwe de xebateke berhevkarîyê ye. Me bi mabesta vê berhevkarîyê gelek çîrokên kurdan ên herêma diyarbekir berhev kirin, bi vî rengî me ew çîrok ji ber bayê demê yê wendabûnê xelas kirin û diyariyê arşîva pêşerojê kirin.

BEŞA YEKEM

DI ZARGOTINA CÎHANÊ DE CIHÊ ÇÎROKAN

1.1. Zargotin û Geşedanên Zargotinê Yên Li Cîhanê

Zargotin qewimîn û cerebeyên ku bi sedşalan di serê civakê re derbas bûne û bi awayekê bandor li ser civakê kirine û bi rengekî ketine ser zar û zimanan e. Zargotin kevneşopîyan ji nifşekî radigihîne nifşekî dîtir û bi awayekî di navbera nifşan de pirên pêwendiyê ava dike. Carinan ev cerebeyên ku tên ragihandin wek dastan, efsane çîrok û gotinên pêşîyan in û rasterast bi zimên ve têkildar in; carinan jî bîr û bawerî cil û berg, xwarin û vexwarin, rabûn û rûniştin û afirîneriyên wê civakê bi xwe ne.

Zargotin jî peyveke hevdudanî ye. Ji peyva zar (ziman) û gotinê pêk hatiye; ango tiştên ku bi zar, bi ziman were vegotin zargotin e. Şîn, şahî, kêfxweşî û xemgîniyên ku hatine jiyîn û qewimîne hemû bi zar bûne (Rojhilat, 2016: 4-12). Bêjeya zargotinê bi kurdî tê wateya zanista gelêrî, zanîna gelî; ango gelnasiyê. Di zaravayên Kurdî de ji bo zanista folklorê, bi kurmancî peyva *zargotinê*, bi soranî, *xelknasî* û bi kirmanckî *zanistiya şarî* tê gotin (Yıldırım, ûyd, 2013: 11). Bêguman em sînore zargotinê tenê bi ziman ve girê bidin em ê sînor û asoya zanista zargotinê teng bikin. Em ê hewl bidin ku di bendê jêr de vê rewşê zalaltir bikin.

Folklor, li weletekî yan li herêmekê mijarên çanda gel a madî û manewî ji xwe re dike mijar, wan li gor rêbazên xwe yê taybet berhev dike, dabeş dike, şîrove dike, dinirxîne û li ser van encaman xwe digihîne sentezekê (Örnek, 2014: 21). Bêguman eger meriv bikaribe van mînakên mijarên çanda gel weke zargotin bi nav bike divê di demê ku di ser re derbas bûne de ji alî hişê hevpar ê civakê ve hatibe pejirandin û têra xwe hatibê dubarekirin. Ev têgehên dúbarekirin û pejirandinê di zargotinê de gelek girîng in. Herwiha ev têgeh bi hevdu re girêdayî ne û hevdu dişopînin. Mijar an berên ku civak di dilê xwe de nehewîne û nepejirîne jixwe dubare nake. Mijarên ku ji alî gelek kesan ve neyên vegotin jî nikare bi berdeyamî bijî. Wê demê dê li ber bayê demê bikeve, ji holê rabibe û wenda bibe.

Herçend bi gelemperî di nava gel de û hin berhevkarên de bêjeya zargotinê were bikaranîn jî; lê di lîteratora navnetewî de bêjeya folklorê jî êdî cihê xwe qewîn kiriye. Ji ber wê çendê hewce ye ku em li ser wateya bêjeya folklorê jî rawestin. Ji ber ku ji bêgavî, em ê di hin nivîsên teorîk de carinan bêjeya folklorê jî bi kar bînin.

Folklor ji du bêjeyên Îngilîzî pêk tê: *folk* gel û *lore* jî zanîn e, bi vî awayî folklor tê wateya zanîna gel, gelnasiyê. Pênaseyên ku hatine kirin piranî bi hêla wê ya zanînê (lore) de ketine, hinek ji wan jî li ser gel (folk) sekinîne. Yê ku li ser zanînê sekinîne, li ser mirovên ku berên folklorê afirandine, bikaranîne, nesekinîne ji wê bêtir bala xwe dane ser berên folklorê (Dundes, 2005: 27-29). Dema ku meriv li hemû welatan û di zimanan de bi giştî bala xwe dide binavkirin û pênasekirinên folklorê hemû li derdora bêjeyên gel (folk) û zanînê (zanînê) çûne û hatine.

Li ser pênase û xwezaya folklorê Alan Dundes, di gotara xwe ya bi navê “Folklor çi ye” de wiha vê rewşê şîrove dike:

Standard Dictionary of Folklore, Mythology and Legend a cilda yekem de, bîst û yek cure pênaseyên ji hev cuda tên kirin. Di van pênaseyan de tiştê hevpar ê ku derdikeve pêş ev e: Folklor kevneşopîya gel a devkî ye, yan di kevneşopîya gel a devkî de ye (Dundes, 2005: 27-29). Ev jî destnîşan dike ku li ser pênase û naverokên zargotinê lihevkirineke bi giştî hîn jî tune ye. Di vî warî de, heta di nav folklornasê welatekî de jî lihevkirinek û yekdengiyek hîn jî çê nebûye. Esas vê nelihevkirinê divê meriv heta cihekî wek rewşeke asayî jî bibîne û bi wî rengî binirxînin. Ji ber ku berê dasa zargotinê pir berfireh e. Her berhevkarê dema ku berhevkarîyê dike bêtir çi bi ber dasa wî/wê bikeve; herwiha lêkolînerê dema ku li ser mijarên zargotinê dixebite mijara wî çi be û bi viya ve girêdayî bala wî/wê li ser kîjan mijarê be, di dilê xwe de kîjan mijar hewandibe dê wê bêtir derxe pêş.

Vê rewşê folklornasê Tirk Sedat Veyis Örnek (2014:23) wisa şîrove dike; li ser beşên civakî û civaknasiyê meriv nikare çarçoveyeke teqez deyne û bi beşên din re jî nikare van sînorên nelihevkirinê bi awayeke eşkere diyar bike.

Zargotin berên ji destpêkê heta roja me afirînerên wan ne diyar in; an nayên zanîn, bi gelemperî hemû çandên ji zimanê devkî û nivîskî pêk hatine û di bandora

biyaniyan de ne, hest û raman dengvedan têgihîştina gerdûnî ya gel hemûyan di xwe de dihundirîne re tê gotin (Batur, 1998: 5). Herçend Batur di pêneseya xwe de qala çandê bike jî dema meriv bi giştî li naveroka berhema wî dinêre xuya ye ku bi tenê berên ku pêwendiya wan bi zimên re hene, wêjeya gel weke zargotin dihesibîne.

Naveroka zargotinê jî li gor nêrîn û feraseta folklornasan diguhere. Hinek ji wan hemû berhemên çanda gelêrî dixin bin naveroka folklorê. Alan Dundesê ku di vî warî de gelek xebatên hêja kirine, mijarên zargotinê wisa diyar dike: mît, efsane, destan, çîrok, gotinên pêşiyar, mamik, çîvanok, stran, sehr, dia, nifir, dijûn, heqaret, silav, henek, sond, xatirxwestin, hunerên gelêrî, cil û berg, xwarin û vexwarin, lîstik, şano û muzîka gelêrî, bijîşkiya gelêrî, leqeb, nivîsên mezelan, bîr û bawerî û hwd (Rojhilat, 2016: 16-20).

Her çiqas di lîteretora cîhanê de peyva folklorê êdî wek têgîneke navnetewî hatibe pejirandin jî, di şûna bêjeya folklorê de bi gelemperî heta ji me bê em ê bêjeya “zargotin”ê bi kar bînin. Lê dibe ku di hin cihên teorîk de nivîskaran bi xwe bêjeya folklorê bi kar anîbe û êdî ev bêje lê fesilîbe, wê demê em ê di wan deran de bêjeya folklorê bi kar bînin. Ji ber ku gava di berhevkarîyê de me têgeha folklorê bi kar dianî, gel tu wate nedida vê bêjeyê û tiştê jê fam nedikir. Herwiha bêjeya folklorê di nava mirovên xwende de jî di wateya komên govendê de; yan di dewsa navê zanîna govendê tê bikaranîn. Bêguman ev rewş tenê di nava kurdan de wisa nîn e di nava gelê tirk de jî bêjeya folklorê bi heman wateyê tê bikaranîn û bi tenê bi hin mijarên taybet ên heremî ve tê girêdan. Ji ber van sedeman erdnîgariyê ewqas dêrîn û bi wê ve girêdayî ji alî berên zargotinî ve ewçend dewlemend, bi taybetî hîn jî li ser zargotina kurdan xebatên bi rêk pêk nehatine kirin û dewlemendiya zargotina vê erdnîgariyê hîn jî nehatiye berhevkrin û neketiye nava arşîva cîhanê.

1.2. Dîroka Belavbûna Zargotinê

Di sala 1812’an de li Almanyayê di wateya “zanista gelêrî” de peyva ku dihat bikaranîn “volkskunde” bû. Piştê 22 Tebaxa 1846’an de kevnezanên îngilîz ji kovara Atheneiumê re nameyekî dişîne û pêşniyaz dike ku di şûna bêjeya *kevnarên populer* de bêjeya *folklorê* bê bikaranîn (Dorson, 2017: 21). Piştê 1891’ê de di Kongreya

Folklorê ya Navneteweyî de bêjeya folklorê tê pejirandin. Herwiha di vê kongreyê de çarçove û mijarên folklorê jî bi berfirehî tên nîqaşkirin.

Bêjeya folklorê niha him wek navê vê zanistê; him jî di şûna navê hemû beran de ku di encama berhevkarîyê de bi dest dikevin tê bikaranîn. Folklornasê tirk Erman Artun (2017: 11) dîroka berhevkarîyên ku ji mêj ve hatine kirin ji devê Boratav (1907 - 1998)¹ wisa radigihîne me; cara ewil xebata ku rasterast li ser folklorê hatiye nivîsîn di Yewnana Kevn de (B. Z. 2) ji alî Pausanias bi navê Şayesa Yewnanîstanê ye. Pausanias di berhama xwe de qala jiyana û bîr û baweriyên gelê xwe dike. Herwiha di hin berhemên gerzan lêkolîner û dîrokzan de ne rasterast be jî gelek agahiyên giranbuha hene. Di sedsala 10'an de gerzanên ereb Êbnî Fazlan û Ebû Dûlef, di sedsala 13. de gerzanê venedîkî, di sedsala 14. de gerzanên ereb Êbnî Batûta di berhemên xwe de gelek agahiyên derbarê folklorê de dane.

Herwiha di xebatên kesên wek Herodot (B.M 425) û Strabon, Ksênefon, Plutarc (B. Z 1.) de jî ne rasterast bin jî agahiyên derheqê gelên din û kurdan de hene (Yıldırım, ûyd, 2013: 16).

Li gor tespîten G. Cocchiara (1980) ya di dîroka hizra Ewropayê de cîhgirtina gel, çanda gel, bawerî û toreyên gel; piştî kifşkirina Amerîkayê rastî eleqeyeke mezin tê. Li Ewropayê di bingeha vê eleqeyê de ku bi sedemên curbecur çûyîna Amerîqayê yên kesên wek oldar, gerzan, hunermend, maceraperest hene. Van kesan tiştên ku di vê *cîhana nû* de dîtin, nivîsandin û arşîveke dewlemend li pey xwe hiştin. Nivîskar û lêkolînerên rojhilatî bi sedemên curbecur eleqe nîşanî vê *cîhana nûh a* bi gotina ewrûpiya *mirovên hov xwedî kok* jê re tê gotin dane. Hinekan ji wan li gor xwe di wan de; zarokatiya şaristaniya ewrûpayê, hinek ji wan paqijî û reseniya serdema yekem a xiristiyaniyê didîtin. Hinek jî di wê baweriyê de bûn ku dê bi lêkolîna van çandan, bêtir Yewnana klasîk û Romayê fêm bikin û têbigihên (Çobanoğlu, 2012: 94).

Em ê li vir di şûna têgeha *mirovên hov xwedî kok* de *mirovên xwezayî* yan *mirovên jiyana xwezayî* pêşniyaz bikin. Ji ber ku herçend hinek ewrûpiyên wek Montaigne li hember van nêrfinan derketibin jî ev navlêkirin bi giştî nêrfîn û feraseta li

¹ Pertev Naili Boratav: Li ser folklorê tirk bi awayekî teorîk xebitiye û di vê qadê de gelek berhemê wî hene.

hember gelê din destnîşan dike. Hemû danûstendinên van mirovan her tim bi xwezayê re ne û di nava jiyaneke xwezayî de ne. Ronakbîrên wek Voltaire, (1694-1788) Montesquieu (1689-1755) herçend wek Montaigne, J.J. Rousseu nehizirin jî; çanda niştecihên Amerîkî, Asyayî û gelê xwe rûberî hev kirine û bi vî awayî civaka xwe rexne kirine û pesnê wan çandan dane. Di demeke pir zû de, di nava rewşenbîrên Ewropî de ew eleqeya li hember vê cîhana nû, îcar berê xwe ji *mirovên jiyana xwezayî* dide cîhana kevn; ango rojhilat. Gerzan, zanyar, nivîskar û kesên oldar îcarê rojhilata bi *sêhr û mîstîk* meraq dikin û berê xwe didin wir (Rojhilat, 2016: 7-12).

Di sala 1650'yî de Pirtûka Pietro Della Valle ya bi navê “Viaggî di Pietro Delle Valle il Plegriño” li ser tore û baweriyên gelên Asyayî û Mezopotamyayê lêkolînê dike û agahiyên berfireh dide. Jean Babtîste Tavernîer (1605-1689) jî wek Pietro heman rêyê dişopîne, li ser heman mijaran pirtûkekê diweşîne. Antonîe Galland (1649-1715) bi navê *Les Mîlles Et Une Nuits Çîrokên Hezar û Şevêkê*” werdigerîne fransîzî û pirtûk rastî eleqeyeke mezin tê (vghz. Atti, 2013: 4).

La Fontaine (1601-1695) dema ku çîrokên lawiran dinivîse bi awayekî eşkere dibêje ku: Min ev çîrok ji pirtûka Bîdpaî (Beydaba) ya bi navê *Kelîle û Dîmneyê* wergirtine (La Fontaine, (2000:1). La Fontaine, Gelek zanyarên wek Marc Lescarbot (1580-1630, Dîroka Fransaya nû), Lafîtau (1681-1746, Toreyên Hovên Amerîqî), J. J. Rousseu, Voltaire (1694-1788), Montesquieu (1689-1755) berê xwe dane bawerî û toreyên gel û li ser wan lêkolînên giranbiha kirine (vghz, Rojhilat, 2016: 7-12).

Li ser van bingehan em dikarin bibêjin ku geşedanên folkorê di sedsala 19. 20. de bi awayekî, bi şert û mercên gelemperî yên civakî, yên ewrûpayê ve alaqadar e. Herwiha geşedan û pêşketinên di zanista gelnasiyê de, guherîn û rûdanên sereke yên civakî ne.

Em vî tiştî di kar û xebatên li ser zargotina kurdî de jî dibînin, kesên ku berhevkarîya zargotina kurdî ji xwe re dikin derd û xem, li ser hûr dibin. Di sala 1919'an de di “Belavoka Komeleya Kurd ji bo Zanîne” ya ku di kovara Jînê de hatiye weşandin, di nîfşê Hawarê de, Rewşenê û heta roja me ku sazî, dezgeh û her wiha di şaxsiyetê ku li ser zargotinê bi hewldanê xwe yên kesane xebitîne de jî dibînin (Rojhilat, 2016: 7-12).

Herçend li ser folklorê berê hin xebat hebin jî, lê weke zanistêke serbixwe xebatên gelnasiyê di sedsala 19. de dest pê dikin. Di dawiya sedsala 18. de Herder têgînên wek gel, stranên gel, rihê gel, baweriyê gel bi kar anîn. *Stranên Gel* ên Herder cara ewil 1778-1779 de çap bûn. Digel wê jî xebatên folklorê heta sedsaleke din tam derneketin holê. Piştî Birayên Grimm 1812an de bi navê *Kinder und Hausmärchen* (Çîrokên ji bo Zarok û Maliyan) çap kirin. Bi bandora Romantîzm, Nasyonalîzmê û mirovan berê xwe dan demên dêrîn û bi vî rengî di nav kesên bi hizir û ramanên netewperî tevdiqeriyên û nasnameya xwe ya netewî meraq dikirin de gelek alîgir peyda kirin. Bi vê bandorê di dawiya sedsala 19. de li Ewrûpa û li Amerîqayê saziyên folklorê ava bûn (Dundes, 2006: 12).

Li Almanyayê bi taybetî Herder bi awayekî bîrdozî li ser zargotinê xebitî. Li gor Herderî, wêjeyê resen a ku ji bin bandora wêjeya biyanî derketiye; rihê civakê yê herî baş, paqij û hevpar, yê ku xirab nebûye di “wêjeya gelêrî” de ye. Dêvla ku elman, yewnan, latîn; an neteweyêke din teqlîd bikin divê vegere rehê xwe yê derîn û kevnare. Ji bo ku ev jî pêk were divê elman bi zimanê xwe yê xwerû û dewlemend xeber bidin (Çobanoğlu, 2012: 102).

Dema ku hebûna tunebûna neteweyek bikeve xetereyê xelasiya neteweyê ancax bi berhevkirina berên zargotinî pêkan e. Ji ber ku di zargotinê de rehê civakê ya hevpar veşartîye û civak bi tenê li dora vê giyana hevpar dikare were ba hev. Herwiha eger neteweyêke bixwaze mora xwe li dîrokê bide û xizmetê ji mirovahiyê re bike divê vegere cerebeyên xwe dêrîn û wan cerebêyê jiyân û çanda xwe diyariyê şaristaniyê bike. Ji ber ku darek ancax dema ku li ser koka xwe şîn bibe bi domdarî dikare fêkiyên baş û xweş bide.

Ji alî rê û rêbazên ve xebatên Herder bandoreke mezin li ser rewşenbîrên wê demê çêkir. Bi vê bandorê Birayên Grimm ketin nav liv û tevgerê û ew bi awayekî zanistî li ser zargotina Almanî xebitîn. Herwiha wan Teoriyên Zimanên Hînd-Ewropî bi pêş xistin û pêşengiya wê kirin. Van xebatan Herder û Birayên Grimm wek pêla avê bandoreke erênî li ser folklorên Fînî jî kirin.

Li Fîndiyayê Julîs û Kaarla Krohn, ku bav û kur bûn, li ser zanista zargotinê xebatên giranbuha kirin û pirtûkek bi navê *Rêbazên Zargotinê* li ser teoriya zargotinê

nivisandin. Dû re xwendekarê wan Dr. Ellias Lönnrot (1884), di navbera salên 1835-1849'an de destana Fîniyan a bi navê *Kalavela* berhev kir û weşand. Piştî weşandina vê destanê hişmendiya netewperweriyê di nava Fîniyan de bi carekê de belav bû (Rojhilat, 2016: 7-12).

Piştî ku folklor wek zanistekê serbixwe tê qebûl kirin, li her welatî, bi taybetî di nava milletên ku di nava pêşketinê de ne, xebatên li ser çanda gel, bawerî û adetên gel û her cure hêmanên manewî ku, bi jiyana civakî re rasterast têkildar in, bi lez tên kirin. Di cîhana rojhelat de jî xebatên bi vî rengî, di destpêkê de, bi piranî ji aliyê mîsyonerên Rojavayî û Rûsî ve hatine kirin. Herwiha xebatên li ser folklor an jî çand û zimanê civaka kurd jî, bi vî rengî dest pê kirine. Divê em vê rastiyê destnîşan bikin ku ev xebatên mîsyoner û lêgeran ku di çarçoveya *Rojhelatnasiyê* de tên nirxandin, xebatên gelek hêja ne û herwiha dokumentên pir hêja gihandine serdema me (Atti, 2013: 5).

Ev kar û xebatên di demên cihê cihê de li ser berên zargotinî yê curbecur hatine kirin; hemû ji bo xebatên piştî xwe, ji alî rê û rêbazên berhevkarîyê, termînolojîyê, dabeşkirina berhemên zargotinî ve bûne çavkanî û palpiştên sereke. Bi alîkariya van xebatên destpêkê, bi kar û xebatên peyrevên van kesan, êdî zargotin bêtir bi pergala dibe û dibe wek dîsîplîn û zanistekê serbixwe.

1.3. Xebat û Çavkanîyên Giştî yê li Ser Çîrokan

Yewnanî û Rûman derketina holê ya cureyekê çîrokan, *fabl* (B.Z 6000) digihandin Aisopos (Ezopê) ku li Asyaya Biçûk jiyabû. Lê li gor lêkolînan, fabl berîya Ezop (Aisopos) 1000 sal berê, li erdnîgarîya Mezopotamyayê ji aliyê Somerîyan li ser nivîstekan hatine nivîsîn (Kramer, 2014:141).

Li ser çîrokan ev daneyên li ber destê me yê nivîskî ne, bêguman heta ku berhemek derbasî ser nivîsê bibe paşxaneyek wê ya dûv dirêj heye. Çîrok jî bi heman rengî berîya ku li ser van nivîstekan were nivîsîn ji mêj ve jî di nava hemû civakan de hebûne û berbelav bûne; ji ber ku heta tiştek were nivîsin jê re pêvajoyek dûvdirêj divê.

Ji roja me 1500 sal berê dema zilm û zordestiya keyayê Hindê Debşelem li ser gelê wî zêde dibe. Beydaba wek zanayekî xwendekarê xwe li dora xwe kom dike û ji wan re rewşê vedibêje:

Lazim e ku em di vê dema zahmet de gelê xwe bi tenê nehêlin û divê ez herim û bi awayê çîrokî û bi devê lawiran hin şîretan li Debşelem bikim; da ku dev ji vê zilm û zordestiya xwe berde. Beydaba li ser vê yekê lê dixê diçe qesra wî bi awayekî mijarê vedike û bi zarê lawiran şîretan li Debşelem dike, ta ku wî heta astekî tîne. Beydaba ji bo rêvebiriyê baş û adîlane vê pirtûkê dinivîse. Piştî ku padîşahê Îranê, yê ku bi dadmendiya xwe tê nasîn, bi hebûna vê pirtûkê dihesê bi alîkariya bijîjkê xwe Berzeveyh pirtûkê bi dest dixê û werdigerîne zimanê Pehlewî. Tiştê balkêş ew e ku her padîşahî ev pirtûk bi dest xistiye weke razekê ji herkesî veşartiyê û parastiyê (Beydaba, 2011: 11).

Çîrokên 1001 Şevêkî bi rêbaza rêzeçîrokan hatiye nivîsîn. Destpêka rêza çîrokan bi kurtasî wiha ye. Hukumdarê Semerkandê Şahzeman Rojekî ji bo ku here serdana birayê xwe Şehriyarê ku hukumdarê Sasaniyan, ji malê derdikeve; lê belê tiştêkî ji bîr dike û car din dizîvire malê. Dema dizîvire tê dibîne ku jina wî bi yekî reşik re di kêf û zewqa dinyayê de ye. Li ser viya Şahzeman radibe her duyan jî dîkuje û lê dixê diçe cem Şehriyarê birayê xwe yê padîşahê Sasaniyan. Rojekî dema birayê wî li nêçîrê ye mêze dike ku jina birayê wî hîn ji jina wî jî xirabtir dike. Rojekî derdikevin ger û geştê wê demê meselê ji birayê xwe re vedibêje. Tam di wê demê de dinêrin ku efrûtekî cinan ji wir de tê û sindiqeq di destan de ye. Ji tirsan her du jî derdikevin serê darekî. Efrûtê cinan sindoqa xwe vedike û keçîkek pir bedew jê derdikeve. Efrûtê cinan piştî kêliyêkê di xew ve diçe. Keçîk ji bo, bi wê re bikevin kêf û zewqê dinya û dinyaligê gazî wan herdu hukumdara dike; ya na dibêje ez ê gazî efrûtê cinan bikim. Evana êdî ji mejbûrî dadikevin jêr (Tülücü, 2004: 1-53).

Li ser van bûyeran êdî bawer dikin ku hemû jin wisa ne. Piştî viya Şehriyar radibe jina xwe dîkuje û şevê bi keçîkekê re radibe û rûdine û dû re jî keçîkê dîkuje. Piştî sê salan di wî welatî êdî keçîk namînin. Qîza wezîr radibe bi pîlan pê re dizewice û bi alîkariya xwişka xwe her şev çîrokekê ji hukumdar re vedibêje, tam di cihê herî bi kelecana de çîrokê qut dike. Ev rewş tam 1001 şevêkî didome ji ber wê çendê ji van çîrokan re dibêjin çîrokê 1001 Şevêkê. Di dawiyê de Şehriyar Şehrezadê nakuje û pêra

dizewice, bi xêra wê keçikên bajêr tev xilas dibin. Herçend li ser binyada van çîrokan nêrînên cûda cûda hebin jî, kesên wek pisporê Sansqîrîdî A. W. Von Schlegel, Maxs Muler koka van çîrokên 1001 şevêkî digihîne welatê Hîndê. Ev çîrok ji bo Erebi bi navê Hezar Efsane (Hezar Çîrok) jî tên werdigerandin (Tülücü, 2004: 1-53).

Di nava nevoraka wê ya rengîn ji Çîn, Hîndistan, Kurdîstan, Îran, Tirkîstan, Erebiistan û Afrîqayê gelek şop û hêman hene loma wekî dîmenekî pîrlewn ê rojhilat û başûrê dinyayê derdikeve pêşberî xwîneran. Ji ber wê jî çîrokên 1001 şevêkî di çar beşan wek çîrokên Hindî, çîrokên Îranî, çîrokên dewra Harûnê Reşîd (786-809) û çîrokên serdema Fatîmî û Memlûkîyan hatine dabeşkirin (Celalî, 2018: 38-42).

Bêguman heta ku bigihîje La Fontainê (1621-1695) fransizî gelek kesên din jî çîrok nivîsîne. Di pêşgotina pirtûka Aisopos de (2010: 11) ev rewş wisa hatîye nivîsîn: La Fontaine 238 çîrok di 12 pirtûkan de kom kirine. Heta pirtûka şeşan pîr eşkere di bin bandora Aisopos de maye. Herwiha La Fontaine di pêşgotina berhema xwe de derbarê vê mijarê de bi xwe jî wiha dibêje: Bavê lehengên min Ezop e.

Di qada çîrokan de lêkolînên zanistî yên bi rêk û pêk cara yekem ji aliyê birayên Grimm ve tên kirin. Birayên Grimm di 1812'an de pirtûkeke ji 200 çîrokan pêk tê bi navê Çîrokên *Zarok û Malîyan* li Almaniyayê çap dikin (Ewig, 2006: 376- 389). Çapkirina van pirtûkan bandoreke pîr mezin li ser Almanan û herwiha li ser folklornasên cîhanê yê din jî çêdike. Piştî van gelek kesên din, didin pey şopa Birayên Grimm. Li gor bawerîya birayên Grimm û xwendekarên wan; çîrokên gel yadîgara mîtolojîyên serdema kevnên herî dawî Hind- Almanî ne û bi alîkarîya van motîfên belawela yên di van çîrokan de; ji nû ve sazkirina mîtên Xweda, Xwedevend û lehengan pêkan e (Degh, 2005: 165-187).

Bêguman ji xeynî van xebatên ku me li jor rêzkirin, di vî warî de gelek xebatên din jî hene; ku ji bo ku mijar dirêj nebe me cih nêdan wan xebatan.

1.4. Teorî û Rê û Rêbazên Belavbûna Çîrokan

1.4.1. Teoriyên Belavbûna Çîrokan

Piştî ku folklornasan girîngiya berên folklorê û taybetî jî ya çîrokan fêhm kirin; belavbûna rê û rêbazên çîrokan jî meraq kirin. Hinekan gotin çavkanîya hemû çîrokan welatê Hindê ye, hinekan gotin Misir e û hinek jî wan jî ketine pey şopa çîroka resen a ewil. Her rêbaza teorîk li gor xwe li ser çîrokan xebitiye, berê xwe dane hin taybetmendiyên çîrokê û li gor nêrîna rêbaza xwe, rê û rêbaza belavbûna çîrokan jî şîrove kirine. Ev hemû rê û rêbazên teorîk bûne sedem ku, asoya folklornasan berfirehtir bibe û dahûrandinên akademîk li ser çîrokan bi pêş bixin. Em ê di vê beşê de ne bi giştî be jî, ji bo balkişandina vê mijarê li ser çend rê û rêbazan sereke rawestin. Ji ber ku rê û rêbazên folklorê gelek zêde ne û ew bi tenê dikarin bibin mijara xebateke bi serê xwe.

1.4.2. Koçberiya Çîrokan û Deynwergerîna Çandî

Theodor Benfley çîrokên hindê Panhatantra (Kelîle û Dîmne) werdigerîne almanî û çap dike. Banfley di pêşgotina vê pirtûkê de nêrîna xwe ya belavbûna çîrokan jî eşkere dike. Benfley di serdema navîn de tespîta; gelo bê ka çawa ev çîrok ji zimanê Pehlewî, Erebî, Îbranî, Sanskrîtî, Latînî û ji wir jî wergeriyane zimanê dîtir dike (Ewig,2006:376-398).

Li gor Benfley wekhevûna çîrokan ne mervantiya di nava gelan de ye; wekhevûna wan, ji dan û stendinên wan ên dîrokî û çandî pêk tên. Ger ku zimanê gelan cuda bin jî di van têkiliyên dîrokî de ji çanda hev û din hin tiştan bi deyn werdigerin. Herwiha li gor baweriya Birayên Grimm jî malzarok û çavkaniya hemû çîrok û mîtan Hindistan bû û ji wir pêl bi pêl li hemû deverên din belav bûbûn. Dûre Wander jî piştgiriya dide vê teoriyê û hinekî din jî bi pêş dixê. Li gor Wander jî çîrok di serdema navîn de bi rêyên cuda cuda hatine Ewrûpayê û li wir belav bûne. Herwiha bi vê nêrîna xwe birayên Grimm bandorê li ser teoriya erdnîgariya Fînî jî dikin. Ji ber ku ew jî her dixwazin xwe bigihînin guhertoya herî resen (Sydow, 2005: 108- 124).

Di warê çîrokan de daneyê herî kevn a li ber destê folklornasan Paçatantraya welatê Hindê bû. Li ser van daneyan û bi hizrên netewperweriyê kesên wek Herder û

birayên Grîmm bi xebatên xwe bingeha vê teoriyê avêtin. Demeke pir dirêj vê teoriyê bandoreke pir mezin li ser folklornasên din jî kir. Niha ev kesên ku vê nêrînê bi lêv dikin vê çavkaniyê bi tenê bi Paçatantrayê ve gire nadin herwiha dewlemendiya zargotina gelê hind-ewrûpî û mezapotamyayê jî bi lêv dikin.

1.4.3. Teoriya Etnolojîk

Alîgirên vê nêrînê, lêkolînerên bi navê Andrew Lang, Edward Taylor û M. Lennan in. Li gorî nêrîna wan: Kaniya çîrokan ne mîtolojî yan jî Hindistan e; ew bermayên jiyana medenî ne. Li gorî nêrîna Lang: Ji fikrên îptîdaî ku di çîrokan de hene diyar e ku, ew ji dewrên arkaîk mane lê ew li deverên cuda û bi rengê ji hev serbixwe derketine meydanê. Ji ber ku çandên cuda jî bi rengê paralel pêş ketine, di nava çîrokên wan de jî hevbeşî hene (Attî, 2013: 13). Li gor vê teoriyê jî çîrok li nav her welat û gelan bi heman bandora ji hizirînên olî yê cuda cuda derketine holê.

1.4.4. Teoriya Erdnîgarî- Dîrokî

Bi bandora hizrên birayên Grimm *Teoriya Erdnîgarî- Dîrokî ya Fînî* bi pêşengiya Kaarle Krohn û Antî Aarne dertê holê û bi pêş dikeve. Herwiha ji vê teoriyê re ekola Fînî jî tê gotin. Ev teorî li hember teoriya Koçberiya Çîrokan û deynwergirtina Çandî ya Benfley derdikeve holê. Di vê metodê de ji bo xwe gihandina çavkaniya resen û belavbûna hemû rêyên wê; guhertoyên (varyant) çîrokekê hemû tên berawerdkirin (Ewig, 2006: 376-398).

Li gor vê rêbazê guhertoyên çîrokê çiqas zêde dibin bila bibin, reseniya van hemû guhertoyan li ciyekî (erdnîgarî) ji çavkaniyekê wek pêlên ava behrê pêl bi pêl belav bûne. Teoriya Dîrokî- Erdnîgarî motîfasyon û heta rêbaza xwe ji xebatên Elias Lönnrot, Brayên Grimm û C.W. Von Sydow girtiye. Bi taybetî, xebatên Elias Lönnrot di vê geşedanê vê teoriyê de roleke pir çalak listîye (Hîkmet, 2016: 26-31).

Di vê rêbazê de folklornasê ku danberheviyê dike hewl dide ku dîroka çîrokekê, straneke gel; an berên folklorîk ji nû ve ava bike. Di vê rêbazê de divê li ser şaxê her çîrokekê bihûrgilî û bê pêşdarastin lêkolîn bê kirin. Bi vê rêbazê bi sedan berên zargotinî yê heman varyantên çîrokan tên berhevkirin. Di vê rêbazê de ne hemû berên zargotinî bin jî, hinek ji wan ji çavkaniya resen li erdnîgariyekî û di demekê de

derketine holê û belavbûne. Bi vî awayî lêkolîner hewil dide ku xwe bigihîne serçaviya esasî. Dorson, 2011: 11- 19).

1.4.5. Teoriya Antropolojîk-Karîgerî

Li gor vê rêbazê jî; ji dêvla ku em yekoyek li ser guhertoyên çîrokan bisekinin; divê em li ser çîrokekê lêkolînên bi dilê xwe bi awayeke berfireh bikin; da ku em xwe bigihînin encamekê. Folklorîst Franz Boas hê di 1916an de li ser rêbaza Antropolojîk-Karîgeriyê de wiha dibêje: Ku lêkolînek baş li ser berên folklorîk yê komekê bê kirin; meriv dikare gelek agahiyên etnografîk jî di derbarê wê komê de bi dest bixe. Li gor baweriya Boas folklor eynika çandê ye. Alan Dundes van her du rêbazan wiha şîrove dike; di esasê xwe de yê ku rêbaza berawerdkirî dipejirînin pir hindik bi zanistê re mijûl dibin; lê yê ku rêbaza etnografîk dipejirînin jî ji zanistê bêtir bi gel re mijûl dibin. Zanyariyê bi tenê ji bo ku gelnasiyê baş şîrove bikin wek amûr bi kar tînin (Dundes 2005: 16-20). Esas divê ev herdu rêbaz di lêkolînan de hevdu temam bikin, yek li ber yekê nebe asteng; ku pêkan be dema ku ev herdu rêbaz an hinek rêbazên din bi hev re bînan bikaranînin dê encama lêkolînan jî sêdwertir be.

Ruth Benedich di berhema xwe ya *Zuni Mythology* de karîgeriya folklorê radixe ber çavan û wisa pê de diçe folklor ji bo çareseriya fantaziya û dijminahiya sînorên çandî gelek caran rêgezên civakî binpê dike. Çîrok hem bi çandê re li hev kirî ye, hem jî ne lihev kirî ye. Rêgez û tevgerên ku di nava civakê de qedexe bin, nikarin bînan bilêv kirin, lê di berên folklorê de ji xwe re rêyekî dibînin (Dorson, 2011: 34).

Birastî jî dema ku di nava kurdan de jî meriv bi vê nêrînê li berên zargotînê dinêre gelek tiştên balkêş derdikevin holê. Di stranên gelêrî de dema qala bejn û bal, dev û lêv û pêşîrên jinêkî tê kirin bi şeyesandineke kitekitî tîna pêşkeşkirin. Di wê şevbihêrkê; an dawetê de ji jin û mêran heta kal û pîran û xortan keseke şaş û metal namîne û kesek rewşê şermazar nake û rêgezên civakê bibîr naxe; Lê ji derveyê zargotînê bilêv kirinê bi vî rengî rastî astengiyên rêgezên civakê tîna. Wisa xuyaye ku Ev rewş di berên zargotînê de rewa ye; an di hişê hevpar yê civakê de ev rewş berê tiştêkî asayî û ji rêzê bûye; an jî wek ecizîyek û serî hildaneke li hember regez û zagonên civakî ye.

Teoriya Antropolojîk Karîgerî bi gelemperî ji aliyê folklornas Franz Boas û xwendekarên wî edîtorê Kovara Folklorê Amerîkî Ruth Benedicct û folklornas William Bascom ew jî xwendekarê Melville Herskovits bû, ku mamosteyê Bascom bi xwe jî xwendekarê Boas bû. Piştî ev teorî bandora xwe li ser folklornasên Ewrûpî yê wek Lînda Degh jî dike (Dorson (2017: 61-62).

Lo gor Dorson, Wiliam Bascom di pêşvebirina vê teoriyê de bi rol û rîsteke girîng rabûye (Dorson, 2011: 34). Bascom fikr û ramanên takekesî û civakî nêzî hev du dike û Bascom çar karîgeriyên girîng ên zargotinê wisa rêz dike.

1. Karîgeriya şabûnê, şakirin û xweşbihurandina demê.
2. Karîgeriya piştevaniya sazî û dezgeh û rê û resmên civakî.
3. Karîgeriya veguhestina çand û perwedehiyê, ji bo nifşên ciwan.
4. Karîgeriya ji rizgarbûna ji zext û zordariyê takekesî û civakî (Hîkmet: 2016: 90).

1.5. Teoriyên Dabeşkirina Çîrokan

1.5.1. Dabeşkirina Aarne -Thompson

Xwendekarê Karla Khron Anti Aarne bi rêbazê Dîrokî- Erdnîgarî Finî di 1910an de îndeksa/pêrist tîpolojiya çîrokên gelerî derdixe. Aarne çîrokan wek çîrokên lawiran, çîrokên gel ên esasî û wek pêkenok di bin sê beşan de disenifîne. Di vê îndeksê de bi gelemperî çîrokên Hind-Ewrûpayê bi kurtî hene. Dû re ev rêbaz ji aliyê xwendekarê Aarne, Stith Thompson ve du caran (1928-1961) tê sererastkirin û bi pêş xistin. Dû re ev rêbaz ji aliyê xwendekarê Aarne, Stith Thompson ve du caran (1928-1961) tê sererastkirin û bi pêş xistin (Dundes, 2005: 16-20). Thompson çîrokan, wek çîrokên lawiran, çîrokên gel ên esasî, yê pêkenokî, yê ku bi formulekî dest pê dikin û wek ên ku nakevin dabeşkirinê di bin pênc serenavan de dabeşkirine. Em ê jî li vir bi kurtasî derbarê dabeşkirina Thompson de hin agahiya bidin û car caran jî berê xwe bidin çîrokên kurdan.

Di motîf îndeksa Thompson de ji hemû deverên cihanê çîrokên gel, efsane û mît li gor motifên/nîgarên xwe bi awayekê alfabetîk û mêjerî hatine dabeşkirin. Lêkolînerê folklorê dema ku bixwaze li gor nîgaran xwe bigihîne çîrokekê divê li cilda şeşan a ku hemû nîgarên çîrokan bi awayekê alfabetîk tê de hatine tomarkirin binêre û di wan de li peyvên sereke bigere. Thompson bi vê îndeksa xwe karê lêkolîneran gelekî hêsan kiriye. Ji ber ku ji alî her du folklornasan ve hatiye bikaranîn ji vê re *Motîf Îndeksa Aarne-Thomson* jî tê gotin (Dundes, 2005: 16-20). Mixabin heta niha ji bo dabeşkirina çîrokên kurdan ew derfet û zanîn çênebûye ku rêbazên wisa zanistî bîn pêşxistin û bikaranîn. Divê li gor vê rêbazê hemû çîrokên kurdan li gor nîgarên xwe bi awayeke zanistî bîn dabeşkirin da ku karê lêkolîneran hêsan bibe. Em ê di sernavên jêr de Dabeşkirina Aarne-Thomson bi awayekî kurt bidin nasîn.

1.5.1.1.Çîrokên Tevlihev

1.5.1.1.1. Çîrok an Çîrokên Derasayî (Tîprêzgeh, 300-749)

Di dabeşkirina Aarne-Thompson de ev çîrok di nava tîprêzgeha 300- 749 de hatine tomarkirin. Aarne-Thompson cureyên van çîrokan li gor rewşa wan a derasayî wisa rêz dike:

Dijminên derasayî, mêrên/jinên derasayî, efsûnkirî; an xizmên din, efsûnkirî, peywirên derasayî, alîgirên derasayî, hêmanên sêhrî, hêz û zanînen derasayî. Li gor Linda Degh çîrokên bi sêhr wesîqeyên herî kevn ên dîroka mirovahiyê ne. (Degh, 2005: 342-353). Ev cûre çîrok ji ber nîgarên ku di xwe de dihewînin meriv dikare bibêje ku nûnertiya cûreya çîrokê dikin. Ji ber ku ev cûre çîrok ji her alî de zêde pirolekirîne û di nava gel de dema meriv qala cûreyê çîrokê dike, rasterast çîrokên derasayî bi lêv dikin.

1.5.1.1.2.Çîrokên Olî (Tîprêzgeh, 750-849)

Di tîprêzgeha Aarne -Thompson de di navbera 750-849an de hatine tomarkirin. Di van çîrokan de li derdora nîgarên bihuşt, dogeh, mêvan û mazûvanê wan hatine honandin. Herçendî lehengên ciyê (sînagog, mizgeft, demxane û hwd) van çîrokan li gor her ol û şaristaniyê biguherin jî; lê hêma motîf û fonksiyonên wan naguherin. Di katologa Aarne -Thompson de di bin sê sernavan de hatine dabeşkirin; xwedê ceza dike

û xelat dike, rastî derdikeve holê, mirovê di bihuştê de Adem, mirovê ku guh daye şeytan Adem (Degh, 2005: 342-353).

Ev çîrok hinek ji wan pir dirêj, hinek jî pir kurt in. Nûner û pêşengên olan, ji bo ku şîretên sincî li derdora xwe bikin, wan jî çîrok bi kar anîne. Ji ber wê carina bi efsaneyên olî re jî tînen tevlihevkin.

1.5.1.1.3. Çîrokên Romantîk an Romanî (Rêzeçîrok, Tîprêzgeh, 859-999)

Ev çîrok di kataloga Aarne -Thompson de wek novella jî hatine binavkirin; ango romanên kurt in. Ev kategorî çîrokên xwezayê yê curbecûr û nêzî jiyana rasteqîn di xwe de dihevin. Di vana de hêmanên fantastîk li gorî çîrokên din pir kêmtir in. Kesayetên van çîrokan ne kesên çîna bilind in, ne jî cin û perî ne; ew bi gelemperî kesên ji rêzê ne û navê wan jî navên jiyana me ya rojane ne. Di van çîrokan de ji xeynî hin kesên gewre û şeytan hin dijminên xirab hene; lê ev ne kesên derasayî ne, mirovên jiyana me ya rojane ne. Têmaya van çîrokan ji şaşmîtiyê zêdetir, serhatîperestî, kartêker, û hestiyarî ye. Ji lehengiyê zêdetir jîrîtî, hin tevgerên mirovane yê wek aqilmendî, berxwedêrî, zexmî û sebir e (Degh, 2005: 342-353).

Di van çîrokan de bûyer, li cihana me ya rasteqîn, li cîyekî diyar û di demeke diyar de diqewimin. Ev xal van cure çîrokan ji yê din cuda dikin. Ji ber ku di cureyê din de cî, cîyekî xeyalî ye, dem jî demeke tam nediyar e.

1.5.1.2. Çîrokên Hêsan

1.5.1.2.1. Çîrokên Lawiran (Tîprêzgeh, 1299)

Leheng û kesayetên wan lawir in; lê cihana wan cîhana me ya rojane; tevgerên wan jî wek ên mirovan in. Wek mirovan dixwin, diaxivin û dihezirin. Ev tişt jî ji bo wan wek ku pir ji rêzê be, asayî be tu kes şaş û metel namîne. Ev çîrok piranî li ser dijberiyê hatine honandin. Hertim li hember xirabiyê başî li hember hêzê (şêr, gur) konetî (rovî) heye û nûnertiya temayê başî-xirabî, konetî-hêz her ji aliyê hin lawirên diyar ve tînen kirin. Piştî tîkoşîna van hêzên dijber, di dawiya van çîrokan de ji bo guhdaran rasterast şîret hene.

Di kataloga Aarne–Thopson de ev çîrok jî di bin navê çîrokên lawiran de hatine dabeşkirin û li gor vê dabeşkerinê di tîprêzgehê de ciyê xwe digirin. Di kataloga Aarne - Thompson de çîrokên lawiran wisa hatine dabeşkirin:

Lawirên hov, lawirên hov û kedî, mirov û lawirên hov, lawirên kedî, çûk, masî, lawirên din û heyber (Degh, 2005: 342-353). Weke ku li jor di dabeşkirina Aarne - Thopson de jî diyar dibe cureyê lawirekê, dikare di tîprêzgehê de bi serê xwe lawirê hov cî bigire û dikare wek mirov û lawirên hov jî bê dabeşkirin. Di qada çîrokbêjiyê de bi qasî ku tê zanîn dîroka çîrokên lawiran, ku jê re fabl jî tê gotin, xwe digihîne Someriyên, Kelîle û Dimneya Hindê û Ezopê yewnanî û La Fontaineê fransîzî.

1.5.1.2.2. Henek û Pêkenok (Tîprêzgeh: 1200-1999)

Ev cure çîrok ji aliyê Aarne ve wek jest, anekdot hatine binavkirin. Di kurdî de jî her herêmekî li gor xwe bi nav kirine weke pêkenî, pêkenok, pêkenîn, meselok, metelok, henek, qerf, lek, gelte, latîfe, serpêhatî, nukte, serhatî, anekdot, qise, kurteçîrok û hwd Herçend van demên dawî pêkenok bi serê xwe wek cureyekê bê hesibandin jî, di kataloga Aarne -Thopson de wek cureyekê çîrokê hatiye dabeşkirin. Bi gelemperî ji bo dem bihurandineke xweş û şîret dayînê tîpîk bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku li ser her mijarên jiyana hatine vegotin.

1.6. Ji Alî Avahîsaziyê ve Dahûrandina Rêbaza Vladimir Propp

Herçend di salên 1960î de di folklorê de rêbaza *tekst navendî*, ji aliyê Andre Jones, Lord Raglan hatibe bikaranîn jî; lê di gelnasiyê de nûnerê vê rêbazê yê herî girîng Vladimir Proppê Rûsî tê pêjirandin. Propp bi pirtûka xwe ya *Avahîsaziya Çîrokan* navdar dibe. Her çiqas dû re alan Alan Dundes jî bi vê rêbazê gelek xebat kiribin jî lê di hin waran de bi rexnegirî nêzî vê rêbazê dibe. Li gor Propp, bi rêbaza *tekst-navendî* xebat û lêkolînên li ser çîrokan, çiqas berfireh û kûr bin jî, meriv tu carî bi vê rêbazê bi ser nakeve û tu encamê jê nagire. Ji ber vê çendê Propp gihîştîye encama ku; divê çîrok ji aliyê avahîsazî/ tîpîk ve bê dabeşkirin (Çıblak, 2005: 129).

Li gor Propp pêvajoya derketina çîrokan a dîrokî, ya ku li ku û ji alî kê ve hatine gotin, ewqas ne girîng e. Li gor wî ya girîng teşe û karîgeriya van çîrokan e. Propp li ser 100 çîrokên rûsî yê awarte ku ji mîj ve hatibûn berhevkirin li gor rêbaza

binyadgerî dixebite. Propp di van çîrokan de li ser pirrengînî, yeksengî, yekdirûviya çîrokan radiweste. Propp dibîne ku di çîrokên cuda cuda de fonksiyon û peyvîrên lehengan her yek in û qet naguherin.

Li gor Propp tiştê ku cuda xwiya dikin di esasê xwe de eynî ne, qet naguherin. Tiştê ku diguherin leheng in û alavên ku di çîrokan de hatine bikaranîn in. Propp bi van xebatan û di vî warî de dixwaze bigîhîje zagonên sabît. Propp di vê derbarê de wisa berdewam dike: dabeşkirina çîrokan a herî berbelav, em wan weke çîrokên awarte, çîrokên toreyî, çîrokên lawiran dabeş dikin.² Ev dabeşkirin di destpêkê de ji her kesî ve rast xuya dike; lê piştî wê bivê nevē pirsek tê kirin: Gelo çîrokên lawiran bi gelemperî derasayîbûnê jî di xwe de nahewînin? Em tam dijberê wê bifikirin, lawir jî di çîrokên derasayî de ne xwedî roleke sereke ne Li gor Propp rêbaza Aarne ne rêbazeke zanistiye. Ew tîprêzgeha Aarne sûdewar dibîne û wisa pê de diçe; di esasê xwe de dabeşkirinek teqes ya tîprêzgeha tune ye (Proop, 2011: 9-15).

Dema ku meriv bi nêrîna Propp li çîrokan dinêrin bi rastî jî ji alî dabeşkirinê ve; çîrokek di heman demê de, hem wek çîrokeke olî, çîrokeke derasayî hem jî wek çîroka lawiran xuya dike. Lehengê çîrokê dibe ku lawir be, bi devê wî lehengî mijareke olî were bilêvkirin û dibe ku, di heman demê de taybetmendiyê wî yê derasayî jî hebin.

Li gor Propp karîgerî kiryarên kesan e; lê ev kiryar jî li gor wateya honandina herîkîna bûyeran tînan diyarkirin. Bi awayekê din kiryarên kesan bîngeha beşên çîrokan e. Propp van kiryaran jî guherîna kesan her dem rizgar dike û ciyê her kiryarê li gor herîkîna bûyerê diyar dike. Propp bi vî awayî 31 kiryaran tespît dike. Propp van kiryaran wisa rêz dike:

Dûrketin, qedexekirin, bînpêkirina qedexeyê, lêpîrsîn, komkirina agahiyan, xapandin, tevlibûna sûc, xirabî (kemasî), navbeynkarî, destpêkirina kiryara dijber, çûyîn, kiryara yekemîn a pexşker, berteka leheng, girtina heybera efsûndar, rêwîtiya di navbera du keyîtiya de, lêkdan, îşareta taybet, serkeftin, hilanîn, bi şûn de vegehin, şopandin, alîkarî, xwe veşartin û vegehin, fikrên bêbingeh, karê zahmet, pêkanîna karê

² Ev dabeşkirin ji alî V. F. Miller ve hatîye pêşniyazkirin. Herwiha ev senifandin ji aliyê dibistana mîtî ve jî hatîye pêşirandin.

zahmet, nasandin, derxistina holê, guherîna teşe, cezakirin, zewicandin (Proop, 2011: 28-65).

Bêguman di hemû çîrokan de ev kiryar bi dorê peyda nabin lê car caran ji van karîgerîan du-sê heb tune ne; yan di ser re hatine gavkirin. Digel viya jî dora qewimîna kiryan car din naguhere. Di çîrokên derasayî de her tişt bi xirabiyekê dest pê dike. Leheng ji bo ku xirabiyê ji holê rake dikeve nav liv û tevgeran. Ji bo viya jî hinek kes alîkariya leheng dikin; hinek jî li hember derdikevin. Bi vî awayî leheng heta ku bi ser dikeve, bi dorê di hemû qonaxan re derbas dibe. Propp di van xebatên xwe de li ser karîgeriyên çîrokan digihîje van encaman:

1. Kiryarên lehengan ji aliyê kê û çawa diqewimin bila biqewimin tu carî naguherin û her yek in û berdewam dikin.
2. Di çîrokên derasayî de karîgerî/kiryar bi sînor in.
3. Dora karîgeriyan her yek in.
4. Avaniya hemû çîrokên derasayî yek in naguherin (Propp, 2011: 24, 25, 26).

Rêbaza Propp mijareke bi serê xwe ye û pir berfireh e. Li her welatekî û van demên dawî de li ser çîrokên û dastanên kurdan jî gelek folklornas bi vê rêbazê xebitîne. Ji ber ku mijara me ya esasî nîn e em ê vê mijarê li vir bihêlin, derbasî mijarê din bibin.

1.7. Tevlihevkirina Çîrokan Bi Berên Din Re

Di qada folklorê de ji destpêkê heta niha di nava gel de û di nava lêkolînerên hîn nû dest bi xebatê kirine de hin berên/cureyên folklorîk ji mêj ve tên tevlihevkirin. Herçend bi taybetî li Ewropayê bi alîkariya xebatên teorîk ev mijar zelal bûbe jî; lê di nava berhevkarên kurd de ev gelemşe û tevlihevî hîn jî berdewam dike, bêtir beloq e. Ji ber ku ev xebat heta niha bi tenê ji alî hin kesên dildar ve hatine kirin. Dema ku em dîn û bala xwe didinê ji heman berê zargotînê re berhevkarê dastan, yek efsane yê din jî çîrok gotiye. Ji ber vê çendê em ê ji bo zelalî û çareserîya vê tevliheviyê bi alîkariya tabloya Folklornas William R. Bascom hewl bidin ku vê gelemşeyê piçek be jî çareser bikin. Bêguman ji xeynê Bascom hin kesên din jî li ser vê pirsgirêkê lêkolîn kirine û gotar weşandine Maxs Luthi Wilfried Buch ji wan kesan in.

Folklornas William R. Bascom di gotara xwe ya “Cureyên Folklorê: Di Vegotinên Pexşan” de bi awayeke zanistî li ser mît, efsane û çîrokan danberheviyê dike û wiha balê dikşîne ser çîrokan; li gor Bascom çîrok cureyeke vegotinên pexşanî, sêwirandî û xeyalî ne. Ne wek dogma ne jî weke dîrok tên pejirandin; dibe ku qewimîbe û dibe ku ne qewimîbe jî, ne girîng in û rasteqîn nayên pejirandin. Herçendî bi armanca kêfxweşiyê hatibin sêwirandin jî; lê weke mînak karîgerîên çîrokan ên sincî, yên cur be cur jî hene. Dibe ku çîrok ji bo dem û ciyekî hatibin sêwirandin; ji ber vê çendê çîrok bê dem û cî ne û wek vegotinên zarokan hatine pejirandin. Bascom cureyên çîrokan wisa rêz dike: Çîrokên merivan, çîrokên lawiran, çîrokên xapandinê, çîrokên nitirandî³ û dirêj, çîrokên nakokiyê, çîrokên qalibgirtî, çîrokên ehlaqî, û fabl (Bascom, 2006: 125-151).

Em ê li gor tabloya Bascom a li jêr mît, efsane û çîrokan ji aliyê, bawerî, dem, cî, helwesta pejirandinê û ji aliyê kesayetên sereke ve binirxînin.

Tabloya Cureyên Pexşanî

Cure	Bawerî	Dem	Cî	Helwesta pejirandinê	Kesayetên sereke
Mît	Rast	Dema dûr a borî	Cihaneke cuda ya zû; an wekî din.	Pîroz	Heyînên derveyî mirovan
Efsane	Rast	Dema nêz a borî	Cihana me ya îroyîn	Pîroz an ne pîroz	Mirov
Çîrok	Sêwirandî	Demeke Ne dîyar	Cîyekî çawalêhato	Ne pîroz	Mirov an ên din

³ Nitirandî: pirolekirî, fişalkirî, zêde nepixandî.

Weke ku di tabloya jor a Folkloras William R. Bascom de jî diyar dibe ew mît, efsane û çîrokan li ser çend xalên girîng dide ber hev. Herwiha pir hindik ev tablo ji aliyê gelek folkloran ve jî hatiye pejirandin.

Civak ji mît û efsaneyan teqez bawer dike; lê baweriya xwe bi çîrokan nayîne. Bi gelemperî mît demeke beriya afirandin; an serdestpêka afirandina cihanê de diqewimin: lê efsane li gor mîtan bêtir dinyewî ne dem, dema cihana me ya îroyîn e. Di çîrokan de demeke tam diyar tune ye; dem, her dem e; ango tam ne diyar e.

Li gor tabloya Bascom ciyê ku mît lê diqewimin cihaneke cuda ye, ne wek vê cihana ku em tê de dijîn e; heke cî ev دنیا be serdestpêka afirandina cihanê ye. Tam dijberê mîtan ciyê ku efsane lê diqewimin cihana me ya îroyîn e. Ciyê bûyerên çîrokan jî lê diqewimin jî yan wek çiyayê qaf ciyekê xeyalî ye yan jî ciyekê çawalêhatoye; ango cî di çîrokan de tam nediyar e.

Gel ji ber ku mît û efsaneyan pîroz dihesibîne teqez jê bawer dike: lê çîrokan wek bûyerên sêwirandî û xeyalî dibîne, ji ber wê çendê ji wan bawer nake. Lehengên mîtan Xweda, Xwedawend û yên derdora wan in; yên çîrokan mirov, cin, perî, hijdiya; an gur û rovî ne. Lêbelê yên efsaneyan bi tenê mirov in. Ji alî leheng an keseyatiyan ve tiştê hevpar a di nava her sê cureyan de ev e ku gelek caran xwedî hêzeke derasayî û derasayî ye.

Maxs Luthi di gotara xwe ya bi navê “Cudabûna Çîrokan ji Efsane, Menkabe, Mît, Fabl û Pêkenokan” de, ji bo çîrokê wisa dibêje: Di çîrokê de fam feraseta li hember hêza xwedayî kêr e, herwiha tiştê pir bi tirs û xof di xwe de nahewîne. Di vî warî de di çîrokên periyên de; yan di yên derasayî de jî giraniyek û cîdiyet heye (Lûthî, 2005: 421-429).

1.8. Karîgeriya Çîrokan

Herçend gelek karîgeriyên çîroka yên cur be cur hebin jî em ê di vê beşê de di bin du navên serekede nêrînên xwe parve bikin. Yek jê karîgeriya civakî ya din jî karîgeriya perwerdehiyê ye.

1.8.1. Karîgeriyên Civakî

Di esasê xwe de karîgerîên civakî û perwerdehî nêzî hevdu ne û carinan ev karîgerî dikevin nava hevdu jî. Ji bo ku mijar baştir bê fêmkirin, bi kurtasî me ev her du karîgerî ji hevdu cuda nirxandin. Ji vê beşê mabest bêtir ji xeynî zarokan mezin in. Di nava keft û leftên jiyane de civak li ku derê hebe pêdivî û teşqeleyên wê jî hertim hene. Di nava keft û leftên jiyana rojane de gelek pirsgirêk tên serê mirovan. Xapandin, xiyamet, dizî, kuştin, zordarî ji vana çendek in.

Çîrok ji bo ku civat bigere û ji şîretên wê ders were hilgirtin tê gotin. Carinan bav ji zarok; an bûka xwe re rasterast nikare tişteki bibêje. Dema ku bibêje belkî dilmayînek, şikestinek çêbibe. Ji bo van rewşan gelek caran mezinan, kesên şareza mexsed û miraza dilê xwe bi lehengên çîrokan dane vegotin. Kesên jîr û jêhatî xelat kirine, kesên tiral û kone jî celat kirine. Herçendî di çîrokan de remzên fantastîk hebin jî, jiyana lehengên wan jiyana me bi xwe ye; yan jî xeyalên jiyana me ne. Her çî be jî di çîrokan de mîr û beg û paşa bazirgan û gavan, xulam û axa, dê û bav jin û mêr, zirbav û damarî her yek bi rol û rista xwe ya di nava civakê de radibe. Bi hebûn û şîrovekirina van endamên civakê, civak tê nasîn bi wî awayî tê birixistinkirin û bi vî rengî hê jî hêsantir tê birêvebirin.

Dema ku zilm û zordestiya keyayê Hindê Debşelem li ser gelê wî zêde dibe. Beydaba wek zanayekî xwendekarê xwe li dora xwe kom dike û ji wan re dibêje: Lazim e ku em di vê dema zahmet de gelê xwe bi tenê nehêlin û divê ez herim û bi awayê çîrokî û bi zarê lawiran hin şîretan li Debşelem bikim; da ku dev ji vê zilm û zordestiyê berde. Di encamê de Beydaba xwe digihîne Demşelem û bandoreke erênî li ser wî çê dike. Ji bo ku debşelem welatê xwe xweş bi rêve bibe, li ser wê radibe Paçatantrayê dinivîse. Bi rê nîşandana Beydaba û alîkariyan çîrokan gelê Hindê ji bin nîrê zilm û zordestiya keyayê wê demê xelas dibe (Beydaba, 2011: 11-15).

Di vê mînaka Debşelem û Beydaba de em rol û rista çîrokan û rola wana birêvebirina civakê pir eşkere dibînin. Ji ber wê çendê kes nikare bibêje ku cûreyê çîrokê bi tenê ji bo zarokan tê gotin.

Em dibînin ku Ezop (Aisopos) jî gotinên xwe ji keya re rasterast nabêje, ew jî bi zarê lawiran dibêje; lê digel wê jî car din xwe ji xezeba keşîşên Delpohoi rizgar nake. Li ser çîrokên wî cezayê mirinê lê dibirin; lê tê gotin ku Ezop car din parastina xwe bi çîroka *Bi Rêwiya re Qirşik* û dema ku cezayê wî teqez jî dikin; ji bo şermezarkirina wan çîroka *Mişk û Beq* vedibêje. (Aisopos, 2010: 7-11).

Bi giştî dema em li pêvajoya derketina fablan dinêrin wisa dixwiye ku yek jê ji bo ku şikestinek, dilmayînek çê nebe, gotinên mirovan bi devê lawiran didin gotin û tevgerên mirovan li wan bar dikin. Ya din jî weke ku di meseleya Ezop û Beydaba û keyayê Hindê Debşelem de jî dixwiye ji ber tîrsa desthilatdarî û nîrê zorê ye. Ji bo ku rastî xezeba zordesta neyên, gotinên xwe bi devê lawiran dane gotin; ango remz bi kar anîne.

1.8.2. Karîgeriyên Perwerdehiyê

Armanca vegotinan a xebrojkan yek jê bi kefxweşî bihurandina demê be; ya din jî hilgirtina pend û şîretan e. Di cureyeke xebroşkan a bi navê fablan de jixwe di dawiya çîrokê de ev şîret bi xwe jî tîr bilêvkirin. Ji ber vê çendê di mezinkirin û gihandina zarokan de xeberoşk amûra ewil û sereke ye; ku ji alî dayikan ve tîr bikaranîn. Di çîrokan de hertim li hember xirabiyê şerê qencî û başiyê heye. Lehengên qenc bi xurtbûn û hêza xwe li hember dêw, hijdiya û hûtan li ber xwe didin, têdikoşin û bi ser dikevin. Ev jî di pêşerojê de li hember kes, bûyer û bobelatan rêya berxwedan û têkoşinê nîşanê zarokan dide. Encamên bi vî rengî li hember xirabiyê hêviyê di zarokan de diafirînin.

Di encamê de teqez lehengên qenc û başî bi ser dikevin. Zarok dema van çîrokan guhdarî dikin xwe dixin dewsa van lehengên dilpak, dilêr û ku bi hemû taybetiyên xwe nîşaneyên qencyê ne. Bi vî awayî çîrok bandorên pir erênî li ser kesayeta zarokan çêdikin. Piştî ku pedegog û perwerdekar bi van aliyên çîrokan hesiyan, wek amûrekê perwerdehiyê, bi taybetî di pêşdibistanan de û di refê din de jî bi kar anîn. Nirxên navnetewî û mirovahiyê yên wek sebir, rastbûn, dilpakî, qencî û wekhevî bi alîkariya çîrokan derbasî nivîşê din dibin.

Di tevahî pergalên perwerdehiyê de, armanca sereke ya perwerdehiyê ev e ku, nirx û normên civakê veguhezîne ferdên civakê û bi vî awayî ferdeke bitendurust, biaheng, bixwebawer û civakhez mezin bike (Pertev, 2008: 110). Xeberojk bi remz û nîgarên xwe yê fantastîk jî dibin keştî û balafira zarokan, wan welat bi welat, li çiya û banî, li deşt û zozanên efsûnî, razmend û nehênî digerin. Ji ber vê taybetmendiye çîrok, asoya jiyana zarokan firehtir dikin. Ev jî di pêşerojê de bandora xwe li ser nêrîna helwesta giştî ya jiyana wan dike.

Helbestvanê Tirk ê navdar Cemal Süreya li ser girîngiya çîrokan wiha dibêje: Zarokên ku çîrok guhdarî nekiribin; dema mezin bibin, wêneyê pisîkan jî bi rastkêşê çê dikin. Zarokên ku li çîrokan guhdarî bikin asoya xeyalên wan jî firehtir dibe. Ji ber ku di çîrokan de sînorê xeyalan tune ye. Zarokên ku çîrokan guhdarî nekin jî her tiştî mekanîk dibînin û wisa jî dihizirin, hest û ramanên xwe tevî çareseriyên nakin.

Di çîrokan de ji ber ku bûyer û serpêhatî zêde ne; ango asta aksiyona wan hertim berz e, ev jî rê dide ku zarok bêtir ji wan hez bikin û wan guhdarî bikin. Zimanê çîrokan zimanekî herikbar û rewan e. Herwiha bi guhdarîkirina çîrokan, zarok bê zahmetî fêrî taybetmendî û xweşikbûna zimanê dayika xwe jî dibin.

La Fontaine di pêşgotina pirtûka xwe de wiha balê dikişîne ser rol û rista çîrokan a ji bo perwerdehiyê: Dîgel ku Platon Homeros ji welatê xwe diqewirîne jî; lê ciyekê bi nirx dide Ezop û daxwaz dike ku pîrejin çîrokên wî fêrî zarokan bikin. La Fontaine li ser vê mijarê wiha berdewam dike:

Çimkî em çiqas zû hînî zanebûn û dilpakîyê bibin ewqas baştir e. Dêvla ku em ji bêgavî hînbûyînen xwe yê nebaş sererast bikin, divê em hewl bidin ku wan di serî de sererast bikin. Ji bo vê jî, ji çîrokan baştir rêyeke din heye gelo? Herçend ev çîrok ji derva de bi tenê ji bo zarokan xuya bikin jî ne wisa ne, esas wateyên wan ên pir cuda û qewîn hene (La Fontaine, 2012: 1-6). La Fontaine jî hîn di sedsala 17. de hay ji hêlên çîrokan ên perwerdihê heye û ji wan baştir jî rêyeke din nabîne.

Di nava cûreyên zargotinî û heta yê nûjen de jî cûreya ku herî zêde nêzî rihê zarokan e çîrok e. Di navbera salên 4-8 an de xeyalên zarokan û dinya fantastîk a çîrokan pir nêzî hev e. Ji ber wê çendê dema ku mezin çîrokan ji zarokan re vedibêjin

di navbera wan û zarokan de jî pêwendiyêke xweş çê dibe. Meriv dikare bibêje kû çîrok dayika xêzêfilman û malzaroka lehengê wan e. Ji ber wê çendê îro li gelek welatan ev çîrok ji bo qanalên zarokan çavkaniyên sereke ne. Di vî warî de divê pedegog bi zanîna xwe rê nîşanî medyaya dîtbarî bidin da ku di şûna wan filmên tirsnaq de çîrok bîn weşandin.

Li gor pedegogan çar heb karîgerîyên çîrokan hene: 1. Kêf û zewq, 2. Psîkolojîk, 3. Perwerdehî 4. Amedekirina jiyana civakî (Uçak, 2010: 77-99). Dema ku çîrok tîn gotin, çî zarok be çî mezin be, kêfa tevan jê re tê; demborî be jî, mirovan ji teşqele û keft û leftên jiyana rojane bi qasekî dûr dixin. Guhdêr hinek be jî noqî nava jiyana mîstîk a çîrokan dibin. Di mesele û bûyerên ku di çîrokan de derbas dibin zarokan ji alî derûniyê ve amadeyê jiyana rasteqîn dikin bi wî rengî zarok li hemberî xirabî û nebaşîyan bê parastin namînin.

Zarok cihê xwe, yê dê û bavê xwe, xizm û hevalên xwe, bi kurtasî der û dorên xwe di çîrokan de dibînin. Herwiha mînakên kesên baş û xirab, kone û rast jî di nava çîrokan de dibîne bi vî awayî zarok bêyî ku li ser bifikire xwe amadeyî jiyana civakî dike. Bi vî rengî cihê xwe di nava civakê de digire, ji civakê qut nabe û jê nareve.

BESA DUYEM

ZARGOTINA KURDAN

2.1. Hizr û Ramanên Lêkolîneran ên Li Ser Zargotina Kurdistan

Ji sedsala 18. vir ve rêya gelek lêkolîner, gerzan û mîsyoneran bi awayekê bi erdnîgariya Kurdistanê ketiye. Van kesana li ser civaka kurdan û zargotina wan gelek berhemên giranbuha nivîsîne û bi taybetî li ser zargotina kurdan hizr û ramanên xwe di van berheman de pêşkeşê xwînerê xwe kirine. Di vê beşê de em ê bi kurtasî guhê xwe bidin hizr û ramanên van kesan, hela bê ka li ser zargotina kurdan çi gotine.

Weke Ku Berry Sanders jî dibêje maka her cûre nivîsê wêjeya devkî ye. Gelên dinyayê paşê ji xwe re alfabe çêkirine, xwendin û nivisandina xwe bi pêş xistine di pey re jî ew cûreyên wêjeya xwe ya devkî nivisandine, xistine ser kaxizê. Ev pêvajoya wisa sistematîk e ku edî kes li ser vê nîqaşan nake (Begîk, 2018: 17).

Meriv dikare bibêje ku dîroka zargotinê bi qasî dîroka mirovahiyê dûvdirêj e. Em dîroka nivîsê ancax digihînin serdema Someriyîyan. Herçend di nivîstekên Someriyîyan de em rastî hin cûreyê zargotinê yê weke gotinên pêşiyîyan, dastana Gilgamêş û zêmaran werin jî, bêguman ev berên zargotinê beriya ku werin nivîsîn ji mêj ve di nav gel de bi sedan salan hatine vegotin.

Piştî ku zargotin wekî zanistê serbixwe tê qebûl kirin, li her welatî, bi taybetî di nava gelên ku di nava pêşketinê de ne, xebatên li ser çand, bawerî û adetên gelî û her cure hêmanên manewî ku, bi jiyana civakî re rasterast têkildar in, bi lez û bez tên kirin. Li Kurdistanê jî xebatên bi vî rengî, di destpêkê de, bi gelemperî ji aliyê mîsyonerên Rojavayî û Rûsî ve hatine kirin (Attî, :2013: 5).

Ji serdema Yewnana Antîk û vir ve di derbarê kurdan û erdnîgariya wan de gelek çavkanî hene; lê rasterast ne li ser zargotinê ne. Kesên wek Herodot, Strabon, Ksenefon, Plutarch qala kurdan û erdnîgariya wan kirine. Wek mînak Ksenefon, di berhema xwe ya bi navê “Anabasis” (Vegera Deh Hezaran) qala kurdan dike û derbarê erdnîgariya wan de hin agahiyên dide (Yıldırım ûyd, 2013: 16).

Dîrokzanê heyama kevnare Strabon di nivîsê xwe de destnîşan dike ku; niştecihên li bakur ên li derdora çiyayên Araratê dijîn Kardû ne. Strabon salix dide ku wî piraniya agahiyên derbarê Medan de ji kilam û destanên epîk ên dengbêjên wê demê wergirtine. Strabon û hin dîrokzanên din diyar dikin ku di welatên Medan de kevneşopîya dengbêjiyê gelek belavbûyî bû. Herwiha dîrokzanên Ermen Moses von Khoren (Musayê Xoroneyî) P. Z di sedsala 5. de qala xewneke keyayê Medan ên dawîn Astyages (Ajdehaq) dike. Li ser vê xewnê şîroveya dengbêj û şêwirmendê wî yê navdar Angreas jî radigihîne (Gultekin, 2013: 15).

Di agahiyê strabon û Khoren de jî em têdigihên ku dengbêj bi tenê ne stranbêj bûne, wan hemû êş û elem û diroka gelê xwe di hişê xwe de parastine, em dikarin bibêjin ku ew derwêşê dîrokê bûne. Herwiha ew di derbarê hemû jiyane de xwedî zanîneke kûr bûne; ji ber wê çendê jî şêwirmendê keya û mîrên dema xwe bûne.

Gerzanên Rojavayî yê wek Marco Polo, Tavernîer û gelekên din di serpêhatiyên xwe de qala kurdan kirine. Di seferên xaçperestan de Rojavayîyan gelê kurd bêtir nas kirine. Herwiha gerzan û welatnasên ereb en wekî Ebû Fazlan, Îbn Hewgel, Îstexrî, Belazûrî, Mesûdî jî di heqê kurdan de hizrên xwe nivîsîne. Kesê wek Evliya Çelebî û Katîb Çelebî jî li ser erdnîgarî û zargotina kurdan gelek tişt nivîsîne. Divê em vê rastiyê destnîşan bikin ku, ev xebatên misyoner û lêgerên ku di çarçoveya *Rojhelatnasiyê* de tên nirxandin, xebatên gelek hêja ne û herwiha dokumentên pir giranbuha gihandine serdema me (Yıldırım üyd, 2013: 16).

Biyanîyên ku rêya wan bi Kurdistanê ketine, ewqas li ser xwezaya wê ya bedew, dewlemendiya wê ya sererd û binerd de, xêr û bêra wê ve ecêbmayî nemane; çiqas ji zengînbûn, û nazikiya ruhê gel û zargotina wê (Cindî, Evdal, 2008: 26).

Nivîskar û hîmdarê edebiyata Ermenîyan a nû, Xaçatûr Abovyan di nivê sedsala 19'an de nivisiye: Poezya gelê Kurd ûsa pir pêş ketiye, ûsa zengîn bûye ku, her Kurdekî em dikarin wek helbestvan bicibînin. Ew pir serwext in, gelek zû hema bêje, hahanga disewirînin (Cindî, Evdal, 2008: 27).

Piştî bûyer û bobeletên xwezayî; an qewimînên civakî, dengbêj bûbe şahid an nebe şahid hingê dertê holê ya dilê xwe digel hest, raman û cerebeye zanîna xwe ya

jiyanê teva li wan berên dengbêjiyê bar dike û bi lêv dike. Ev berên di encamê de dertên holê hem derbirînên dengbêj bi xwe ne hem jî yên civakê ne.

Hîn di salên 1830'î de F. Dubois de Montpereuxsê ku ji bo lêkolînan diçe Kafkasyaya Başûr berhevdaneke muzîk û kilamên wê herêmê dike. Piştî ku ew li Pasûrê guhdariya kilamên kurdî dike, wiha dibêje:

Ji aliyê qarekterê xwe ve cûdahiya kilamên Tirkî ji yên Farisan nîn e. Yên Gurciyan jî wisa ye, jixwe diyar e ew bi piranî teqlîdên cîranê xwe dikin. Lê dema kilamê Kurdî û yên Kafkasî hatin stiran, me xwe di asteke din de hîs kir. Ez ê wê bandora ku kilamên kurdî di dilên min da peyda kirin heta dawiya temenê xwe tu caran ji bîr nekim. Di kilamên kurdî de serdestiya rîtm û ahengê hebû, pê re jî awazê wan hinekî cîdî û bengî bûn (Gultekin, 2013: 25). Îro roj amûr alavên ragihandinê gelek bi pêş ketine, gelek derfet hene ku meriv xwe bigihînin stranên gelê din û di navbera wan de danberheviyên zanistî bikin. Dema ku meriv bi vê nêrînê li stranên gelê din û dengbêjiya kurdan dinêrin ji alî rîtm û şewaza vegotina stranên de cudabûnên pir şênber û beloq xuya dikin.

Lêkolîner û mûzîkjen Komîtas dema rêwîtiya xwe ya li derdora Araratê rastî dengbejekî kurd ê kal tê. Komîtas: “Dengbêj berê xwe daye çiyayekî û distrê. Kalê distra û çiya newal pê re distran.” Dema kilama dengbêj diqede dengbêj, ji Komîtas re wiha dibêje:

Erê lawê min ez kurd im, ez bi kurdî distrêm. Dema kurdek tenê li hember çiyayekî disekine, ew bi hev du ra bi kurdî diaxivin û distrên (Gultekin, 2013: 25). Ew reseniya zargotina kurdan ji alî gelek lêkolîner û gerzanên cûr bi cûr ve jî tê destnîşankirin. Ne bi giştî be jî dengbêjiya kurdan bi gelemperî bê amûrên mûzîkê tê pêşkeşkirin. Dengbêjî ji van aliyan de û bi hin şeweyên xwe yên vegotinê li gor xwe ye û naşibe vegotinên çandên gelê din.

Kurdolog û mîsyonerên fransiz Thomas Bois ji 1900'î pê ve bi qasî 20 salan di nav kurd û xiristiyanên li Sûriyê de mabû, dibêje ku: Xiristiyanên li Kurdistanê, stranên xwe yên olî bi zimanê xwe; lê yên evîni û dilîni bi kurdî distrên. (Gultekin, 2013: 24). Em ji vê nêrîna Thomas Boisî Fransiz fêhm dikin ku newa û naveroka mûzîka

kurdî bêtir li kilaman evînê tê, bêtir lê di fesil e; ya na yekê ku zimanê dayika wî cihê be, bê ka çima bi kurdî bistrê? Weke mînak Garabêtê Xaço, Aram Tîgran, Gula Dengbêj; herwiha wek Gula File jî tê binavkirin; ku heta ew û Evdalê Zeynikê di lecekê de diavêjin ber hev beriya Evdal dengbêja Surmeli Paşa bû.

Piştî gera xwe ya li kurdistanê Prof. V.F. Mînorskî dinivîse ku; kurd xweyê edebiyateke gelerîyê pir zengîn in, li bal kurdan çîrok destan stran pir in. (Celîl, Celîl, 1978: 8). Zanyarê alman M. Bagner hê di sala 1855'an de dinivîse ku tirkan gelek kilamên kurdî wergerandine bi zimanê xwe (Cindî, Evdal, 2008: 26). Bi taybetî ev wergerandin ji alî hunermendên ku bi esl û fêslên xwe kurd, yê ku bi tirkî distrên ve bê nav û nîşan hatiye kirin.

Mîsyonerê Swêdî N. F. Höijer wiha dibêje: Her çiya, gol, çem, gelfî, bajar, gund; yan jî her kevirê mezin li welatê wan çîrokeke xwe heye (Gultekin, 2013: 10-11). Rêwîyê ku hatine Kurdistanê ecêbmayî mane ku, çawa rêncber, cotyarên kurd, bi kilam û bilûra xwe, bi gotinên zargotinê karin bê zahmetî, ziman ji sewalan re jî bibînin. Di vê derheqê de rêwîyekî Rûs V.Î. Massalskî dinivîse “Ez gelek caran zendegirtî mame, ji hostatiya şivan û gavanên kurdan. Ew li ciyekî disekinîn fêza girekî yan ser zinarekî li wir serwerî kerî û sûriyê xweyî li bintara wan de diçirin dikin. Keriyê pez gura şivên dane. Pêş da diçe vedigere, ber bi çepê yan rastê diçe. Bi gaziya şivên dest xwe da dora wî dicive, yan jê durdikeve” (Cindî, Evdal, 2008: 27).

Dema ku jinên kurdan pez û dewarên xwe didoşin bi nazikî nêzî wan dibin, pêşiyê wan dixwînin, mist didin û dema dest bi dotinê jî dikin. Bi dengê nerm hezkirinê di dilê xwe de ji wan re pêşkeş dikin. Gelek caran min ji diya xwe û pîrika xwe pirsîyê çawa çê dibê hûn ji ajalên re stranên dibêjin, qey ew ew bi zimanê me zanin? Digotin belê kurê min ew jî wek me zindî ne dema em ji wan re kilaman dibêjin ew şîrê xwe pirtir didin; dema em bi hezkirin nêzî wan nebin ji wan re kilaman nebêjin ew şîrê xwe dikişînin, vedişêrên nadin. Ev rêbaza ku kurdan ji mêj ve bi kar dianîn van demên dawîn li gelek welatên ewrûpayê bi guhdarîkirina mûzîka klasîk hat ceribandin, piştî guhdarîkirina mûzîkê çespendin ku şîrê çelêka zêdetir dibe.

Serbezekî din F. Mîlîgîn dinivîse: “Li welatên pêşdaçûyî, ji bo ajotina lawiran şiv û qamçiyê didin xebatê. Lê li Kurdistanê tu pêwîstî tune bi wan li lawir xîn. Li vira

dewsa qamçî sazbandî tê xebatê û ew yek gelekî sade û rehet tê bikaranîn. Merivê kurd li ereba xwe siwar dibe û gava kilama xwe dest pê dike, gamêşê wî pê ra pê ra dilivin. Gava erebeçî bixwaze gamêşa bide sekinandin, nastrê û gamêş disekinin. Eva hunerekî usa ne ku di dinyayê li çikî mayîn tune.” (Cindî, Evdal, 2008: 27- 28).

Mîsyonerekê din E. J. Larzon jî kurdan wek komeke poetîk bi nav dike û dibêje ku: Ew evîndarên mezin ên stran û mûzîkê ne (Gultekin, 2013: 10-11). Birastî jî dema ku em li civaka Kurdan dinerin, ne bigelemperî be jî, her kurdekê ku di xemgînî û kêfxweşiyê de destê xwe biavêje kerika guhê xwe, dikare li ser şîn û şahiyên û li ser her mijara jiyane hahengê stranên bê emsal biafirîne. Em van afirîneriyên bê şik û guman dikarin wek helbest bihesibînin. Bêguman helbesta gelerî ya her civakê têra xwe heye. Lê wek Larzon û Abovyan jî destnîşan dikin, ne pir berbelav e û ne di wê miqama ku dengbêjên kurdan disewirînin. Di weletên pêşketî de kesên ku helbestan dinivîsin, di esasê xwe de yên di pîleya jor de xwenda ne.

Dîrokzan û etnografê Ermen S. Yexiyazarov di gotara xwe ya bi navê “Qiseke Kurt Derheqê Etnografiya Kurdên Qeza Yerêvanê” de nivîsiye: gerek meriv li zozana be; ku bibîne ev milletê qedîm, li çiya û baniya çawa bi dil û can şa dibe. Ji berbangê hetanî êvara dereng, ji her çar aliyan dengê awazên bilûra şivanan tê, şevê hîvron da, gişk govendê digirin û li ber dengê zurnê hetanî nîvê şevê direqisin. Zanayê sazbandiya gelê Kafkasê Vasîlî Garganov, piştî ku bi sazbandiya kurdan re dibe nas dinivîse: Hem di jiyana kurdan da, hem jî sazbandiya wan da, tiştêkî suruştî yê usa heye ku, wana ji tu kesî hilnedaye û ew tişt li ba tu mîletekî cînar tune (Cindî, Evdal, 2008: 27- 28).

Her wekî ku di bendên jor de jî dixwîye dewlemendiya zargotina kurdan bala gelek lêkolîner û gerzanan kişandiye. Herwiha ev kes li gor gelên cîran, cudabûna û balkêşiya jiyana rojane ya kurdan jî destnîşan dikin.

2.2.Kar û Xebatên li Ser Zargotina Kurdan ên Ewil

Li jêr xebat, lêkolîn û berhevkarîyên ger ji aliyê biyaniyan ve ger jî; ji aliyê kurdan ve li ser zargotinê hatine kirin, em ê bi kurtasî wek kronolojîk li jêr binivîsin. Armanç û hêviya me ev e ku heval û hogirên me xwe bigihînin van xebatan; bixwînin, bidin xwendin û yên bi zimanên biyanî hatine çapkirin wergerînin, zimanê kurdî.

1. Bi qasî ku em hay jê hene xebata herî kevn a ji alî lêkolînêrên biyanî ve li ser zargotina kurdan hatiye kirin û gihîştîye roja me xebata ku di sala 1711'an de ji aliyê *Mesrop Maştos* ve ya ku li Ermenîstanê hatiye nivîsîne. Di vê berhemê de 115 gotinên pêşyan hene û bi zimanê ermenkî hatiye nivîsîn (Cindî, Evdal, 2008: 15).

2. Rahîp û mîsyonerê Îtalî Mauriziyo Garzoni derdora bîst û pênc salan di nava kurdan de dimîne û gelek lêkolînan li ser kurdan û çanda wan dike. Ligel Garzonî Domenico Lanza û Giuseppe Campanile ku ew her du jî mîsyonerê Îtalîn e; ev hersê mîsyoner çand, herêm û zimanê kurdan bi Ewropiyan didin nasîn. Dûv re Garzonî bi navê Gramera Kurdî di sala 1787'an de wan xebatê xwe wek berhem li Romayê çap dike. Xebata Garzonî ya Pallasê Rûsî di heman salê de çap dibin. Ji ber van xebatên wî yê payebilind ew, wek bavê kurdan tê binavkirin (Dost, 2010: 7-8).

3. Bi ragihandina kurdnasê Rûsî Mînorskî, Rûsya cihê zayîna kurdnasiyê ye. Di 1787 an de bi daxwaza împaratoriya Rûsyayê Katherîna mezin Pallas fehengêk çapkiriye û di vê ferhengê de ligel gelek zimanên din 276 peyvên kurdî jî hene. Ji ber wê çendê ew wek bavê kurdnasiyê tê binavkirin (Dost, 2010: 7).

4. Di salên 1834-1839'an de mîsyonerê Amerîkayî Heratio Southgate (1812-1894) li gelek herêmên rojhilat û rojhilata navîn geriyaye û pirtûkek li bajarê Newyorkê çap kiriye. Di vê pirtûkê de, ji cil û bergan heta toreyan, ji stranên gelerî heta cûreyên xwarin û vexwarinan derbarê kurdan de gelek agahî hene (Yıldırım, ûyd, 2013: 53).

5. Di serê sedsala 18. de Mele Mihemedê Erwasî bi kurdî li ser bîjîşkiya gelêrî nivîsiye. Di vê pirtûkê de navên nexweşyan û dermanên wan hatine nivîsîn (Yıldırım, ûyd, 2013: 53).

6. Di sala 1844'an de Moritz Wagner dema li derdora Araratê lêkolînan dike, hin kilamên Kurdî jî berhev dike û wan bi navê *Rêwîtiya Min a Li Îranê û li Welatê Kurdan* diweşîne (Gultekin, 2013: 23).

7. Peter Lêrx yekemîn ewropî bû ku berê pêşîn nasiya xwe da emr û jiyana kurdan. Herwiha ew weke yekemîn zanyar û pispor bû ku Akademiya Zanistiya Êrisatê alikariyeke mezin da wî û Lêrx ji zarê kurdan mînakên zargotina wan nivîsî.

di navbera salên 1853 û 1856'an de di kampa leşkerên dîlgirtî ya leşkerên osmanî de, li derdora Mêrdîn, Cizîr, Dersîm, Diyarbekir, Mûş, Xarpûtê, Rûha û Erzûrimê berhev kirin. Herwiha li ser leşkerên kurdên kurmanc û dimilî lêkolînek kiriye û gelek agahî berhev kirine. Piştî Lerch ew wek pirtûk bi navê *Lêkolîn li ser kurdan û Îraniyên Xaldehyên Bakur* (Forschungen Uber Die Iranischen Nord-Chaldaer) çapkiriye (Celîl, 2013: 12-13).

8. Dr. Oscar Blau di sala 1858'an de berhemeke bi navê *Eşîrên li Kurdistanê* nivîsiyê. Herwiha di vir de destnîşan dike ku kurd xwediyê kevneşopiyêke dewlemend a kilam û destanên şer û evînî ne (Gultekin, 2013: 22).

9. Aleksander Jaba (1803-1894) di navbera salên 1848-1869'an de li ser navê konsolosxaneyê Rusyayê li Erziromê bûye. Di van salan de bi alîkariya Jaba, ji aliyê Mela Mahmûdê Bazîdî 12 xebat hatine kirin. Di nava wan de ya ku di gelek waran de li ser zargotina kurdan agahiyên berfireh dide pirtûka bi navê *Adat Rusûmatnameyê Ekradiyê û Camiyê Rîsale û Hikayetê Ekradiyê* ye (Yıldırım, 2013: 53-54).

10. Di sala 1878'an de Pirtûka bi navê *Serpêhatiya Etnografya Kurdî* ji aliyê Yegîzarov ve derheqê Kurdên derdora Erîvanê ve hatiye nivîsîn û pirtûk li Tîflîsê hatiye çapkirin (Yıldırım, 2013: 56).

11. Rojhilatnasekî Alman ê bi navê Ferdînand Jûstî li petersbûrgê di sala 1880'an de berhemeke bi navê *Kurdishche Grammatik* çap dike. Herwiha pirtûkek wî ya navên lawiran *Noms D'Animaux en Kurde* jî bi kurdî heye (Dost, 2010: 7-8).

12. Rojhilatnasekî Swîsrî yê bi navê Prf. Dr. Albert Socin di navbera salên 1868 û 1870'an de li rojhilatê Kurdistanê jiyaye û bi Eugen Prym re xebatên girîng li ser zimanê Kurdî kirine û berhema ku ji du cildan pêk tê bi navê *Kurdische Sammlungen* li Petersburgê di sala 1887 û 1890'an de tê çapkirin. Di vê xebatê de bi taybetî hin dastanên Kurdan cihê xwe girtine (Dost, 2010: 11).

13. Lêkolînerê Ermen K. Aygonî (1838-1908) bi navê *Folkloria Kurdî* ku di nav de 200 gotinên pêşiyar jî cî digirin, çap dike (Yıldırım, ûyd, 2013: 56).

14. Yek ji kurdnasên dawiya sedsala nozdehan û destpêka sedsala bîstan Hugo Makas berhemeke bi navê *Kurdish Text und Kurdish Studien* yekem car li Petersburgê sala di 1897'an de çap bûye. Di vê berhemê de şaxeke Memê Alan jî heye (Dost, 2010: 11).

15. Di sala 1904'an de Sargîs Haykuniyê ermen, ji ermenên herêma Wanê yê ku bi kurdî kilam digotin, 28 dastanên kurdî berhev kirine û ew wek pirtûk li Moskovayê çap kirine (Gultekin, 2013: 25).

16. Le coq di navbera salên 1901-1903an de diçe Rojhilatê Kurdistanê û di navbera salên 1906-1907'an de jî tê Kurdistanê Bakur û gelek keresteyên kurdî berhev dike. Van xebatên xwe li Berlînê bi navê *Tekst in Phonetischer und Persischer Umschrift (Lêkolînên Kurdî û Farisî)* çap dike (Yıldırım, ûyd, 2013: 56).

17. Begrat Chalatianz di sala 1905an de 15 destanan epîk ên kurdî berhev dike û wan digel wergera Almanî çap dike. Di vê xebatê de destanên navdar ên wek Siyabend û Xecê, Mem û Zîn û Leyl û Mecnûn jî hene (Gultekin, 2013: 28).

18. A. Fon Lêkok tekstekê ji hin çîrok Mêm û Zîn û ferhenga Ahmedê Xanî bi zimanê elmanî û bi tîpên latînî çap dike (Celîl, 2013: 15).

19. Rojhilatnasê rûsî yê bi nav û deng Vlademîr Fyodoroviç Mînorskî (1877-1966) li ser çand, ziman û wêjeya kurdî gelek xebat kirine. Herwiha Mînorskî di sala 1902an de li rojhilatê Kurdistanê li ser baweriya Ehlê Heq (Yeresanî) gelek berhemên hêja berhev kirine û ji wan berheman gelek niha hîn jî di pirtûkxaneyê Petersburgê de ne (Yıldırım, ûyd, 2013: 57).

20. Rojhilatnasê Almanî Oskar Mann di 1901 de diçe rojhilatê Kurdistanê li gelek deverê wê dimîne û li wir Cewadê Qazî nas dike bi saya wî gelek tiştan berhev dike û van xebatên xwe di sala 1906'an de li Berlînê bi navê *Tuhfe Muzefferiye* çap dike. Di vê berhemê de beyta Dimdim, Mem û Zîn, Las û Xeza, Bapîr Axayê Mengur û hinek berhevokên din tê de cih digirin (Dost, 2010: 20).

21. Di sala 1911'an de piştî ku zanîngeha Peterburgê diqedîne ji alî zanîngehê ve li ser navê zanîngehê wek rojhilatnas diçe Ermenîstan û Wanê. Orbelî li Miksê hînî

zimanê kurdî dibe; stran, çîrok, çîvanok, têderxistinok (mamik) berhev dike û wan berhevokan bi navê *Li Mûksê Folklor û Jiyana Rojane* çap dike (Celîl, 2013: 13-14).

22. Di sala 1917'an de efsere Îngîlîz Edward Noel li gelek deverên Kurdistanê geriyaye û gelek keresteyên folklorê kurdan berhev kirine. Noel di xebata xwe de gotinên kurdan dabeşkirine. Noel di sala 1917'an de li Londonê gotareke bi navê "Di biwêj û gotinên pêşyan de karakterên Kurdan" weşandiye (Yıldırım, ûyd, 2013: 57).

23. Di sala 1920'î de efsere Îngîlîzî Ely Bandîster Soane xebateke bi navê "Exlaq û Adetên Kurdan di Gotinên Pêşyan de" weşandiye (Yıldırım, ûyd, 2013: 58).

24. Di sala 1931'ê de komîteya Ronkayê ya Ermenistanê ya Miletan (Namkompiros) ji Gerdoê Gêncî, Heciyê Cindî, kompozîtor Karo Zekeryan û Asatur Xaçaturyan komeke cara ewil ji bo berhevkirina zargotina kurdan ji alî komara Ermenîstanê bi fermî tê peywirdarkirin (Celîl, 2013: 15).

25. Heciyê Cindî û Emînê Evdal di sala 1936'an de li Erîvanê xebata xwe ya bi navê *Folklorê Kurmanca* çap dike. Di vê pirtûkê de gelek xebetên li ser zargotinê hene (Cindî, Evdal: 2008).

26. Di sala 1936'an de ji aliyê Lucie Paul Margerette Kamuran Bedirxan ve xebata ku ji 171 rûpelan pêk tê li Parîsê hatiye çapkirin (Yıldırım, ûyd, 2013: 53).

27. Di sala 1930'yî de hevalê Celadet Bedirxan, kurdnasê fransî yê navdar Loger Lescot, li Rojavayê Kurdistanê gelekî maye, gelek kel û pelên zargotina kurdî berhev kirine û xebata xwe di sala 1940'î de weşandiye (Lescot, R: 2013). Herwiha di Hawarê de bi navê Tawûsparêz nivîsên wî hatine weşandin (Hawar, 1932).

28. Etnolog û kurdnasê Rûsî yê bi nav û deng Basîl Nîkîfîn (1885-1960) li ser zargotina kurdan gelek kereste berhev kirine û ew di pirtûka xwe ya bi navê *Kurd* de weşandine (Yıldırım, ûyd, 2013: 58).

29. Lêkolîner û wêjevanê kurd ê navdar Elaedîn Secadî li gelek deverên Kurdistanê geriyaye, li ser zargotina kurdan berhevkarî kiriye û ev di xebata xwe ya bi navê *Rîştey Mîrwarî* di sala 1953'an de weşandine (Yıldırım, ûyd, 2013: 58).

30. Di sala 1960'î de rojhilatnasê Rûsî O. L Vîlçevskî berhema xwe ya bi navê *Kurd*, Destpêka Dîroka Etnîki ya Gelê Kurd” çap kiriye. Ji xeynî vê xebata wî, gelek xebatên wî yên din jî li ser kurdan û çanda wan in (Yıldırım, ûyd 2013: 58).

31. Qanatê Kurdo û Margeret Rûdenko xebata bi navê *Pendî Pêşîniyan û Qisey Nesteqî Rojhelat* di sala 1961'ê de li Moskovayê bi zimanê Rûsî û Kurdî dan çapkirin. Herwiha Qanatê Kurdo 12 wariantên destana Memê Alan di “Roja Nû” de weşandin (Yıldırım, ûyd, 2013: 58-59).

32. Ji Başûrê Kurdistanê Mihemed Tewfîq Wirdî di sala 1961'ê de xebata xwe ya bi navê *Folklorî Kurdî* li Bexdayê çap kir (Yıldırım, ûyd, 2013: 53).

33. Ji Rojhilatê Kurdistanê Prof. Dr. Mihemed Mûkrî li ser zargotina kurdan gelek xebatên giranbuha kirine: *Di Folklorî Kurdî de Motîfên Ermenî, Di nav Kurdan de Navên Çivîkan* û pirtûkek jî bi navê *Stranên Kurdî* çap kirine (Yıldırım, ûyd, 2013: 59)

34. Di sala 1965'an de rojhilatnasê Frensî Thomas Boîs lêkolînên xwe yên li ser çanda kurdan bi navê *Connaissance des Kurdes (Nasîna Kurdan)* li Berûdê dan çapkirin. Di vê pirtûkê de li ser mît, destan û jiyana kurdan gelek mînak hene (Yıldırım, ûyd, 2013: 59).

35. Car din di sala 1965'an de Ç. Bakayev di xebata xwe ya bi navê *Zimanê Kurdekanî Azerbaycan* li Moskovayê da çapkirin. Di vê berhemê de Bakayev cî daye gelek gotinên pêşîyan (Yıldırım, ûyd, 2013: 59).

34. Di sala 1966'an de T.F. Aristova pirtûkek bi navê *Kurdekanî Pişt Qefqas* nivîsiye û di çarçoveya folklorî Kurdî de cî daye gotinên pêşîyan (Yıldırım, 2013: 59).

35. Akademîsyenê Kurd Îzeddîn Mistefa Resûl xebata xwe ya bi navê “*Lekolînewey Edebî Folklorî*” di sala 1970'î de li Bexdayê çap kiriye (Yıldırım, ûyd, 2013: 59).

36. Sadik Bahaeddîn Amedî di sala 1078'an de pirtûkeke bi navê *Folklorî Kurdî* li Kurdistana Başûr çap kir. Her wiha kesê ku bixwaze li ser devokan bixebite, ev pirtûk di wî warî de jî çavkaniyeke hêja ye (Bahaeddîn, 2013).

37. Di sala 1978'an de Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl xebateke ji 1050 pêk tê bi du cildan, bi navê *Zargotina Kurda* li Moskowayê dan çapkirin. Di vê xebatê de ji her cûreyên zargotina kurdan gelek mînakên hêja hene (Celîl, 2013:504).

38. Di sala 1988'an de ji aliyê helbestvanê navdar Cegerxwîn ve xebata bi navê "Folklorê Kurdî" li Stocholmê tê çapkirin (Yıldırım, ûyd, 2013: 60).

Bêguman kar û xebatên li ser zargotina kurdan hatine kirine ne ev bi tenê ne, ev tenê ji wan xebatan çend mînakên ewil in. Em dikarin vê lîsteyê gelekî dirêj bikin lê ji ber ku ne mijara me ya esasî ye em ê li vir vê mijarê bi dawî bikin.

2.3. Cûreyên Zargotina Kurdan

Mijarên ku di zargotina cihanê û yan kurdan de hene herçend weke cûre bi navê cûrbecûr werin binavkirin jî ji alî naverok û pênaseyê ve pir hindik nêzî hev in. Lê em vî tiştî ji bo naverokê nikarin bibêjin. Naveroke her berên zargotinî li gor bîr û bawerî, cerebe, fam û feraseta wê jî diguhere. Ji ber ku çîrok jî cûreyeke wêjeya gel e. Di vê beşê de ji bo ku çarçoveyek çêbibe em ê berê xwe bidin cûreyên wêjeya gel. Bi taybetî wek mînak em ê li ser çend cûreyan, ligel pênaseyên giştî hewl bidin ku naveroke van serenavan ji alî wêjeya gel ve binirxînin.

2.3.1. Çîrok

Çîrok, bûyerên bi awayekî pexşan ku bi sedsalan ji alî gel ve hatine afirandin, bi awayekî derasayî, bi alîkariya lehengên hêzên wan derasayî ne (cin, perî, gurê manco, mîrza mihemed û hwd) li ciyekî nediyar; an xeyalî (çiyayê qaf, li welatekî) derbas bûne re tîn gotin.

Di zaravaya kurmançî de ji bo çîrokê navên wek çîrvanok, çîvanok çîrçîrok, xeberoşk, xevroşk, xevşok, xemîşok tê bikaranîn. Ramazan Perteve (2008: 87) jî ji bo bikaranîna navê çîrokê agahiyên ji devê Firat Ceverî wisa rêz dike; di kovara Hawarê de (1943-1946), Ronahî (1942-1945), Roja Nû (1943-1946), Hêvita Welat (1963-1965), Çiya (1965-1970), Hêvî (1983-1992) û di gelek kovarê nû û yên kevn de navê çîrokê hatiye bikaranîn. Kurdên sovyeta berê bi gelemperî serhatî bi kar anîne.

Herçend li gor hereman ji bo çîrokê navê cihê cihê hatibin bikaranîn jî lê di nava gel de bi gelemperî çîrok berbelav e.

Hêmanên ku di mirov û jiyana mirov de hene; hema bêje hemû bi awayekê di çîrokan de cihê xwe digirin. Pergala malbatê, welidandin, mirin, bûyer û hestên ku di jiyana mirovan de diyarde ne, qeder, kêfxweşî, xemgînî nirxên ehlaqî û dijehlaqî mijarên jiyana me ya rojane, mijarên sereke yên çîrokan e.

La Fontaine di pêşgotina pirtûka xwe de wiha dibêje: Çîrokek ji hatina cem hev a ji du perçeyan pêk tê. Em dikarin bibêjin ku perçeyek laşê çîrokê; yê din jî canê wê ye. Laş çîrok bi xwe, can jî şireta ku ji wê der tê ye (La fontaine, 2012: 1-6). Ango bêyî bûyerê ku di çîrokê de hene; tu xwe nagihînî encamê, tu şîretê jê hilnadî; lê ku laş ango bûyer çiqas xurt dibe bila bibe laşê bê rih û can bi kêrî tu tiştêkî nayê. Divê motîfê ku di çîrokê de ne û encam hevdu tamam bikin.

Mirovan daxwaz, xwestek û çareseriyên xwe yên jiyane bi deh hezar salane bi awayekê bi lehengên çîrokan dane vegotin; da ku nişên din, peyrevên wan ji wan qewimînan şîretan hilgirin û heman xeletiyên careke din nekin. Herçend bûyer û lehengên çîrokan derasayî, nehên û razmend bin jî; car din bi her awayî remzên jiyana me ya rojane ne. Dema em bi vî awayî lê binêrin armanca hêman, nîgarên derasayî û derasayî yên di çîrokan de nîşandayîna têkiliyên civakî ne. Di encamê de ji bo guhdar û xwînêran, bendewariya hilgirtina şîretan heye.

Cureyê çîrokê çî dibe bila bibe; ku têkiliya wê bi jiyane re tunebe, dê teqez ji holê rabe. Çîrokbêj her tim bingeha çîrokan ji hin beşên civakê hildide. Di vê derbarê de mîrê çîrokan La Fontainê Fransîzî jî wiha dibêje: Bi kurtasî çîrok wêneyeke wisa ye ku em hemû xwe dikarin tê de bibînin. Çimkî di lawiran de baş xirab çî hebe, di me mirovan de jî ew heye; ji ber wê jî em encama van hemû tiştan ne (La fontaine, 2012: 1-6).

Piştî van nirxandinan em dikarin bibêjin ku çîrok, bi remzan vegotina jiyane bi xwe ne. Weke ku di nav gel de tê bawerkirin; di hin waran de hatibin pirolekirin û hêmanên derasayî di xwe de bihewînin jî bi giştî ne derew in û ji gelek aliyên de meriv dikarin jê sûdê werbigirin. Ji bo mezinan jî gelek şîret û pendan di xwe de dihewînin.

Di hemû çîrokan de hema hertim dualîzmeke pir beloq heye. Bi gelemperî şerê xizanî û dewlemendiyê, kirêtî û bedewiyê, dostanî û dijmanatîyê heye. Li hember xirabiyê her tim qencî serî hildide û di encamê de jî, her car qencî bi ser dikeve. Lehengên alîgirê başiyê tên xelatkirin, xirabî jî têk diçe û tê şermezarkirin. Em vê dualîzmê di olên kurdan ên kevnare de jî dibînin. Di Zerdeştîyê de li hember sembola xirabiya Ehrîmen, Hurmuz dertê holê bi wî re dikeve nava têkoşînekê. Ev bawerî di kilamên li ser Zerdeştîyê de jî xwe wisa dide der: Erê Hurmuz bihar hat Ehrîman çû ji welat. Bihar li vir remza xêr û bereket û ronahiyê ye, Ehrîman jî remza tarîfî û xirabiyê ye.

Di vegotinên çîrokan de hin gotinên qalibî, yên diyar hene; ev pir hindik wek hev in; bi gelemperî jî heman qalib di çîrokên cuda cuda de tên gotin. Ev qalibên di formata zûgotinokan de, bi ahengsaziya dangan, bi tiştên bi hev re elaqedar û ne elaqedar tên ba hev. Bi saya lihevanînokan mirov dikare çîrokan ji mît û efsaneyan jî cuda bike. Herwiha ev lihevanînokên ku di destpêk û di dawîya çîrokan de tên dubarekirin asta baweriya wan di serî de de dişikînin. Weke ku çîrok bi xwe bibêjin ji min bawer nekin, binêrin ez tiştên ne tişt li hev tînim û dibêjim.

2.3.2.Dastan

Ev peyvik bi eslê xwe peyvikeke Îranî ye. Hem di kurdî de hem jî di farisî de heye. Wek gelek peyvikên hevpar koka vê peyvikê jî digihîje zimanê pehlewî ku serçaviya zimanê kurdî û farisî bûye. Peyvik di zimanê pehlewî de “datestan” di kurdî û farisî de piçekî guheriyê bûye dastan, di her du zimanan de jî wisa cî girtiye (Bozarslan, 2008: 210-211). Her wiha bêjeya *dastan* di Mem û Zîna Ehmedê Xanî, di beşa 11’an û 37’an de du caran û di Dîwana Cizîrî wek *dastan* hatiye bikaranîn. Ji ber wê çendê em ê di tezê de weke dastan bi kar bînin.

Di zimanên Ewropî de ji bo dastanê bi piranî bêjeya *eposê* tê bikaranîn. Epos bi eslê xwe bêjeyê yewnanî ye. Dastan di nava ereban de jî bi navê el-sra”, “el-kada”, tê binavkirin. (Oğuz, 2004: 5-7). Dastan di demên pir kevn de qewînên ku di kûrahiya dilê civakê de bandorên mezin çêkirine, bi piranî bi şeweyê manzûm, bi alîkariya gotinbêj û dengbêjan bi şewazeke coş û peros hatine gotin û gihîştine roja îroyîn.

Di dastanan de derheqê bûyer û qewimînên civakî û dîrokî de gelek agahiyên bingehîn hene. Dema ku yek bixwaze giyana civakê baş fahm bike û têbigihîje; divê ew kes teqez li ser dastanên wê civakê hûr bibe; ji ber ku şîfreyên civakan di serborî, rabirdû û paşxaneyê wan de veşartî ne. Di vî warî de jî cûreya herî girîng jî dastan e.

Di wêjeya cihanê de wek dastanên xwezayiyên ku herî zêde derdikevin pêş *Gilgamêş û Îlyada û Odyseia* ne. Li gor M.A Atak (2013: 11-16) Dastana Gilgamêş, ku wek dastana herî kevntirîn ya cihanê tê zanîn, B.Z. li derdora 3000-2500 salan li Mezopotamyayê bi zimanê Somerî tê nivîsîn.

Bi alîkariya dastanan kevneşopî, bîr û baweriyên civakan ji nifşekê xwe digihîne nifşeke din. Dastan bi vê taybetiya xwe di nava nifşan de dibe pira pêwendî û ragihandinê. Piştî mîtoloji û efsaneyan berhemên herî kevn ên wêjeya gel dastan in. Di her civakê de lehengên dastanan bi gelemperî rêveber, pêşeng, zanayê gel in; yan jî kesayetiyên pîrr xurt û bi bandor in. Dastan, li derdora van kesayatiyan car caran jiyana wan a derasayî; car caran jî ya rasteqîn di nava hêmayê dem û cih de bi awayekî berfireh, manzûm û dîdaktîk dihûne, derdixe pêş.

Di vê derbarê de Pertev Nailî Boratav jî wisa dibêje: “Lehengên dastanan ji kesên wekî serkêş, rêber û lehengên ku karên mezin bi ser dixin ku, ew vê têkoşînê di radeya herî bilind de temsîl dikin. Mirov dikare bibêje ku dastan cureyeke edebî ya komiçka arîstokrasiyê ye (Boratav, 2011: 57,70).

Ku em bala xwe didin lehengên dastanên kurdan dastana Siyabend û Xecê ne tê de bi gelemperî lehengên wan; kesên bi nav û deng in; mîr in, axa ne, beg in; an jî kur û keçên mîr û axayan in. Memê Alan mîrê Mixribyan, padîşahê kurdan e, Zîna Zêdan xwişka mîrê Cizîra Botan e; Cembelî kurê Mîrê Hekariyan e, Rustem kurê Zalê pêhlewan e.

Dastanên kurdî bi piranî bi helbestkî bin jî, hin ji wan bi awayê pexşankî jî tên gotin. Hin ji wan jî bi herdu awayî ne. Bi gelemperî dastanên kurdan ji aliyê dengbêjan ve tên gotin. Lewma gelek caran Qewimînên xwezayî yên wek erdhêj, xela, şewat, nexweşî û bûyerên ku bingeh û sedemên wan mirov in; yên wekî koçberî, şer û pevçûn, lehengî, jiyana eşîrî û evîn, bûne mijarên dastanan.

Herçend dastan bingeha xwe ji bûyerên dîrokî bigirin jî, ji ber ku bûyerên derasayî jî di dastanan de pir zêde ne, em nikarin dastanan wek çavkaniyeke sereke ya dîrokê binirxînin û bigirin dest. Dastanên me piranî ji aliyê dengbêjan ve û bi meqem tînan gotin û strandin. Ji ber ku ji aliyê dengbêjan ve tînan strandin; her dengbêjek di wê atmosfera vegotinê de, di wê xos û perosê de li gor xwe hin tîstan lê zêde dike, jê derdixe û li gor xwe şîrove dike. Ji ber vê egerê heman dastan li gor herêman diguherin û gelek şaxên wan derdikevin hemberî me.

Di bingeha dastanan de bûyereke biçûk a esasî û rasteqîn heye; lê bi demê re ev qewimînên rast, carcaran bi şibandinan, carcaran bi lêzedekirinên derasayî dewlemend dibin, êdî dikevin formekî din. Dastan bi giştî di bin du sernavan de tînan dabeşkirinkirin. Ev; dastanên xwezayî û dastanên çêkirî ne. Em di vê qadê de li hemû cîhanê rastî van herdu cureyan tînan. Em bi giştî cûreya dastanê dikarin di bin du sernavan de pênase bikin.

2.3.2.1. Dastanên Xwezayî: Di encama hin bûyerên civakî de jixweber derdikevin holê. Malê hevpar ê civakê ne. Ne diyar e kengê, ji aliyê kê ve hatine gotin. Çirûska van cure dastanan ên ewil, di demên ku hînan nivîs nehatibû dîtin û pêşneketibû de hatiye avêtin. Bi rêya vebêjer û dengbêjan ji nifşekê neqlê nifşeke din dibin û digêhên roja îroyîn.

2. 3.2.2. Dastanên Çêkirî: Bûyer û bobelatên ku bandor li ser civakê kirine, ji aliyê helbestvan; an dengbêjekî ve bi şibandina formên dastanên xwezayî dûre tînan nivîsîn. Nivîskar an vebêjên van dastanan diyar in. Her welatek li gor xwe dastanên wan ên çêkirî jî hene. Netew bi alikariya van dastanan her tim dixwazin hest û ramanên netewî zindî bihêlin.

Dastanên kurdan ji gelek aliyan ve taybetmendî û rewşa civaka kurdan radixin ber çavan. Her wiha meriv di dastanên de, rastî agahiyên derbarê wek dîrok, çand û kelepûra kurdan jî tînan. Weke mînak dastana kela Dimdimê dastaneke ku şopa wê di dîrokê de heye. Di dastana Memê Alan de em rastî derbarê mêvanperwerî, birêvebirina civaka kurdan, çînan di nava êl û eşîrên kurdan tînan.

Dastanên kurdî hem bi awayê helbestkî, hem bi awayê pexşanî tîn vegotin. Herçend dastana Ristemê Zal bi naveroka xwe di lîteratorê de, wek dastan bê pejirandin jî, hemû şaxên wê bi tenê wek pexşan tîn vegotin. Lê ji xeynî dastana Rostemê Zal hemû dastanên kurdan bi awayê helbestkî; an pexşan û helbestkî tîn vegotin. Ji van dastana dastana Zembîlfiroş bi gelemperî bi awayê helbestkî tîn vegotin.

Dastanên ku di nava civaka kurdan de û yên belavbûyî em dikarin weha rêz bikin; Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdim/Xanê Lepzêrîn, Zembîlfiroş, Kerr û Kulik, Ristemê Zal, Derwêşê Evdî.

Cembelî Kurê Mîrê Hakariyan ku di hinek çavkaniyan de hê jî wek dastan nayê hesibandin, lê bi hinek taybetmendiya xwe meriv dikare nêzî forma dastanê bihesibîne. Di vî warî de, di nava berhevkarên de hîn jî sergêjîyek didome, gelek stranên gel yên wek filîtê Quto, Evdalê Zeynikê yên di nava gel de belavbûye û çîroka Mirza Miheme wek dastan tîn hesibandin. Em dikarin dastanê kurdan li gor naveroka wan di bin du sernavan de dabeş bikin: 1. Dastanên Qehremanî: Rustemê Zal, Kela Dimdimê, Derwêşê Evdî, Kerr û Kulik 2. Dastanên Evînî: Memê Alan, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş û hwd Ji ber ku mijara me ya esasî ne dastan e û babeta dastana mijarek bi serê xwe ye em ê li vir vê mijarê bi dawî bikin û derbasî mijarên xwe yê din bibin.

2.3.3. Mîtolojî

Eger meriv bixwaze naveroka mîtolojîyê fêhm bike divê meriv serê pêşîn li ser bêjeya mîtolojîyê hûr bibe. Bejeya mîtolojîyê bêjeyêke hevedudanî ye. Mythos di Yewnana Antîk de di wateya çîrokê de tê bikaranîn; logos jî tê wateya hij û mantiq (Price, 2011: 16).

Nexwe pîştî vê şîroveya Price ya etîmolojîk meriv dikare bibêje ku mîtolojî çîrok in; lê çîrokên aqilane ne. Dema meriv bi hûrgilî bala xwe bide wateya vê bêjeyê, dualîzmek jî derdikeve holê. Ji ber ku çîrok ango xevroşk qewimînên dûrî aqil in. Hêla wê ya *logosê* jî aqil dihewirîne. Ger meriv bi zanista îroyîn li wateya vê bêjeyê û naverok û bûyerên di wan çîrokan de tê qalkirin binêre, dibe ku meriv bixelite jî. Ji ber ku di demên arkeîk de ji mêj ve zanist wek roja me ya îroyîn pêş neketibû û di wan deman de mirovan dixwest wateyekê li jiyandê û qewimînên cîhanê bar bike. Meriv

dikare bibêje ku li gorî wan deman, van lêgerînên bi vî rengî asoya mirovan firehtir dikir. Bi gelemperî mijarên mîtan ên bingehîn; digel afirandina gerdûn, xweda û xwedawendan, mirovên pêşîn; qewimînên serdestpêka cîhanê, sedem û bingehên gunehê ewil, û bidestxistina agir û her wekî din in.

Ezman ji bo mirovan ciyekî bi raz û sir bû, dema ku li ser fezayê û ezman hûr û kûr dibûn hem rêzdariya wan li hember zêde dibû, hem jî tirs û xofek diket dilê wan; ji ber hindê ji bo mirovan feza ezman dibû sedema afirandina hin mîtên nû yên li ser kozmolojiyê. Ev rewş me ber bi baweriyên, olan dibe. Di vê serdema me ya bigumanbar de mirov; ji bo ku berjewendiyekî bi dest bixe ber bi xweda ve diçin û bi olan ve dihatin girêdan. Ango mirovan her tim piştî xwe daye hêza mezin û xwestine ev hêz bi wan re be.

Mirovan ji bo temeneke bêdawî, ji bo dermankirina nexweşiyên, jiyanekê bi rûmet û aram, mal û milkên dinyayê, ji bo bidestxistina bihuştê û ji ber metirsiya dojhê; ger bi rêya dayîna qurbanan ger bi lawa û diayan, daxwaz û xwestekên xwe ji hêza xwedayî kirine û xwestine wê hêzê ji bo van daxwazên xwe bi hêla xwe bixin îkna bikin.

Ev pêwendî, pîrozî û tirsî xofa li hember ezman piştî serdemên paleolitik jî berdewam dike lê ne wek berê, êdî pir nediyar e. Herçend pir ne diyar be kengê û çawa ew nêrîna berê guheriye; lê mirovan ew hêza Xwedayî ya nediyar anîne li yekê sekinandine û bawer kirine ku cinnet û her tişt ji aliyê wê hêzê ve hatiye afirandin.

Bi gelemperî vegotinên çîrokên afirîneriyê ne. Mît, vegotînin di civakên ku di jiyana xwe de kevneşopî wek rastî û pîroz dipejirînin û weke bingeh diçespînin re tê gotin. Mît çîrokên pîroz, destpêka afirandina cîhanê û jêderka wê vedibêjin. Mît bi gelemperî çîrokên xweda, xwedawendan û derdora wan vedibêjin. Her çiqas lehengên mîtan xweda û xwedawend bin jî, ew carcaran tevgerên mirovan jî nîşan didin. Ger leheng di dirûvê mirovan an giyanewerên din de bin jî ev giyanewer pîroz in û xwediyê hêzên derasayî ne. Ger li wir teyrê enqer, hesp an efrûtê cinan hebin jî ew jî xwedî hêzeke derasayî ne; hema çî bixwazin bi carekê de pêk tên.

Li ser afirandina cîhanê çîrokên her şaristaniyê ji hev cuda ne. Li gor baweriya kurdên êzdî dinya di heft rojan de ji aliyê heft milyaketan ve tê dirustkirin. Di vê dirustkirênê de her milyaketek xwedî peyvireke cuda ye. Yek bayê yek axê çê dike û herî dawî jî mirov tê xuliqandin. Ji bo pîrozkirina vî tiştî roja heftan; ango roja dawî bi cejnan tê pîrozkirin.

Di mîtolojiya kurdan, farisan û hîndûyan de jî em vê dualîzmê pir eşkere dibînin. Di baweriyên kurdan ên berê de Ehrîmen sembola tarîti û xirabiyê be jî li hember wê hertim Hurmuz; ango sembola ronahiyê, başî û jiyanê heye. Di mîtolojiya newrozê de jî Dehaq dijminê jiyanê ye ew tarîti zilmê û mirinê simbolîze dike lê li hember wî jî car din Kawayê hesinkar heye dostê jiyanê ye û mirovan dide jiyîn. Piştî têkçûna Dehaq 21 adarê wek destpêka biharê ye û ronahî dest pê dike. Esas meriv berê xwe bide etîmolojiya peyvên Newrozê meriv vê rastiyê zalaltir dibînin. Di zaravaya kurdî- kirmanckî/zazakî de *newe* tê wateya *nûya* kurmancî, *roz* jî tê wateya rojê. Ango ev peyveke hevedudaniye û tê wateya *roja nû*.

Li gor lêkolîner Hoşeng Broka pîrozkirina Newrozê bi van xalan ve girêdayî ye: Li ser erdnîgariya Mezopotamyayê ji bo newrozê gelek mîtoloji û çîrokên cur be cur tên gotin. Ji bo ku mesele hinekî din jî zelaltir bibe, em ê li vir qala şaxek- dudoyên van bûyerên ku di nav gel de berbelav in bikin. Mîtolojiya heft Xweda/Xwedawendan; ev mîtoloji ji me re qala çêbûna dinyayê û afirandina mirovan dike. Lê li gor vê mîtolojiyê dinya ji aliyê heft Xwedayan tê birêvebirin. Ji Xwedayan yek jê seroka wan her şeşan e. Seroka Xwedayan fermana afirandin û xulaqandina mirovan dide cîgirên xwe. Her Xwedayek peyvirekê digere ser xwe yek ji wan afirandina erd, yek jê çiya û yê dawî jî afirandina însan digire ser xwe û di dawiya roja şeşan de, êvara sêşemiyê afirandina cîhan û mirovahiyê diqede. Xwedayê ku dinya û însan afirandinê dibin heyranê vî karê xwe, li însan û dinyayê heyîrî dimînin. Ji ber wê roja pîştî wê; ango roja çarşemê şahiyê pir mezin çêdikin û hemû melek, û yên mayîn dikin xizmeta însan. Ev roja şahiyê roja 21 Adarê ye, ango newroz e roja nû ye. Herwiha ji vê bûyerê re hefte jî tê gotin; ji ber ku dinya di heft rojan de hatiye çêkirin, durustkirin. Çawa di xiristiyanan de yekşem, di baweriya îslamê de în be; ji ber wê di kevneşopiyên kurdan ên kevn de jî roja çarşemê pîroz tê hesabandin. Dema ku newroz rastî roja çarşemê were, wê demê pîrozbahiyên pir mezin tên lidarxistin û li seranserê wê heftê û di wê

mehê de her roja çarşemê agir tèn pêxistin pîrozbahî tèn lidarxistin. Dema em dîn û bala xwe didinê 21 adarê ji bo someriyên jî dihat wateya ji nû ve zindîbûna xwezayê û hatina Xwedawendan; ev jî nişaneyê evîn û bereketê ye. Îraniyan her sal di 21'ê Adarê de bi navê Akîfîl; ango şahiyên ji nûve zayînê, şahiyên bereketê li dar dixistin. (Üzgun, Ekinci, 2001:9-12).

Car din li gor Price hin komên mirovan çawa tèn ba hev û çawa civakekê nû pêk tînin, ji van mîtan re jî dibêje mîtên avakirinê (Price, 2011: 15). Çîrokên afirandina her gelî ji hev cuda ne. Ger em car din berê xwe bidin çîroka netewbûna kurdan mînaka Kawayê Hesinkar derdikeve hemberî me. Di Şaxeke Kawayê Hesinkar de du xortên ku her roj ji bo dermankirina birînên Dehaq tèn serjêkirin û mêjiyên wan xortan marên ku di nav her du milê Dehaq de serê xwe derxistine didin wan maran. Destê aşvan naçe ku her roj her du xortan serjê bike; aşvan di dewsa xortekî de her roj pezekî serjê dike, xortekî jî azad dike û ber bi çiya dişîne. Ev xortana jî ji bo ku canê xwe xelas bikin, ji ber zilma Dehaq direvin û li serê çiyayên asê tev digihên hevdu. Cemşîd jî tê serkêşiya wan dike; aha tê gotin ku netewa kurdan ji wan ciwanên serê çiyayê pêk hatiye.

Ev dualîzm û şerê qencî û xirabiyê, ronahî û tarîtiye û wateya roja newrozê di mîtolojiya hîndûyan de jî bi simbolên cuda; lê hema bibêjin bi heman awayî derbas dibe. Destpêka vê cejnê li ser şerê Xweda Îndra û hijdiya Vîtra didin rûniştandin. Îndra qencyê Vîtra jî xirabiyê temsîl dike. Li vir Îndra Vîtrayê dîkujê, di dawiyê de qencî bi ser dikeve û xirabî jî têk diçe (Yıldırım, 123-124).

Dema em bi vê nêrînê li mîta qiyametê tofanê dinêrin em dibînin ku li gor lêkolîner Sumerolog Samuel Noah Kramer dîroka wê digihîje derdora B.M 2000 Salan. Di wan nivîstekan de bi kurtasî xweda û xwedawend ji pêvajoya mirovahiyê kêfxweş nabin û biryar didin ku hemû mirovan ji holê rakin di bin avê de bihêlên; lê di nava wan de nakokî derdikeve. Ji wan xwedayê avê Enkî xeberê dide kesekî bawermend û xwedî ahlaqekî, keya Ziusudra. Li ser vê agahiyê Ziusudra radibe keştiyekê amade dike û ji her giyanewerekî hin nûmûneyan digire ba xwe. Ji xeynî wê keştiyê hemû dinya heft roj û heft şevan di bin avê de dimîne; roja hefta Xwedayê rojê Utu xwiya dibe û av bi şûn de dikişê. Ziusudra li hember An û Enlîl serê xwe ditewîne; ew jî li ser vê rêzdariya wî temen û jiyaneke wekî ya Xwedayan diyarî Ziusudra dikin

(Kramer, 2014: 173-174). Ziusudra di baweriya kurdên êzdî de û pirtûkên pîroz de wek Nebî Nuh derbas dibe.

Heman bûyer bi nav û deverên cuda; lê bi heman awayî di hemû pirtûkên pîroz de jî heye. Lê hemû olên pîroz jî dixwazin vê bûyerê weke bûyereke pîroz û dîrokî nîşan bidin. Heman tişt ji bo çarmixa Îsa jî derbasdar e; gelek bawermend vê bûyerê wek bûyereke olî ya dîrokî dipejirînin. Ji ber ku bi her awayekê nasîn û wateya mîtan ne mijara me ye bi awayeke kurt meriv dikare bibêje ku her weke ku ji ragihandinên jor jî em dibînin ku di çîroka newrozê de ji mirinê bêtir jiyan serdest e.

2.3.4. Efsane

Ev bêje di zimanên rojavayî de wek *legendusdi* di tirkî de her çiqas wek *söylence* bê binavkirin jî; bi gelemperî bêjeya efsaneyê bêtir tê bikaranîn. Di zimanê Rojavada bêjeya efsaneyê hemû jî koka xwe ji *legendusa* latînî digirin. Di îngîlîzî de *legend* di fransîzî û almanî de *legende*, herwiha di almanî de *sage*, di îtalyanî de *leggenda*, di îspanyolî de *leyenda* di yewnanî de *mîtos/mît* di dewsa bêjeya efsaneyê de tê bikaranîn. Di erebî de jî di şûna efsaneyê de usture tê bikaranîn. Di hin ferheng û çavkaniyên de pênaseya efsaneyê bi vî rengî derbas dibin; Di hin ferhengê almanî de *sage*, hin mijarên mîtolojîk û yên dîrokî bi awayekî zargotinî bi awayekê devkî tên gotin. Cardin di ferhenga almanî ya din de *lagende* bi awayekî efsûnî vegotinên hin mijarên dîrokî ye û her wiha *sage* vegotina hin bûyerên dêrîn her wekî ku rast be tê vegotin. Di ferhenga îngîlîzî de jî efsane bermayînen çîrokê ku di demên dêrîn de mane, mîten ku ketine şeweya romantîk û modernîze bûne re tê gotin. Çîrokên ku li ser li kesen navdar re hatine gotin in. Li gor Brayên Grîmm jî derbarê mirov, bûyer an cihê rasteqîn an xeyalî de vegotinên çîrokî ne (Yavuz, 2013: 1-4).

Efsane, bêjeyêke Îranî ye. Di zimanê kurdî û farisî de jî wek *efsane* derbas dibe. Çîrokên ku di wan de, cih, bûyer û kesayetên rasteqîn; an xeyalî hene, bi baweriya ku rasteqîn in re, efsane tê gotin. Vebêj û guhdarvan ku ji heman çandê bîn, bê şik û guman ji rastbûn û durustbûna wan bawer dikin.

Efsane li gor mîtolojiya ji alî demê ve bêtir nêzî dema me ne. Kesayetê ku di efsaneyan de derbas dibin herçendî taybetmendiyê wanê derasayî hebin jî ew kesên ji

cihana me ne; bi gelemperî kesayetên dîrokî an nêzî wan in. Ji alî şênberiyê de jî pir zêde ne dûrî me ne. Çîrok ji alî derasayîbûnê ve asta efsaneyan dibihurin; herwiha bi hêmanên fantastîk xemilandî ne. Ji ber wê yekê baweriya gel bi çîrokan qet tune ye.

Di xebatên qadan de tiştê ku em bûn şahidê wê ku di vegotinê de gelek caran çîrokbêj jî bixwe dibêjin; “de xebrojk in ne me dîtiye, ne jî hûn jê bawer bikin.” Lê belê ev tişt ji bo efsaneyan ne derbasdar e. Efsane di nava gel de rast û pîroz tên hesabandin. Ne bi qasî mîtosa bin jî bi taybetî bawerî bi cûreya efsaneyê olî heye û wan rast dipejirînin. Heman tişt ji bo mîtolojiyê jî derbasdar e. Her çiqas ev wek çîrokê xweda û xwedawendan û carcaran mirovên xwedî hêza Xwedayî tevî van cûre vegotinan bibin jî pir balkêş e; ku gel jê bawer dike. Wisa dixuye ku di bîra gel de ew gelek caran weke perçeyek ji perçeyê olê û pîroz tên hesabandin.

Li gorî nêrîna Mircea Eliade; mîtoloji xwe dispêre bingeheên pîroz û metafîzîk, lê mijara efsaneyan; çîrokên bi efsûnan xemilandî ne ku civak wan bi hêza xwe ya xeyalî derdixe meydanê (Eliade 2001: 9). Girêdan û pêwendiya efsaneyê ya bi demên dîrokê re, cûdahiyê sereke ya di navbera mîtoloji û efsaneyan e. Ango ji sedî sed ne zelal be jî di efsaneyan de em dikarin qala serdemekê bikin lê di mîtan de ev ne gengaz e.

Her çiqas di pênasekirin û di barê naverokên efsaneyan de hizir û ramanên cuda hebin jî di navbera salên 1959-1969 bûne mijarên kongreya di navbera van salan de di şeş kongreyan de hatine nîqaşkirin. Di nav van kongreyan de kongreya herî serkeftî ya Bûdapeşteyê ye ku bi serkeftiya Kurt Ranke hatiye lidarxistin û bi sererastkirinê wî efsane di çar beşan de hatin dabeşkirin û di bin van beşan de hin binbeş hatin diyarkirin ji ber ku mijara me ya sereke ne efsane ne em bi tenê ji bo ku derbareyê mijar û naveroka wan de hin zelalî çêbibe em ê van çar beşan li vir binivîsin. Ev beş ev in: 1. Efsaneyên derbareyê Afirandina cîhanê û dawîya wê de. 2. Efsaneyên dîrokî, Efsaneyên derbareyê û dîroka şaristaniyê de. 3. Efsaneyên derbareyê heyînen derasayî de- efsaneyên mîtîk. 4. Efsaneyên olî- efsaneyên derbareyê Xweda û lehengan de (Yavuz, 2013:12-23).

Digel ku di nava berên zargotînî de cureyê herî berbelav yek jê efsane bin jî; lê mixabin ku li ser efsaneyên kurdan jî heta niha xebatên bi rêk û pêk nehatine kirin. Yê hatibin berhevkerin jî perçe perçe di nava berên din de hatine weşandin; an bi wan re hatine tevlihevkerin. Dema me di qadê de ji bo xebatê berhevkarî dikir em gelek

caran rastî efsaneyên li ziyaretan, li ser kesayetên olî, çol û çiya, birc û bedenên hatin. Her wiha li ser navçeyên Amedê, germava Çêrmûgê û Çiyayê Bûkê jî varyantên efsaneyên cuda cuda hene. Li ser çêkirina Bircên Amedê, li ser hin beşên wê li ser mizgeft û ziyaretên Amedê gelek efsaneyên bi efsûnî hene.

Xebatek bi zimanê tirkî, tenê ji efsaneyên Diyarbekirê pêk tê, xebata bi navê *Efsaneyên Diyarbekir* ji alî Muhsîne Helîmoglu Yavuz (2013) ve hatiye kirin; di vî warî de herçend xebateke akademîk be jî hin kêmasiyê wê hene. Di berhevkarîyê de bilêvkirina devok û ziman divê bi her awayî bê parastin. Mixabin ku ev pîvan ji alî berhevkarê me ve bi tu awayî li ber çava nehatiye girtin. Di vê xebatê de jî hinek baweriyên gel wekî efsane di pirtûkê de cih girtiye. Ji ber ku xebat bi zimanê kurdî nehatiye weşandin, ji ber wê rih û giyanê efsaneyan tam derneketiyê holê.

2.3.5. Zûgotinok

Zûgotinok cureyeke ji zargotina zarokan e. Hem bi awayekî manzûm hem jî pexşan tîr gotin. Ji ber ku bi gelek cûreyên din ên zargotinê re têkilîya wan hene; ji vana stran, şanoya geleri, çîrok, mamik, lorîk ji vana çendik in. Bi gelemperî di destpêka lîstîkan de ji bo ku gelemşeyek, tevliheviyek dernekeve holê ji bo hîlbijartina makekî; her wiha di destpêka çîrokan de jî ji bo balkişandina guhdaran, di nava çîrokê de ji bo pêwendîya navbera tekstê û di dawiyê de jî ji bo ku çîrok bêtir di bîra guhdaran de bimîne û dilê wan xweş bibe tê bikaranîn.

Di zûgotinokan de carcaran em rastî serwayê (kafîye) tîr; lê em bi awayekê bi rêk û pêk weke cureyên manzûm ên din rastî serwa, paşserwa (redif) û rawestê di nava ristên wê de nayên. Ahengsazî bigelempêrî bi dubarekirina dengên nêzî hev pêk tê. Gelek caran bi bêjeyên ku alaşeya wan bi hev re tune xwe digihînin encamên dûrî êqil. Her wiha hevgirtineke rist û kiteyan jî tune. Hêmayê ku di zûgotinokan de hene û ji xwe re dike armanc yek jê jî gotinên surrealîst û kenîna guhdaran e (Kaya, 1999: 553).

Di hemû lêkolînên li ser zimên û perdehiyê de girîngiya zimanê dayikê bi awayekê şênber derdikeve pêşberî me. Zimanê dayikê ew tişt e ku serê ewil zarok wî hîn di malzaroka dayika xwe de dibihîze. Ji bo çespondina van nêrînan, derûnînas Jacques Mehler 27 sal berê du zarokê ku zimanê dayika wan cihê cihê ne, ji dayika

xwe dibin nabin, zimanekê biyanî û zimanê dayika wan bi wan didin guhdarî kirin. Dibînin ku zarok bi tenê bertekê nîşanê zimanê dayika xwe didin ji ber ku deng û nêweya zimanê dayika wî ji wî re ne xerîb e û hîn di malzaroka dayika xwe de pê re bûye nas. Her wiha cardin Jean Pierre Lecanuet di 1980'î de bi hinek dayikên ducanî ku di heftayê xwe yê dawî de ne, zûgotinokek û kilameke zarokan bi hinek dayikan; zûgotinokekî û kilamek cihê jî bi hinek dayikên dide guhdarîkirin. Di encama vê lêkolînê de derdikeve holê ku zarokê ku berê çî guhdarî kiribin bêtir kêfa wan ji wê zûgotinok û kilamê re tê (Ricq, Sogart, Dehaene, Lestiene, 2013:95,97). Piştî van mînakên bi awayeke piştrast em dikarin bêbêjin ku zûgotinok, ziman jî di nav de gelek tiştan didin naskirin û hîn hînkirin.

Karîgerîên zûgotinokan yek jê jî, di perwerdehiyê de dema ku zûgotinok bê bikaranîn fêrbûn jî bi kêfxweşî pêk tê; yan jî gava ku zarok eciz dibin di navberê de bînan bikaranîn ji bo zarokan wek behnedanekê ye. Ev jî rê dide ku zarok ji waneyên din eciz nebin û demeke xweş bi hev re bibûrînin. Em tev dizanin ku fêrbûnên bi kêfxweşî bêtir di hiş û bîra zarokan de dimînin.

Karîgerîên zûgotinokan yek jê jî di fêrbûna zimên de pêşketina tevgerên psîkomotor ên zarokan in. Zarok dema ku zûgotinokan pir zêde bi kar bîne bêyî ku zahmetiyê bikêşe û bifikire bêjeya zû zûka û di cî de bi kar tîne. Wek çawa ku dema meriv serê pêşîn dest bi ajotina erebeyê dike heta ku mêjî fermanê nede dest û pêyan peyvira ku ji wan tê xwestin nayînin cî; lê dema ku heman tişt pir dubare bibe di serê mirov de li hêla çepê omûrîlîk heye ew bi awayekê jixweber dikeve dewrê. Dema ku omûrîlîk bikeve dewrê edî mêjî hêzeke taybet bi kar nayne, tevger jixweber pêk tînin ev tevger edî psîkomotor e. Heman tişt ji bo zimên jî derbasdar e. Bi saya zûgotinokan dema ku heman peyv zû û li ser hev bînan dibarekirin dibe tevgerê psîkomotor. Ev jî ji bo pêşketina zimên gelek girîng e.

Dema zaroktiyê ya herî xeternaq serdema ku ji temenê 0-6 pêk tê ye. Ev serdem hîn wek serdema şenber tê binavkirin; ango zarok bi tenê wateyê dide tiştên ku bi pênc lebatan tê hîskirinê, bi tenê wan watedar dibîne. Di vê serdemê de zarok di nava hewildanê xwendin û nivisandin û hevnasîna hewirdora xwe de ye. Alaqeya zarokên pêşdibistanê di vê serdemê de li ser çîrok û listikan e. Di vê serdemê de zarok hawirdora xwe keşf dike û xwe nas dike. Her wiha cara yekem pêwendiyê wî ya bi

hawirdora çandî re çêdibe û ji aliyê hiş û mêjî ve bi pêş dikeve. Ji ber wê bandora vê serdemê li ser keseyat û nasnameya zarokan heye.

Cûreyên zûgotinokan ên weke destpêka çîrokan, nava çîrokan, dawiya çîrokan; ku em ê di beşa çîrokan de li ser çend mînakên wan rawestin. Her wiha zûgotinokên manzûm, xelitandin û bilêvkirinê yên cûrbecûr hene. Ji ber ku mijara me ya sereke ne zûgotinok in; em ê li vir bi tenê li ser du cûreyên wan mînakên bidin.

2.3.5.1. Cûreyên Zûgotinokan

2.3.5.1.1. Zûgotinokên Helbestkî

Bi gelemperî zûgotinok di têşeya manzûm de ne. Ev zûgotinok di têşeya helbestê de rist bi rist hatine nivîsîn. Lê hejmareke diyarkirî ya ristan tune ye. Zûgotinokên ji du ristan heta bi panzdeh ristan jî hene.

Mînak:

Silo silo du nikulo

Dasê bigre here çilo

Nikul jê bû silo gêj bû

Pisê pisê nan garisê

Pis ket çalê

Pis fetisî

Fat reqisî (Zîlan, R, 1996 : 15).

2.3.5.1.2. Zûgotinokên Lîstikan

Di lîstikan de di navbera zarokan de ji bo ku tevliheviyek, gelemşeyek û eciziyek dernekeve holê tên bikaranîn. Meriv dikare van zûgotinokan jî di nava xwe de bike sê beş. Zûgotinokên destpêka lîstikan, zûgotinokên nava lîstikan û zûgotinokên

dawiya lîstikan. Di nava gel de herî zêde yê berbelav zûgotinokên destpêka lîstikan e. Em ê li jêr ji vana zûgotinokan çend mînakên binivîsin.

2.3.5.1.3. Zûgotinokê Destpêka Lîstikan:

Dema ku zarok dest bi lîstikê dikan ji bo ku makekî hilbijêrin di destpêka lîstikan de dibêjin.

Mînak:

Yek û yek

Teyra belek

Zaza bilbil

Dermanê dil

Şerq û şema

Li ber çema

Çem miçiqî

Av tê nema

Ez kuncî

Tu kuncî

Li ser textikê firincî

Ez firiyam tu ma li cî (Gelerî: berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê).

2.3.5.1.4. Zûgotinokên Bilêvkirinê

Ji bo ku ziman bi pêş bikeve û herikbar bibe ev cûre zûgotinok tên gotin bi vî rengî hin xeletiyên bilêvkirîyên ji holê tên rakirin.

Mînak:

Ruvî revî, rê revî, rê revî, ruvî revî.

Şemo şemo, sê sêşeman, sê şo sabûn, şabaş daye.

Pişk û mişkê di kolê da, min pişk xwar, mişk ma tê da.

Mînak

Her heft hirç, her heşt hirç

Her heşt hirçê pişt bi pirç

Her heşt hirçê pişt bê pirç

Heft hirç heşt hirç (Gelerî: berhevkariyên ji herêma Diyarbekirê).

2.3.5.1.5. Zûgotinokên Xelitandinê

Ev zûgotinok dema civat geş dibe ji bo kêfxweşî çê bibe û civat bigere tê bikaranîn. Bi vî rengî dixwazin yên di nava civatê bi awayekê di zûgotinê de bixelite û civat kêfxweş bibe. Hem ji alî mezinan ve hem jî ji alî zarokan ve tên bikaranîn.

Mînak:

Min qîr di konê mamê xwu da, mamê min qîr bi konê min da.

Tir û tivir di kevçî da min tivir xwar, tir ma di cî da.

Çêçik û kûçik di malê da, çêçik firrîya, min çêçik xwar, kûçik firrîya min çêçik xwar.

Dest davêjimê, dev davêjê, dest davêjimê, dev davêjê, dest davêjimê, dev davêjê.
(Gelerî: berhevkariyên ji herêma Diyarbekirê)

2.3.6. Gotinên Pêşiyên

Gotinên pêşiyên li gor herêman bi navên cuda cuda tên bilêvkerin. Weke mînak li herêma Amedê wek gotinên bav û kalan, li herêma botanê gotinên pîr û kalan û li

herêma mêrdînê jî wek gotinên pêşiyên me tên binavkirin. Gotinên pêşiyên tê wateya gotinên ku ji alî pêşiyên me ve ji mêj ve li ser bûyer û qewimînekê hatine gotin. Carinan ji bo şîrovekirina mijarekê meriv bi deqe û seatan diaxive û mînan dide; lê dibe ku ew hemû bi qasî gotineke pêşiyên bi bandor nebin; nabin zimanê derbirîna dilê me.

Bêguman pêvajoya gotinên pêşiyên bi qasî dîroka mirovahiyê dûr û dirêj e. Demeke pir dirêj xebata herî kevn a di derbarê gotinên pêşiyên de wek pirtûka *Meseleyên Suleyman* dihate zanîn. Lê nêzî du sed sal berê lêkolînên ku li ser *Misira Kevn* (B.Z. sedsala 3.-1) hatin kirin ev nêrîn ji holê rakir û gotinên pêşiyên ên Misiriyan derketin holê (Kramer, (2014: 150).

Di Yewnana kevn de dihat bawer kirin ku; ev gotinên ku li ser perestgehan hatine nivisandin ji aliyê heft zanyaran ve hatine vegotin. Di nava Hîndûyan de jî *Sûtrayên* (gotinên pêşiyên) ku di deqên pîroz de jî derbas dibûn, derdikevin pêşberî me. Her wiha gotinên pêşiyên li *Rojava*, ji ber ku kin kurt bûna wan di hunera gotinbêjiyê (xîtabet) de ji aliyê Arîsto ve hatine bikaranîn. Pirtûkên pîroz ên weke *Zebûr*, *Tevrat* û *Încil* jî çavkaniyên sereke yê gotinên pêşiyên û biwêjan tên hesibandin (Rojhilat, 2016: 4-12).

Bêguman ji pêvajoya derketin û kemilandina van gotinên pêşiyên re bivê nevé pêvajoyeke dûr û dirêj divê. Ev tê wê wateyê beriya ku ev gotin werin nivisîn jixwe di nava gel de ji mêj ve berbelav bûne.

Weke ku Wray ve Perkins jî gotiye: Gotinên pêşiyên bi awayekê kin û kurt; ji bo axêver di bilêv kirina hizr, raman û axaftinê de bidestxistina rêya herî hêsan e (Tüm, 2010:663-678). Her wiha li gor William R. Bascom (2005:125- 151) karîgerîya gotinên pêşiyên beralîkirina nerazîbûn û nelihêv kirinên civakî ye û ji bo kesê ku di nava hewildana lihev kirina hawirdora û qedera xwe jî, reya aşt kirinê ne. Ji ber ku ne mijara me ya sereke ye û gotinên pêşiyên mijareke bi serê xwe pir berfireh e; em ê li jêr weke mînak çend heban binivîsin.

1. Ji bo ku rîstek bibe gotina pêşiyên; gerek peyvên wê rîstê lihevhatî bin, sal û zeman di ser re derbas bibin û wateya wan ji alî gel ve hatibe pejirandin.

Mînak:

Aşê dîna, bê av digere.

Bext, kela mêran e.

Gayê pîs, tim golik e, mêrê pîs, tim lawik e.

Kes nabê dewê min tirş e.

(Aslan, 2006: 26).

2. Berî her tiştî di gotinên pêşiyên de darazek heye. Bi vê taybetiyê, mirov dikare gotinên pêşiyên ji biwêjan cuda bike û veqetîne. Ji ber ku di biwêjan de darazeke giştî tune ye; bi tenê şîrovekirina rewşeke taybet heye.

Mînak:

Barê bîaqilan, li piştê bêaqilan e.
berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê)

Çavê kul, ji çavê kor çêtir e. (Gelerî:

3. Bi gelemperî di wateya mecazî de ne. Tîştê ku qal dikin û tiştê ku li ser radiwestinê cuda ne. Bi gelemperî armanc tiştê ku tê qal kirin nîn e. Lutz Rohrich û Wolfgang Mieder, vê rewşê wisa bilêv dikin: Gelek caran wateyên ku bêjeyên gotinên pêşiyên di xwe de dihevin; dixwazin ji derveyê wê hin tiştên din vebêjin (Sağlam, 2001: 45-51). Ev taybetmendîya gotinên pêşiyên, sêwirandina wêjeya gel a bi hezar salan jî nîşan dide. Di vir de Heman tişt jî bo biwêjan jî derbasdar e.

Mînak:

Malê bi tirê hatî, bi virê diçe.
digerin.

Masiyê mezin, di ava kûr de

Meke lez tu yê zimanê xwe bikî gez.

Mezînan got, biçûkan firot.

(Gelerî: berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê)

4. Hin gotinên pêşiyên hene ku di wan de têkiliya jiyan û xwezayê pir berbiçav e. Gelek caran gotinên pêşiyên ji qewimîn û bûyerên xwezayê jî mînakên didin, bingeha xwe ji wir digirin.

Mînak:

Adarê agir xweştir e, ji sawarê.
28).

Avli serê kaniyê şêlî dibe. (Aslan, 2006: 18-

Gotinên pêşiyên û biwêj derbirînen hizr û ramanên gel û xeml û xêza zimanê gel bixwe ne. Bêguman gelek gotin hene ku meriv ji bo gotinên pêşiyên li vir bilêv bike lê ji bo ku dirêj nebe em ê derbasî mijara biwêjan bibin.

2.3.7. Biwêj

Biwêj jî wek gotinên pêşiyên xeml û xêza zimanan e. Bi alîkariya van hêmanên zimên em dikarin tişta di dilê xwe de xweştir û bi bandortir bi lêv bikin. Em dikarin biwêjan wek hêmayên xweşvegotinê bi nav bikin. Biwêj jî weke gotinên pêşiyên piştî qewimîn û bûyerekê bi taybetî ji bo vegotina wê rewşê hatine afirandin. Bi gelemperî biwêj jî wek gotinên pêşiyên mecazî ne. Li gor gotinên pêşiyên meriv dikarin bibêjin ku biwêj bêtir nêzî dema me ne; ji ber wê çendê jî gelek caran bi çîrokê xwe re tên vegotin.

Biwêj jî wek gotinên pêşiyên ji jiyan û bîra gelî ya hevpar dawerivîne û gihîştine roja me. Ji ber vê yekê jî wek gotinên pêşiyên, nîşane û remzên netewî di xwe de dihewînin. Ji ber van sedeman ev gotinên qalibî dibin çavkaniyên her cure lêkolînên li ser wê netewê. Biwêj jî wek gotinên pêşiyên carcaran bi gotinên navdaran, bejeyên hevedudanî û nifir, dijûn û hin qalibên din re tên tevlihevkirin; lê ew jî herî zêde bigotinên pêşiyên re tên tevlihevkirin (Rojhilat, 2016: 4-12).

Armanca biwêjan ragihandin û şîrovekirina rewşên taybet e; ya gotinên pêşiyên rênîşandan, pend û şîret, hilgirtina dersekî ji mijarên jiyanê ye, ragihandina tiştên bi giştî ye. Biwêj rewşa giştî şîrove nakin û ranagihînin. Her wekî ku me di mijara gotinên pêşiyên de jî gotibû, ev cudahî cudahiya herî girîng a di navbera gotinên pêşiyên û biwêjan de ye. Ji ber ku ne mijara me ya sereke ye em ê li vir çend heb mînakên bidin û derbasî mijarên xwe yên din bibin (Rojhilat, 2016: 4-12).

Mînak

Bêvila xwe rakirin.

Diranî wî/wê qîç bûn.

Paş stûyê xwe xurandin.
ji herêma Diyarbekirê)

Bûn bilq û birûsk. (Gelerî: berhevkarîyên

Herwekî ku ji pênasêya wan jî diyar dibe, bi gelemperî tiştê ku tê gotin û tiştê ku dixwazin bidin fêmkirin cuda ne, ango mecazî ne. Her çiqas şibandin hebe jî, gelek caran wate pir cuda ye.

Mînak

Bi qûna tazî, tembûrê dixwazî.

Çavbirçî bûn.

Dendikê xwe çizirandin.

Barê ceh û genim ji hev kifş bûn.

(Aslan, 2006: 29- 93).

2.3.8. Pêkenok

M. Xalid Sadînî di pirtûka xwe ya bi navê *Pêkenokê* de navê pêkenokan wisa rêz kirine: pêkenî, pêkenok, pêkenîn, meselok, metelok, henek, qerf, lek, gelte, latîfe, serpêhatî, nukte, serhatî, anekdot, qise, kurteçîrok û hwd (Sadînî, 2012: 13- 17). Lê di nava van navên cur be cur de pêkenok, edî hema hema em dikarin bibêjin rûniştiye, betir berbelav xuya dike. Di jiyane de tiştên ku nebûbin mijara pêkenokan hema em dikarin bêjin ku qet tune ne. Pêkenok li ser, şîr şahî mervantî, bawerî, keç û xort, mela, axa û hwd di her mijarê de hatine gotin. Mirov dikare bêje ku pêkenok di van hemû mijaran de helwest û rexnegiriya gel e.

Gelek ji wan netewek li ser yeka din weke mînak kurdan li ser ermenan, ermenan li ser tirkên, elmanan li ser îngîlîzan; carna jî bajarekî li ser yekê din pêkenok çêkirine, Amediyan li ser Rihayîyan, Waniyan li ser Mûşîyan pêkenok afirandine. Hinek caran wisa dibe ku ji bo ku, bajarek bi bajarekî din; gundek bi gundekî din henek û yariyê xwe bike, hin bûyerên qewimîbin zêde dikin û bi demê re weke pêkenok dikeve nav zar û zimanên gel.

Bi gelemperî payama pêkenokê di dawiyê de ye. Lewre hemû qerf, hevoka bi bandor di dawiya pêkenokê de ye. Gelek caran ev hevokên bi derb ên wek gotinên pêşiyar û biwêj dibin navê pêkenokan jî. Bi taybetî pêkenokên biwêjî pir berbelav in. Gelek caran, dema ku hin tişt rasterast werin gotin, mirov pê diêşin; ji ber vê yekê jî hem ji bo ku şikestin û eciziyek û dilmayînek çênebe, hem jî peyam li ser qewimînên civakî, bûyer û şaxsiyetên dîrokî bê dayîn, bêtir şênber û bi bandor dibe.

Armanca vegotina pêkenokan digel xweş bihurandina demê, bi zêdekirina hin tiştên pêkenînî şîret dayîn e; lewra pêkenok cureyeke didaktîk e jî. Heke ne ji pekenînê lawiran bin meriv dikare cûreya pekenokan wek cûreyek serbixwe binirxîne, di nava çîrokan de dabeşkirin neke. Herçendî ev pekenok li gor cûreyên çîrokan ên din kin bin jî; çîrokên lawiran ji alî hin motif û teşeyên xwe ve dikevin nava cûreyên çîrokan.

BEŞA SÊYEM

DI ZARGOTINA KURDAN DE ÇÎROK

3.1. Dabeşkirina Çîrokên Kurdan

3.1.1. Çîrokên Derasayî

Dema ku çîrok tèn gotin bêguman bi giştî jiyanekê mîstîk û derasayîbûnê tê bîra meriv. Di nava çîrokên kurdan de çîrokê ku dikevin beşa derasayî gelek zêde ne. Çîrokên ku bi giştî, bi nîgar û lehengên xwe dikevin beşa derasayîbûnê jixwe hene; lê hinek ji wan jî bi nîgar û lehengên xwe ne derasayî ne. Lehengên wan wek şivan, gavan, padîşah, wezîr bin jî di cihekî çîrokê de teqez tiştinên derasayî diqewimin; lê belê çîrok piştê bi awayekî asayî berdewam dike.

Çîrokên ku lehengên wan Mîrza Miheme ne; hema em bibêjin bi giştî dikevin vê beşê ji ber ku hêman û nîgarên wek teyrê enqer, dêw, hijdiya cin û perî di xwe de dihevin. Carinan tu dinêrî ku Mîrza Miheme bi dêw û hijduyan re dikeve şer û cengê û wan têk dibe. Carinan jî tu dinêrî ku teyrê Sîmir wî ji dinya tarî digihîne dinya ronî. Di van çîrokên derasayî de hêza lehangan hêzeke derasayî ye. Herçend lehengên van çîrokên derasayî rastî îxanetê bîn, ji cî û warê xwe werin dûrxistin, kemîn li pêşiya wan bîn danîn, arasteyê rêyên şaş bîn kirin jî, hertim bi awayekê van astengiyan tevan beralî dikin û di encamê de bi ser dikevin.

Di şaxek çîroka Mîrza Mihemed de, Mîrza Mihemed biçûkê birayan be jî kalê kujer têk dibe û sê keçikên pir bedew, ku ji alî kalê ve dîl hatine girtin, rizgar dike. Digel hijyariya xwişka herî biçûk û xweşik guh nade şîretê wê û ji alî birayê xwe ve rastî bêbextiyê tê. Li wir dikeve rêyeke şaş û başerekî ji hijdiyayekî xelas dike. Car din bi alîkariya teyrê Sîmir bi awayekê tê ser rûyê erdê, tê bi xwişka biçûk a xweşik re dizewice û herdu birayê xwe jî dikuje. Em di vê çîrokê de jî dibînin ku çiqas astengî li pêşiya Mîrza Mihemed hebin jî; ew tevan beralî dike û bi ser dikeve.

Her wiha şaxên çîrokên Şahmaranê jî çîrokên dikevin vê beşê ji ber ku, şahmaran bi hemû raz û sirên dinyayê dizane, hemû qewimînan ji mêj ve texmîn dike. Ew li dinyayeke din a di bin erdê de padîşahê qewmê xwe ye. Di nava berhevkarîyên

me de jî Çîroka bi navê Hesênê Kilindar û Şahê Maran jî, ku me di dawiya cih daye vê çîrokê, jî çîrokek bi vî rengî ye.

Çîrokên ku lehengên wan rasterast cin û perî bin. Ev jî çîrokên derasayî ne. Di navan çîrokên kurdan de bi vî awayî gelek çîrok hene. Di nava berhevkarîyên me de jî çîroka bi navê Qîza Şahê Periya ji van çîrokan e. Her wiha rasterast ên lehengên wan ne cin û perî bin; lê bi dan û stendîne xwe bi wan re hebin jî dikevin vê beşê. Di nava berhevkarîyên me de çîroka bi navê Serxweş û Bengî bi vî rengî ye. Di çîrokê de Serxweş padîşah e, Bengî jî xulamê wî ye. Ev herdu kes, kesên ji jiyana me ya asayî ne. Lê xezala qîza mîrê cinan û Zîna mîra periyar kesayetên derasayî ne, lehengên mîstîk in. Di nava berhevkarîyên me de çîroka bi navê Feyrûşah û Feyruzade de jî lehengên sereke lehengên asayîne lê; qîza cinan û cazûbat lehengên derasayî ne. Her wiha Guloka Şev û Royê û Eysê Qotê jî ji van çîrokan e.

Di çîroka Giloka Şev û Royê de nîgara herî balkêş û diyarde pîrê ye. Ji ber ku pîrê dema bi hilkirina gilokên rîsîn şev û rojê diyar dike. Di çîroka Eysê Qotê de ji xeynê sê dizan û kuçik, tev mirovên ji rêzê ne û taybetmendiyê wan ên jiyana me ya rojane ne; ji wan dizan yek bi hildana hin navan çî kilît û qeyd û bend hebin teva vedike, yê din dema serê heval û hogirên wî bikevin tengasiyê bi hildana peyva heval yekcar bi hawara wan ve derdikeve; kûçik jî hemû xetereyan ji mêj ve dibîne û xwediyê xwe agahdar dike.

3.1.2.Rêzeçîrok

Ev cûre çîrok di dabeşkirina Aarne-Thompson de wek çîrokê romanî derbas dibin û lehengên wan di vê dabeşkirinê de asayî ne, mirovên jiyana me ya rojane ne. Lê belê me di encama vê lêkolînê de dît ku, ev dabeşkirin tam li çîrokên kurdan naye ji ber ku çîrokên dirêj ên lehengên wan asayî jî hene, derasayî jî hene. Ji ber wê çendê me di bin du serenavan de ev cûre çîrok vekolan. Lê belê ev cûre çîrok di dabeşkirina Aarne-Thompson de di bin serenavekî de hatine bicihkirin.

Di dabeşkirina Aarne-Thompson de ev wek çîrokên romanî, rêzeçîrok derbas dibin. Li gor baweriya me jî meriv van cûre çîrokan weke rêzeçîrok bi nav bike baştir dibe. Ji ber ku di van cûre çîrokan de bûyerên cûrbecûr li pey hev rêz dibin; ji ber wê

çendê li gor cûreyên din gelek dirêj in. Ev rêbaz di çîrokên 1001 Şevê de û di çîrokên Îranî de jî heye.

Bi qasî ku me di qada berhevkarîyê de jî dît, hîn jî çîrokên tevî şaxên xwe pênc şeş saet tînin gotin hene. Dema em 30 salî bi şûn de biçin çîrok derasayî be; an ne derasayî be ji alî çîrokbêjan û gel ve, tînin gotin ku hin çîrokan bi rojan dewam dikirin. Ji van rêzê çîrokên dirêj ên lehengên wan asayî ne, yê cihana me ya roja ne, ew jî hene yê derasayî jî hene.

3.1.2.1. Çîrokên Ku Lehengên Wan Rasteqîn in

Lehengên wan cure çîrokan bi gelemperî kesayêtên jiyana me ya roja ne. Em her tim bi wan re dijîn, hez dikin, hêrs dibin di şî û şahiyên de bi hev du re ne, bi kurtasî li her derê em her roj rastî hevdu tînin. Bi gelemperî ev çîrok li gor yê din dirêjtir in.

Ji van çîrokan ên asayî ku me berhev kiriye çîroka Evdilo Îso ye ku 2: 24 xulek heye, bi tenê du caran di çîrokê de nîgareke derasayî derbas dibe ku ew jî Xocê Xizir e, carekê di serê çîrokê de der tî, tî destê xwe li piştê Evdilo Îso dixê, dû re dema Evdilê Îso zilmê dike di dawîya çîrokê de xuya dibe û destê xwe ji piştê wî dikişîne. Ji xeynê Xocê Xizir tu hêman û kar û tevgerê derasayî di çîrokê de tune ye. Dema ew weke pirtûk bê çapkirin derdora 50 rûpelî heye. Evdilê Îso lehengekê ji nava gel e, bi xwe gavan e. Bi kar û kirînen xwe tî serê êla xwe. Kesên ku di çîrokê de derbas dibin, em her roj pê re didin û distînin ên weke ap, pismam, dotmam û aşîk û her wekî din in.

Yê ku leheng û kar tevgerên wan asayî ne yek jê jî ya ku me ji devê çîrokbêj Qûtbetînê Farqînê girtiye, çîroka Meşhed û Ecac e, ku ew jî 2:08 xulek heye. Ji ber ku dirêj bû me di tezê de cih neda wê jî. Di Meşhed û Ecac de jî ji xeynê pirolekirina şer û şonikê pêlawaniyê tu rewş û tevgerê derasayî tune ye.

Her wiha hin çîrokên ku lehengên wan rasteqîn in û yê jiyana me ya rojane ne weke bûyerên dîrokî ku di bûhurîna demê de hinekî veguherî ne û di hinek bêtê çîrokê de nîgarên derasayî tevî bûne. Xeyn ji wê, di van cûre çîrokan de cihê ku bûyer

lê qewimiye êl û eşîr kes an gundê wî tê binavkirin. Bêguman ev tişt jî li penasekirina cûreya çîrokê nayê. Ev jî dide xuyakirin ku ev, wek ku bûyerên ku di buhurîna demê de qemine lê hîn jî bi şekl û şemal û naveroka xwe veneguherî ne cûreya çîrokê.

3.1.2.2. Çîrokên Ku Lehengên Wan Derasayî ne

Herçend di van cûre çîrokan de lehengek an du lehengên jiyana me ya rojane hebin jî yên mayîn cin in, perî ne, teyr; an şahmaran in û her wiha lehengên asayî jî ligel yên derasayî bi alîkariya kesayetên wek Xocê Xizir û hin heyberên weke kum, lambe, gustîlk mefhûr dibin xwedî taybetmendiye liv û tevgerên derasayî. Di hinek çîrokên ku lehengên wan cin in, perî ne. Di çîroka Mîrza Mihemed de, ku em di beşa derasayî de li ser sekinîbûn, em dibîn ku bi rastî rêzeçîrok in; ango çîrokên ku di nava hevdu de ne.

Ji wan çîrokên dirêj yek jê, ku me bi tenê şaxeke wê berhev kir, çîroka Xana Delîla bû. Herçend lehengê wê yên sereke wextekî mîr û padîşahê welatê xwe bûne û dû re bûne derwêş; di vê şaxê de çîroka Mîrê Berhema, Qerecehnimê Mistehq û ya Bajarê Reş Gayê Belek bi rêzê tînin vegotin û her yek bi tîra xwe hene û ji serî heya binî bi hemanên derasayî niximandî ne, wek rêzeçîrok di nava hevdu de ne û gelekî dirêj in. Dema ku di formata pirtûkê de were çapkirin şaxeke wê bi tenê bi rehetî 55 rûpel heye. Dema em şaxên wê yên din jî bi hesebînin ew jî tev hev du 150 rûpel heye. Ew jî bi serê xwe romanek e û tîra xwe dirêj e.

Bêguman heman çîrok dikare cihê xwe di nava çîrokên derasayî de jî bigire. Ji ber ku di dabeşkirina Aarne -Thompson de çîrokên dirêj; ango rêzeçîrok bi tenê yên lehengên wan rasteqîn in, derdikevin hemberî me. Wisa xuyaye ku ev tişt ji ber cudabûna çanda rojava û rojhilat diguhere. Ji ber ku em vê rêbaza helqe yên şax şax di nava hevdu de, di çîrokên 1001 Şevkî de û çîrokên Mala Zalê yên di pirtûka Fîrdevsî de jî dibînin. Weke ku me di mînakên di jor de jî rêz kirine xuya dibe ku dirêjbûn an rêzeçîrokbûn bi leheng an bi naverok û nîgarê navê çîrokê ve girêdayî nîn e. Çîrokên me di qadê de berhev kirin çî asayî be çî derasayî be vê nêrîna me diçespînin.

3.1.3.Çîrokên Lawiran (Fabl)

Ev cûre çîrok ji mêj ve di nava her civakê de hene. Di van çîrokan de di dewsa mirovan de bi awayekî sembolîk lawir hene û her lawirek jî di nava civakê de hin kesan û beşên civakê temsîl dikin. Weke mînak rovî, merivê kone yê ku bi tenê ji xwe re ye û hertim li berjewendiyên xwe difikire. Gur kesê wêrek e lê hinekî jî kêmaqil e. Şêr nûnertiya asalet, wêrektî û serdestiyê dike.

Ev cûre çîrok li welatê Hindê ji alî Beydaba ve ji bo ku gelê xwe ji ber zilma keyayê wê demê biparêze û hinekî jî ji alî rêvebirêyê ve alîkariya wî bike bi awayekê bi remz ji bo ku padîşah fermana wî dernexe mexset û miraza dilê xwe bi van cure çîrokan vedibêje û Beydaba di dawiyê de padîşah diguherîne û ji alî rêveberiyê ve digihîne çiyekî maqûl. Car din Aisopos jî li Yewnanistana kevn vê rêbazê bi kar tîne û şîretan li mirovan dike her wiha yek jê jî La Fontaineê fransizî ye û ew jî çîrokên pexşanî bi awayekî helbestkî dinivîse; vediguherîne rewşeke manzûm.

Her wekî ku me li jor jî hinekî qala van cûre çîrokan kir ku di demên berê de çîrokbêj ji bo ku xwe ji xezeba serweran biparêze û di nava civakê de dilê mirovan nehêlê û neşikîne ev cûre çîrok bi kar anîne. Herçend di çîrokên din de jî, ji bo civakê rexne û peyamên girîng hebin jî di wan de, serê wan peyaman nixamandî ne. Lê di fablan de ev peyam û rexne teqez hene û bi awayekî eşkere tînin dayîn. Gelek caran di dawiya van cûre çîrokan de ev peyam bi xwe jî tînin bilêvkirin.

Ev cûre çîrok ji ber ku kurt in di nava civakê de hema bibêje her kes ji vana bi çend heban dizane. Eger ev çîrok di xwe de tiştên pir tirsnaq nehewênînin li ber zarokan jî dikarin bînin gotin. Ji ber ku kurt in û teqez peyamekî di xwe de dihewînin; perwerdekar di dibistanan de ji ber van teybetmendiyê van çîrokan, bi gelemperî van cûre çîrokan bi kar tînin.

Dema ku bi gelemperî em dînin û bala xwe didinê ev cûre çîrok di nava kurdan de pir zêde berbelav in û hinek ji wan, ji alî çîrokbêjan ve bi awayekî helbestkî tînin vegotin. La Fontaine di pêşgotina pirtûka xwe de bi xwe jî dibêje ji bo ku kêfa mirovan jê re were û hêsan bin min ev çîrok veguhezandine dirûvên helbestan. Lê tiştên balkêş ev e ku di nava civaka kurdan de jixwe bi wî awayî tînin vegotin. Dema ku meriv dînin û

bala xwe didin pevbestîn û hûnandina wan ji alî kîtekêjiyê ve û ahengîsaziya dengan ve di pîleya herî jor de dixûyên. Me jî ji bo wê xebatê çend mînak ji van cûre çîrokan ji devê hin dengbêjan girtin lê ji bo ku tez pir zêde stûr nebe, me weke mînak bi tenê cih dan du hebê pexşan.

Di van cûre çîrokan de gur, rovî, hirç, eylo, kurmorî, kew û hwd difikirin, xeber didin û yekser bi şivan, gavan bêrîvan, pîrê û zarokan re xeber didin, didin û distînin û dibin hevalê wan. Di çîroka Miya Topal de ku me di pêvekê de cih dayiyê, rovî, gur û mî bi şivan re xeber didin. Di çîroka Heca Rovî de, rovî dîk, kew û kund bi hev re xeber didin tu kes şaş û metal namîne.

Berhevkarên kurdan jî dikarin van cûre çîrokan li gor lehengên wan; an jî li gor mijar û peyama ku di dawiyê de tê dayîn berhev bikin. Weke mînak çîrokên li ser konetiyê û yan; li ser debengiyê; yên ku lehengên wan rovî an ker in, dikarin li gorî sembolan bîna dabeşkirinkirin. Dema ku wisa be karên lêkolîneran hêsantir dibe; yan na lêkolîner divê ji bo mijarekê bi dehan pirtûkan peyda bike û hemûyan bixwîne, ev jî ji bo lêkolîneran ji her alî de zahmetiyeke mezin e.

3.2. Ji Alî Teşe ve Çîrok

Di beşa yekem de di xala teorî û dabeşkirina çîrokan de me bi kurtasî hinekî qala dabeşkirina V. Propp kiribû, ku esas ji hinek alîyan de nirxandineke li ser têşeyê çîrokê ye. Propp ji alî binyadgerîyê de çîrokan serê pêşîn wek heft heb karîgerîyan rêz dike. Vana wek “dûrketin, qedexekirin, bînpêkirina qedexeyê, lêpîrsîn, berhevkirina agahiyan, xapandin û tevlêbûna sûc” bi nav dike. Van karîgerîyên hanê di hemû çîrokan de, bi gelek taybetmendiyên tîpîkî şênberkirin. Ji derveyê livbaziyan ew kesayetên ku wan kiriyara dikin bi heman awayî rêz dibin (Çağlar, 2014: 32-55). Piştî jî Propp pêvajoya pêkhatina çîrokê ji alî teşe ve di 31 xalan de dinirxîne. Ji alî teşe ve ji xeynî vê hêlengandinê, hêlengandina herî berbelav a çîrokan ji alî pêkhatina bûyeran ve; ango ji alî teşe ve di sê beşan de bi alîkariya bûyer û hin qaliban, çîrokê di sê beşan de dinirxîne. Ev jî hin qalibên diyar ên ku pir hindik di hemû çîrokan de tîpîkî duaberekirin; weke *destpêk*, *pêşketin* û *bidawîkirin* tîpîkî binavkirin. Bayram Çağlar (2014: 32-55) vê rewşê ji devê Arthur Berger bi şemayekê wîsa radigihîne me:

1. Rewşa Destpêkê: Têketin
2. Kêmasî } Rakêşî
3. Serkeftin }
4. Derxistina Holê: Çareserî û bextewarî

Weke ku di pêşnûmeya jor jî dixûye; xala duyemîn û sêyemîn meriv dikare weke pêşketin; ango geşbûn bi nav bike. Wê demê wek destpêk, geşbûn û çareserî meriv dikare dabeş bike. Boratav jî dabeşkirinekê li ser zûgotinokan dike û wîsa vê rewşê wisa şîrove dike:

Bi gelemperî di destpêk, navber û di dawiya çîrokan de hin zûgotinokên pexşanî tên bikaranîn. Guhdaran ji bo atmosfera çîrokan amade dikin. Ev zûgotinok herçend wek pexşan xuya bikin jî bi hêmanên manzûm ên wek şibandina dangan xemilandî ne. Li gor Boratav di çîrokan de bikaranîna zûgotinokan wê hewayaya rakêşayî bi hêmayên qerfî û kenînê belav dike (Boratav, 2000; 9).

Armanca bikaranîna van zûgotinokan bi giştî ji bo destpêkê bala guhdaran bikêşe ser xwe û di navbera deqê de jî girêdanekî, pêwendiyekê, di navbera beşên dîtir de çêbike. Herwiha bandora van zûgotinokan li ser vegotina zimanê çîrokê jî çêdibe. Bi alîkariya zûgotinokan çîrok ji jiyana me ya rasteqîn tê bi dûrxistin. Çîrok ber bi jiyaneke efsûnî û cihaneke dîtir, cihaneke bi sehr û remz ve tê tavidan. Bi alîkariya zûgotinokan zimanê çîrokê ji zimanê şenber jî tê bi dûrxistin û zimanekî efsûnî û bi remz tê bikaranîn.

3.2.1. Destpêk

Di vê beşê de pirsgirêkek derdikeve, ji bo çareserkirina pirsgirêkê lehengê asasî ji bêgavî edî ji malê derdikeve û dide pey çarenûsa xwe. Di beşa destpêkê de bûyer hîn bi hûrgilî nayên şîrovekirin, şaxên bûyeran di beşên pêş de rûdidin. Ev beş bi hinek zûgotinokên diyarkirî dest pê dikin, nîşaneyên destpêkê yek jê jî ev qalibên diyarkirî ne.

Çîrokbêj di destpêka çîrokan de ji bo ku bala civatê bikişînin, civatê amade bikin, zûgotinokan bi kar tînin. Herwiha ji ber ku di van zûgotinokan de tiştên bi hev

re alaquadar û ne alaquadar tèn bikaranîn û tîştên di jiyana me ya rasteqîn de ne pêkan bin li pey hev tèn rêzkirin; bi vî rengî baweriya guhdaran a bi deqê di destpêkê de tê şikestin û di çavê guhdaran de bûyerên ku di çîrokê de bèn pêşkeşkirin weke ne rast be, derew be tèn nîşandan. Form û qalibên zûgotinokên destpêka çîrokan pir hindik diyar in. Em li vir ji qalibên diyar çend mînakên bidin:

“Hebû tunebû rehma Xwedê li dê û bavê hazir û guhdaran ji xeynî beqî û muxtar, cendirme û tahsîldar û mişkên qulê dîwaran. Tuneye ji me re, heye ji we re û çîrok ji me hemûyan re. Hebû tunebû xêr û xweşî li dê û bavê guhdaran, carek ji caran rehmet li dê û bavê guhdaran, hebû tunebû ji Xwedê mezintir kes tunebû. (Gelerî: berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê)

Weke ku di zûgotinokên li jor jî dixuyî kes an tîştên ku bi hev re aleqeya wan hebe; an tune be tev li ser hev hetine rêzkirin. Weke muxtar, cendirme tahsîldar û mişkên qulê dîwaran. Weke ku tê zanîn di jiyana me ya rasteqîn de muxtar û mişkê qulên dîwaran tu carî nayên ba hev; lê li vir ew tîşt pêk hatiye. Bi vî rengî çîrok ji şênberiyê ber bi razberiyê ve tê tavidan.

3.2.2. Geşbûn

Di vê beşê de ji ber pirsgerêkên di beşa destpêkê de rû didin, leheng ji bêgavî ji malê derdikeve û bi vî rengî rêzebûyer dest pê dikan. Bi derketina leheng a ji malê hinekên wek dêw, hijdiya, cin tèn û astengiyê ji leheng re derdixin; dema leheng tam bêhêvî û çareserî dimîne; yê wek xocê xizir, kalêpîr, diya pîr, perî û hwd tèn pêşiyê hin agahiyên pêşwext didin leheng; an hin amûrên weke kum, lambe, tayek, an du ta mû didin leheng. Leheng bi alîkariya wan agahiyên û amûran dema serî wî/wê dikeve şeq û deqên giran bi dêw, hijdiya an pîra hût re dikeve şer û cengan û bi awayekê wan têk dibe. Di vê beşê de herçend leheng hin astengiyên beralî bike jî; lê hîn jî xwe nagihîne menzîla xwe ya esasî û pirsgerêka ku ji bo wê ji cih warê xwe derketibû, pirsgerêka esasî hê jî çareser nabe. Meriv vê beşê bi alîkariya wan rêzebûyeran û bi alîkariya hin zûgotinokên wek qalib tèn bikaranîn, dikare ji hev du derxe, ji beşê din cuda bike.

Ev zûgotinok ji bo ku yeknesanî û eciziyê ji holê rake, aheng, pêwendî û girêdanekê di nava deqê de çêdike. Bi alfkariya van zûgotinokan çîrokbêj dem û bûyerên ku ji mêj ve qewimîne û lehangan ji qonaxekê derbasî qonaxeke dîtir dike. Wek mînak em ê çend heb zûgotinokên ku di vê beşê de bi gelemperî tên bikaranîn binivîsîn:

“Diçûn diçûn, sê payîz û du havînan diçûn, carinan peya û carinan jî siwar diçûn, carinan xwasî û carinan jî bi sol heta ber deryayê diçûn.”

“Çol û çolistan, berîw û beristan, havîn çû ma zivistan, hêna serê wan kete xax û baxê giran” (Akyol, 2002: 23). “Pir geriya hindik geriya, roj li pey rojan hefte li pey heftan çûn, meh li pey mehan bihurîn û çûn, çûn û hey çûn” (Kaplan, 2018: 37). Indî pir çûn hindik çûn, here ku tu naçî. (Gelerî: berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê).

Weke ku di zûgotinokên jor de jî dixuye di zûgotinokan de bi xwe de jî liv û tevgerê heye; meriv ji van zûgotinokan jî fêhmî dikin ku hîn bûyer didomin hîn her tişt nava livbazîyekê de ye.

3.2.3. Çareserî

Di vê beşê de ew pirsgirêkên ku derketibûn hemû bi awayekî çareser dibin. Ew girêkûrikên ku bi bûyeran li dora leheng hatibûn girêdanê di yek bi yek vedibin, her tişt hêdî hêdî zelal dibe. Piştî van çareserîyan leheng vedigere cih û warên xwe, ji bo wî û derdora wî rojên bextewariyê dest pê dikin. Em vê çareserî û bextewariyê di zûgotinokên ku di dawîya çîrokên de tên bikaranîn jî dibînin. Di zûgotinokên vê beşê de daxwaz û xwesteka jiyaneke xweştir û aramtir heye. Bi vî awayî dilê guhdaran tê xweşkirin û çîrok bi awayekê mûsikîl bi kaffîye tê bi dawîkirin. Em li jêr ji vana çend heban weke mînak rêz bikin:

Çîroka me li şevbihêrk û li desta bila bimîne rengê jiyana erdnîgariya Avesta çîroka me li mala, bila ji xwe re bibîne hevala bigere li dinê, kesî nehêle bi tenê, bila bibe sebra dil û evînê (Zinar, 2012: 12-56). Şahî kete nava melmeketê wana. Xwedê te'ala miradê wan li wê derê bi hev kir, ê me jî li vê derê bi îmanê bike. Çîroka min çû diyara rehme li dê û bavê hazir û guhdara. Mesela min li diyara rehme li dê û bavê

guhbara. Dibê ew bi miradê xwe şa dibin, ê din jî guhdarê me jî bi miradê xwe şa bin (Gelerî: Berhevkariyên ji herêma Diyarbekirê).

3.3. Hin Lehengên Hevpar di Çîrokên Kurdan de

Hemû qewimîn û bûyerên ku di çîrokan de pêk tên bi kurtasî hemû avahiya çîrokê li ser piştta lehengê çîrokê saz dibe. Herwiha şîretên ku tên dayîn bi alîkariya liv û tevgerên leheng tên dayîn. Lehengên çîrokên her neteweyekê li gor çand û pêdiviya wê civakê teşe digirin û li gor wê pêdiviyê bi rola xwe radibin.

Di hemû çîrokan de taybetmendiya her lehengekî li gor xwe ye û her yek e. Çîrok hema hema li ser hemû mijarên cîhanê hatine vegotin, li beramberî jîrtî û wêrekiyê, konetî û tiralîyê, fambarî û zanîne û hwd, leheng hatine afirandin û hilibjartin. Ji van lehengan her yek bir rol û rista xwe ya di nava civakê de radibe û wê pêk tîne. Taybetmendiya her civakê ji hevdu cuda bin jî ev mijarên navborî yên hemû mirovahiyê ne, hevpar in. Ji ber wê çendê rol û rista gelek lehengan di hemû çîrokan de bi gelemperî wek hev in û naguherin.

Di çîrokan de kesayetên jiyana me ya rasteqîn ên wek key, keybanû, mîr, gurî; yên jiyana razber ên weke cin, perî, dêw, hût, hijdiya, teyrê Enqer û ji lawiran jî gur, rovî, şêr, ker, beq, mişk, kevok û hwd dibin lehengên sereke yên çîrokan. Em ê di vê beşê de hin lehengên bi gelemperî pir hindik di hemû çîrokan de derbas dibin ji wan çend heban li jêr rêz bikin.

Keçelok: Di çîrokên kurdan de car caran bi navê keçelok, carinan jî li gorî herêman bi navê gurî tê binavkirin. Hin caran lehengekî jîr û jêhatî ye ji bo ku xwe di nava civakê de veşêre û der û cîran û xizmên xwe biceribîne postekî, çermekî dikişîne serê xwe. Di vê formê de dema digihîje mexsed û mirazê xwe; yan raza wî eşkere dibe ji rewşa keçelokbûnê derdikeve û vediguhere rewşa xwe ya berê. Di van cure çîrokan de gelek caran keçelok kur; an qîza axa û padîşahekî ye; an keçelok jixwe lehengekî pir jîr û jêhatî ye; yan jî ji ber ku gelek bûyer û bobelat di serî wî re derbas bûne bi awayî pirsgirêkan ji hev dide alî, wan çareser dike.

Di hinek çîrokan de jî birastî keçelok e. Di van cure çîrokan de ji alî şekil û şemalê xwe ve jî ne wekî lehengê din e, ne yekî qeşeng e. Tam dijberî wê yekî kirêt û

belengaz e. Yekî ewqas belengaz e ku meriv nikarin nan ji destî wî bigirin. Lê belê di van çîrokan de xwedî raz, zanîn, fam û feresat e. Mesele û bûyerên ku ji alî tu kesî ve neyên çareserkin ji alî keçelok ve tên çareserkin.

Padîşah: Di gelek çîrokan de, ne lehengekî sereke be jî lê lehengekî diyarker e. Her tim dewletê temsîl dike. Gelek lehengên esasî yên weke Mîrza Miheme bi rê dike, dişîne rêyên dûr. Ji ber ku dewletê temsîl dikin gelek caran xedar in. Bi gelemperî piştî vê birêkirinê gelek tiştên serê lehangên; ango bi vî rengî çîrok dertê holê. Di çîroka Keçelokê de ku me di pêvekê de cih dayiyê, balkêş e di dewsa peyva padîşah de peyva dewletê tê bikaranîn. Car din ji berhevkarîyên me ku di çîroka Padîşah de dît lehengê sereke padîşah e. Padîşah li vir ji gelê xwe re pir baş e, gelê wî jê razî ye, yekê bi dad e.

Diz: Di gelek çîrokên kurdan de wek lehengekî sereke ye. Gelek caran di diziyê de du; yan sê heb in û bi hev re dikevin pêşbaziyê. Di hinek çîrokan de jî ne lehengê sereke ye; lê bi alîkariya wî; yan wan, mijar tamam dibe. Ji bo vê xebatê me sê heb çîrokên ku lehengên wan ên sereke rasterast diz in berhev kirin. Yek ji wan Dizê Helebê û Dizê Şamê ye û yên din jî du şaxên Miheme Dizê Rihayê ne; lê ji bo ku tez dirêj nebe me di vir de cih neda wan çîrokan. Dema meriv bala xwe didiyê çîrokên ku diz tê de hene, bi gelemperî çîrokên derasayî ne.

Damarî: Di çîrokê kurdan de damarî nîşaneyê zilm û zordariyê ye. Bi gelemperî zorakên xwe yên esasî di ser zarokên din re digirin û tehdeyîyeke zêde li yên din dikin. Di çîroka Çêleka Zerî de û di ya *Fatma Xanim Tenûr* de (Serhedî, 2016: 66) de em rastî damariyan tên ku çîroka *Fatma Xanim Tenûr* di nava klasîkên dinyayê de bi navê *Pisîka Ariyê* tê naskirin. Nîgarên ku di van herdu çîrokan de derbas dibin hema hema wek hev in. Di herdu çîrokan de jî heta tu bibêjî li zarokên damariyê zilmê dikin. Dema ku bextê zarokên sêwî vedibe jî hertim diwxazin zarokên xwe di dewsa wan kin. Lê damarî di dawiyê de bi ser nakeve, digel ku gelek zilm û zordariyê dikêşin jî, dawiyê de hertim zarokên din bi ser dikevin û damarî û zarokên xwe jî di halê xwe de dimînin. Di van çîrokan de zarokê ku sêwî dimîne bi gelemperî keç in.

Dêw: Di gelek çîrokên kurdan de derdikevin hemberî me. Xwedî hêzeke derasayî ne û gelek mezin in, carinan lêveke wan li erdê yek li ezmanan e. Di çîrokên

derasayî de astengiyên sereke yên li hember lehengan e. Ku mirov nêzî wan bin, bêhna mirovan teqez digirin; lê ligel hêza wan a derasayî di hemû çîrokan de wek ahmaq, debeng derdikevin hemberî me. Hinek ji wan jî heft serî ne. Bi derbekî derin, ku tu ji derbekî zêdetir lê bidî car din zindî dibin. Bi gelemperî keçên padîşah ên xweşik ji xwe re hildibijêrin û wan dîl digirin.

Şahmaran/Şahê Maran: Di zargotina kurdan de tebayekî mîtolojîk e. Li gelek deverên Kurdistanê çîrokên bi navê şahmaran hene û pir berbelav in. Serê wê serê keçikeke pir bedew û laşê wê laşê maran e; xwedî hiş û aqilekî pêşketî ye. Haya wê ji hemû raz û sirê dinyayê heye. Di dîwana maran da şah û padîşahê wan e. Li gelek herêmên Kurdistanê, li gelek malan li ciyê herî xweş, wenyê wê daliqandî ne. Di nava berhevokên me de jî çîroka bi navê Hesenê Kilindar de leheng û nîgareke sereke ye. Dema ku sira wê eşkere dibe; rastî xiyanetekî were bi carekê de ji holê wenda dibe. Nîgareke xwediyê soza xwe û dil bi rehm e. Çîroka Şahmaran a herî berbelavbûyî de ew jineke bedew e; ango mê ye; lê belê di hinek şaxên wê de jî em dibînin ku mêr e.

Kalê: Ew wek kalekî rûsipî ye ku gelek caran alîkariya lehengan dike. Dema ku hewce bike derdikeve hemberî lehengan hin şîretan lê dike û ji ber çavan wenda dibe; heta ku car din pêdivî pê çê bibe dernayê holê. Di esasê xwe de ev kar û tevger ên Xocê Xizir in. Lê ji ber ku di çîrokan de carinan wek Kalê Pîr tê binavkirin, me jî bi kurtasî cih dayê.

Pîrê: Ew jî wek Xocê Xizir dema ku hewce dike derdikeve holê û bi şîretên xwe alîkariya lehengan dike. Lê carinan pîra cazû jî xwe dike dilqê pîrê. Wê demê gelek zirar û ziyane dide derdora xwe. Pîra cazûkar di çîrokên kurdan de wek pira xirabiyê û tevliheviyê ye. Pîra cazû di dawiya çîrokan de, herî dawî tê cezakin.

Rovî: Em dikarin bêbêjin ku di çîrokên kurdan de lawirê herî zêde derbas dibe rovî ye. Rovî lawirekî kone û fêlbaz e. Di hemû çîrokên ku rovî tê de derbas dibin teqez der û dora xwe dixapîne. Di nava çîrokên ku me ji bo vê xebatê berhev kirine de jî, lêhengê sê heban rasterast rovî ye. Di hersêyan de jî rovî lehengê sereke ye û navê wî her bi konetiyên tê xwendin. Ji wan çîrokan me bi tenê weke mînak cih daye çîroka Heca Rêvî.

Gur, di çîrokan de wêrek e; lê pir zêde gavên xwe bi hiş û aqil navêje. Ji ber wê çendê hema di dawiya hemû çîrokan de zirarê dibîne. Ker, di çîrokan de debengiyê temsîl dike. Di gelek çîrokan de bê hiş e. Her wiha hirç jî her çiqas bi hêz be jî ew jî lawirekî bê hiş û aqil e, debeng e. Kurmorî nîşaneyê xîret û berxwedan û dilsoziyê ye. Di gelek çîrokan de dema leheng alîkariya wan dike; digire perê xwe dide lehengan û dema serê lehengan bikeve tengasiyê, perê wan li hev dide hema di wê kêliyê de tê alîkariya leheng.

Bêguman di çîrokên lawiran de gelek lehengên din hene û lehengên her çîrokê cuda cuda ne. Ji ber van egeran ji bo ku dirêj nebe me bi tenê ji vana çend mînak nivîsandin.

3.4. Nîgarên Sereke di Çîrokên Kurdan de

Stith Thompson nîgar (motîfê) di çîrokê de wek hêmayê herî biçûk ku di kevneşopiyê de hebûna xwe bi hêzeke hertîm didomîne bin av dike. Ji bo ku ev hêma bibe xwediyê vê hêzê divê xwediyê hin taymetmendiya kartêker û bi bandor be. Ji bo hêmanek bibe motîf divê dilnawaz û balkêş be. Herwiha divê taybetmendiya wê yê derasayî hebin û di kevneşopiyê de têra xwe bîn dúbarekirin. Thomson motîfan di bin sê beşan de kom dike û wisa pê de diçe; beşa yekem, Xweda, lawirên derasayî, cazûkar, dêw, perî û hin keseyatên çîrokan ên wek damariya xayîn û zarokê biçûk ên berdilkê civakê. Di beşa duyem de hin amûrên sêrdar ên ku bi hin tevgeran ve girêdayî ne, adetên seyr, baweriyên sosret ûhd. Beşa sêyem jî bûyerên balkêş, em dikarin wek motîf bi nav bikin (Ekici, 1998: 25-43).

Veselovsky, motîfê wek yekîneya herî piçûk ku nayê perçekirin, terîf kiriye. Bi nêrîna Veselovsky; mijareke (çîrokî) di heman demê de rêzomotîfek e. Yanî çîrok, bi rastî ji hatina cem hev a watedar a motîfan pêk tê. Li gorî nêrîna Veselovsky; di çîrokê de motîf di rêza sereke de ne. Mijar li dû wan e. Mijar, meseleya afirandin û anîna cem hev a motîfan e. Li gorî nêrîna Vlademir Propp; motîf ew pêşnûma ye ku bi remzan (sîmge) tijî ye (Atti, :2013: 14-17). Di dewsa motîfê di zimanê kurdî de beşên nîgar û nexş û nimûş hene. Ji van her du bêjeyan ji bo ku pratîktir be em ê bêjeya nîgarê bi kar bînin.

Hema di hemû xebroşkan de taybetmendî û peywirên kesayetên naguherin, her diyar in. Ku lehengek baş be heta dawiyê, di her şert û mercî de û di bûyerên dîtir de jî baş e. Weke mînak Xocê Xizir di hemû çîrok û zargotina kurdan de remz û nîşaneya qenciye ye. Teyrê Enqer jî her tim nîşaneya qencî û başiyê ye di dastana Rûstemê Zal de. Dema ku Zal tê dinê ji ber ku por û rû û rûçikên wî wek ên periya spî ne pêlewane bi nav û deng bavî wî Sam, kurê xwe Zal digire û diavêje ciyekê asê. Lê Teyrê Enqer tê wî digire û dibe. Heta ciwantiyê wî xwedî dike. Teyrê Enqer car din dema serê Mîrza Mihemed dikeve talî û tengiyê, tê hawara wî (Firdevsi, 2013:152-154))Her wiha teyr di baweriya kurdên me yê Êzdî de jî nîşaneya qencî û başiyê ye. Pîra hût di hemû xebroşkên me de remz û nîşaneya xirabiyê ye; ji bo xirabiyê hema çî ji destê wê were teksîr nake, yekê jî nake dudo. Her wiha pîrebok û dêw jî her tim nîşaneya xirabiyê ne. Di vê beşê de em ê bi kurtasî qala hin nîgarên sereke yê ku di çîrokên kurdan de derdikevin pêş bikin.

3.4.1. Xocê Xizir

Di zargotina kurdan de dema tengasiyek çê dibe, serê lehengan dikeve şeq û deqên giran, tê alakariya wan, ji wan re rêberiyê dike. Xocê Xizir bi nav û nûçikên cuda di hemû çîrokên derasayî de derdikeve holê. Carinan di çîrokan de weke kalekî pîr, baba dewrêş; an weke kalekî rûspî derdikeve hemberî me û rê û dirban nîşanî lehengan dide, alîkariya wan dike û ji ber çavan wenda dibe. Xocê Xizir bi gelemperî di çîrokên derasayî de derdikeve holê. Lê carinan di çîrokên asayî de jî derdikeve holê û çarenûsa leheng diyar dike.

Xocê Xizir di dastana Memê Alan de hem beriya ji dayikbûna Mem, di navlêkirina wî de, hem jî di rê de derdikeve pêşiya Mem. Her wiha di rêwîtiya wî de, tiştê ku dê li Cizîrê derkevin hemberî wî û çareseriya wan jî jê re vedibêje û ji ber çavan wenda dibe. Bi ragihandina Propp (1998: 44) di zargotina rûsan de jî navê Xocê Xizir dibe *Baba Yaga* dema astengî derdikeve holê tê hawar û gaziya lehengan.

3.4.2. Pîra Hût

Di hemû çîrokan de kesayetek merivxwir e. Dema meriv nêzî wê bin hilma merivan digire û dibêje: “Him dikim gum dikim / bîna meriyê xerîb hildikim” (Gelêrî).

Her wiha di çîrokan kurdan de dêw jî bîna merivan digire. Bi gelemperî qîzên pîra hût sê; yan heft heb in. Lê dema ku leheng ji bo kuştina wê dihere, tiştê balkêş ew e ku di kîjan çîrokê de dibe bila bibe, her tim alîkariya lehengan dikin li hember diya xwe. Qîzê pîra hût xweşik in. Ev peyam di çîrokan de gelekî balkêş e.

3.4.3. Ziya / Hijdiya

Gelek caran di çîrokên derasayî yên weke Mîrza Miheme de nîgareke astengdar e. Di gelek şaxan de pêşiya avê digire û heftê keçikekê dixwe. Piştî ku Ziya tê kuştin pêşiya avê vedibe. Em heman tiştî di mîtolojiya Someriyana de jî dibînin; ku di wir de navê ziya *qur* e. Em dibînin ku ev nîgar ji Someriyana heta niha bi guherînên pir hindik di çîrokên kurdan de bi rola xwe ya berê radibe û jiyana xwe berdewam dike.

Di mîtolojiya Someriyana de herçend di şêkil û şemaleke nediyar de be jî; bi navê *qur* di sê mîtên cuda de derbas dibe û dema *qur* tê kuştin dinya li ser avê dimîne û çandinî cotkarî betal dibe. Di destana Gilgamêş de jî *qur* Xwedewenda bi navê Ereşkagi direvîne dibe welatê miriyan; ango dojhê. Li ser vê yekê Xwedayê avê Enkî erîşê *qur* dike di nava wan de şerekî dijwar derdikeve û Enkî *qur* dikuje. Piştî wê li tu welatî çandinî nabe, bi tevahî betal dibe. Di mîtolojiya Someriyana de *qur* nîgareke xirab e dema ku tê kuştin, av naçe ser çemê Dijleyê; xelaya pir dijwar radibe. Di kîtabeyên Someriyana de piştî ku kurê Enlîl Nînûrta *qur* dikuje wiha derbas dibe:

“Mar car din anîn ba hev

Yên ku ji qur belav bibûn

Berhevkin û avêtin Dijleyê

Dûrê av di ser ra çû û çû ser erdan

Erd bi zeviyan mişt bûn

Baxçeyê xurma û rezî tiriyan pir mêwe dan

Embar bi zad û fêkiyan mişt bûn” (Kramer, 2014:211).

Her wekî ku di ristên jor da jî dixûye kuştina Ziya wek destpêka xelayê ye; hebûna wan jî weke bîn û berketê tê binavkirin. Di nava gel de em hîn jî rastî vê baweriyê tên. Wisa xuyaye ku Ziya di Someriyana de jî sembola bîn û bereket û çandiniyê ye bûye.

Samuel Noah Kramer wisa didomîne; pir eşkere ye ku kuştina nîgara hijdûyayan bi mîtolojiya Mezopotamyayê re ne bi sînorkirî ye. Hema di her serdemê de û di nava her gelî de em rastî çîrokên kuştina Ziyayan tên. Bi gelemperî jî ev çîrok di nava Yewnanan de pir berbelav bûne. Herçend di nava van lehengan de Herakles û Perseûs bi kuştina hijdûya bi nav û deng bin jî; hema em bibêjin lehengê Yewnana yên ku Ziya nekuştibin tune ne, bi geşbûna xaçperestiyê jî ev lehengî dibe para ezîzan. Gelek caran nav û nûçikên lehenga û kitekita bûyerê biguhere jî ev nîgar di hemû gelan de her berdewam e. Vîlademîr Propp jî derheqê vê nîgarê de wisa dibêje: hijdûyayê bi navê Koşçek Vixr bi carekê derdikeve holê û keybanûyê direvîne (Propp, 1998:42). Dema em bala xwe didinê hebûna hijdiya ji someriya bigire heta yewnanan ji rûsan bigire heta kurdan nîgarê kuştina hijdiya di hemû gelan de hebûye. Ew û şahmaran ji heman malbatan bin jî ji alî qencî û xirabiyê ve naşibin hevdu. Weke dualîzmekî dualî xuya dikin. Wek ronahiya Hurmuz û tarîtiya Ehrîmen dualî ne. Şahmaran hertim alîgirê qencyê; hijdiya jî alîgirê xirabiyê ye.

3.4.4. Teyrê Sîmûrg

Teyrekî mîtolojîk e, di zargotina kurdan de her dem alîgirê başiyê ye. Bi qasî ku di çîrokan de derbas dibe balindeyekî gelekî gir e û jîr û jêhati ye. Bûyer û bobelatan teva ji mêj ve dizane. Meriv dikarin bibêjin ku feylesofê teyran e, wek şahmaranê şahê maran e.

Di çîrokên Mala Zalê de gelek caran dertê holê. Dema ku zal ji dayika xwe dibe ji ber girsbûn rêng û rûyê wî Zal dibin diavêjin serê çiyayeke pir bilind wê demê Teyrê Sîmûrg /Enqer, Zal digre dibe hêlîna xwe û wî xwedî dike. Di çîrokên Mîrza Mihemed de jî Mîrza Mihemed ji dinya tarî digihîne dinya ronî. Her tim qasîdê qencî û başiyê ye. Her wiha di çîroka Bedîhê Zeman de ya ku di arşîva me de ye jî teyr derdikeve û peyaman ji bavê Bedîhê Zeman Hemze re tîne.

3.4.5. Hesp

Di çîrokên kurdan de hesp jî nîgareke mîtolojîk e. Gelek caran ji xeybê tê; bi taybetî ji bo lehengan tê şandin rêyên ku bi mehan ber xwe bide, ev hesp dikarin di demên pir kin de kuta bikin. Bi gelemperî xwedî hişekî xurt û jîr û jêhatî ne. Dema ku serê leheng dikeve tengasiyan bi her awayî alîkariya lehengan dikin.

Di zargotina kurdan de hesp nîgarêk aliyê alîkarî û qencyê ye, fama ye. Her wiha gelek taybetmendiyê derasayî di xwe de dihewîne. Di dastana Memê Alan de kurê bahrê, di Siyabendê Silîfî de Deybilqiran, di ya Ristemê Zal de Rexşê belek, di ya Derwêşê Evdî de Hidman e. Hemû jî heta kêliya dawî parazvanê siwarê xwe ne. Di hemû çîrokên ku hesp tê de ne yan di dastanên kurdan de, bi hatina hesp re leheng jî derdikeve ser rûyê erdê, edî şênber dibe û dikeve şer û cengên giran.

3.4.6. Perî

Di gelek çîrokan de keçên padîşahan e, di dirûvê kevokên spî de li ser avekî derdikevin hemberî me. Dema ku tu zevt bikî sehra wan xirab dibe û dibin keçikên pir bedew û xweşik. Di çîroka serxweş û Bengî ya ku me dawiya tezê de cih dayiyê de û di dastana Memê Alan de jî eynî bi vî rengî meriv wan li ser avakî dibînin. Di çîroka Serxweş û Bengî de ew her sê kevokê ku salê carekê xwe li ser avê dişon perî ne. Di çîrokê de di dirûvê sê kevokan de derdikevin hemberî Bengî. Dema dikevin avê Bengî şilhikê ya biçûk e ku navê wê Zîn e, digire edî perî bê şilhik nikare bi tu derekê re here û piştî pê re dizewice.

Perî di çîrokên kurdan de hertim alîgirê qencyê ne û dilbirehm in, hay û baya wan ji mêj ve ji her tiştî heye. Di nava berhevkariyê me de jî çîrokek bi navê Qîza Şahê Periya heye û her wiha di çîroka Serxweş û Bengî de jî perî nîgareke diyarker e.

3.4.7. Mefhûr

Di hinek çîrokên kurdan de dema leheng pêdiviya wî/wê pê çê dibe, leheng li ser siwar dibe û bi hewa dikeve, cihê ku dê biçe ciqas dûr be jî, heta meriv çavê xwe bigire û veke bi carekê de leheng digihîne menzîla wî. Meriv di çîrokên din ên cîhanê de jî bi rengên cûda be jî rastî vê nîgarê tê.

3.4.8. Lambe

Ev nîgar jî weke mefhûrê bi sehr e. Dema ku pêdivî pê çê dibe, leheng destê xwe lê digêrîne, tê dide, mîrê cinan; an perî derdikevin û ji leheng re dibêjin: “biferme tu dibêjê em dinyayê xirab bikin; an ji nû ve ava bikin.” Heta ku lambe di destê wî de be, leheng çî bixwaze bi carekê de pêk tê. Nîgara lambeyê jî weke kum, gustîlk û mefhûrê ye, bikeve destê kê hêz jî dikeve destê wî kesî.

3.4.9. Sindoq

Bi gelemperî zarok; an merivan dikin nava wê û bi ro da, avê de berdidin. Di du çîrokan de ku me berhev kirine; di çîroka Qîza Şahê Periyên de, pîra cazûkar zarokê bi navê Temelî Zêrîn û Temelî Zîvîn dikin sindoqê û bi ro da berdidin. Her wiha di çîroka Bedîhê Zeman ya ku di arşîva me de jî em rastî vê nîgarê tên. Di hinek çîrokan de jî sindoq bi sehr e, cin an perî xwe tê de vedişêrin.

3.4.10. Kum/ Kulik

Ev nîgar jî bi gelemperî lehengan li ber çavên mirovan wenda dikin, leheng çî bike jî bi tu awayî liv û tevgerên wî ji alî mirovên din ve xuya nabin û kes nabîne. Bi saya vê nîgarê serê leheng ji şeq û deqên giran rizgar dibe; yan bi kumê xwe alîkariya mirovan dike. Kesên baş xelat dike yên din jî celat dike.

3.4.11. Fêkîyên Zayendguher

Dema ku meriv sêvê dixwe dibe ker an; car din dixwe dibe mirov. Ev nîgar di çîrokan Zarokên Ser bi Zêr de derbas dibe (Öncü, 2014: 22-23). Di hinek çîrokan de jî dema zarok çê nabe Xoce Xizir tê sêvê dide jinikê û dibêje heta ez nehatim, hûn navekî lê nekin. Bi xwarina wê sêvê zarok çê dibin û Xizir jî tê nav lê datîne û ji ber çavan wenda dibe.

3.4.12. Dilqguherandin

Bi gelemperî jin ji bo ku nasnameya xwe veşêrin dilqguherîne pêk tînin; lê carinan mêr jî dema mecbûr dimînin dilqê xwe diguherînin. Ev guherîn gelek caran bi alîkariya çerm û postên pezekî pêk tê, carinan jî leheng xwe dike dilqê derwêşan û di

nava gel de digerin ji bo ku rastiya civakê fêr bikin û kêmasiyan beralî bikin. Di çîrokên ku me berhev kirine de jî di Çîroka bi navê Eysê Qotê de wisa derbas dibe: “Îja paşa wezîrê xwe ra dibê wezîr, wezîr dibê ha go ka rabe em ê xwe tevdîr bikin cilê babadewrêşa li xwe kin em ê li nava bajarê xwe bigerin. Çika kî tedê çî dike, kî di eziyetê de ye, kî di xweşiyê de ye, kî di rehetiyê de ye, em fam bikin.” Her wiha di çîroka ku me berhev kiriye lê me li vir cî nedayiyê de pîra cazû çoyê xwe li kerê dixê kerê dike xortekî pir qeşeng û çeleng.

3.4.13. Cezakirin

Bi gelemperî dibê hespekî tî dikin û avê dûrê wê digirin; yekî jî birçî dikin û em dûrî wî datînin û şeqa wê/wî pê ve girêdidin û hespan berdidin bi vî awayî şeqên wan ji hev çîrçîrî dikin. Di çîroka ku me berhev kiriye de ev cezakirin wisa derbas dibe: “Tîne qatirkî heft roya tî dike qatirkî jî heft roya birçî dike. Lingekî pîrê davê qatira tî lingekî jî davê qatira birçî, ava qatirê datîne hêla dinê ê birçî jî datîne hêla dinê. Îja kaş dike dike şeqa pîrê ji hev çîrçîrî dike. Pîrê geber dibe dihere.” (Berhevkarîyên ji herêma Diyarbekirê)

3.4.14. Îşlik û Desmala bi Xwîn

Bi gelemperî ji bo pêkhatin û pesendkirina karekî tê bikaranîn. Di şaxeke Mîrza Mihemed de dema Mîrza Miheme Ziyayê devê ava bajêr girtiye dikuje, keçik ji bo ku were nasîn destê xwe yê bi xwîn li îşlikê wî dide. Di çîroka damariyê û xwişkê de, li ser devavêtina damariyê dema biryara kuştina xwişkê tê girtin, destê birayê wê naçêyê ku wê bikuje heywenekî dikuje û xwîna wê li desmala wê dixê û diçe malê. Ev herdu çîrok jî di nava arşîva me de hene; ya pêşîn di pêveka tezê de jî heye.

3.4.15. Hejmar

Dema meriv, li cîhanê bi gelemperî dîn û bala xwe didin nîgarên hejmaran bingeha xwe ji mîtolojiya wê netewê digirin. Weke mînak li gor baweriya kurdan dinya di heft rojan de durist bûye. Tê bawerkirin dinya ji heft tebeqeyan pêk hatiye. Hem di baweriya Êzdiyan de hem jî di baweriya Îslamiyê de heft ferîşte hene û her yek ji wan karên cuda tî naskirin.

Di zargotina kurdan de jî bi gelemperî hejmarên weke 1, 3, 7, 40 derdikevin pêş. Dema meriv bala xwe didin şaxên çîroka Mîrza Mihemed hejmara 3'an gelek caran tê bikaranîn. Tevî Mîrza Mihemed sê kurê padîşah hene. Kalê pîr hersê xwişk dîl girtine. Dawiya dawî hersê kur bi hersê qîzan re dizewicin. Dema ji aliyê Teyrê Sîmûrg ve ber bi dinya ronî tîn heft roj û heft şevan tîn. Di şaxek din de ji bo zewaca Mîrza Miheme 40 roj û 40 şevan li hêviya Mîrza Mihemed dimînin. Her wiha ev hejmar di dastan û baweriyê me de jî her hene. Di dastana Memê Alan de wek hejmara sê, heft, sê sed û şest û şeş, çil û çar gelek caran dubare dibin. Di dastana Memê Alan de dubarekirina hin hejmaran bi vî rengî ne:

Bajarê Mixribyan li ser heft çiyayî e, li ser sêsed û şêst şeş qapiyan e. Daîra min a belek li ser heft tabaqan e. Piştî mirina Mem, Zîn jî heft roj bi şûn de dimire. Hîmê qonaxê li ser çil û çar lingan e. Em di gelek ciyên dastanê de rastî hejmara sisêyan jî tîn. Tevî bavê Mem her sê bira, her sê xwişkên perî, Tavbano, Hîvbano, Stêrbano. Her sê birayên wêrek Hesên, Çeko û Qeretajdîn (Lescot, 2013: 32).

3.4.16. Xewn

Bi gelemperî di zargotina Kurdan de, bi taybetî jî xewn agahdariyeke peş a rasteqîn e. Dema ku yek xewneke nebaş bibîne ji vegotina xewna xwe kesekê nebîne jî; diçe serê avekê disekine xewna xwe ji avê re vedibêje. Yan jî tesedîqekî derdixe, dide der û cîranan û ew tesedîq dikeve ber wan nebaşiyayî. Bi vî awayî tê bawerkirin ku qewimînên nebaş ên ku di xewnê de hatine ditin bi van tesedîqan beralî dibin. Di çîrokan de beriya ku bûyer pêk were biqewime leheng xewnekê dibîne; lê ev xewn xewnên ji rêzê nîn in. Leheng xewnê bi çî awayî bibîne, hema têvî kitekitê wê ew xewn pêk tê. Car caran jî di dewsa nîgara xewnê de pîr, kal; an Xocê Xizir derdikeve pêşberî leheng û agahiyên ku dê di demên pêş de biqewimin dide leheng û leheng jî li gor wê tevdiqere. Gelek caran leheng xewnekê dibîne dikeve pêy wê xewna xwe. Di rastiya çîrokê de ew xewn çarenûsa leheng jî diyar dike.

3.4.17. Yek Zarokî

Di gel ku di nava kurdan de kesên ku zarokên wan zêde hebin bi nirx in û ew di nava civakê de biqedr û qîmet in jî, dema em bi giştî li çîrokên gelêrî û dastanan

dinêrin em dibînin ku lehengên wan bi zor û zahmetiyan tên jiyanê û berdilkên dê û bavê xwe ne û bi pîranî zarokên bi tenê ne. Dema em li Dastana Memê Alan jî dinêrin ew berdilkê her sê kokimê birayan e û bi rêberiya Xocê Xizir hatiye dinê.

Di şaxên çîrokên şahmaranê de jî ev nîgara yek kurekî heye. Lê piştî ku bi şahê maran re dibe nas dibe yekî şareza. Herçend di çîrokan de kurê padîşah ê tekane be jî ew li pey çarenûsa xwe dere; piştî ku gelek bûyer û bobelat tên serê leheng; lê dawiya dawî bi ser dikeve.

3.4.18. Rêwitiya Dûr, Çov û Solên Hesinî

Ev nîgar dema ku leheng ji bo peyvirekî; an cezakirinekî bi armanca cihekî dûr tê şandin, tê bikaranîn. Dema ku ew çov û solên hesinî li ku derê bihele edî leheng digihîje armanca xwe; yan cezayê wî/wê bi dawî dibe. Di nava berhevkarîyên me de di çîroka bi navê Mîr Miheme de wisa derbas dibe:

“Ejderha dibêje; ez ê ji te re cotek solê hesinî û çovê hesinî bînim û ez ê bidim te, tu derkeve here pezê te aîdî min. Ejderha cotek solê hesinî û çovê hesinî jî didiyê û dibêje de here, çi çax tu çûyî û te mêze kir ev solê hesinî û çovê hesinî di dest û lingê te de heliya tu zanibe ku mala paşa li wan dera ye, tu here ew qîzik li wan dera ye.”

Her weke ku di motifên jor de yên me qala wan kirin de jî dixwiyî, ev ne bi tenê di çîrokeke an de derbas dibin; ev pir hindik bi heman rengî di çîrokên cur be cur de wek nîgarên hevpar in. Bêguman ji xeynî van nîgaran jî di çîrokê kurdan de hin nîgarên din jî hene ku ji ber ku mijar dirêj nebe me li vir qala wan nekirin.

3.5. Çîrokbêj

Yên ku çîroka vedibêjin re çîrokbêj tê gotin. Bêjeyeke hevedudanî ye ku ji bêjeya “çîrok û gotinê” pêk tê. Bêjeya gotinê di dema niha de weke *bêj* têşe digire. Bêjeyên dasatanbêj, dengbêj û zarbêj jî bi heman rengî bi alîkariya bêjêya gotinê hatine dariştin. Di nava cûreyê zargotina kurdan de a herî berbelav bêguman çîrok e. Di şevên zivistanê yên dirêj de di şevbuhêrkan de amûra sereke çîrok bûye. Di nava kurdan bi gelemperî dengbêj wek vebêjên çîrokan e jî. Herçend giraniya dengbêjan li ser

stranbêjîyê be jî di wan şevên dirêj de encax çîrok dikarîbû wan şevên zivistanê yên dirêj bibihurandina.

Dema me li qadê çîrok berhev dikirin me dît ku, ligel lorîkan cûreya herî zê de ji alî dayikan ve tê vegotin çîrok in. Nifşên nû yê ku hatiye bişaftin ne di nav de di esasê xwe de her dayikek çîrokbêjek e. Ji ber wê çendê gelek dayîk hene ku weke çîrokbêj nayên zanîn, lê belê di asta çîrokbêjan de ne; yan dayîkê çîrok û çîrokbêjan e.

Li gor Lînda Degh bîra mirovan ji bo vegotina çîrokan di van xalan de girîng e: Divê çîrokbêj bikaribe di bîra xwe de gelek xebroşkan biparêze. Tiştê ku hilkirine⁴ divê bikaribe di demêke berfireh de pêşkeş bike. Dema ku meriv ji vî alî de lê dinêrin serkeftina çîrokbêj a herî mezin girêdana wî ya bi teksta resen re ye, parastin û neguherandina çîrokê ya di bîra xwe de ye (Degh, 2005: 421-429).

Çîrokbêjên esasî dikare di bîra xwe de bi sedan çîroka bihemilîne, ev çîrokbêj çîrokbêjê esasî ne. Di qada berhevkarîyê de çîrokên ku me ji devê Qûtbetînî Farqînî girtin her yek ji wan saetekî; yan du saetan berdewam dikirin. Çîrokbêj Qûtbetînî Farqînî heta 30 çîrokî jî ji me re gotine; ku di nav wan de çîrokên lawiran jî tune ne. Farqînî çîrokên wisa kin û kurt çîrok nedihesibandin û ji me re qala wan nedikir. Ji xeynî van çîrokan çîrokbêj bi dehan kilamên gelerî û dastanên kurdan; ku bi saetan berdewam dikirin jî dizanîbûn. Biqasî ku çîrokbêj bixwe jî digot di dîwana mîr û began; an şevbuhêrkan de bi rojan dengbêjî kiriye û çîrok vegotine. Farqînî gelek çîrokên xwe di dîwanan de bi tenê carekê guhdar kirine û bi vî awayî hilkirine. Ev tişt jî ji bo bîra mirovekî xaleke gelekî balkêş e. Farqînî dastana Huseynî Kurdî⁵ ku li ser navê berhevkar Hîlmî Akyol (2018) ve hatiye weşandin; ku ev dastan bi serê xwe deh seatan berdewam dike.

Çîrokbêjek ne pêkan e ku çîrokeke dirêj a di zarokatiya xwe de bihîstibe, weke ku ji nivîsê bixwîne dubare bike. Her wiha car din Istvan Lazerê ku li ser veguherîna çîrokan xebitiye jî wiha berdewam dike:

⁴ Hilkirin: Ji yekî din hildan, ji ber kirin.

⁵ Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Akyol, H. (2018). *Huseynê Kurdî*. Ankara :Weş, J-J.

Ne pêkan e ku du mirov hemû beşên çîrokê bi heman awayî vebêjin; heta mirovek jî nikare heman çîrokê bi heman gotin û kitekitan vebêje. Jenos Areney vê guherîne weke kêmbûna hiş/mêjî yan bîrê nahesibîne; wê weke pêkanîn û hunereke bi zanetî dihesibîne û wisa dihizire. Li gor gelek lêkolînên din ku li ser vê mijarê hatine kirin jî ev ne qusûrek e (Degh, 2005: 421-429).

Dema me qeydên çîrokbêjan digirtin û me ji wan dipirsî gelo ew ê çîrok çiqasî ber xwe bide? Wan jî ji me re digot, li gor civatê diguhere. Digotin eger civat xurttir be ez bêtir lê germ dibim, lê vedibim. Ev jî dide xuyakirin heman çîrokbêj, heman çîrokê li gor atmosferê, carina seatekê carina jî ji seatêkê zêdedir; an kêmtir dikare vebêje. Eger çîrokbêj derfetê nebîne û çîrokên ku dizane ji civatê re venebêje di buhurîna demê de wan çîrokên xwe ji bîr dike. Her wiha bandora zêdebûna temen jî li ser vê mijarê xaleke neyîniye. Ji ber van herdu egeran, di qada berhevkarîyê de gelek kesan ji me re gotiye; “weleh me berê pir dizanîbû û me digot, lê niha ev 40 sal e ku me venegotine û êdî emrê me jî çûye û me ji bîr kirine.”

F. Ranke lêkolînekê li ser heman çîrokê û di demê cihê cihê dike û di encama van lêkolînan de wiha dibêje: Veguherîna herî zêde di ciyê girîng a çîrokan de pêk tê û di vê veguherîne de helwest û vegotina kesane ya çîrokbêj girîng e (Degh, 2005: 421-429). Di vê veguherîna heman çîrokê de dem, diyardeyeke sereke ye. Dem çiqas di navbera herdu tomarkirinan de derbas bibe guherîn jî ewqas zêde dibe. Her wiha derûnî û rewşa çîrokbêj a giştî jî hertim ne wek hev e, hertim di heman modê de çîrokan venabêje.

Lînda Degh di gotara xwe ya bi navê *Vebêjên Çîrokan* de bi hin daneyên zanistî wiha balê dikişîne ser bîra çîrokbêjan: Bîra çîrokbêjên bêqusûr weke rêbaz divê têra xwe hebe. Li gor çavdêriyên zanistî hin çîrokbêj ji 4 an 6 çîrokan zêdetir nizanin. Hinek ji wan jî dema ku hewce bike dikarin naveroka 20 çîrokan bi kurtî vebêjin. Lê çîrokbêjên rasteqîn herî kêr 40 an jî wî jî zêdetir çîrokan dizanin. Li gor lêkolînên ku heta niha hatine kirin li Transîlvanyayê O Nagys Mrs Györi 400; li girava Czech Jech's Flomena 500 çîrokan dizanin. Li gor agahiyên Kalmany temenê çîrokbêjan bi gelemperî di navbera salên 60 û 80î de diguhere. Pir kêr ev dadikeve binê 40î (Degh, 2005: 421-429). Bêguman di vî warî de hin îstîsna jî hene. Hin kesên ciwan jî ne kêrî extiyaran in.

Di qada berhevkarîyê de em rastî çîrokbêjê ku 400-500 heban dizane nehatine; lê yê 40 hebî dizanin hatine; ango em rastî çîrokbêjên esasî hatine. Li vir esas ji hejmarê girîngtîr ji bo nirxandina bîra çîrokbêj tiştê ku derdikeve holê kinbûn; an dirêjbûna çîrokê ye. Dibe ku çîrokek sê seatan ber xwe bide; lê belê 10 heb çîrokên kurt sê saet berxwe nedin. Ji bo ku mijar zelaltir bibe weke mînak divê em qala sê heb çîrokbêjên ku me qeydên wan girtine bikim. Wê demê em ê bîra hersê çîrokbêjan li ser 10 heb çîroka bihelsengînin.

Şaziye Bîngol a ku 70 salî ye me jê 10 heb çîrok girtin, çîrokên wê di zik hev de her yek 10 xulek bûn. Her wiha 10 heb çîrokên ku me ji Nejmedînê Tilxûmê girtin di zik hev de her yek 30 xulek bûn. 10 hebê ku ji Qutbedînê Farqînî jî girtine di zik hev de her çîrokek wî tam 1.30 saet diajo. Eger meriv ji alî demê ve çîrokê Şaziye Bîngol û Qûtbedînê Farqînî bi de ber hev, yek çîrokeke Farqînî bi qasî neh çîrokên Şaziye Bîngolê ye. Her wiha bi vê nirxandinê Şaziye Bîngol 10 heb çîrokan dizane, Farqînî jî 90 heb çîrokan dizane.

Nexwe heke dema ku ev dane werin dayîn her çîrokek di zik hev de çiqas demê diajo, divê ew jî were ragihandin. Ya na wê demê meriv nikare hêlsengandineka rasteqîn li ser van daneyan bike. Cardin Lînda Degh (Degh, 2005: 421-429) di heman gotara xwe de qala agahî û tespîten Leza Uffer dike. Leza Uffer çîrokbêjan li gor zanîna û mijûlbûna wan di nava xwe de wisa dabeş dike:

1. Yên ku çîrokan dizanin lê venabêjin; vebêjên pasîf. Kesên ku ji zaroktiya xwe de çîrok guhdarî kirine û tîna bîra wan. Lê dema ku bixwazin vedibêjin.

Di nava civaka kurdan de jî ev gelek in. Heta ku yekê nas ji van kesan re nebêjin û pê bawer nebin teqez venabêjin. Çîrokên ku dizanin pir zêde naxemilînin ji alî ziman û şewazê de pir serkeftî nîn in. Girîngiyê nadin vê zanîna xwe û tiştêkî pir ji rêzê dibînin.

2. Yên ku car caran vedibêjin: Çîrokan dizanin û xexta cî û dema guncav be vedibêjin. Çîrokbêj tiştê ku dibihîze nîşe digire; lê tiştêkî nû naafirîne. Tiştên ciwantiya xwe vedibêjin. Serpêhatî û pêkenokan dizanin.

Ev kes di nava civaka kurdan de wek kêsên cimhatî tên bi navkirin, kesên ku civatê digerin û bi çîrok û pekenokan dilê civatê xweş dikin. Lê divê berhevkar karibe van kesan der bike. Ji ber ku ev beş jî van zanînen xwe wek karekî rojane dizanin û pir zêde girîngî nadin van zanîne xwe û wek taybetmendiyeke xwe nabînin.

3. Vêbêjen Zana: Ji alî civakê ve hatiye ferqkirin û afirînerên zana ne. Ji vegotina çîrokan pir hez dikin û bi bîra xwe serbilind in.

Di nav civaka kurdan de ev kes niha pir kêr bin jî hene. Çavkaniyên esasî jî ev kes in. Li gor agahiyên çîrokbêjan ev berê li her deverê li her gundekî hebûne. Divê dema berhevkar kesên wisa peyda kirin, qedir û qîmeta wan bizanibe heta ku bawerîya wan bi dest nexe divê dest bi berhevkarîyê neke. Dema dest pêkir jî hemû tiştan ji wan hilnede, wan tam nedoşe dev ji wan bernede.

3.6. Dengbêjî

Deng, dengê ji qiraka meriv dertê re; yan dema ku du tişt li hevdu dikevin di encama wê lihevketinê de enerjîya ku derdikeve holê re tê gotin. Peyva *bêj* jî rayeka lêkera *gotinê* ya dema niha ye. Mînak: Di dema niha de em dibêjin; *dibêjim*. Yê ku li ser bûyer û bobelatên civakî; yan hest û ramanên xwe bi awayê strankî miraz û mexseda dilê xwe vebibêje re dengbêj tê gotin. Ji karê ku *dengbêj* dike re jî dengbêjî tê gotin. Di nava gel de gotinek pêşyan heye ku di derbarê kevneşopiya denbêjiyê, de me agadar dike: “Ji roja ku deng hebûye dengbêjî hebûye.” Ango gel di wê baweriyê de ku pêvajo û rabirdûya dengbêjiyê bi axiftinê dest pê kiriye. Ayhan Meretowar jî (2017: 9) dide pey vê nêrîna gel û wisa dibêje; mêjûya edebiyata kurdî nola dîroka gelê kurd xwedî rabirdûyeke dûr û dirêj e.

Em dizanin ku Mezopotamya li erdnîgariya ku kurd lê dijîn; bûye jêderka dastana Gilgamêş, ku yekemîn dastana cîhanê ye. Li gor Somerolog Samuel Noan Kramer zêmara ewil B.M 1000-200 salî de li derdora Nipurê peyda bûye. Her wiha cardin li gor Kramer lorîka pêşîn jî li van deveran ji alî dayikekê ve hatiye vegotin (Kramer, 2014: 396-405).

M. Îzadî di gotareke xwe li ser Mûzîka Kurdî de de qala kevnbûna kevneşopiya kurdan dike û wiha dibêje: Dengbêj ji roja ku kurd bûne niştecihên Mezopotamyayê

hene. Îzadî destpêka vê kevneşopiyê digihîne dîroka B.M 247-227 heta dema Partan (Ekîncî, 2013: 17).

Dîrokzanê heyama kevnare Strabon di nivîsê xwe de destnîşan dike ku; niştecihên li bakur ên li derdora çiyayê Araratê dijîn Kardû ne. Strabon salix dide ku wî piraniya agahiyên derbarê Medan de ji kilam û destanên epîk ên dengbêjên wê demê wergirtine. Strabon û hin dîrokzanên din diyar dikin ku di welatên Medan de kevneşopiya dengbêjiyê gelek belavbûyîbû. Her wiha dîrokzanên Ermen Moses Von Khoren (Musayê Xoroneyî) P. Z di sedsala 5. de qala xewneke Astyagesê (Ajdehaq) keyayê Medan ên dawîn dike. Li ser vê xewnê şîroveya dengbêj û şewirmendê wî yê navdar Angreas jî radigihîne (Gultekin, 2013: 15). Weke ku di çavkaniyan de jî diyar dibe dîroka destpêka dengbêjiyê dûr û dirêj e.

Bêguman di dinyayê de stran û stranbêjê her gelekî li gor xwe hene û navên cur be cur li stran û stranbêjên wan hatine kirin. Di nava rûsan û welatê ku berê di nava sînorên Rûsyayê de bûn û her wiha li rojhilatê Ewrûpayê û li bakurê Ewrûpayê û li gelek deverên din ji kilaman re dibêjin *ballad* (Beğîk, 2018: 22 - 23).

Dengbêjî çavkaniya xwe ji rabirdûya rasteqîniya dîrokê digire. Bûyerên ku dibin mijara dengbêjiyê bi gelemperî bûyerên ku bi rastî qewimîne. Dengbêj an bixwe bûye şahidên van bûyeran yan jî ji dengbêjên mayîn bihîstiye. Hayrettîn Ekîncî (2013: 19-22) li vê mijarê me wisa agahdar dike; li derdora salên 1937'an li Hezoya girêdayê Elihê leşker diçin malan, malbateke bi nav û deng, Mala Eliyê Unis Nanê wan dixwin û destdirêjiya qîz û jinên wan dikin. Li ser vê bûyere şerekî dijwar di navbera hêzên dewletê û Mala Eliyê Unis de diqewime. Edirrahmanê Eliyê Unis û gelekê din derdikevin serê çiyayê Mereto. Her wiha kilama Bişarê Çeto, Koçero, serhildana Şex Seîd jî bingeha xwe ji bûyerên rasteqîn digirin.

Dema ku meriv qala dengbêja bike bivê nevé divê meriv qala şevbuhêrkan jî bike. Şevbuhêrik bêjeyeke hevedudaniye ji bêjeya şev û borandinê pêk tê. Ew jî tê wateya bi aweyekê xweş borandina şevê. Bi rojan gel li benda van rojên xweş û geş diman. Dema ku dengbêjekî gerok dihat civat bi carekê de kom dibû. Di van şevan dirêj de dengbêjan bi stran, çîrok, dastanan xwe şev dixemilandin, dibûn xeml û xêza van şevan. Ev şevbuhêrk gelek caran li dîwan û dîwanxaneyên beg û mîran dihatin

lidarxistin. Di pêşgotina pirtûka Hayretîn Ekîncî de Mehmet Öncü li ser şevbihêrkan nêrîna xwe wiha bi lêv dike:

Çima ku ev şevbuhêrk di dîwan û dîwanxaneyan de dihate pê di jiyana civakî de xwedî ciyekî bi rûmet bûn. Weke saziyêke bipergal bibûn li gor rêz û rêzîknameyên xwe dixebitîn. Rabûn û rûniştina van dîwanxaneyan li gor kevneşopiyekê pêk dihat. Li rex dengbêj û çîrokzanên ku ji aliyê mîr ve dihatin xwedîkirin, xebatkarên wan ên wekî qahwe çêker, aşvan û xizmetkar jî hebûn. Bi xwe li hêla jorîn rûdiniştin, mêvanên bi rûmet li aliyê rastê; dengbêj, çîrokzan û şêwirmendên mîr û began li aliyê çepê ciyê xwe digirtin. Bi vî awayî li aliyekê xwarin û vexwarin li aliyê din sihbet û stranên dengbêjan ew şevbuhêrkên kurdan dixemilandin (Ekîncî, 2013:13).

Di nav dengbêjan de yên ku xwendin û nivîsa wan hebin pir kêr in; hema bibêje qet tunene. Ji ber vê egerê em dikarin bibêjin ku li ser dengbêjiya kurdan bandora çandên din hebe jî pir kêr e. Ya balkêş ew e ku ev kesê ku qet xwendin û nivîsandinê nizanin çawa çêdibe ku van kilam û dastanên ku bi roj û şevan berdewam dikin; ji ber dikin û di bîra xwe de dihewînin. Weke ku dengbêjê nemir Karabetê Xaco jî gotiye: Dengbêjan hemû berhem û nixên gelê xwe di bîra xwe de dihewandin, ev jî hewceyê pesn û xelatdayîne ye. (Ekîncî, 2013: 12). Dengbêjiya kurdan çendî resen be ewçend jî miqam û gotinên stranên wan, ji bo zimanê din hatine wergerandin.

Mehmet Korkmaz di gotarên xwe de vê rewşê wisa bi lêv dike; muzîsyen *Celal Yaraci* ⁶jî dibêje ku: Kilamên ku em distrên tev ji Kurdî hatine wergerandin. Gelê me yê Rojhilat (Kurd) ji stranên Kurdî pir hez dikin; lê belê nikarin guhdarî bikin⁷; em jî ji stranên re gotinên Tirkî dinivîsîn û wan kêfxweş dikin. Yaraci hema dest bi mînaka dike û dibêje: strana *Sînemî* ya ku li ser navê min tê zanîn û xistine repertuara radyoyê bi Kurdî ye û ji bo keçikeke di ava Zapê de wenda bûye hatiye gotin. *Vur davulcu* (lêbixe daholvan) jî di reseniya xwe de bi Kurdî ye. (Bayrak,2002:39-48). Em dikarin bi sedan mînakên bi vî rengî li ser hev rêz bikin; lê ji ber ku mijara me ya sereke ne ev babet e ji bo têgihîştina mijarê niha ev bes in.

⁶ Mûzîkjenekê Tirk e, bi strîna stranên gelêrî tê nasîn.

⁷ Ji ber ku di wan salan de zimanê kurdî qedexa bûye; ji ber wê çendê jî Celal Yaraci dibêje nikarin guhdarî bike.

Dema meriv bi nêrîna dengbêjê nemir Xaco li meselê binêre wê demê meriv têdigihê ku dengbêj bi tenê ne yên ku stranan dibêjin; dengbêj ew kesê ku serwextê gelek cureyê zargotinê yên weke stranên gelerî, çîrok, dastan, gotinên pêşyan û biwêjan, zûgotinok û mamikan e. Ji ber wê çendê me hewcetî pê dît ku me cih da wan kesên ku hemû berhemên zargotinî di bîra xwe ya bêbinî de dihewînin û ji nifşekî radigihînin nifşekî din û dibin pira pêwendiyê ya di nava nifşan de.

Di pêşketin û bikaranîna zimên de bêguman cihê dengbêjiyê, cihekî girîng û sereke ye. Dengbêj sêrbazê peyv û gotinê ne. Peyv û gotin di destên wan de wek libê tizbiya Erzurimê ne bi ku de û çawa bixwazin bi wir de li ba dikin û dibin û tînin.

3.6.1. Dengbêjî û Çîrok

Dengbêj gelek berên zargotinî di şevbuhêrkan de radigihînin civakê. Yek ji wan cureyan jî çîrokên ku di şevên dirêj de bi navbeynkariya dengbêjan dihatin neqilkirin. Di berhevkarîyê de me dît ku kesên çîrokan vedibêjin eger dengbêj be asta bilêvkirin vegotina wan ji kesê din cudatir e. Kesên dengbêj gotina bêtir li hev tînin, bêtir xweşgotin in. Her wiha bîra dengbêjan jî ji xwe xurt e dema çîrokek li ber wan tê gotin zûtir hildikin. Li gor kesên din bêtir dikarin çîrokên dirêj di hişê xwe de bihemilînin.

Eger bala dengbêjan li ser be teqez her dengbêjek çend heb çîrokan dizanin û dikarin vebêjin. Lê belê di dema berhevkarîyê de bi qasî ku me fam kir; ku hinek ji wan berê xwe nadin cûreya çîrokê, stran û dastanan girîngtir dibînin. Ev nêrîn bi giştî di guhdêran de jî heye ez bawer im ev hinekî jî encama ferasetên berhevkarîyê jî dide der. Ji ber ku dema me daxwaza çîrokan ji wan dikir gelek ji wan şaş û metal diman û digotin û heta niha kesekî ji me çîrok û dastanên dirêj nexwestine. Bi tenê hema her kes ji me re dibêje bistrên, ji me re kilamekî xweş bibêjin.

Wisa xuyaye ku bi vî rengî girîngiya saziya dengbêjiyê baş nehatiye fêmkirin; ji ber ku dema ku em bi berfirehî li meselê binêrin em ê bibînin ku hemû berên zargotinî di tûrikê dengbêjan de hene, bes divê berhevkar bikaribe devê wî tûrikê veke. Wê demê ew ê bibînin ku çi yaqût û elmas, zêr û zîv di tûrikê wan de hene. Dengbêj çiqas bala wî li ser çîrokan tunebin jî car din teqez dikarin çend heb çîrokan ji we re bibêjin.

Lê belê nayê wê wateyê ku kesên ne dengbêj bin, nikarin çîrokan vebêjin. Di nava kesên ku me çîrok jê digirtin gelek ji wan jî ne dengbêj bûn. Ji ber ku di nava civakê de di hinek waran de dengbêj û çîrokbêj ji hev hatine cudakirin. Carinan dema ku tu dibêjî filankes, dibêjin ew çîrokbêj e yan çîrokbêjiya wî li pêş e û filan kes jî dengbêj e; ango bêtir deng li pêş e.

3.7. Ziman û Şêwaza Vegotinê di Çîrokên Kurdan de

Çîrok ji ber ku ji alî gel ve tîr afirandin û gotin; zimanê wan zimanekî gelekî zelal, rewan e û fêambar e. Çîrokbêj deng, lebat û rû û rûçikên xwe li gor xemgînî bextewariyê bi kar tîne; da ku bala guhdaran bikêşe ser xwe û wan jî noqî nava wê jiyana mîstîk û bi remz bike. Di hevoksaziyê de bêjeyê ku herikbariya vegotinê asteng bikin, bêjeyê ku ji alî deng ve vegotina wan zahmet be nayên bikaranîn û peyv bê hewcedarî nayên dubarekirin. Lînda Degh vê rewşê wisa şîrove dike: Di çîrokê de her tişt sade, resen û sivik e (Degh, L: 2005: 342-353).

Şerîf Oruç di gotara xwe ya bi navê Lêkolînerê ku ji Aliyê Jêwaz ve Taybetmendiya Çîrokên Ewrûpayê Lêdikole: Max Luthi, (Oruç, 2005: 421-429) bala lêkolîneran dikêşe ser şêwaza çîrokan. Lûthi ji alî şewazê ve çîrokên Ewrûpayê di bin pênc serenavan de dinirxîne. Herçend lêkolîner Lûtî bi tenê li ser çîrokên Ewrûpayê bin jî; dema ku meriv bi hûrnêrîneke giştî bala xwe didiyê, meriv dibîne ku ev tespîten wî tespîten giştî ne. Li gor baweriya me ev nirxandinên wî ji alî şewazê ve wek rêbaza Viladimir Propp ji bo hemû çîrokên cihanê derbasdar in. Em ê jî bi van hizr û ramanan di çarçoveya ku Max Lûtî xêz kiriye de li vê meseleyê binêrin û li çîrokê me bifesilînin. Lûtî di pênc serenavan de li ser vê meseleyê hûr dibe.

3.7.1. Yekparêzî

Di çîrokan de dinya rasteqîn û ya derasayî, derewîn di nava hevdu de ne. Rastî û derew her bi hev du re ye, ev tişt hemû li ciyekî diqewimin (Oruç, 2005: 421-429). Dema Mîrza Mihemed ji dinya rastîn diçe dinyayeke dîtir jî li wir bi Teyrê Sîmir re dikeve galegalan, hevalbendiya wan çêdibe û car din vedigere. Her wiha çîroka Serxweş û Bengî, ku di navê berhevkarîyên me de ye, Serxweş serwerê bajarê xwe ye bi qîza mîrê cinan Xezalê û qîza mîrê periyar Zînê re dizewice û wan digire dibe nava

qewmê xwe. Ji qewmê wî kesek şaş û metal namîne. Her wiha car din çîroka bi navê Qîza Şahê Periya, ku ew jî di nava berhevkarîyên me de ye de ye, jinek cotik zaroka tîne di her serşuştîne de gelek zêr jê diweşin û ji wan yê kur diçe bi qîza şahê periyar re dizewice car din ev wek tiştêkî ji rêzê tê hesabandin. Dema ku lehengên çîrokan bi dêw, hût, periyar re didin û distînin jî bi vî rengî ye.

Di çîrokan de ev teba û mirov weke jiyana rojane ligel hev in, mal û milkên wan di nava hevdu de ne; lê ev tişt nabe sedema xof û tirsê, kesek ji nişka ve venaciniqe; ango dinya rasteqîn û ya metafîzîk di nava hevdu de ne, yekparêzî heye. Hertîşt weke ku ne ji hev cuda, weke ku yek be tê xuyakirin.

3.7.2. Rûxalkî

Di çîrokan de, di cih, dem, rih û derûniyê de kûrbûnek û kurahiyek tune; her tişt di ser re diqewime. Keseyatên çîrokan wek ku ne xwediyê; rih û can, derdor û hestan bin; wek figuran tîne nîşandan û pêşkeşkirin. Navê malbat, xwişk û bira û xizmên leheng dema ku di honandina bûyerê de pêdivî pê çêdibe navê wan tê xwendin. Di çîrokan de şexsiyet û hestên kesan nayên nîşandan; bi tenê bi kiryar, şêl û tevgerê wan tîne pêşkeşkirin (Oruç,2005: 421-429).

Di çîrokan de dem ne guherbar e, carina di ser re sedsal jî derbas bibe em dibînin ku leheng her wek xwe ne, temenê wan qet naguherin; lê kesên ciwan û yextiyar hene. Ew jî her wek xwe ne; lê bi tenê peywira ciwantî û yextiyariyê tînin cî. Di çîroka Qîza Şahê Periyar de, ku di nava berhevkarîyên me de ye, dema ku jinik zarokên bi navê Temelîzêrîn û Temelîzîvîn tîne dinê, bi arastekirina herdu jinên din, bi salan bavê wan jina xwe li ba kûçikan girê dide. Heta ku zarokên wî mezin dibin û hîn tîne diya xwe ji wê rewşê xelas dikin.

Di çîrokan de şayesa xweşî, nexweşî û tengavbûnê baş nayê kirin hema di rû re tê nîşandan. Ku nexweşî an birînek hebe jî bi tenê navê wê tê gotin, bi kitekit nayê pêşkeşkirin. Weke mînak di çîroka Şengê û Pengê de dema gur karikan dadiqurtîne û dema ku bizin zikê gur diqelêşe qala tu êş û azarekê nayê kirin bi tenê bûyer diqewime û diqede. Dema hewce dike Mîrza Mihemed ji çîpa xwe goştê canê xwe jê dike û davêje devê Teyrê Sîmir, lê tu şayesandina wê êş û azara wê birînê nayê kirin.

Car din bi veguhastina Max Luti ji Buhler Bilz radihîne me, Bilz vê rewşê wiha şîrove dike: Di şexsiyetên çîrokan de mêjî û jîrîfî tune ye. Di nelihevkin û çareserkirina pîrsgirêkan de lehengên çîrokan hertim hewceyê alîkariyê ne. Lehengên çîrokan ne ji ber jêhatîbûna xwe; bi piştewaniya siûda xwe, xwe digihînin van alîkariyan (Oruç,2005: 421-429).

Ji bo vê alîkariyê carina, Xocê Xizir, perî, Teyrê Sîmir û carina jî şîretê kal û pîrekê, carina xwe digihînin hawar û gaziya lehengan. Herçend gelek caran lehengên çîrokan de ev rewş wîsa be jî, di hinek şaxên Mîrza Mihemed de em dibînin ku di gelek beşên çîrokê de ji bo ku çarenûsa xwe diyar bike bi vîna xwe der tê holê û di hinek waran de gelek astengiyan bi zanîn û jîrbûna xwe çareser dike. Sankî herwekî ku di demê de çiqas hatiye gotin kesayetê çîrokê bi rewş û tevgerên xwe bûye kesek ji jiyana me ya rojane. Lê li gel van tespîtan jî siûda Mîrza Miheme wek lehengên çîrokên din her bi wî re ye, car din gelek pîrsgirêkên wî bi alîkariya siûda wî tîr çareserkin. Bêguman ev tişt ji bo hemû şexsiyetên çîrokan derbasdar e.

Di çîroka Qîza Şahê Periyana de perî alîkariya Temelîzêrîn û Temelîzivîn dike. Her wiha di çîroka Serxweş û Bengî de Mîrê cinan alîkariya Serxweş dike û wî digihîne Qîza Şahê Periyana. Her cara ku serê serxweş dikeve şeq û deqên giran mîrê cina tê hawara wî û pîrsgirêkên wî çareser dike. Temelî Zêrîn û Temelî Zîvîn jî bi alîkariya nîgara sindoqê bi ro da berdide, bi avê de diçin jî car din siûda wan alîkariya wan dike û kal û pîrek wan digire û ji xwe re xwedî dikin. Her wiha piştî ku mezin dibin, vêga qîza şahê periya tê hawara wan. Bêguman em mînakên bi vî rengî dikarin li pey hev rêz bikin lê ji bo ku pîr dirêj nebe em ê li vir kuta bikin.

Di çîrokan de bûyer hemû nayên çareserkin. Bi tenê bûyerên ku li derdora leheng lê dijîn û rêyeke ku ew pê ve diçe tîr çareserkin; yê mayîn jî li wir dimînin. Çareserkin, an neçareserkirina wan jî nayê bilêvkin. Projektora erebeyê çawa bi tenê rêya ku tê de diçe, pêşiya xwe, ronî dike; di çîrokan de jî ciyê ku şopên leheng lê hebin û dê pê de biçê ji me ve xuya dikin; cî û bûyerên din haya me jê tune ye, ji me ve tarî ne.

3.7.3. Şêwaza Razber

Di çîrokan de bûyer û kesayêtên çîrokan hertim di ser re, di rû de tîn nasandin, tu carî bi kitekit neyên şayesandin û pêşkeşkirin. Di zargotina Kurdan de ji xeynî cureya çîrokê em vê şayesandina bi kite kit bi taybetî di stran û dastanên kurdan de dibînin. Di strana Têliyê de şayesandina Têliyê bi deqan berdewam dike, her wiha di dastana Memê Alan de Şayesandina Zînê bi berfirehî tê kirin. Lê belê di çîrokan de em vî tiştî nabînin hew dibêje qîzik pir pir bedew bû; yan kurik gelek qeşeng û çeleng bû, ne bejn û bala wan, ne cil û bergên li ser wan, ne solên di lingên wan de û birî û bijang û çav û sifetên wan tîn şîrovekirin û şayesandin. Bi tenê, guhdar pê dihesa ku leheng baş e; yan xirab e, keçik bedew e yan kîrê e û hew.

Di çîroka padîşah de, ya ku di arşîva me de ye, qesr û qonaxên wî tev hildiweşin û padîşah piştî xwe dide mal û milk û saltanata xwe, terkî dinya dibe û diçe. Ew bûyer li wir diqewime û li wir dimîne. Şayesa kesayêtên çîrokan çiqas di rû de bê kirin, ewçend bandorê li ser şêwaza vegotina çîrokê jî dike û bi vê şêwaza razber ewçend çîrokê ji rasteqîniyê û heqîqetê jî bi dûr dixe. Çîrok çiqas ji heqîqetê bi dûr bikeve ewqas asoya wê firehtir dibe û liv û tevgera wê hêsantir dibe û vegotina wê herikbartir dibe.

Wê demê guhdêr li ser guherîn û veguherînên derasayî pir zêde nahizire û li çîrokbêj napiçeke û nabêje ew çima awha bû, ew çima awha nebû. Em dibînin ku di çîrokan de ku qesrek hebe, ew qesr ji elmas û yaqûtan e, ku mirîşk an werdekek hêkan bike, hêkên wan zêrîn an zîvîn in, ku kerek hebe ji heriyê ye; ango herîni ye. Ev jî taybetmendiyên jiyaneke dîtir in, ne taybetmendiyê jiyana me mirovan e. Leheng an heft qatan dadikevin jêzermînê yan heft qatan bi jor dikevin; an jî li pişt çiyayê Qaf in. Ev jî rê dide ku şewaza çîrokê ji şênberiyê bi dûr bikeve û ber bi razberiyê ve bimeşe.

3.7.4. Bi Tenê Hiştin (Tecrît) û Girêdayîbûna bi Her Tiştî re

Luthî, bi tenê hiştinê wisa şîrove dike: Mebest bi vê têgehê ew e ku şexsiyetên çîrokan bi tu tiştê re pevgerêdayîn û pêwendiya wan tune ne. Lehengên çîrokan ne bi malbat, ne welat ne jî bi hinek têkberan, amûran ve girêdayî ne. Rihê lehengê çîrokan tunene û tu têkiliya wan bi demê re nîn e. Lewma dikarin pêk ve di nava tevgerê de

bin û digel wê bi hêsanî dikarin ji hevdu veqetin jî. Bi tenê ew tiştê ku ne niştecihê tu derêkê be, tu pêwendî bi jiyana derve û manewî re tune be dikare pêwendiyên nû çê bike, veqete û jê qut bibe (Oruç,2005: 421-429).

Di çîrokên ku di arşîva me de ne; di çîroka Xana Delfîla de hersê derwêş her yek, serwer û padîşahê welatê xwe ne. Ji bo hin tiştên ku hatine serê wan; dev ji text û tacê xwe mal milkê û xwe berdidin û terkiserî dinyayê dibin. Her wiha em vî tiştî di çîroka Padîşah de jî dibînin. Padîşah jî terkiserî dinyayê dibe û diçe heta gavaniyê dike.

Weke ku di van herdu mînakên jor de jî dixuye ku cih û asta wî/wê ya çînî çî dibe bila bibe dikare yekser terka text û tac, mal û milk an jin û zarokên xwe bike û qet li pişt xwe nenêre. Bi vî rengî em têdigihên ku rihê lehengên çîrokan û li tu derê bi tu tişteki ve negirêdayî ne.

Dema lehengên çîrokan di demên cuda cuda de her cara ku rastî heman tiştî tî, car din heman xeletiyên dikin. Her wiha lehengên ku peyvîr û asta wan nêzî hev bin; sînore tevgerên wan jî hatine diyarkirin, ew her mecbûr û girêdayê tevgerekê ne. Eger ku di wî sînore diyarkirî de erka wî xirabî be, ne pêkan e ku heman leheng qencyê bike; ango tevgerên wan hatine sînorkirin. Her wiha li gor Lûthî di bûyerên ku ji hev pir cuda û ji hev hatibe tecrîtkirin, rastlihevhatina wan a demekê ne siûd e; ew li gor bername û plansaziyeke bêhempa û bi rêk pêk tê. Ev pêkhatin hemû ne rasthatinî ne; ji mêj ve li gor binyada çîrok û nîgaran hatine plankirin.

3.7.5. Berzbûn û Hewandina Dinyayê ya di Nava Xwe de

Li gor Lutî ji ber ku motifên çîrokan tunene; motifê ku ji mît û efsaneyan derbasî çîrokan bûne ji rastî û heqîqetê hatine bi dûrxistin, asta derasayîbûna wan hatine zêdekirin û bêtir hatine zelalkirin; bi vî awayî asta manewiyata wan jî zêde bûne. Leheng ji taybetmendiyan şexsiyeta xwe ya esasî hatine dûrxistin (Oruç,2005: 421-429).

Di çîrokan de asta manewiyeta şexsiyatan çiqas bê berzkirin û bûyer çiqas ji şenbêriyê bê dûrxistin û nêzî razberiyê be; perspektîfa wê ewçend fireh dibe û hemû dinyayê di nava xwe de dihevine. Şexsiyet û heyberên çîrokan çiqas ji taybetmendiyan

xwe yên esasî bên dûrxistin, çiqas naverokên wan bên valakirin ewçend berz dibin; çiqas bên berzkirin jî ewçend temsîliyeta wan jî zêde dibe û hemû tiştên dinyewî dixin nava xwe, di xwe de dihevin. Herçend razberbûn wek dûreparêziya rastiye bê hesabandin jî bi vî awayî ev motîf dibin temsîliyeta heqîqetê jî.



BESA CAREM

BERHEVKARÎ Û ÇÎROKÊN HERÊMA DIYARBEKIRÊ

Rê û rêbaz di lêkolînên zanistî de, stratejî û rêya sereke ya ji aliyê lêkolîner ve, dê bê şopandin û bikaranîn e. Bi vegotinek din *rê û rêbaz* bernameya bi rêkûpêkkirina li gor mijarên lêkolînê ye. Em ê di vê bêşê de li ser rê û rêbazên berhevkarîya zanista zargotinê, bi taybetî li ser qonaxa plansaziyê rawestin. Ji ber ku ev mijareke berfireh e û bi tena serê xwe dibe mijara tezekê. Herwiha di vê beşê de em ê deh çîrokên ku me ji herêma Diyarbekirê berhev kirine ji alî cih, dem, leheng, peyamên di xwe de dihevinin bi kurtasî binirxînin.

4.1. **Rê û Rêbazên Berhevkarîyê**

Kîjan xebat dibe bila bibe heke li gor rê û rêbazekê neyê meşandin gelek tevliheviyan û aloziyan bi xwe re tine. Herwiha lêkolîner li gor hêz û dema dayê wê xebatê ne pêkan e ku encamên sûdewar jî ji wê xebatê bi dest bixe.

Kesên ku agahiyên derbarê folklorê de didê me jî weke *kesên çavkanî* tên binavkirin. Kesên çavkanî di lîteratura navnetewî de ji bo ku pratîktir e weke *çavkanî* tê bikaranîn. Ji ber wê çendê em ê jî di vê xebata xwe de bêjeya çavkanî bi kar bînin. Lêkolînên qadê di bin sê serenavan de tên vekolan û nirxandin: Ev serenav plansazî, berhevkarî û nirxandin in (Çobanoğlu, 2012: 66).

Herçend nirxandin wek encamekê be û ji wan cuda xuya bike jî, ew jî perçeyek ji perçeyê vê pêvajoya xebatên qadê ye. Ji ber ku hersê qonaxên berhevkarîyê ji serenavên cuda cuda pêk tên em ê bi gelemperî li ser qonaxa plansaziyê rawestin. Lê ji bo pir dirêj nebe em ê bi du sê bendan qala qonaxên din jî bikin.

Kesekî ku di qada navneteweyî de navdar e û tê nasîn Kenneth S. Goldstein, di gelnasiyê de bi taybetî jî di *rê û rêbazên (metod) berhevkarîyê* de serwest e wiha dibêje: Ji bo berhevkarîyeke serkeftî rêbaz, bi tenê şertek e. Di vir de kesê ku berhevkarîyê dike, ji rêbazê jî girîngtir e. Ger ku meraqa wî/ê li ser wî tiştî tunebe; ku xuy û xisleta wê/wî ji bo berhevkarîyê ne guncav be, bi tenê bi zanîna teknîk û rê û rêbazan nikare berhevkarîyeke serkeftî bike (Çobanoğlu, 2012, 66- 67). Di qada

berhevkarîyê de têkiliyên bi çavkaniyan re mijareke pir hessas e, ku di berhevkarîyê de divê tu baweriya vebêj bi dest bixî. Carinan yek gotinek, tevgerê rabûn û rûniştekan ne di cih de, çavkanî ji berhevkar bi dûr dixê piştî wê êdî tu çî jî bikî feyde nake.

Wek çarçove em ê sernavên ku Goldstein û Boratav di vê qadê de bi kar anîne esas bigirin. Di hin waran de em ê li gor civaka kurdan hin sernavên din jî lê zêde bikin. Ji ber ku taybetmendiyên her neteweyê ji hev cuda cuda ne. Di berhevkarîyê de ji xeynî rê û rêbazan keseyeta berhevkar jî pir girîng e em ê vê rewşê di bin çar sernavan de bi nirxînin.

1. Kesê ku berhevkarîyê dike divê di kesayata wî de pêşdarazî tunebe. Hahangê li ser tiştan li gor hest û ramanê xwe biryaran nede. Pêşdarazî li ser tişt, bûyer an kesekî biryara ku ji mêj ve li gor nêrîn û baweriya xwe dayîn e. Di encamên lêkolînan de carinan hîpoteza, angaşata lêkolîner rast, carinan şaş derdikeve. Ji ber vê yekê, divê berhevkar di serî de biryara rastbûn an şaşbûna encamê nede; divê hinekî bi sebir be (Boratav, 2013: 42- 43).

Di vî warî de du tişt derdikevên pêş: Yek zanîna berhevkar e, ya duduyan jî bîr û baweriya berhevkar e. Ku berhevkar di derbarê berên zargotinê de serwext be li ser berên zargotinî yên ku çavkanî jê re vedibêje, li ser başî û xirabiya wan hema biryarê nade; ku ne serwext be hahangê wê biryara xwe bide. Ev jî dê rê li ber gelek kêmasiyên mezin veke. Ya duduyan jî, heke berhevkar li gor hest û ramanên xwe yên netewî; yan olî tevbigere wê demê berên ne di derbarê netew; an bîr û baweriya wî de be berhev nake, ku berhev bike jî dê bi pêşdarazî tevbigere.

1. Berhevkar divê hestên xwe tevlî kar û barê xwe neke, bêalî be bikaribe çavdêriyan bike û di warî de baldar be. Kesê ku berhevkarîyê dikan bi gelemperî ew kesên ku berên folklorê gelê xwe berhev dikan in, ji ber vê yekê divê nehizirin ku ev tişt ji bo gelê min baş e; an xirab e (Çobanoğlu, 2012: 67). Dibe ku di hinek berhevokan de ji gelê me re rexne jî hebin, hinek kêmasî û qelsiya civaka me jî tê de hebin û wan raxin ber çavan. Divê lêkolîner vî tiştî tu carî jî bîr neke ku; vegotina rastiyê tu carî zirar û ziyaneke nade kes û gelan; berewajî wê ev tişt rê dide ku kêmasî û pirsgirêk bîr çareserkin. Divê berhevkar bikaribe bi hemû beşên civakê re pêwendiyên deyne, derûniya wan fêhm bike, wan bide axaftin û di vî warî de behreya wî/wê hebe. Divê berhevkar bi biçûkan re biçûk, bi mezinan re jî mezin be (Çobanoğlu, 2012, 67).

Di erdnîgariya mezopotamyayê de gelek netewe, bîr û baweriyên cihê cihê hene. Di vî warî de Mezopotamya weke xalîçeyêke rengîn e, wek bexçeyêke bi gul û sosin û dar û beran xemilandiye. Civaka kurdan jî bi deh hezaran sal in ku li ser vê xalîçeya rengîn dijî. Her wiha kurd jî xwediyê bîr û baweriyên cihê cihê ne. Weke kurdên misilman, elewî, êzdî û yaresanî, kakaî. Ji ber vê yekê divê berhevkar di qadê de hay ji gotin û tevgerên xwe hebe, baweriya tu gelî neşîkîne û wan biçûk nebîne. Weke mînak di baweriya Kurdên Êzdî de serekê melean Melekê Tawûs e; di ya misilmanan de Melekê Tawûs weke şeytan tê binavkirin. Di qada berhevkarîyê de me dît ku gelê Êzdî bi tu awayî peyva şeytîn nayne ser zimanê xwe û dibêjin ew kelîmeya ku em jê hez nakin, em nikarin bibêjin; lê navê wê tu carî bi lêv nakin.

2. Divê berhevkar bixwaze bikeve nava gel, di vî warî de dilxwaz be; ji gel hez bike yan jî bikaribe di hinek ciyan de, bi awayekê bi weyna (rol) kemasiyên xwe beralî bike. Kesê ku ji gelê xwe hez meke, civakhez nebe teqez dê nikaribe berhevkarîyêke baş jî bike (Çobanoğlu, 2012: 67). Divê berhevkar xwe bi xwendin û zanîna xwe, xwe li ser gel; an çavkanî re negire. Ku wisa be çavkanî jî dê li gor wî tevbigere û wê dilê xwe jî berhevkar re veneke.

Em ê di vê beşê de jî, weke çarçove ji xebata Kennet Goldstein a ku weke teza doktorayê di sala (1964: 1977) an de bi navê “Li Qadê Metodên Berhevkarîyê” hatiye amadekirin û di qada navnetewî de weke referans hatiye pejirandin sûdê wergirin (Çobanoğlu, 2012: 68). Her wiha em ê hinek sernavên din jî bi xwe lê zêde bikin. Ji ber ku her neteweyek xwediyê bîr û baweriyek cuda ye; em ê carina li gor civaka kurdan şîroveyan bikin û hin tiştan lê zêde bikin. Bê guman em ê di vî warî de ji xebatên nûjen jî sûdê bigirin.

4.1.1. Plansaziya Berhevkarîyê û Qonaxa Destpêkê

Ji bo her lêkolînê beriya her tiştî divê mijarên ku bên lêkolînkirin û pirsgirêkên dê bên çareserkerin werin diyarkirin. Her çiqas mijara ku em qal dikin, lêkolînên qadê bin jî; her lêkolîneke qadê di bingeha xwe de li pirtûkxaneyekê yan jî li arşîvekê dest pê dike. Divê berhevkar bizanibe bê gelo çima ew vê xebatê dike, di vê xebatê de armanca wî/wê sereke çi ye û bi vê xebatê, hûn dixwazin bigihên kîjan armancan,

hêviya wê/wî ji vê xebatê çî ye, tiştên ku hûn difikirin bikin gelo tînan an na û were pîvan jî çiqas rasteqîn in? Heke berhevkar bikaribe bersiva van pîrsan bide dê karê wê/wî jî hêsantir bibe. Ji bo ku ev tişt bi pergalî bê meşandin xebateke gelnasî; divê bi dorê van rêyan bişopîne. Mirov dikare lêkolînên qadê di sê qonaxan de binirxîne: Plansazî, berhevkarî û ji nirxandinê pêk tê. Em ê di vê beşê de bi taybetî li ser plansaziya beriya çûna qadê bisekinin (Çobanoğlu, 2012: 69).

4.1.1.1. Amadekariyên Beriya Çûna Qadê

Li gor K. Goldstein (1977) folkloras beriya ku biçe qadê divê hin amadekariyan bike. Li gor wê berhevkar dema ku biçe qadê wê kar û barî wê/wî gelekî zêde bin û dê gelekî mijûl be. Ji ber vê berhevkar wê demê û derfetê, ji karê ku divê pêşiyê bikira re nebîne. Berhevkarên ku beriya çûna qadê ev pîrsgirêk çareser kiribin, wê dema xwe jî baş û li gora dilê xwe bi kar bîne. Her wiha wê berhevkar dem û derfetên xwe ji bo çareserkirina pîrsgirikên ku dê dûvre li qadê derkevin pêş wî/wê bi kar bîne (Çobanoğlu, 2012: 73).

4.1.1.2. Xwendina Berhemên li ser Mijaran

Ku pêkan be divê berhevkar hemû berhemên li ser herêma ku dê berhevariye bike û li ser gelê wir hatine nivîsîn bixwîne. Weşanên bi vî rengî dê agahiyên li ser dîroka civaka wê herêmê, her wiha dê agahiyan li ser hizr û ramanên siyasî, ol, bawerî û perwerdehiyê bide berhevkar (Goldstein, 1977: 24).

Piştî ku berhevkar mijara xwe ya berhevkarîyê diyar kir divê li ser mijara xwe pirtûk û materyalên bi mijara xwe ve girêdayî ye peyda bike. Bi xwendinê re divê nîşeyê xwe bigire da ku dûv re jî bikaribe jê sûtê werbigire. Xwendina berhemên li ser mijarê asoya berhevkar bêtir fireh dike. Piştî xwendinê berhemên û temaşekirin û guhdarîkirina vîdeo û dangan karê berhevkar hêsantir dibe. Berhevkar piştî van agahiyan êdî dizane çî dike û ji wê berhevkarîyê çî dixwaze û dê piştî wê çî encaman jê derîne. Her wiha xwendineke bi rêk û pêk li ser mijarê rê li ber dahûrandineke zanistî û teorîk jî vedike.

4.1.1.3. Lêkolîna Çavkaniyan û Pêwendiyên bi Mezinên Herêmê re

Piştî tespîtkirina mijarê û xwendina berheman divê berhevkar lêkolîna çavkaniyan bike. Navê kîjan çavkanî li kîjan herêmê were xwendin; divê berhevkar beriya ku rasterast biçe cem çavkanî; divê biçe cem rûsipî yan kesê ku li wê herêmê baş tên nasîn bi aweyekê xwe bigihîne wan ji bo pêwendiya bi çavkanî re alîkariyê ji wan bixwaze. Ji ber ku dema rûsipî û kesên li wê herêmê tên nasîn bibin navbeynkar êdî baweriya çavkanî jî dikeve cih û tiştê berhavkar dixwaze bi vî rengî hêsantir bi dest dixe.

4.1.1.4. Pêwendiyên bi Kesên Çavkanî re û Berdewamiya Wê

Kesên ku dê xebatên qadê bikin, li ciyê ku ev xebat dê bê meşandin heke pêwendiyê bi berhevkarê ku berê ev xebat kirine re deyne dê baştir bibe. Kesekî wisa dikare hin agahiyên derbarê; divê mirov çawa tevbigere ji kîjan tevgeran dûr bisekine û li wê herêmê kîjan rêbazên berhevkarîyê dikare encamên tewrî baş bi dest bixîne bide (Goldstein, :1977: 26).

Berhevkar heke pêkan be xwe bigihîne berhevkarê beriya xwe yên ku berê li qada ku dê bixebite baştir dibe. Bi vî rengî dê derbarê taybetmendiyê wê herêmê û xuy û xisletê çavkaniyan de bibe xwedî agahî. Bi van agahiyan berhevkar awantajên mezin bi dest dixe. Ev tişt ji bo berhevkarê dê rê li ber encamên baş veke. Her wiha dê têbigihê ku berê li wê qadê di kîjan mijran de berhevkarî hatine kirin, gelo di mijara ku dê bixebite de lêkolîn hatine kirin an nehatine kirin.

4.1.1.5. Tomarkirinên Berê

Eger berhevkar, herêma ku dê lê berhevkarîyê bike xwe bigihîne markirinên to berê, wan guhdarî û temaşe bike, dê ji bo berhevkar gelekî baş be (Goldstein, :1977: 27). Berhevkar bi vî awayî dikare beriya ku biçe herêmê; derbarê taybetmendî bîr û bawerî, toreyê wê herêmê de dikare bibe xwedî agahiyên rast û baş.

4.1.1.6. Alav û Amûrên Pêdivî pê Hene

Xebatên ku li qadê bîr kirin wê ji wan gelek bîr nivîsîn û nîşe bîr girtin. Ji bo wê jî, xebatên ku li qadê dê bîr kirin wê pêdivî bi qasî ku hewce dike bi kaxiz, lîstîk

û pênuşan hebe. Herwiha divê kamera, wênekêş û denggirên di qadê de bên bikaranîn divê beriya çûna qadê bên bikaranîn û ceribandin. Berhevkar divê bizanibe, bê ka li ku derê perçeyên alav û amûrên bi kar tîne peyda dibin. Herî kêr divê berhevkar di warê tamîrkirina alav û amûrên xwe de xwedî agahî û serwext be. Ji ber ku şandina alav û amûran ji bo tamîrkirinê, wê berhevkar ji aliyê demê ve gelekî bixe tengasiyê û bitengijîne (Goldstein, :1977: 28-29).

Ger ku pêkan be berhevkar alav û amûrên pêdivî bi wan hene berdestên wan jî peyda bike û ji her yekê du heban bi xwe re bibe baştir dibe. Divê alav û amûrên ji bo berhevkarîyê tîne hilbijartin, ji aliyê çawaniyê ve pir baş bin. Ji ber ku wê li ser van qeydan gelek lêkolînên zanyarî, tez, belgesel û film bên amadekirin. Di berhevkarîyê de tomarkirineke baş ji bo berên folklorê ciyekî xwe yê pir girîng heye.

4.1.1.7. Agahiya Berhevkar yên ku Derbarê Zanîna Zargotinê de

Dibe ku mijara berhevkar ji berên zargotinê yek be; lê ku di derbarê berên din de; yên wek çîrok, dastan, mît, efsane, pêkenok, mamik zûgotinok, gotinên pêşiyar û biwêjan de ne xwedî agahî be dema berhevkarîyê bike dê bitengije; wê nikaribe bi hêsanî wan berên zargotinê ji nava hevdu derbixe û ji wan dabeşkirineke baş bike. Bi vî rengî karê berhevkar girantir dibe.

Her wiha dema berhevkar di warê zanîna zargotinê de tam serwext nebe dê nikaribe dastanbêj; an çîrokbêjên baş ji nava hevdu derxe. Wê demê dê kelûpelên zargotinê yên berhev bike jî dê ji alî çawaniyê ve ne pir baş bin. Ku berhevkar di vî warê de xwedî zanîn be, dema ku çavkanî biweste ew jî dikare çend tiştan vebêje. Di gelek mijarên zargotinê de, bi taybetî, di yên kurdan de avêtina ber hev rêbazeke sereke ye. Bi vî awayî çavkanî bêtir li mijarê sor dibe, weke ku serê çaviyê der be bêtir pê de diçe. Her wiha bi vî rengî berhevkarî di asta sohbetê de pêk tê û tirsar berhevkar a li hember qamerayê jî bivê nevê dişikê. Bi vî awayî berhevkarî ji asta fermiyetê jî derdikeve.

4.1.1.8. Di berhevkarîyê de Jin û Mêr

Li gor mijarên berhevkarîyê, qada ku berhevkarî dê lê bê kirin; berhevkar divê ciyê ku jin hewce bike jin ciyê ku mêr hewce bike wê mêr berhevkarîyê bike (Boratav, 2013: 47).

Dibe ku li gor toreyên wê herêmê dema ku berhevkar zilam be kêşên çavkanî yên jin bi rihefî nikaribin qutiya dilê xwe jê re vekin û zanîna xwe pê re parve bikin. Lê ku berhevkar jin be, bêtir dikare bi kêşên çavkanî re bide û bistîne, dikarê bi wan re bimîne, çavdêriyan bike. Her wiha ev tişt ji bo zilaman jî derbasdar e. Yan jî di çûna qadê de komên têkilhev hebin, jin û mêr bi hev re bin li wir dikarin li gor pêdiviyên ji hev biqetîn û cûda bixebitin. Tiştê ku tê pêşniyazkirin di berhevkarîyê de li ciyê jinan berhevkarên jin; li yên mêran jî berhevkarên mêr bin baştir dibe. Çavkaniyên jin li nava mêran hema em bibêjin qet nabêjin. Eger vebêjin jî gelek ji wan naxwazin deng û dîmenên xwe bidin. Di qadê berhevkarîyê de bi vî rengî soz ji me digirtin û hîn zanînen xwe bi me re parve dikirin.

4.1.1.9. Komên Berhevkarîyê

Divê komên berhevkarîyê ji mêj ve bî amadekirin. Divê dema ku komên amadekirin ji zanîna teknîkî û teorîk bigire, heta di koman de li gor qadan hebûna jin û mêran jî bê hizirîn. Lê divê em vî tiştî destnîşan bikin ku, karê berhevkarîyê ne karekî girseyî ye. Ev kar bi girseyî bi komên qerebalix nayê kirin, dema ku wisa be karê ku bê kirin jî baş nayê kirin. Tiştê ku di berhevkarîyê de tê pêşniyazkirin herî zêde sê kes dikarin bi hev re derkevin qadê. Lê kesek jî dikare bi tena serê xwe vî karî bike (Boratav, 2013:46-47).

Weke Boratav jî destnîşan dike dema komên berhevkarîyê qarabalix bin herkes li gor xwe hin tiştan dibêje çavkanî wê demê nizane kê esas bigire, li gor kê tevbigere. Di koman de tu bixwazî nexwazî zanîn, hezkirin û sebra hemû berhevkarên ne wek hev e; ji ber çendê jî di komê de yek ji berek zargotinê hez meke li gor ê din zûtir eciz dibe. Bi wî rengî jî berhevkarîyeke sûdewar bi dest nakeve.

4.1.1.10. Pêwendiyên bi Kesên Çavkanî re û Berdewamiya Wê

Ev pêwendî bi navbeynkariya kesên ku li wê herêmê tên nasîn, tên hezkirin re; yan xizmekî wî/wê were danîn dê ji bo berhevkar û berhevkarîyê baştir bibe. Dema ku berhavkar biçe mala çavkanî xwarin, vexwarin an xelateke biçûk di dest xwe de bibe, dê dilê çavkanî xweş bibe. Bi vî rengî berhevkar di destpêkê de baweriya çavkanî bidest dixê. Ji bo berdewamiya vê pêwendiyê jî divê berhevkar car caran hal û rewşa çavkaniyan bipirse; tevlê şîn û şahiya wan bibe. Pêwendiyek xurt din ava herdu hêlan de çê dibe. Bi vî rengî bêtir nêzî çavkanî dibe, êdî dibe kesekê ji wê malbatê.

Her wiha berhevkar, dema ku biçe qadê divê bi kincên xwe, bi rabûn û rûniştina xwe wisa pir balê nekişîne ser xwe; bi kincê xwe bi tevgerê xwe weke ku yekê ji wê civakê be tevbigere. Bi taybetî kurd baweriya wan çî dibin bila bibin ji lixwekirinên pir wisa beloq hez nakin. Ku pêkan be divê kincên berhevkar ên ji bo qadê û li gorî wê herêmê jî hebin. Li vir girîngiya kesayetiya berhevkar derdikeve holê. Kesê ku zîrek, zarşêrîn, û jêhatî be, wê pêwendiyê baş bi çavkanî û kesên derdorê re deyne. Heke berhevkar yekê civakhez û rûvekirî nebe, ji civakê hez neke nikare têkiliyên baş bi derdora xwe re deyne.

Bêguman her civakek girîngiyê dide kok, binyad û netewa xwe; lê di nava kurdan de ev tişt bêtir bi hin tabetiyên din jî derdikeve pêş. Hema hema her mezinekî kurdan herî kêr dikarê ji bav û bapîrê xwe heta heft bavan ji we re bihejmêre. Beriya her tiştî kurd navê binemal, êl û eşîrê xwe bilêv dikan. Hertim dixwazin bê zanîn ku ji êl û eşîrek çiqas jêhatî û mezin hatine, pêvajoya malbata wan çiqas dûr û dirêj e.

Ji ber ku pêwendiya zargotinê bi van tiştên ku me li jor rêzkirin heye; weke rêbaz berhevkar dikare ji bo nirxdayîn û bidestxistina baweriya wê civakê û çavkanî bi tomarkirina netewe êl, eşîr, malbat û baweriyên dest pê bike. Wê demê çavkanî bivê nevé wê bêtir li mijarê din jî vebe, bi vî rengî nêrîna wê civakê jî li hember berhevkar pir hindik diguhere û bi vî awayî karê berhevkar gelekî hêsan dibe.

4.2.1. Pîvanên Berhevkarîyê

Dema ku berhavkar biçe qadê û dest bi berhevkarîyê bike, gelek rêbazên ku berhevkar di qada berhevkarîyê de bi kar bîne hene. Ev rêbaz carinan li gor armanca berhevkar, berên ku berhev dike û rewşa çavkanî jî diguherin. Rêbaza anketê, rêbaza

hevpeyvînê, çavdêriyê û rêbaza tevlîbûnê ji vana çendek in. Ji ber ku ev mijar jî pir berfireh e û mijara me ya esasî nîn e. Em ê bi tînê li jêr, li ser hin pîvanên berhevkarîyê rawestin.

Herçend rê û rêbazên hemû zanista nêzî hev bin jî; rê û rêbazên her dîsîplînekî li gor qada xwe ye. Eger pêkan be divê berhevkar di derbarê jiyana çavkaniyan de hin kurte agahiyên binivîse; ku ev jî ne pêkan be divê herî kêma ev agahiyên em ê li jêr binivîsîn ku ji alî hemû folklornasan ve hatine pejirandin. Prf. Dr. Erman Artûn van pîvanan wisa rêz dike:

1. Nav û paşnava kesên çavkanî,
2. Cihê ji dayîkbûnê û dîroka wî/wê.
3. Xwendinê û ne xwendina wî/wê.
4. Navnîşana çavkanî
5. Jêderka berêna zargotinê ku çavkanî jê girtiye.
6. Cihê ku berhevkarî hatiye kirin
7. Dîroka berhevkarîyê.
8. Nav û paşnavên kesên ku berhevkarî kiriye (Artûn, 2017: 12-16).

4.3. Nirxandinên Çend Çîrokên ku Me ji Herêma Diyarbekirê Berhevkirine

4.3.1. Serxweş û Bengî

Rojekî Serxweş û Bengî derdikevin nêçîrê ji xwe re. Xezalek ji ber wan radibe û ew nikarin wê zevt bikin Serxweş Bengî dişîne malê. Bengî xulamê Serxweş e, Serxweş padîşahê gelê xwe ye. Tu nabêjî ew Xezal jî qîza mîrê cinan e û rêzebûyerên din piştî vê bûyerê diqewimin.

Lehengê çîroka me: Serxweş, Bengî, Xezala qîza mîrê cinan, Zîna perî ye. Divê serê pêşîn meriv li ser navê lehengê çîrokê hin şîroveyan bikin. Ev li gor rêbaza Aarne-

Thomson û li gor nîgarên xwe çîrokeke derasayî ye. Bi gelemperî çîrok di cîhana cin û periyên de derbas dibe.

Navê lehengê çîrokê ji her alî de weke remz in û bi zanetî hatine hilbijartin. Serxweş di wateya, yê ku serê wî xweş e; ango serxoş e. Bengî di wateya evîndar, aşiq, kesê ku ji tiştêkî pir zêde hez bike, hemû hebûna xwe dabe ser wî tiştî re tê gotin. Serxweş mezinê êla xwe bajarê xwe ye, yekê ku ji neçîrê û ji kêf û zewqê hez dike. Dilê wî çî bixwaze lê pey mexsed û miraza dilê xwe diçe, ji bo wê dikare terka text û tacê xwe bike. Ji ber wê ev nav weke sembol hatiye bikaranîn. Serxweş, serxweşê kef zewqa xwe, serxweşê jiyane ye.

Bengî jî kêşê ku jiyana xwe dide ser tiştêkî, aşiq û evîndar û girêdayiyê tiştêkî ye. Yek ji yekê re dibêje tu li ser filan tiştî bengî bûye. Navê Bengî jî bi aweyekê remz hatiye bikaranîn ji ber ku xulamê padîşah an mezinê xwe ye li hember wî bengî ye. Ji ber wê çendê xirabî û xayîntî li ba wî tune ye.

Herçendî Xezal qîza mîrê cinan be jî di dilqê xezalan de derdikeve hember Serxweş; hiş û aqil ji serî wî dibe wî serxweş dike. Xezal di zargotina kurdan de bedewiyêke pîr û pak temsîl dike û gelek caran nêçîrvanê xwe li pey xwe dike bengî. Ji ber vê çendê navê Xezalê jî bi zanetî hatiye hilbijartin û di çîrokê de nîgareke diyarde ye.

Zîn di çîrokê de perî ye. Di zargotina kurdan de hin caran cin nûnertiya xirabiyê bikin jî; lê perî tu carî ne alîgirên xirabî û neqenciyê ne, her dem alîgirên başî û xweşiyê ne. Herwiha ligel temsîliyeta perîbûnê navê Zînê jî di zargotina kurdan de navekî bi qedr û qîmet e, dilsozî û evîne di xwe dihewîne. Heta ku navê dastana kurdan a evîne Mem û Zîn e. Ji ber vê çendê meriv dikare bibêje hemû navên ku ji bo çîrokê hatine hilbijartin bi zanetî hatine hilbijartin û her navek nûnertiya nîgarekî dike.

Bûyer li cih û warekî nediyar de diqewime. Di çîrokê de bajarek û ada heft behran mewqiyê Zîna mîrê periyên e heye. Ev jî cihekî nediyar e û mîtolojîk e. Herwiha dem jî ne diyar e. Di hemû çîrokên derasayî de weke ku di çîroka me de jî derbas dibe, heft sal wek heft rojan e.

Her çendî di nava lehengên çîrokê de cin û perî hebin jî ew jî mirovên jiyana me ya rojane xuya dikin, ew jî hez dikin, hêrs dibin, bêrî dikin. Ji ber ku di çîrokê de di bûyeran de cihê tirsnaq û xeternaq tune ne; ji ber wê çendê ji alî zarokan ve jî dikare bê xwendin û guhdarîkirin. Heta di vê çîrokê de perî û cin xwediyê soza xwe ne û alîgirên xweşî û qencyê ne, her tim alîkariya mirovan dikin. Di nava civakê de ligel zarokan jî gelek caran bi tirs û xof qala vana tê kirin û ev heyber bi aweyeke sawdar tîr nîşandan. Ji ber wê çendê zarok mezin bibin jî her tim tirs û xofa perî û cinan û heyberên din di dilê wan de tê çandin ev tirs û xof dikeve bin hişê wan û beralîkirina wê jî gelekî zahmet e. Lê belê bi çîrokên bi vî rengî ev tirs û xof û saw dikare ji dilê mirovan bîr derxistin an kêmkirin. Herwiha bi çîrokên wisa derasayî û xeyalî, asoya zarokan jî fireh dibe û zarok jî, mezin jî ji çîrokên wisa hez dikin, bi vî rengî çîrokbêj dikare peyama çîrokê xurttir bide guhdêran.

Ji alî hûnandin û pevbestîna ve çîroka Serxweş û Bengî xuyaye ku bi salan di civatan de hatiye gotin. Gelek gotinê pêşiyar û biwêj bi aweyeke xweş, di ciyê xwe de hatine bikaranîn ev jî bandoreke erênî li ser guhdaran dihêle. Di van aliyan de meriv dikare bibêje ku çîroka Serxweş û Bengî bi herikîna demê re ji hêla pevbestîna hûnandin û zimên ve mezbûnê bûye.

Di vê çîrokê de jî nigara herî balkêş jî hebûna sê kevokan e. Ev her sê kevok di gelek çîrokên kurdan de û di dastana Mem û Zînê de jî bi heman rengî derdikevin hemberî me. Di dastana Memê Alan de bi navê Hîvbanû, Tavbanû û Stêrkbanû tîr nasîn. Ew bi gelemperî dema diçin ser avê û şilîkê xwe ji xwe dikin bi carekê de dibin keçên pir bedew. Ji bo ku tu wan zevt bikî, divê tu şilîk an cilê wan bidest bixî; ku ew cilê xwe bidest bixin car din dibin kevok û difirin derin. Di vê çîrokê de jî guherîn bi heman rengî ye.

Piştî ku Serxweş li pey Xezala qîza mîrê cinan dere digel lawa û tikayê Xezal cardin wî napejirîne jî, mîrê cinan û Xezal car din jî qencyê bi Serxweş dikin. Rêya bidestxistina Zîna mîrê periyar nîşanî wî didin. Her cara ku Zîn ji cem wî diçe car din Xezal û malbata xwe alîkariya wî dikin. Herçendî di serî de Serxweş nankoriyan bike jî dûv re ligel Zînê Xezalê jî dipejirîne û herduyan jî bi mahr dike, bi wan re dizewice.

Peyama vê beşê ew e ku divê meriv bi pêşdarastin nêzî hev du nebin û hevdu tevî kêmasiyan bipejirînin. Her cara ku Serxweş diçe welatê xwe Bengî wî bi kêfxweşî pêşwazî dike û mal û milkên wî cardin radestê wî dike. Peyam ev e ku çiqas derfet bikevin destê meriv jî divê meriv bi hevalê xwe re xayîntiyan neke û her carê jî Bengî vê dilsoziya xwe ligel Serxweş diçespîne.

4.3.2. Hesenê Kilindar û Şahê Maran

Rojekî Hesenê Kilindar û hevalê xwe diçin nêçîrê û dibînin ku marekî reş î pîs xwe li marekî xweşik lefandiye, kevir digire diavêje marê reş. Kevir dere li marê xweşik dikevê tu nabêjî ew mar jî qîza Şahmaran e. Hesenê Kilindar yekê dilbirehm e, şahê maran ziyayekî gir û xwedî hiş û aqil û zanîneke bêhempa ye. Meriv dikare bibêje ku wek feylesofê maran e.

Marên reş û marên xweşik ew jî marên ji maristana Şahmaran in. Jina mêrik xwedî mereqeke bêhempa ye, ji bo meraqa xwe dev ji jiyana mêrê xwe jî berdide û jê dixwaze ku raza xwe jî jê re bibêje. Pez û beran jî ne lehengên sereke bin jî li ser encama çîrokê bandora wan heye. Di kêliya dawîn de beran, Hesenê Kilindar ji xeletiyê vedigerîne. Dem û cih li gor formata çîrokan e û tam nediyar e. Dem di çîrokê de wek salek û rojekê derbas dibe. Cih jî weke gundekî cihê seydê û weleta maran derbas dibe; ango cih jî tam nediyar e, ew jî li formata çîrokan tê.

Herçend mar di nava civakê de wek lawirekî tirsnak bê nasîn jî; lê di çîroka me de xwedî aqil û zanîn e; ew jî wek însana hez dikin, hêrs dibin, heqî û neheqî ji hev didin alî û carinan dek û dolaba digerin. Ji ber wê çendê çîrokên Şahmaran di nava hemû beşên civakê de dikare bê xwendin û vegotin. Vêbêjê çîrokê ev çîrok bi sedan caran ji pîrika xwe guhdar kiriye û bi xwe jî bi kurdî dixwîne û dinivîse ji ber wê çendê çîrok bi zimanekî herêmî nehatiye nivisandin, hinekî di bin siya zimanê nivîskî de maye.

Çîrokên şahmaran di nava civaka kurdan de pir berbelav in, gelek şax û şovên wê li her derê Kurdistanê û li gelek deverên din hene. Serê Şahmaranê serê qîzeke pir xweşik û bedew e; lê laşê wê laşê maran e. Li gelek deverên Kurdistanê wêneyê Şahmaranê li ode û dîwanxaneyan li cihê herî xweş daliqandiye.

Çîroka hesenê Kilindar û Şahmaranê bi her awayî ne wek hev be jî; lê di alî mijar hûnandina bûyeran ve dişibe “Şahmaran 1”ê ya ku di pirtûka Mehmet Öncü de di rûpela 477’an de hatiye weşandin (Öncü, 2014:477). Di çîrokên Şahmaran de bi gelemperî têkiliya mirov û xwezayê tê hêlsengandin. Di gelek şaxên çîrokên Şahmaran de mirov şîrê xag xwariyê xiyanetê li Şahmaran dike. Di vê berhevkarîya me de Hesênê Kilindar bi alîkariya beran di kêliya dawî de ji vê rewşê xelas dibe. Herdu marê ku ji bo kuştina Hesênê Kilindar dertên, dema ku fam dikin Hesênê Kilindar bi zanetî serê qîza şahê maran neşikandiye êdî zirarê nadin wî. Car din şûn de dizîvirin wê agahiyê didin şahê maran. Dema ku bûyerek diqewime divê meriv hema bi pêşdarazî tevnegere û meriv rewşê tam fahm bike û li gor wê tevbigere. Di çîrokê de nîgara herî balkêş û diyarde morîka bin zimanê Şahmaran e. Hesênê Kilindar bi îsrar wê ji Şahmaran dixwaze. Li gor baweriyê ew morîk bi kê re be, bi zimanê hemû zîndewaran dizane. Di şaxa Mehmet Öncü ya ku navborî de dewsa morîkê tifa şahmaran digire û navê nêçîrvan jî di wir de Bedran e. Di van herdu berhevokan de jî Şahmaran di kêliyên dawî de raza xwe eşkere nake. Lê di gelek berhevokan de, mirov her tim raza Şahmaran eşkere dikin. Çawa raza wan eşkere dibe dimirin û li cihekî nepenî yên din ji nû ve zindî dibin û jiyana xwe car din li wir berdewam dikin.

Çi dibe bila bibe hin tişt hene divê meriv ji yên herî nêzî xwe re jî nebêjin. Dema ku meriv bibêjin digel meriv heval û hogirên meriv jî zirar û ziyane dibînin û kesên meriv mecbûrî van tiştan bikin jî divê meriv têkiliyên xwe ji wan qut bikin û jê dûr herin. Digel ku ev xiyanet ji alî Şahmaran ve tê zanîn jî her tim alîkariya mirovan dike. Di gelek şaxê Şahmaranê de Şahmaran qîz e, keçikeke pir bedew e; lê di vê çîroka me de Şahmaran bavê qîza bedew e. Di hin berhevkarîyên Mehmet Öncü de jî em rastî vê babetê tîn, di hinek şaxan de wekî mêr derdikeve hemberî me. Di nava civakê de tê bawerkirin ku mar bi taybetî evînadarê keçên bedew dibe, ev rewş carinan ji bo zilaman jî derbasdar e. Tê gotin ku li Sûra Amedê heta 30 sal berê jî mêrikek hebûye û bi maran re jiyaye gelek marên wî hebûne û kes newêrîbûye ber bi wê mala wî ve here. Çîrokên bi vî rengî di nava kurdan de hene û her tîn gotin.

Bi gelemperî di gelek şaxên çîroka Şahmaranê de rexnegireyeke mafdar jî ji bo mirovan û mirovahiyê heye; ji ber ku her cara ku pêwendî di navbera wan û mirovan de çê dibe ew wek lawir her tim alîkariya mirovan dikin; mirov jî her tim zirarê didin

wan û xiyanetê li wan dikin. Di van cure çîrokan de mirov her tim xwe bi tenê difikirin û ezeziya mirovan; zirar û ziyana ku didin xwezayê û pergala wê bi awayeke zelal tê rexnekirin.

Di hemû ol û baweriyên de di hemû cîhan û xwezayê de mirov û mirovahî tekane kesê ku xwedî hiş û aqil ê herî bi nirx tê nîşandan; lê di van çîrokan de tiştê derdikeve holê tam dijberî van bîr û baweriyên e; mirov her tim ji xwe re ne û ji xeynî xwe li tu kesî nafikirin. Ji ber van egeran ev cure çîrok di perwerdehiyê de bîr bikaranîn dê zarok jî bi awayekê rexnegirî li tevgerê xwe û mirovên din binêrin. Ji ber ku bi taybetî di vê sedsalê de mirovan zirar û zîyanên pir zêde dane pergala cîhanê û ev zirar hê jî beyî ku bisekine bi lezgînî berdewam dike.

4.3.3. Giloka Şev û Royê

Mijara vê çîrokê bûyerên ku bi şev li derdora axa, xulamê wî û paşayê bajêr derbas dibin. Kesayetên çîrokê ji xeynî pîra ku guloka şev û rojê dirêse mirovên asayî yên cîhana me ya îroyîn in.

Xulamê ku lehengê çîrokê ye merivekî dilsoz, dilpak û wêrek e. Di destpêkê de hîlbijartin û hêlsengandina axa, ji bo xulam pîvan û hêlsengandina civaka kurdan nîşan dide. Kesê ku cihê xwe yê di nava civakê de nizanin vê pîvanê binpê dikin ji alî axa ve tîr qewirandin, lê xulamê dawî û lehengên çîrokê hay ji van pîvanên civaka xwe heye û jixwe bûyerên çîrokê jî li dora vê dilsoziya wî dibihurin.

Di vê çîrokê de nîgara herî balkêş û diyarde gulok e. Ji ber ku pîrê demê bi hilkirina gulokên rîsîn şev û rojê diyar dike, ew jî bi girîngiya karê xwe dizane dilsoza karê xwe ye. Her wiha ev nîgara eyarkirina şev û rojê nîgareke mîtolojîk jî dixuye. Çîrok ji serî heya binî û pir eşkere birêxistinkirin û dîzaynkirina civaka kurdan ji alî rol û rîsta kesên û çîna wan radixe ber çavan. Li vir xulam bi xulamtiya xwe dizane li hember axêyê xwe û mezinên civakê yên weke paşa, rêzdar e, ji bo wan her tiştê ku dikeve ser milê wî zêde zêde jî pêk tîne. Ji ber serjêkirina çîl keleşan ji alî pedegojîk ve ne li gor zarokan e. Di civata ciwan û mezinan de bê gotin baştir dibe.

Zimanê çîrokê zimanekî zelal û herikbar e. Gotin û peyvên çîrokê bi devoka navçeya Erxênî hatiye xemilandin; digel ku temenê çîrokbêj ji şestî buhuriye jî, di

hinek peyvan de bandora tirkî jî li ser çîrokbêj dixwiye. Di çîroka Guloka Şev û Royê de rol û rista kesan a di nava civakê de dilsoziya wan a li hember peyvîrên wan tê destnîşankirin û di van waran de şîretê dide guhdêran.

4.3.4. Birakose

Çar bira hene, ji wana hersê bira, lawê birayê xwe yê mezin dixapînin, gayê wî bi bihayê golikê jê digirin. Li ser viya birayê wan ên mezin, ji bo heyfgirtina lawê xwe hinek rêzebûyeran tîne serê wan.

Di vê çîrokê de ji xeynî rovî, lehengên çîrokê tev mirovên jiyana me ya asayî ne. Bûyer li gund û der û dorên birakose lê dijîn derbas dibe. Şaxên çîrokên birakose di nava gel de pir zêde ne. Di dema berhevkarîyê de, em rastî sê şaxên birakose hatin. Di çîrokê de rêzebûyerên ku bi dorê derdikevin, xweş hatine hûnandin û hêdî hêdî ber bi encamê ve diçin. Di hinek çîrokan de çîrokbêj, carinan hinek şaxên çîrokan li nava hevdu dixin lê di vê çîrokê de em rastî wî tiştî nehatin.

Çîrok bi zimanê herêma Erxenîyê ya navçeya Diyarbekirê hatiye vegotin. Di destpêk û dawîya çîrokê de em rastî gotinên qalibî yên ku her tim di çîrokan de dubare dibin tên. Ji alî vegotinê ve deqa me, di çarçoveya çîrokê de ye. Di çîrokê de hejmara sisêyan her tê dubarekirin. Hersê bira li hember birayê din tevdigerin, birayê mezin her tim sê rojan demê dide birayên xwe yên din. Di bûyera kerê de jî bi tenê sê zêr tên bikaranîn.

Piştî ku pêvajoya mirovahiyê dest pê kiriye, xirecir û teşqelîyên nava mirovan qet neqediyane. Li gor kesên bawermend nelihevkarîna birayan bi bûyera herdu kurên Hz. Adem, Habîl û Qabîl dest pê dibe. Ji hesûdî Qabîl, Habîl dike û tê bawerkirin ku ji hingê ve ev hesûdî û nelihevkarîna di nava birayan de heye. Di çîroka birakose de jî em rastî vê mijarê tên; ku bira, bira re ne rast e hertim xirarabiya hevdu dixwazin, li pey hevdu digerin. Herçend hersê bira zanin ku lawik kurê birayê wan ê mezin e jî gayê wî dikin golik li ber çavê wî reş dikin û bi wî awayî jê distînin. Di bûyera kerê de jî her çiqas piştî ku fêm dikin, ker zêra neke û di bûyere mirina birayê mezin de, birayê wan ên mezin di hundirê gorê de yeko yeko pozê wan ên din jê dibe jî, yek ji yê din re rastiyê nabêje. Rastî dirustî tu caran li cem birakoseyan peyda nabe; ango xêrnexwaz

in. Hemû bira bi tenê xwe difikirin û xêra birayê xwe naxwazin. Di nava kurdan bi mijara van çîrokan ve girêdayî, êdî gotina birakose bûye biwêj. Yek ji yekî re dibêje law hûn birakose ne; ango hûn bi hev re ne rast in, xêra hevdu naxwazin.

4.3.5. Keçelok

Du heb sofîyê yextiyar bi her tiştê xwe û bi her awayî weke hev in, dişîbin hevdu, herdu jî li jinîkekê dibin xwedî, dibêjin jina me ye. Li ser vê yekê li hev du nakin û radibin diçin cem qazî ji bo ku meseleya wan çareser bibe. Qazî dike nake nikare wan ji hevdu safî bike li ser vê yekê radibe wan dişîne cem dewletê. Werhasil dewlet jî wan nikare ji hevdu safî bike edî dişînin pey Keçelok, Keçelok wan ji hev safî dike û gelek bûyerên din jî bi fambarî û rastî durustiya xwe çareser dike.

Keseyatên çîrokê yên wek keçelok, sofî ku yek ji wan cin e, qazî wezîr, qîza wezîr û dewlet in. Bi gelemperî hal û rewşên lehengê çîrokê ji xeynî sofîyê cin kesayetên roja me ya asayî ne. Herçend Keçelok di vê çîrokê de yekî belengaz û bêxîret be jî lê yekî xwedî fam û feresat e, bi zanîna xwe weke derwêşekî ye. Qazî, di qada xwe de yekî peywirdar e, karmendê dewletê ye. Ji Sofîyan kesayeteke derasayî ye; ango cin e.

Dema qewimîna bûyeran bi gelemperî şev e; lê ne diyar e kîjan şev e, cihê qewîna bûyeran jî di mewqîya dewletê de ye. Ev rewş ji alî format ve li pênaseya çîrokê tê. Ji ber ku di çîrokan de cih û dem tam ne zelal e. Dem şev be jî tam nediyar e ev şev kîjan şev e. Kesên karê rêveberiyê dikin, divê li hember mirovên rasteqîn û yên derewîn xwedî helwest bin. Divê rêvebir bikaribin heqî û neheqiyê ji hev du veqetînin. Li ser vê mijarê di çîroka Keçelok de gelek şîretên giranbiha hene. Ji ber wê çîrok ji mezinan re hatibe vegotin jî, ji bo ciwanan jî meriv dikare bi kar bîne.

Çîroka Keçelok ji alî pevbestî û vehûnandinê ve çîrokeke gelekî serkeftî ye. Ji ber ku hemû rêzemînakên wê ji bo ku temaya rastî û durustbûnê xurt bikin bi aweyêke profesyonelî bi remzan hatine rêzkirin. Çîrok ji vî alî de ji mijara xwe ya sereke dûr neketiye. Di nava kurdan de di hemû şaxên çîrokên Keçelok de, bi kar û tevgerên xwe weke yekê bûdela û aqilsivik tê nîşandan; lê dû re tê famkirin ku ne wisa ye, ew yekê zana û xwedî raz û sir e.

Di çîrokên kurdan de rewş û tevger, zanîn û fambariya Keçelok, ku li hinek herêman, wek gurî jî tê bi navkirin, dişibe çîrokên Behlulê (Balûr) û Mele Serdîn; ango yê ku serî wî dîn e, dîwane ye ku di çîrok û pekenokên tirkan de jî weke Mele Nasredîn derbas dibe.

Zimanê çîrokê zimanekî fesih, herikbar û zelal e; lê çîrokbêj di hinek cihan de carinan hin peyvên tirkî bi kar tîne. Her wiha bêjeya Behlulê Dîwane jî vê wateyê dide der. Dîwane jî tê wateya dîn, bûdela yê ku hişê xwe wenda kiriye. Di nava kurdan de çîrokên Behlulê Dîwane jî pir berbelav in.

Wezîr herçend yekê kone be jî di konetiya xwe de bi ser nakeve her dem Keçelok pêşiya dek û dolabên wî digire. Tiştê balkêj di vê çîrokê de siya nîgara dewletê li ser çîrokê ye û dewlet di vir de hem bi Keçelok re lehengekê sereke ye; hem jî diyardeya ezmûnkirina rastî û nerastiyê ye.

Di bûyera herdu sofîyan de keçelok bi zanîna xwe ya kûr û bi fam û feraset û pêşbîniya xwe bûyerê zelal dike. Di vir de peyameke gelek balkêş heye ji bo guhdaran hemû dewlet nikare pirsgirêka herdu sofîyan çareser bike lê Keçelok wek rebenekî li ser sergoyê û yekî beredayî ye, tê pirsgirêkê bi yek carekê de çareser dike. Ango zanîn ne ew tişt e ku bi tenê li cem çîna bilind û rêvebiran hebe. Dibe ku li cem kesên wek Keçelok jî hebe.

Di bûyera hespan û wezîr û qîza wezîr de jî, qîza wezîr ji bo ku Keçelok li ber çavê dewletê reş bike jinbûna xwe û bedewbûna xwe bi kar tîne. Keçelok jî wê zanîn û fam û ferasetê xwe dide hêlekê nefsa wî ya biçûk zora wî dibe, dibe bendeyê nefsa xwe û şaşitiyan dike. Çi dibe bila bibe, divê meriv her tim hay ji nefsa xwe hebe û hakimê nefsa xwe be; ya na ew dibe hakimê meriv û meriv dikeve rewşên gelekî xirab û meriv rezîl û riswa dibe di nava civakê de.

Lê digel şaşitiya xwe hişê Keçelok car din zû tê serî wî û rastiyê ji dewletê re dibêje. Di vir de ji xeynî rastiyê tu rê û rêbaz nikare Keçelok ji xetereyê xilas bike. Rastî, durustî ew tişt e ku bingeha hemû jiyanê ye. Di vir de çavê dewletê li her derê her tim li ser her kesî ye. Hemû kesan diceribîne, li mêzîna dadê dixê da ku bizanibe

bê li hember wî rast; an xelet tevdigerin. Keçelok jî bi kar û tevgerên xwe her tim li hember dewletê ango rêvebiriye zelal e, tu tiştî jê venaşêre.

Di bûyera keçika şevê de digel ku dewlet lê tê xezebê jî lê Keçelok li keçikê xiyaneke nake, heta ku keçik bi remza hinarê îşaretkî dide Keçelok. Keçelok ser dide lê sira xwe û keçikê nade tu kesî. Dewlet jî dema vê tevgera Keçelok dibîne wî car din xelat dike û destê wî û keçikê digihîne hevdu.

Di dawiyê de rastî tê xelatkirin şaşitî jî tê celatkirin. Divê di hemû tevgerên xwe de meriv serê pêşîn li hember xwe, dûre jî li hember merivan û rêvebiriye rast û durist be û zelal be. Dema ku meriv zelal be bêguman dê rojekê meriv destkeftiyên wê jî bibîne.

4.3.6. Heca Rêvî

Heca Rêvî cûreyeke çîrokên lawiran e, lehengê wê bi tevahî lawir in. Bi çavdêriya û cerebeyê bi salan di van çîrokan de eynikek ji bo jiyana lawiran hatiye pêgirtin. Herwiha dema em çîrokê guhdarî dikin em di derbarê lawiran de û taybetmendiyê wan de jî dibin xwedî fikir û ramanan. Gelo bê ka ji wan lawiran kîjan bi çi awayî tînan nasîna têkoşîna di navbera wan de li ser çi ye? Ev jî ji bo zarokan, di nasîna lawiran de rêyêke têr baş e.

Bêguman di van çîrokan de herçend mijar li ser lawiran be jî, mebest ne ew û jiyana wan in. Li vir armanc mirov û jiyana wan bi xwe ye. Her lawirek li vir remzeke di dewsa mirovan de ye, ango sembolek e. Her yek di nava civatê de temsîliyeta hin kesan dike. Ji ber wê çendê ev kesê ku di nava civakê de temsîliyeta hin çîna û kesan dikin, hinek ji wan tînan rexnekirin, hinek ji wan jî tînan rûmetkirin û xelatkirin.

Navê çîroka Heca Rêvî bi xwe jî navekî bi kînyayê ye. Çimkî navê rovî û hec; an tobekirin, rastbûn û duristbûn tu carî nayê berhev. Ji ber wê çendê herçend ev peyam li ser rovî bê dayîn jî; divê em her tim hay ji kesên kone û bi tenê ji xwe re ne hebin, wan nas bikin û nekevin kemîna wan. Eger ev pêşbînî bi me re tunebe, ev kêmasî ne bi tenê yê wan kesên kone ne; bêguman em jî dibin şîrkê wan kêmasiyan. Wê demê divê dû re lomeyê me ji encamên ku di vî warî de derdikevin holê jî tunebin.

Di çîrokê de dîk, kew û kund lawirên ji rêzê ne. Bi tenê jiyana xwe didomînin. Lê rexneya ku ne rasterast be jî, bi awayekê nixamtî li wan jî tê kirin. Ew herçend rovî nas dikin jî, bi soz û qirarê wî bawer dikin û ji ber wê çendê jî ev encamên ne baş dertên holê. Li vir kund hinekî cûda tev digere, ji rewşa hevalê xwe dersan derdixe û biazîq tevbigere û di encamê de rovî têk dibe. Dema ku tiştê were serê meriv divê meriv hinekî aqilane tevbigere, ecele meke û gavê xwe bi wî rengî biavêje da ku meriv encamên baş jê derîne. Kund jî li vir vêya baş pêk tîne.

Ev cûre çîrok li her derê û di her civakê de, bi hêsanî tên gotin, ji ber wê çendê ji alî pevbestî û şêwaza vegotinê ve edî di bihûrîna demê de baş rûdinin û bi her awayî bi hev ve dikelîjin û dikemilin. Zimanê çîrokê di nava herêma Amedê de nûnertiya devoka navçeya Erxenîyê dike. Her wiha ev çîrok ji alî jinekî ve hatiye vegotin, ew jî bi serê xwe hin destkeftiyên vegotinê bi xwe re tîne; ji ber ku dayîk ji bo ku zarokên xwe di xew re 'kin û hin şîretan li wan bikin, bi deh hezar salan e ev cûre çîrok vegotine.

Ji ber wê çendê dawîya dawî gelek çîrok li ser navên mêran bînan neqilînin jî, di esasê xwe de gelek ji wan ji alî jinan ve hatine vegotin. Lê belê ji ber rewşa civaka kurdan jin di hin waran de hîn jî ne rihet in. Di berhevkarîyê de me dît ku gelek ji wan hîn jî naxwazin deng û dîmênê wan werin tomarkirin û navê wan li ser kaxizê bînan nivisandin.

4.3.7. Mala Kulîlkê

Her çîrokek li gor hewcedariyê li ser mijareke jiyana hatiye vegotin, leheng remz û nîşaneyên hin beşên civakê ye. Qîzeke yekî hebûye û rojekî xwazgîniyê wê tên keçik ji bo ku ji mêvanan re avê bîne diçe kaniyê, awa mêze dike wa ye di kaniyê de kulîlkek heye û li ser wê kulîlkê dibêje; wa ye xwazgîniyê min hatine ew ê malbata min, min bidinê û ew ê zarokên min çêbin ji bo avê ew ê werin ser vê kaniyê, ew ê destê xwe bavêjin vê kulîlkê û ew ê tê da bixeniqin û li wir por û porçikên xwe dirûçikîne, şîne digire, piştê dê û bav tên ew jî tevlê şîna keça xwe dibin. Piştê bira tê li rewşa wan a kambax dinê û terkiserê dinê dibe û lê dixê diçe.

Kesayetên di çîrokê de ne tev kesayetên jiyana me ya asayî ne. Ji ber wê çendê di çîrokê de tu tiştêkî derasayî tune ye. Wisa xuyaye ku ji bo şîretdayînê li ser mijara ahmaqiye ev çîrok hatiye afirandin; ango çîrokek dîdaktîk e. Ji ber ku di çîrokê de bûyereke dijahlaqî û tirsnaq tune ye; çîroka Mala Kulîlkê zarok jî di nav de ji bo her beşên civakê dikare bê vegotin.

Bûyer li ciyê ku lê dijîn dibihure. Herçendî dûbarekirina hin peyvan di çîrokê de hebe jî, çîrok bi zimanekî zelal hatiye vegotin. Li ser heman mijarê û bi hin navên cuda yên weke Eliyê Xemxur, Muxtar em rastî şaxên vê çîrokê tên. Hinek ji wan di formata pekenokê de jî tên vegotin. Di çîrokê de debengiyeke pir pirolekirî heye. Bi vegotina hin bûyeran rewşa kesên debeng, ahmaq di çîrokê de bi zelalî li ber çavan tê raxistin. Hin kes di nava jiyane de, tiştê ne tişt jixwe re dikin derd û xem û jiyane li xwe û der û dora xwe diherimînin. Bêguman bûyer bûyereke sombolîk e, di jiyane de ev kesên debeng her tim li ser der û dora xwe dibin bar û piştî.

Herwiha dema bira vedigere malê, şorbê ji cotkar dixwaze; lê cotkar bi tiştên ne tişt de dikeve û şorbê nagihîniyê. Cotkar hîn hesp tune ye afir çê dike, ker tune ye kurtan çê dike. Divê her tişt dema ku hewce kir bê çêkirin; lê cotkar vê yekê nake, dilezîne û herwiha bi vî rengî dibe kujerê pitika xwe jî, zîrarê dide der û dora xwe. Di dawiya vê bûyerê de ligel debengbûnê tiştê ku tê rexnekirin çavnebarî û xêrnexwazî ye. Ji ber van herdu tiştan mirov di jiyane de, ji tiştên hîn mezintir dibin. Çîroka Mala Kulîlkê eynikê ji bo civakê pê digire û civakê li ber çavê me bi zelalî nîşan dide. Ji ber wê çendê çîroka Mala Kulîlkê di heman demê de wek rexnegiriyê civakî ye.

4.3.8. Mîrza Miheme

Çîroka me ji şaxan, şaxek ji çîrokên Mîrza Mihemed e. Herçend çîrokbêj leheng wek Mihemed bi nav bike jî bi naverok û nîgarê xwe şaxeke Mîrza Miheme ye. Çîrokên Mîrza Miheme, Miheme, Mîr Miheme, Mîr Mahmût jî tê binavkirin. Di nava van navan de em ê navê Mîrza Miheme bihewînin, ji ber ku ev çîrok di lîteratora giştî de bi gelemperî bi navê Mîrza Miheme derdikeve hemberî me. Di şaxên van çîrokan de Mîrza Miheme bi gelemperî kurê axayekî yan padîşahekî ye, sê bira ne. Ji nav wan birayan birayê herî biçûk e û yê herî jîr û jêhatî ye.

Di gelek şaxan de wek vê şaxa me jî, birayên din her tim li Mîrza Miheme neheqiyê dikin. Geh wî di binê bîran de dihêlin geh werekî û merxasiya ku wî kiriye li ser navê xwe dibêjin. Di rêzepirtûkên ji alî Heciyê Cindî (2014) ve li derdora salên 1930'î hatiye berhevkerin de bi dehan şaxê Mîrza Miheme bi navê cuda cuda di van berheman de hene. Di berhemên ku hatine çapkirin de; ku ji 10-15 çîrokan pêk bê teqez şaxek Mîrza Miheme tê de heye. Dema ku me di qadê de berhevkarî dikir me dît ku kîjan nav ji berhevkarên re hêsan were kîjan ji wan pir zêde di nav gel de berbelav be, hema digotin em bibêjin bila navî wî Mehmed, an Ahmed be.

Dibe ku navê lehengê şaxên Mîrza Miheme cuda cuda bin; çîrokên Mîrza Miheme ji ber mijar û nîgarên xwe wek çîrokên derasayî ne û gelek sembolen mîtolojîk di xwe dihewînin; wek Teyrê Sîmir, hesp, cin perî û hwd Ji ber wê çendê wisa dixwiye ku kurdan piştî îslamiyet pejirandine ji bo xatirê navê Hz. Mûhammed navên wek, navên Mihemed, Ehmed, Magmûd lêkirine. Di gelek çîrokên kurdan de bêtir derdikevin hemberî me û berbelav bûne.

Cudahiya Mîrza Miheme li gor lehengên çîrokên din ji ber jîrbûn û jêhatîbûna wî xwedî seknekî ye û bi van taybetmendiya xwe destkariya pêvajoya çîrokê dike û li gor xwe rê dide bûyeran. Ji ber wê çendê Mîrza Miheme dema ku bi dêw, hût, hijduya yan bi cin û periyên re dikeve cengê û wan têk dibe û guhdêr şaş û metal namînin. Dema meriv ji alî motîfên derasayî li van cure çîrokan dinêre, meriv rastî gelek mijar û sembolen mîtolojîk tên.

Herçend di hinek beşên çîrokê de em rastî dew, an hijdûya jî werin jî; ji ber ku şayesandina wan bi hûrgilî nehatiye kirin, bi tenê wisa di ser re hatine nasandin û wan weke lehengên ji rêzê, carinan jî wek nîgar di çîrokê de cihê xwe girtine. Ji ber van egeran ev çîrok bi gelemperî ji bo mezinan bin jî; lê di hemû beşên civakê de dikare bê gotin û xwendin. Dem û cih di vê çîrokê de tam nediyar e. Her çiqas navê bajar û çiya û geliyê hatibe bilêvkerin jî cih tam nediyar in.

Bavê her sê bira, pîrê, padîşah, her sê xwişk lehengên cihana me ya asayî ne; lê belê Teyrê Sîmir û dêw nîgarên derasayî ne. Di şaxên çîrokên Mîrza Mihemed de teyr carina bi navê teyrê Enqer, carina Ebabîl, carina jî wek Simîr, Sîmûrg tê

binavkirin. Ji ber ku em di beşa motîfan de li ser vê mijarê sekinîne em ê cardin li vir
vê mijarê dubare nekin.

Eger çîrokbêj yekî xeşîm nebe û temenê wî pir ne zêde be ji bîr nekiribin, bi
giştî pevbestîna van cûre çîrokan pir bi hostetî hatiye hûnandin. Berhevkar beriya ku
dakeve qadê divê hay ji şaxên van çîrokan hebe; dema hay jê tunebe ji ber ku ev çîrok
di nava civakê de pir zêde berbelav in dibe ku ji ber van egerê me li jor rêzkirin şaxên
wan û hinek beşên wan bîn tevlihevkin.

Me ji bo vê xebatê sê heb şaxên Mîrza Miheme berhev kirin. Ji wan du heb her
yek nîv seat hene, yek ji wan jî saetek û nîv e. Ya dirêj ku ji çîrokbêj Qutbetînê Farqînî
hatiye girtin bi qasî ku em hay jê hene heta niha nehatiye weşandin, naşibe şaxên din.
Ji ber ku gelekî dirêj bû li derdora 20 rûpelan bû. Ji bo ku tez pir dirêj nebe me cih
neda wê. Ya ku me cih dayê jî ji alî peyamên xwe ve xurt e.

Di vê şaxê de ku me di dawiyê de cih dayiyê, bavê her sê birayan axayekî
dewlemend e. Dema kurên wî jê daxwaza zewacê dikin ew jî ji bo ku wan biceribîne
radibe şertekî dide pêşiya wan; dibêje gerek hûn herin ji min re teyrê Ebabîl bigirin û
bînin. Lê ew baş dizane ku anîna teyr ne tişteki wisa hêsan e. Her sê bira dema bi rê
dikevin diçin, sê rê derdikevin pêşberî wan. Di rêyekî de dinivîse: Çûyîn heye veger
tune ye. Birayê mezin û navîn xwe nadin ser wê rê, xwe ji ser wê rê didin alî. Ew rê
para birayê biçûk dikeve; ango ji Mîrza Miheme re dimîne. Êdî ew jî ji bêgavî dikeve
ser wê rê. Di destpêkê de herdu bira şertê biratiyê ji bîr dikin û naynin cî. Dema ku di
tişteki de xetere hebe yan derkeve holê her kes nikare xwe li wî tiştî ragire. Wê demê
meydan bi tenê ji kesên wêrek û merxas re dimîne ango gotineke pêşiyên heye, dibêjin
berxê nêr ji bo kêr. Ew kesê ku wê kêrê bide berçavê xwe dikeve ser wê rê. Mîrza
Mihemed jî di hemû şaxên çîrokê de berxê nêr e.

Pirs bi pirs qonax bi qonax Mîrza Miheme xwe digihîne cihê rêbir û keleşên
wan hemûyan ji holê radike, radihêjê teyrê Ebabîl û tê. Digel ku tê dinêre, birayê wî
perişan in, ew radibê alîkariya wan dike, çi mal û milkê ku bi dest xistiye jî bi biratî bi
wan re parve dike lê car din birayê wî xayîntiyê lê dikin ji hesûdî wî di binê bîrê de
dihêlin. Mîrza Miheme bi ku de diçe hertim alîkariya însan û teyr û tilûran dike. Ji ber

van qenciya Mîr Miheme hema herkesê ku naskirine, alîkariya wî dikan. Bi alîkariya wan car din tê xwe digihîne dinya ronî.

Çi dibe bila bibe divê meriv li pey tiştê biçûk mekeve, divê meriv di kirin û tevgerên xwe de bi dilekî pak tevbigere û dilsoz be, wê demê jiyan jî li hember mirov comerd tevdigere û gelek rêyên din li ber meriv vedike. Gotineke bav û kalan e dibêje, bi xweziya meriv nagihêje cotê keziya. Dema ku qewimî, hewce kir tu xwe paş de bigirî, biparêzî tu bi wêrekî tevnegerî tu yê cotê keziya nebînî. Wê demê tu di dawiyê de encamên baş jî bi dest naxî.

4.3.9. Miya Topal

Di van cûre çîrokan de gur, rovî, hirç, eylo, kurmorî, kew û hwd difikirin, xeber didin û yekser bi şivan, gavan, bêrîvan, pîrê û zarokan re didin û distînin û dibin hevalê wan. Di çîroka Miya Topal de rovî, gur û mî bi şivan re xeber didin.

Miya Topal li cihekî di wextekî de guh li xwediyê xwe nake jê re gelek astengiyên derdixe her bi ya xwe dike û di dawiyê de lingê wê dişikê. Rovî li benda fersendeke wisa ye. Rovî li ser viya diçe bi gur re hevalbendiyê datîne; piştî şivan bi dek û dolabên rovî dihesse ew jî li gor xwe pîlanekê çê dike.

Ku li cihekî rêveberiyek hebe û pergalek hebe divê meriv jî tevlê wê bibê ji edetê dernekeve; dema ku meriv ji refê xwe biqete bêguman dê tiştên xirab bê serê meriv. Ji alî şivîn ve dema ku meriv bi hêrs rabe bi zîrar rûdine. Divê ji bo ku meriv nekeve xisarê bi hêrsa xwe karibe. Hevaltiya gur û rovî di çîrokê de li ser berjewendiyên e. Hevaltiyên rîknê wan li ser berjewendiyên bêne danîn, ew dîwar yeqîn rojekî hildiweşe û serê xwe nagire. Divê dostaniya meriv hertim bi kesên dilsoz re be. Di mînaka gur de meriv çiqas jîr û jêhatî be û wêrek be jî ku meriv gavê xwe bi aqilane neavêjê dê meriv hertim zîrarê bibîne. Gotinek heye dibêje dest di ser destan re ye û aqil ji aqil mezintir e. Di vir de destê ku di ser destê gur re destê kûçikê gurxenêq e. Aqilê şivan jî dek û dolabên rovî vala derdixe. Dibe ku carinan di jiyanê de hin tiştên xirab were serê meriv, lê divê meriv piştî wê bi tevdîr û aqilane tevbigere.

Şîretên ku di Miya Topal de hene hem pêdiviya zarokan hem jî ya mezinan pê hene; ango hem di hemû civatan de dikare bê gotin. Kesên ku me çîrok jê girtiye

xwendayê medreseyê û ji navçeya Erxeniyê ye û bi xwe jî li ser zimanê Kurdî dixebite ji ber wê çendê behna devoka Diyarbekir ji çîrokê nayê çîrok bi zimanê nivîskî hatiye nivîsîn; lê ji alî pevbestîn û hûnandinê ve kêmasiyên wê naxuyên.

4.3.10. Eyšê Qotê

Rojekî paşa û wezîrê xwe ji bo ku rewşa gelê xwe fêhm bikin û kêmasiyên rêveberiya xwe beralî bikin êvarekî xwe dikin dilqê baba derwêşan û li nava bajarê xwe digerin. Serê pêşîn rastî jineke belengaz û xizan tên, piştî paşa wezîrê xwe dişîne malê û wê şevê bi tenê di nava bajêr de digere. Di rêzê de rastî qesab û sê dizên navdar tê û çîrok bûyerên ku wê şevê diqewimin şîrove dike.

Keseyatên ku di vê çîrokê de derbas dibin keseyatên cîhana me ya rojane ne. Ev paşa, wezîr, qesab, Eyšê Qotê, Ticar Elî, sê dizê navdar û kûçik in. Ji xeynî sê dizan û kûçik, tev mirovên ji rêzê ne û taybetmendiya wan wekî yên jiyana me ya rojane ne. Ji wan dizan yek bi hildana hin navan çî kilît û qeyd û bend hebin tevan vedike, yê din dema serê heval û hogirên wî bikevin tengasiyê bi hildana peyva heval yekcar bi hawara wan ve derdikeve; kûçik jî hemû xetereyan ji mêj ve dibîne û xwediyê xwe agahdar dike.

Di çîrokê de pevbestîn û vehûnandina wê û qewimîn û çareserkirina hemû bûyeran bi rêzê û di demê xwe de pêk tînin. Ji wî alî de çîroka Eyšê Qotê diyar e ku di gelek civatan de ji mêj ve hatiye vegotin. Ji alî pevgerêdana bûyeran ve çîrokek bi hev ve kemiliye û serkeftî ye.

Ji ber ku me çîroka Eyšê Qotê, ji devê çîrokbêjê dîwana mîr û begê Farqînê, ji Çîrokbêjê Qutbetînê Farqînê girtiye ji alî şêwazê ve herikbar e. Ji ber vê çendê di çîrokê de gelek gotinên pêşiyên û biwêj di ciyê xwe de hatine bikaranîn. Dema ku çîrokek ji devê çîrokbêjekî serkeftî were girtin gelek kêmasiyên çîrokê yên ji alî ziman û şêwaza vegotinê beralî dibin û ji van aliyan ve tam dijberî wê destkeftiyên hêja dinimûne û bi xwe re tîne.

Di çîrokê de ji ber bûyera ku qesab mirovan hûr dike û goştê wan di xwaringehê de, digel goştê lawiran dide mirovan; ji ber wê çendê ji bo zarokan bi kêr nayê. Tirs û xovê di xwe de dihewîne ev jî ji alî pedagojîk ve ji bo derûniya zarokan tiştêkî xeternaq

e. Ji ber wê çendê dema ku di şevbuharkan de çîrok bên gotin divê mezinê zarokan û çîrokbêj hay ji wî tiştî hebin û çîrokên xwe li gor guhdaran hilibijêrin. Her wiha ev tişt ji bo weşanên dîtbarî û yê nivîskî jî derbasdar e.

Çîroka Eysê Qotê di civaka qîz û xortan de û di şevbuhêrkên mezinan de dikare bê gotin û ji vî alî de gelek şîretên hêja di xwe de dinimîne. Ev çîrok li ser kesên rêvebir û têkiliya di navbera gel û wan de hatiye gotin. Divê kesên rêvebir hay ji hal û rewşa gelê xwe hebin û car caran di nava wan de bi xwe bigerin, bi tenê bi agahî û gotinê wezîr û wezareyê xwe nemînin. Dema wisa mekin heqî û neheqî gelek caran têkilhev dibin ev tişt jî bi xwe re gelek mexdûriyetan tîne û bi vî rengî baweriya gel bi rêvebiran namîne. Dema ku rewş ev be, rêvebir nikare gelê xwe bi awayekî dadmend li pey hev bibe.

Paşayê bajêr vî tiştî di çîrokê de pir xweş bi kar tîne, herçend di çîrokê de cezakirina mirovan wek serîjêkirin be û ev dadgehkirin li roja me ya îroyîn neyê jî Paşa, hay ji rê û rêbazên rêvebirêyê û dadê heye. Nîgara cilguherîne û gerîna di nava gel de, wek baba derwêşan nîgareke diyarde ye; ji ber ku hal û tevgerên gel ên li hember paşa û li hember baba derwêşekî yan li hember hevdu ne wek hev e.

Di çîrokê de ne eşkere be jî bi awayekî veşartî çavbirçîbûn durûtiya hin kesên di çîna bilind e, yê wek Ticir Elî, Qesab tê rexnekirin. Divê mirov ji bo mal û milkên diya û dinyalixê nixê mirovahiyê bînpê nekin, dema meriv kiryarên ne baş bike wê demê bêguman mirov rojekî rastî cezayê wê jî tê. Karê ku dikin şaş be jî, bi hev re rastbûn û dilsoziya dizan ji alî paşê ve tê xelatkirin. Çavnebariya Ticar Elî û Qesab ji alî paşê ve bi awayeke aqilane tê cezakirin. Her wiha paşa wek rêvebirekî alîgiriya jineke xizan û mazlûm, Eysê Qotê, dike.

Bêguman li vir sekin û tevgerên paşê ji bo kesên din ên rêvebir weke mînak tê nîşandan. Rastî û dirustiya dizan a bi hev re tê xelatkirin; çavnebarî û bê ahlaqî tê cezakirin.

Bi qasî ku em hay jê hebûn di nava berhemana de yê ku çapbûne em rastî vê çîrokê û şaxê wê nehatin; lê dibe ku bûyerên ku di vê çîrokê de derbas dibin beş bi beş

di hin çîrokên din de hebin. Eger çîrokbêj ne serkeftî be carinan beşê hin çîrokên din bi çîroka xwe re vedibêje.

Di berhevkarîyê de em gelek caran rastî vî tiştî dihatin. Herwiha divê berhevkar jî di vî warî de serwext û serkeftî be û hay ji şax û şovên çîrokên din hebe; ya na ew jî di vî tevliheviyê de dibe şîrîkê çîrokbêj. Çîrok ji alî avanî naverokê ve ne rast be jî; edî derbasî nivîsê dibe û bi vî rengî ji alî lêkolîneran ve wek çavkanî tê hesabandin.

Divê berhevkar heta dikare çîrokên xwe ji kesên serkeftî bigire. Sedema tevlihevkirina şaxên çîrokên yek jê temen be, ya din jî derfeta vegotinê ye. Di bihurîna demê de edî bi salan çîrokbêj derfet nabîne ku çîrokê xwe vebêje. Dema bala xwe didênê ev tişt ji bo mamosteteyê jî derbasdar e. Mamoste dema bi salan di beşa xwe de mamostetiyê neke, tiştê ku dizane venebêje gelek agahiyê xwe ji bîr dike.

ENCAM

Zargotin li ser avahîsazî, cih û warên dêrîn, xwarin û vexwarin, lixwekirin, bîr û bawerî, dermanên gelêrî, û mijarên bi zar; ango bi ziman ve girêdayî ne; yên wek çîrok, dastan, efsane, mît, gotinên pêşyan û biwêj, zûgotinok, mamik, stran û hwd dixebite, wan berhev dike, lêdikole û li ser wan dahûrandinên zanistî dike. Ango meriv dikare bibêje ku zargotin li ser hemû mijarên çanda gel a maddî û manewî lêdikolê wan berhev dike û li ser van berhevkariyan dahûrandinên zanistî dike.

Ne bi awayekî pergali be jî di xebatên ku heta niha li ser dîrok, bawerî, gerzanî, stêrknasî û hwd de hatine kirin, meriv perçe bi perçe rastî hin mijarên zargotinî tên. Kar û xebatên zargotinî; ango gelnasiyê ne bi awayekî pergali be jî di sed sala 17. de beş bi beş dest pê dike. Lê piştî xebatên birayên Grîmm (1802) ên li ser çîrokan, li gelek welatan xebatên giranbiha hatin kirin û ev zanist bi rêbazên cur bi cur li seranserê dinyayê bi vî rengî belav bû.

Bêguman di nava van xebetan de cureya ku herî zêde şênber, a herî zêde derdikeve pêş çîrok in. Bi taybetî li ser cureya çîrokê teoriyên belavbûna zargotinê hatin guftûgokirin. Folklornasên wek Theodor Benfley, Birayên Grîmm û peyrevên wan, jêderka çîrokan weke welatê Hîndê bi nav kirin; çavkaniya hemû çîrokan bi Paçatantra ya Beydaba ve girêdan û bawer kirin ku maka hemû çîrokan welatê Hind ye. Hinek folklornasan li hember teoriya koçberiya çîrokan, îcarê teoriya erdnîgarî-dîrokî bi pêş xistin û dane pey şopa şaxa herî resen a çîrokê. Hinekan jî wana jî bawer kirin ku jêderka çîrokan Misir e; yan jî Yewnanîstana kevn e.

Piştî teoriyên li ser jêderk û çavkaniya çîrokan, vêca teoriyên dabeşkirinkirina çîrokan bi pêş ketin. Di vî warî de rêbaza ku herî zêde derdikeve pêş rêbaza Aarne-Thompson e. Di dabeşkirina Aarne-Thompson de ya li ser çîrokên romanî; ango rêzeçîrokan de, herçend bibêje kesayetên van çîrokan ne kesên çîna bilind in, ne jî cin û perî ne; ew bi gelemperî kesên ji rêzê ne û navê wan jî navên jîyana me ya rojane ne (Degh, 2005: 342-353).

Lê em li ser rêzeçîrokên kurdan ên dirêj gihîştin vê encamê ku keseyatên rêzeçîrokan ne bi tenê keseyatên jiyana me ya rojane ne; ango asayî ne. Herwiha em

di vî warî de rastî gelek rêzeçîrokên derasayî jî hatin. Ev taybetmendî ji bo çîrokên “1001 Şevkê” jî derbasdar in, ku jêderka çîrokên “1001 Şevkê” jî di gelek çavkaniyan de wek Îran, derbas dibe. Nexwe meriv dikare bibêje ku ev cudabûna xala rêzeçîrokan wek taybetmendiya welatên Rojhilat xuya dike. Di dabeşkirina Aarne-Thompson de ji xeynî xala rêzeçîrokan û pêkenokên ku li ser lawiran hatine vegotin heman serenav ji bo çîrokên kurdan jî derbasdar in; ango pêkenokên li ser lawiran meriv dikare wek çîrok bi hewsengîne. Meriv dikare dabeşkirina çîrokên kurdan jî di bin van serenavan rêz bike. Mixabin ku çîrokên kurdan weke çîrokê welatên din hîn jî nehatine dabeşkirin. Hin jî di vî warî de em rastî xebateke bi rêk û pêk nayên. Roja îroyîn jî hîn ev erdê beyar li hêviya cotkarên xwe ne.

Herwiha em gihîştin wê encamê ku bi taybetî di navbera pênaseya efsane û mîtan de jî li gor welatên Rojava û Rojhilat hin cudahî hene. Li welatên Rojhilat di dewsa mîtan de efsane tê bikaranîn. Ji ber wê çendê di nava folklornasên Rojhilat û Rojava de jî di vî warî de lihevkerinek tune. Ev jî di qada berhevkarîyê de ji alî teorîk û dabeşkirinê de, rê li ber gelek tevliheviyan vedike.

Hêleke çîrokan dembihurandineke xweş be; ya din jî pend û şîretên li ser jiyana me ya rojane ne. Ji Paçatantra ya Beydabayê Hîndê bigire heta çîrokên Aisopos ên Yewnanî çîrok, her tim wek amûra sereke ya perwerdehiyê hatiye bikaranîn. Çîrok geh ji bo perwerdehiya zarokan, geh jî ji bo ya civakê hatine bikaranîn. Di hinek çîrokan de pend û şîret rasterast nayên dayîn; lê di yên lehengên wan lawir in; ango fablan de bi gelemperî di dawiya çîrokan de peyam û şîreta ji bo guhdaran rasterast tê bilêvkirin. Ji ber taybetmendiya van çîrokan û kinbûna wan, ev çîrok ji bo perwerdehiya zarokan werin bikaranîn baştir dibe. Dema ku çîrok di perwerdehiyê de bî bikaranîn asoya xeyalên zarokan berfirehtir dibe. Zarok bi alîkarîyê leheng û nîgarên çîrokan konetî û qencyê, rastbûn û nerastbûnê ji hevdu derdixin bi vî rengî zarok ji bo jiyana rasteqîn tî amadekirin û li hember nebaşî û xirabîyê bêtir berxwedêr dibin.

Hîmê netewbûnê ya herî girîng zargotina wî gelî bi xwe ye. Cudabûna netewan ji hev û din, bi ziman û zargotinê pêkan e. Piştî şoreşa Fransayê, li seranserê dinyayê netewperwerî pêl bi pêl bi pêş dikeve. Bi pêşketina netewperweriyê her civakê bêtir taybetmendiya xwe yê zargotinê bilêvkirin û derxistin pêş. Hinek welatan bi

berhevkarîya zargotinê xwe dewlemendî û taybetmendiyên ziman û civaka xwe derxistin pêş û bi vî rengî azadiya xwe bi dest xistin.

Di beşa duyem de ji bo nasîna zargotina kurdan ji xeynî folklornasên kurd, me cih da fikir û ramanên lêkolîner, mîsyoner, gerzanên ji gelê din jî. Bi kurt û kurmancî gerzan, lêkolîner û mîsyonerên ku bi awayekî rêya wan bi Kurdistanê ketine hemû jî dewlemendiya zargotina kurdan destnîşan dikin û li hember vê dewlemendiyê dimînin heyirî. Herwiha di encama lêkolînên xwe de me dît ku berhevkarî û lêkolînên li ser zargotina her gelekî folklornasên wî gelî bi xwe kirine; lê belê vê yekê ji bo civaka kurdan meriv nikare bi lêv bike. Ev xebat hê di serdestpêka sedsala 18. de ji alî *Mesrop Maştos* (1711) ve, Mauriziyo, Garzoni, Pallas, Heratio Southgate, Moritz Wagner û yên ve mayîn tên kirin û yên mayîn jî vê yekê berdewam dikin. Bi saya van kesan û xebatên wan gelek berên zargotinî tên berhevkirin û ji wendabûnê xelas dibin. Bi gelemperî ev xebat li zanîngeh û pirtûkxanêyên welatên cur be cur de tên parastin. Divê li ser van berheman xebatên akademîk bînin kirin û ji bo xwe gihandin û sîdwegirtina xwendevan û lêkolînerên kurdan derfet bînin amadekirin.

Her cûreyeke wêjeyî, zargotinî ji alî têşê û naverokê ve xwedî taybetmendiyê cihê cihê ye. Bi gelemperî cûreyên pexşanî yên ku bi bûyeran xemilandî ne, ji ber pêkhatina bûyeran weke destpêk, geşedan û çareserî tên binavkrin. Me jî çîrokên kurdan ji ber pêkhatina bûyeran û bikaranîna zûgotinokan di van sê beşan de nirxandin. Di encama vê nirxandinê de me dît ku di her beşekê de zûgotinokên bi gelemperî tên bikaranîn pir hindik weke hev in û di hemû çîrokan de weke qalib tên bikaranîn. Di beşa destpêkê de tiştên ku bi hev re alaquadar û ne alaquadar ji alî çîrokbêjan de tên bikaranîn, bi vî rengî çîrok ji rasteqîniyê tên bidûrxistin bala guhdaran bi vî rengî tên kişandin.

Di beşa geşedanê de ligel bûyeran, di zûgotinokan de jî liv û tevgerek heye; di beşa dawî de jî di digel çareserîya bûyeran di qalibên ku tên bikaranîn de jî daxwaza jiyanêke xweş û bextewar heye û her tişt êdî çareser dibe.

Li hemû dinyayê, gelek leheng û nîgarên çîrokan bi navê cuda cuda bînin bilêvkirin jî, peywir û nûnertiya wan her yek in, naguherin. Lê belê li gor her şaristanî û civakê hinek leheng û nîgarên çîrokan û peyvir û remzên wan di hin waran de ji hevdu cuda dibin. Ji ber wê çendê em bi taybetî li ser hin leheng û nîgarên çîrokên kurdan sekinîn.

Weke mînak Xocê Xizir remza qencî û alîkariyê ye, Pîra Hût di hemû çîrokan de bîna mirovan seh dike û goştê wan dixwe; ango lehengek, dema xirab, an qenc be di hemû çîrokan de remza wî her yek e, naguhere.

Taybetmendiye her civakê ji hevdu cuda bin jî ev mijarên navborî yên hemû mirovahiyê ne, hevpar in. Ji ber wê çendê rol û rista gelek lehengan di hemû çîrokan de bi gelemperî wek hev in û naguherin. Di xalên esasî de guherînên pir beloq tunebin jî; bivê nevê cudahî û teybetmendiyan her kom, civak û neteweyê hene û ev taybetmendî jî li gor xwe ne. Ji ber wê çendê em di beşa sêyemîn de, li ser hin lehengên çîrokên kurdan rawestiyan. Di çîrokên kurdan de lehengên wek Keçelok, padîşah, diz û hwd derdikevin pêş û me taybetmendiyan van lehengan bi kurtasî destnîşan kirin. Me di encama vê lêkolîna xwe de dît ku her civak li gor erdnîgarî û pêdiviyên xwe lehengan diafirîne û hin taybetiyan li wan bar dike.

Herçend di çîrokan de hemû bûyer li der û dora lehengan biqewime jî, leheng ne xwediyê rih keseyetekî cuda ne. Bi tu derî, bi tu kesekî; yan amûr û alavekî ve ne girêdayî ne. Mîna karmendekî bi tenê peywirê ku hatibin dayîn; rol û rista ji bo wan hatibe diyarkirin pêk tînin, bi tenê karê xwe dikin. Di çîrokên kurdan de Mîrza Miheme bi jirîtî, zanîn, û wêrekiya xwe derdikeve pêş. Di hinek cihan de wek keseyeteke cuda û xwedî vînekî derdikevin hemberî me. Ji alî ziman û vegotinê ve çîrok ji berên zargotinî yên din gelekî cudatir in. Di serî de zûgotinêkên ku di hersê beşên çîrokan de tînin bikaranîn zimanê çîrokê ji berên din cuda dike. Herwiha hertim şêwazeke razber a çîrokan heye. Bi alîkariya vê şêwazê asoya çîrokan berfirehtir dibe.

Di nava civaka kurdan de bi taybetî dayîk bi gelemperî jî hema gelek kes dikarin ji we re çîrokekê dudoyan bibêjin. Lê belê ev kes ne çîrokbêjên esasî ne ziman û vegotina wan jî ne pir wisa serkeftî ye. Lê bi qasî ku me di qada berhevkarîyê de dît çîrokbêjên esasî ne wisa ne, bikaranîna wan a zimên û jest û mîmîkên xwe pir baş bi kar tînin û vegotina wan pir serkeftî ne. Ji ber wê çendê heta ku mecala berhevkarîyan hebe divê çîrokên xwe ji devê çîrokbêjên serkeftî bigirin. Çîrokbêjên esasî dikarin ji we re 40 an jî 40î zêdetir çîrokan vebêjin. Herçend di qada berhevkarîyê de em rastî çîrokbêjên esasî hatibin jî, her ku diçe çîrokbêjên esasî ji ber pêşketina teknolojiyê û bişaftinê kêmtir dibin.

Kesên ku berê xwe bidin zargotina kurdan bivê nevê dê rastî saziya dengbêjiyê werin. Îro roj di nava civakê de wateya dengbêjiyê bi tenê bi stranbêjiyê ve hatiye girêdan. Lê di esasê xwe de dengbêj nûçegihan, dîrokzan, dastanbêj, çîrokbêj; bi kurtasî rewşenbîrê gelê xwe ne. Li ser vî esasî me di qada berhevkarîyê de dît ku hema hemû dengbêj dikarin çend çîrokan vebêjin. Heta di nava civakê de navê hinek dengbêjan bi çîrokbêjiyê re tê xwendin. Ji alî bikaranîna zimên û hûnandina çîrokan ve jî dengbêj gelekî serkeftî ne. Ji ber wê çendê dengbêj çavkaniyên çîrokan ên esasî ne.

Her zanistek li gor xwe rê û rêbazên wê hene. Zargotin jî êdî li seranserê cîhanê di vî warî de zanistek bi serê xwe ye. Di qada zargotinê de jî berhevkarî beşeke bi serê xwe ye. Bi xwendin û lêkolîna berheman, me dît ku berhevkarîyên ku hata niha hatine kirin, hinek ne tê de bi gelemperî ji alî dildaran ve hatine kirin û gelek ji wan ne li gor pîvanên berhevkarîyê ne. Di vê beşê de bi taybetî em li ser qonaxa plansazî ya berhevkarîyê sekinîn. Li gel wê me cerebeyên xwe yên qada berhevkarîyê û zahmetiyê ku derdiketin pêş me, me kurtasî parve kirin. Di nava civakê de me dît ku bi taybetî gelek kesan girîngiya çîrokan fêhm nekirine û çîrokan wek derew bi nav dikin; bêguman ev nêrînên bi vî rengî bandoreke neyînî li ser çîrokbêjan jî dike. Ev encam jî zor û zahmetiyên gelek mezin li hember berhevkarîyan derdixe.

Di berhevkarîyê de me dît ku herçend zargotina kurdan pir dewlemend be jî; lê ji ber ne bikaranîna zimanê kurdî û pêşketina teknolojîyê êdî gelek kes girîngiyê nadin çîrokan, qedir û qimeta çîrokbêjan nagirin. Bi vê mijarê ve girêdayî gelek çîrokbêj bi salan wê derfetê nabînin ku çîrokên xwe ji civakê re vebêjin. Ji ber vê çendê gelek çîrokbêjan çîrokên ku berê gotine ji wan gelek ji bîr kirine.

ÇAVKANÎ

Aisopos, (2010). *Hemû Çîrokên Ezop*, (Wer: Î. O. Çokana), Stenbol: İş Bankası.

Akyol, H. (2008). *Mamê Rovî*, Stenbol: Weş. Do.

Akyol, H. (2002). *Mîrza Miheme û Çepik Ehmed*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Akyol, H. (2018). *Bedihê Zeman*, Ankara: Weş, J-J.

Akyol, H. (?). *Kew û Kew*, Stenbol: Weş. Do.

Amedî, S. B. (2013). *Folklor Kurda*, Amed: Weş. Lîs.

Artun, E. (2010). *Türk Halkbilimi*. (Çapa 6), İstanbul: Kitabevî.

Aslan, Ş. (2006a). *Biwêj*, Amed: Weş. Söz.

Aslan, Ş. (2006b). *Gotinên Pêşyan*, Amed: Weş. Söz.

Asutay, H. (2013). “Çocuk Yazınının Fantastik Dünyası: Masallar” *International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 8/13 Fall, Ankara.

Atak, M. Ali, (2013). *Gulgamış Destanı*, İstanbul: Anonim Yayıncılık.

Atti, H. (2013). *Lêkolîneke Folklorî Li Ser Mem û Zînê*, Teza Lîsansa Bilind Ya Çapnebûyî, Zanîngeha Mardin Artûkliyê: Mardin.

Bahaeddîn, S. (2013). *Folklor Kurdi*, İstanbul : Lîs

Bascom, W. R, (2006). “Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar” C. 1. *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), Ankara: Geleneksel.

Bascom Willam, R. (2005). “Folklorun Dört İşlevi” C. 1, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır) Ankara: Geleneksel.

Batur, S. (1998). *Türk Halk Edebiyatı*, İstanbul: Altın Kitaplar.

Bayrak, M. (2002). “Navê Cot Standardiyê Kurdubesk: Bi Cevherê Xwe Kurd, Bi Gotinên xwe Tirk ”, *Mûzîk Dans û Şarqiyên Kurdî*, Özge: Ankara.

Bedirxan, C. (1932). *Kovara Hawarê*, Stenbol: Weş. Belkî.

Beğîk, M. (2018). *Reso Şahê Dengbêjan*, Stenbol: Nubihar.

Bazancir, R. “Sibirya’dan Bir Masal Anası.” *İstanbul: Üsküdar Üniversitesi SBD*, Hej, 51.

Beydaba. (2011). *Kelîle û Dîmne*, (Wer. Ji bo Kurdî, Ali Karadeniz, Çapa Duyem), Stenbol: Nubihar.

Boratav, P, N, (1913). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, İstanbul: Tarih Vakfı.

Boratav, P,N. (2000). *Tekerleme*, Ankara: Tarih Vakfı.

Boratav, P, N. (2013). *Halk Edebiyatı Dersleri*, Ankara: Tarih Vakfı.

Bozarslan, M.E. (2008). *Baxçê Ziman*. C. 1, Amed: Weş. Deng.

Bozarslan M, E. (2011). *Ferhengê Kurdi*, C. 1, İstanbul: Weş. Deng.

Celîl, O, Celîl, C. (2013). *Zargotina Kurda*, Amed: Weş. Aram.

Celalî, M. (2018). *Kovara Nûbiharê*, sal 26, C. 21: İstanbul. Weş: Nûbihar.

Cindî, H. Evdal, E. (2008). *Folklorê Kurmanca*, Stenbol: Weş. Avesta.

Cindî, H. (2014). *Hikayeted Cemeata Kurda*, C. 1. Stenbol: Weş. Rûpel.

Çağlar, B. (2014). “Vladimir Propp’un Masal Anlatısı Perspektifinden İnterstellar Filminin İncelenmesi” Antalya: *Akdeniz İletişim Dergisi*.

Çobanoğlu, O. (2012). *Halkî Bilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, (Çapa 6.). Ankara: Akçadağ.

Degh L. (2005). “Masal Anlatıcıları”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, C. 2,

(Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır). Ankara: Geleneksel.

Degh L. (2006). “Halk Anlatımı” *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), Ankara: Geleneksel.

Dorson, M. R. (2017). *Folklor û Teoriyên Folklorê yê Îroyîn*, Stembol: Weş: Avesta.

Dorson, M.R. (2011). *Günümüz Folklor Kuramları*, (Wer. Ji bo Titkî: Selcan Görçayır, Yeliz Özay. Çapa 2.). Ankara: Geleneksel.

Dost, J. (2010). *Adet û Rûsûmatnameê Ekradiye*, İstanbul: Nûbihar.

Dundes A. (2005). “Halk Biliminde Çalışma Yöntemleri”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, C. 2. (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), Ankara: Geleneksel.

Dundes, A. (2005). “Folklor Nedir” (Wer. ji bo Tirkî, Gülay Aydın), *Milli folklor Dergisi*, Hej. 65.

Ekici, M. (1998). “Halk Bilimi Çalışmalarında Metin (Text), Doku (Texture), Sosyal Çevre ve Şartlar (konteks) İlişkisinin Önemi”, *Milli Folklor*, Hej. 39.

Ekîncî, H. (2013). *Dengbêjî*, Stenbol: Weş. J-J.

Eliade, M. (2001). *Mitlerin Özellikleri*, (Wer. Bo Tirkî, Sema Fırat), İstanbul: Weş. Simavi.

Evig, Ê, (2005). “Halk Masalı Özerine: Halk Masalı Araştırmaları ve Derlemeleri” *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), Ankara: Geleneksel.

Farqînî, Z. (2010). *Ferhenga Tirkî- Kurdî* (Çapa sêyem), Stenbol: Weş. Zend.

Ferheng.org/tr/ stranbêj.com, 19.01. 2018.

Fîrdevsî, (2013). *Şahname*, (Wer: ji farisî bo Tirkî: Prf. Necatî Lugal), Stenbol: Kabalcı.

Goldstein, K. (1977). *Sahada Folklor Derleme Metodları*, (Wer. Ji bo Tirkî Ahmet E. Uysal), Ankara: Kültür Bakanlığı Milli Folklor Dairesi Yayınları.

Gultekin, M. (2013). *Zargotina Serhedê*, Stenbol. Avesta.

Hîkmet, B. (2016). *Teoriyên Folklorê*, İstanbul: Lis.

Kaplan, L. (2018). *Di çîrokên Hîzanê de Motîfa Dê*, Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê Enstîtûya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Wan.

Kaya, D. (1999). *Anonim Halk Şiiri*, Ankara: Akçağ Yayınları.

Samuel, N. K. (2014a). *Tarih Sümerlerde Başlar*, (Wer. Ji bo Tirkî. Hamide Koyukan), Stenbol: Kabalcı.

Samuel, N. K. (2014b). *Sümer Mîtolojîsî*, (Wer. Tirkî. Hamide Koyukan), Stenbol: Kabalcı.

La Fontaine, (2012). *Çîrok*. (Çapa. 7) Stenbol: Türkiye İş Bankası.

Lescot, R. (2013). *Memê Alan*, İstanbul: Avesta.

Lûthî, M. (2005). “Masalların Efsane, Menkıbe, Mit, Fabl ve Fıkradan Ayrılan Yönleri”. *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar, C.1.* (Edit, Oguz Öcal, Selcan Gürçayır). Ankara: Geleneksel.

Meretowar, A. (2017). *Huseynê Farê*, Stenbol: Wardoz.

Oğuz, Ö. M. (2004). “Destan Tanımı ve Eski Türk Destanları” *Milli Folklor*, Sal, 16, hej. 62.

Öncü, M. (2014). *Çîrokên Efsaneyi*, Stenbol: Weş. Nûbihar.

Özgun, Ö, Ekinci, İ. (2001). *Kovara Rengîn*, Stenbol, Hej, 5.

Örnek, S.V. (2014). *100 Soruda İlkelerde Din Büyü Sanat Efsane*, Ankara: Bilgesu.

- Pertev, R. (2008). *Zarok û Çîrok*, Stenbol: Weş. Dozê.
- Propp, V. (2011). *Masalın Biçimbilimi*, (Wer: Ji bo Tirkî, Mehmet Rıfat, Sema Rıfat) İstanbul: BFS.
- Propp, V. (1998). *Teorî ve Tarih*, İstanbul: Avesta.
- Price, B. (2011). *Kelt Mitolojisi*, (wer. Ji bo Tirkî, Cumhuriyet Atay). İstanbul: Kalkedon.
- Ricq, P. Sagart, L. Dehaene, G. Lestienne, C. (2013). *Dilin En Güzel Tarihi*, (Wer: Sema Rıfat). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
- Rojhilat, J. (2015). “Folklor û Belavbûna Folklorê” *Kovara Folklorê Kurdan*, Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin, Amed.
- Rojhilat, J. (2015). “Gotinên Pêşyan û Biwêj” *Kovara Folklorê Kurdan*, Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin, Amed.
- Sadini, M. X. (2012). *Pêkenok*, Stenbol: Weş. Nûbihar.
- Sağlam Y, M. (2001). “Atasözleri ve Deyimlerde İmgelem” *Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*, C. 18. Hej. 1.
- Sağınç, F. (1999). *Çîrokên Kurdî*, (Çapa Duyem), Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Saydow, C.W, V. (2005) “Coğrafya ve Masal Ekotipleri”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*. (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), C: 2. Ankara: Geleneksel.
- Serhedî, M. (2016). *Kêço*: İstanbul: Wardoz.
- Şenesen, R. (?). “Şahmaran Lokman Hekim ve Adana Efsaneleri” *Çukurova Üniversitesi Türkoloji Araştırmaları Merkezi*, Adana. (Alıntı: turkoloji.cu.edu.tr/CUKUROVA/makaleler/32.php)
- Tülücü, S. (2004). “Binbir Gece Masalları Üzerine” *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Hejmar: 22, Erzurum.

Tüm, G. (2010). Atasözlerinin “Değişik Kültür ve Dilleri Anlamadaki Rolü” *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 5/4 Fall*.

Üzgun, Ö, Ekinci, İ .(2001). *Kovara Rengin*, Hej, 5. İstanbul.

Von Saydow, Ç,W. (2005). “Coğrafya ve Masal Ekotipleri”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar*, (Edit: Oguz Öcal, Selcan Gürçayır), C: 2. Ankara: Geleneksel.

Yavuz, M. (2013). *Diyarbakır Efsaneleri*, Ankara: Egîten Kîtap.

Uçak, S. (2010). *Ulusal Öğretmenim Sempozyumu Bildiriler Kitabı*, İstanbul.

Yıldırım, N. (2015). *İran Mitolojisi*, İstanbul: Pinhan.

Yıldırım, K, Pertev, R. Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, İstanbul : Weş. Zanîngeha Artuklu, Mardîn.

Yılmaz, A. (2012). “Çocuk Eğitiminde Masalın Yeri. (Binbir Gece Örneği)” *SDÜ Fen-Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Hej.25. Süleyman Demirel Üniversitesi Isparta.

Zinar R, (2011). *Kaniya Çîrokan*, Weşanên Şaredariya Mêrdîn: Mêrdîn.

Zilan, R, Aslan, H, Tigris, A. (1996). *Ji Zargotina Kurdî*, Stenbol: Zend.

PÊVEK

Çend Mînakên Çîrokên Ku Ji Herêma Amedê Hatine Berhevkirin

1. Serxweş û Bengî

Carekî hebû ji caran rehmet li dê û bavê û hazir û guhdaran. Serxweş û Bengî hebûn. Serxweş mezîne mala xwe û cîhê ku teda bû. Heger şehîr be, heger gund be, çî be tê da bû êhlê wî bûn, yano zengîn bû û Bengî jî xûlamê wî bû. Ji xwe ra di keyfa xwe da bûn. Ê wê çaxê ref û neçîr ê keyfê bû.

Çûne ref û neçîrê li çola, dibê rojekî çûn neçîrê û xezalekî ji peşîya wan rabû, dane ser piştê xezalê. Ha li wî alî, ha li wê alî, ha wî alî. Bû êvar, Xezalê negirtin. Tarî kete erdê, xezal ji ber wan hinda bû. Serxweş got, Bengî ew xezal jî ez zanim miheqak betiliye. Ew ê ji vê mewkiyê der nê. Feqet dibê ez nayê, ez nayê, ez ê li vir bim. Tu here malê. Tu here emanetê, miqatê malê û mîlletê bibe. Ez ê bidim dû wê xezalê û pê wê herim. Heger ez hatim tu nika malê min, milkê min, sultanata min ji min bistîni û wexta ez nehatim li te xweş helal be, wekî şîrê diya te be mal û milkê min tu çî dixwî, çî dikî tu serbestî.

Bengî kir nekir, got heyran dev jê berde xezala çolan e mirov nizane, mirov dixapîne li pê xwe. Got na, na weleh ez nayê. Li ber min bûye meraq, ez wê xezalê gerek bigrim. Xatir ji hev xwestin. Bengî vegeriya hat malê, Serxweş jî li wir serê xwe danî û raza. Serê xwe danî raza, sibeh zelal bû, rabû ka kahwaltiya⁸ wî çî bû kahwaltiya xwe xwar û der û dora xwe xist û xezal dîsa li ber wî rabû. Eynî xezal dîsa li ber wî rabû, car viya da ser piştê wê.

Dîsa wî bir û çû, li pê çû heta reşîkê mixribê pê çû. Roja dudûya jî ket erdê, bû tarî ji ber hinda bû. Hinda bû, dîsa serê xwe li wir danî û got bi Xwedê ew jî betiliye aniha li wan dera ye, ew hê neçûye. Ew jî serê xwe danî buye serê sîbê ya Allah ya Xwedê fitarekê xwe kir. Nan bû êdî çî hebû pêra zawadê wî, xwar û li hespê xwe siwar

⁸ Kahvaltî: peyv bi tirkî ye, taştê.

bû. Çawa tûrê⁹ lêxîst Xezal hat. Dîsa xezal rabû, dîsa xezal rabû qonaxa sisîya li pê xezalê ye, evar e, êdî hema hema reşika mixirbê ye. Xezal got gurm û ket şikevta pêşiya wî. Ew jî li ber derî, li ser piştâ hespê ma. Ê de sê rojan li ser piştâ hespê pê Xezalê tê betilandî û bê xew e. Û wîsa li ser piştâ hespê dibêje wellehî xezala min ket ev şikefta hanê, ev ê ji vê şikeftê ev der nê. Ew jî li ber derê şikeftê ser piştâ hespê çima di xew da neçû.

Piriyeke betilî û ji hev da ketiye, di xew da çû. Carekî çavên xwe vekir û got: xezala min ketiye vê şikeftê û ew jî dikeve wê şikeftê, li dora xwe mêzedike; hayloo, dora wî tije millet e. Li ser textekî li nav nivîna ye, cîhê wî wîsa xweş e. Û bala xwe daye ku yek legan dest wê da ye, yek sabun dest wê da ye, yek misîn dest wê da ye, yek li ber serê wî rûniştiye. Ê ku li ber serê wî rûniştiye, jê ra got kurê min Xezala te cîhekî da neçûye li vir e. Nebê ê ber serê wî bavê xezalê ye. qîza mîrê cina ye. Wiya mat ma ji xwe ra sekiniye. Got ev çi hal bû anaka ez di xew da bûm. Çavê min vekiriye, bi xwe ez şiyarim, di nava nivîna da me, way dora min wiha ye.

Got kurê mîn rabê, dest û serçavên xwe bişo, nanê te hezir e, em nanê te bînin. Dibê viya anikayî rabû dest û serçavên xwe şuşt nanê wî anîn hatin, nanê xwe xwarin. Bêhna wan derket, got keko tu çî kesekî, vira ku derê ye?

Dibê kurê min ez bavê Xezalê me. Go Xezal ne Xezala koviya çola bû. Go qîza min e. Go ez mîrê cina me û Xezal jî qîza min e te pê xwe anî ye. Dêmek kî dilê wê li ser te heye te pê xwe anî. Viya disekine duşunca¹⁰ dike ev hurmetekî jê ra dikin yekî leganê girtiye, yekî misînê, yekî sabûnê anî, danîne ber serê wî, nanê wî hezir kirine di nava xwe da ewqas vê qiymeta danekê.

Got welleh Xezal qîza te be ez wê nabim. Hey aman zeman tu çima nabî kurê min? Destê kesî nakeve, destê te ketiye tu dibêjî ez nabim. Got welleh Xezal qîza te bi ez wê nabim. Xezal hate ba wî got Serxweş, ma ez etiriya te keti bûm, ew qasî welat min te pê xwe anî ji bo xatirê şehveta te û rindiya te û bedeviya te halê te dilê min hat ba te. Min te pê xwe aniye ji bo xwe û sê roj sê şev e tu li pêy min î, ez bi pêyatî hatim tu li hespê siwar î. Go, tu fedî nakî tu dibê ez tê nabim?

⁹ Tûr :tûr avêtin gerîn, peyase kirin.

¹⁰ Düşünce: peyv bi tirkî ye, hizirîn, fikirîn.

Go, tu bimrî jî tu qîza mîrê cina bî ez te nabim. Hey aman zeman, ji bona Xwedê kirin nekirin got na. Xezal, got Serxweş nê tu yê poşman bibî feqat dîsa jî min te ewqas cîha anî, em ê qencyek din jî bi te bikin.

Bavê Xezal got lawo madem kî tu qîza min nabî ev hevûzek li navsera çiyayekî heye salê carekê sê hep qîzê periyan hene derin di wê hewûzê da dikevin nav avê em ê vê qencyê jî bi te bikin. Madem Xazêlê te dayî dû xwe û ew qas cî aniyê. Gava ku em ê te bibin cihê wan em ê bibên wiha ye wiha ye... Em ê te bi cî bikin, feqat em nikarin li wir bisekinin çimkî ew perî nin em cin in. Em ê te li wir deynîn. Waxta ku ev salê carekî tên û dikevîn nav avê. Waxta şelhikê xwe ji xwe kirin weka sê kevoka ne, wekî sê kevoka tên xwe li ser li hewûzê datînin, şilhikê xwe ji xwe dikin, dibine qîz, cilê xwe ji xwe dikin li wir datînin û dikevin hewûzê. Dikevin hewûza xwe, gava ji hewûzê derdikevin radibin cilê xwe li xwe dikin, şelhikê xwe li xwe dikin, difirin û diçin.

Serxweş a got welleh ev dibe. Got ev bila be, lê Xezal na. Xezal got tu zilmê bi min dikî, te dîlê min şikand de îja tu zanî. Tu yê rojekî hewcê ber vî destê bibî taxmîn dikim; lê îcarê ew ê îşê te ê zor be. Dibê roja wî çî roj e, wî dibin. Roja wî tê roja beriya wê wî dibin wê derê. Dibêjin hewûz ev e, ew ê werin wê derê şelhikê xwe ji xwe bikin, sê kevok in. Ew ê şelhikê xwe li vir deynin cilê xwe deynin serê, ew ê bikevin vê hewûzê. Gava ew ketine vê hewûzê tu cila bîne ba xwe. Ji her sêya kîjanê biqefilînê ferq nake. Ê hebekî cilê wê bîne ba xwe cilê wê bide yalniz¹¹ tu şilhikê nedê. Got tamam û wana wî birin ew ê anikayîn li wê derê bi keys kirin berdan nava hewuzê forsa xwe çêkir xwe şeh kir. Wana hatin û ew tenê ma li wir.

Wiya carekê bala xwe dayêkê saeta wan hatî û her sê kevok hatin. Her sê kevok hatin ser hewûzê xwe danîn li dora hewûzê çûn hatin, çûn hatin. Xwişka piçuk ji her duyê mezin ra dibêje bêhna însanan ji vir tê. Em nekevin hevûzê û wan jî ji xwişka xwe ra gotin, a xwişka min va çendik û çen sal e em tên ser vê hewûzê li vir dikevîne avê însanet li vir çî digerin. Hey kir û nekirin got bêhna însanate tê em nekevinê. Welleh rabûn û firiyan, neketinêkê û firiyan çûn. Cilê xwe ji xwe nekirin, şelhikê xwe ji xwe nekirin û firiyan çûn.

¹¹ Yalniz: fakat, bêjeyeke tirkî ye, lê belê.

Dibê bû êvar wana hatin bavê Xezal û meriyên Xezal hatin. Hatin Serxweş li wir dest vala ye. Got Serxweş got ha, got qey tu dest valayî? Got welleh dest vala me. Got qey nehatin?

Got belê welleh hatin. Êêê got qey neketine hewûzê? Got na welleh neketine hewûzê. Got hatine danîne, çûne hatine, gotiye bêhna însaneta tê neketine. Got welleh tu mayî heta saleke din vê çaxê. Wî hılanîne birine şikeftê, ma li ba wan. Heta ku sala wî dewr bike.

Sala wî dewr bû dîsa wî girtin bi eynî şeklî gotine mêze em ji te ra dibêjin. Kîjan tu biqefline ferqa wan ji hev tune ye. Sê hep xwişkê hev in. Ew dîsa kete kozika xwe wana lêxist û hatin. Bû zemanê saeta wan her sê kevok dîsa hatin. Hatin ser hewûzê danîn, dora wê çûn û hatin xwişka piçûk got xwişka min ji min ra dîsa bêhna însaneta tê.

Got ez bim em nekevinêkê, her du yê mezin je ra got ma çima bêhna însaneta naye me, ma hev tê bi te tenê. Em par jî neketinê, îcar jî em nekevinê em ê gurî bibin. Welleh tu dikevî nakevî tu zanî em ê bi xwe bikevinê. Got aviya kir nekir evê din gotin em ê têkevinê. Ev her du ketinê viya neketê. Dibê Serxweş jî sond xwar dibê ne şelhişkê te be min ê wan negirt. Ne tu bî min her du yên din negirt. Ew ketin hewûzê. Ji hewûzê derketin, şelhişkê xwe li xwe kirin û her sê bi hev re firyan çûn.

Wana hatin bala xwe danêkê Serxweş dîsa dest valaye. Got Serxweş qey dîsa nehatin? Got belê welleh hatin. Got pekî neketine hevuzê? Got welleh ketinê. Êêê got ka? Me ji te ra çî got? Got bi Xwedê hal û hîqayet a wiha ye. Got par jî hatine neketine. Îcar jî her duyê mezin ketinê a piçûk neketinê, min jî ad min got a piçûk nebe ez wanê anikayê nabim. Ê malik ne mîrato cardin ma salek din wê çaxê. Me ji te ra ne got ferqa wan ji hev tune ye. Tu kîjanê bigrî eynî ye. Serxweş dibê way wisa çêbû. Min ad da min gotiye ne ew be ez nabim, nagrim.

Dîsa sala wan din dewr bû, wê zemanê wî birin û çûn. Got binêr wa em ji te ra dibên wisa neke li serê xwe, way îsal du sal e tu li wê derê yî. Tu berdî ev ê here salekî dinê. Way tu zanî salê carek e. Got tamam. Wiya dîsa kete kozika xwe, tê da ma bû zemanê wan, dîsa her sê hatin danîn. Hatin danîn carek din ew a piçûk çû hat, çû hat

got bi xwedê xwişka min bêhna însaneta tê. Got de here lê karê xwe bike te pêrar wisa kir, em neketinêkê te par jî wisa got em ketin û derketin ka çi bû ji me? Got welleh tu dikevî nakevî tu zanî em ê têketinêkê. Dîsa her duyan şilîkê xwe derxist ketinê û a piçûk ma. Wana ketinêkê rabun cilê xwe li xwe kirin û gotin xwişka min wa tiştêkî tune yî ka li heviya min bisekinin heta ez jî ji xwe ra hinekî bikevimêkê, em bi hev ra herin. Got welleh em li hêviya te nasekinin a bi xatirê te. Her du firyan çûn.

Ev got ez pêrar û par neketimêkê ez ê gurî bibim û wê jî cilê xwe, şelîkê xwe danî wê derê kete hewûzê. Welleh Serxweş rakir cilê wê û şelîkê wê kişand kozikê. Kişand kozikê eva anikayî carekî ji hevûzê derket cil û şelîk tune. Warîn pê ket wê nava hewuzê got aman tu çi kesekî, tu î n î, cîn î, tu ji çi cînsê yî ez mamê tazî. Cilê we avêt ba wê cilê xwe li xwe kir. Şelîk nedayikê.

Ey emman zeman, şelîk nedayikê. Got îsal du sê sal e ez way li benda te me li vira anikayê tu par neketî, pêrar jî neketî, vay min te qefalt. Neyse wê girt, wê girt wana hatin. Wana hatin bala xwe danêkê; ku eee way yek girtî. Got Serxweş hatin? Got erê welleh hatin. Got te girt? Got erê welleh way min girt. Kêfa wan jî hat. Wa anîn hatin bi heft defan û heft ziran daweta wan kirin. Li hev mahr kirin di şikevta xwe da. Xezal kir nekir got Serxweş min jî bibe min te anî wê maqamê min jî bibe. Got weleh Xezal tu qîza mîrê cinanî ez te nabim. Xezalê got Serxweş! Got ha. Got tu îlla hewcê ber vî destê bibî ê îcar wê çaxê tunê bibîn ez ê çi bînim serê te. Got welleh ez wisa zanim way min ji xwe ra adinêkê qefilandiye.

Wiya çend sal e li wir e. Êdî mala wî ji wî bi gûman bûye ku nehatiye. Tabî Bengî li malê ye, li ser tişt, emel û seltanata wî. Tabî Bengî jî xulamekî pir saxlem bûye. Hinek din jî li wê derê man ê wanê anikayî got hûn tedarekê min bikin êdî ez biçim, çimkî milk û araziye min jî hene saray û mîlletê min jî hene, mala min jî heye, ez ê biçim.

Rabûn tedarekê wan kirin çi ji wan ra lazim be hezir kirin, Ya Allah û Ya Xwedê. Xatirê xwe ji wan xwest û çû destê bavê Xezal wan. Pişta xwe da wan. Bavê Xezal jê ra got Serxweş temîna me li te be, sakin sakin sakin,¹² bila şelîk nekeve destê

¹² Sakin: nebî nebî. Peyv bi tirkî ye.

wê. Got şelhik bikeve destê wê, felek bavê te be, tu hew wê dibînî. Got wê bifire û here. Got tamam. Welleh viya, eva anikê avêt pişt xwe û ya Allah ya Xwedê fena bûkekê bi rê bikin, xelat û diyariya wê danêkê û bi rê kirin, xatiran xwest û hat. Wê anîn hatine malê.

Mîletê wî pê hesiyan way Serxweş hat û yekê jî bi xwe ra anî, qîzek e û bi her eşya falan û bêvan. Def û zirne lêket, dawet danîn, mîletê wî tamam kişya hat pêşiyê, şahî kete nava wan anîn li ber derî pêya kirin. Şahiya xwe, kêfa xwe û zewka xwe kirin. Wiya anêkayîn wan cila bir û çû kire nav sindoqê û derê sindoqê radane. Navê wê jî Zîn e Zîna mîra periyan e. Şelhikê dibe dike nav sandoqê devê sandoqê radide û mala xwe jina xwe millete xwe gişa temî dike dibê ev şilhik der nê. Ne qefêle bi qefêle ev ê here. Neyse wîsa devam kirin, pir û hindik dewam kirin dîsa ev û Bengî ketine nav kêf û henekan, ref û neçîr û seydê dîsa ji xwe ra geriyan. Çûn hatin heger salek, heger dudo sebî ji wan hê çênebûye.

Dibê rojêke wana diçe avê, diçe cihekî derê sindoqê vekirî dimîne. Awanê hanikê ne li malê ne Zîn digere çima sindoqê nabîne. Sindoqê dî şelhik derxist û li xwe kir ya Allah ya Xwedê lê xist û çû. Wana hatin li vî alî Zîn li wî alî Zîn, ey waaax... Zîn bû gepek nan û çû. Çûne sindoqê ku sindoq vekiriye. Şilhik ne tê da. Dibê cevabê dane Serxweş û Serxweş hat got ê min ji we ra negot. Gotin heyra way sal lêketin ma bîra merivan tê carkî wê bibe. Got welleh çû.

Got carekê din Serxweş li hespê xwe siwar bû, xatiran ji wan xwest. Şikefta mîrê cinan li kure. Çû ber destê Xezalê. Lê xist û çû. Heger pir çû hindik çû dîsa hatî ber şikefta xwe. Xezal bala xwe dayê ku ehh Serxweş way li hespê siwar bûye way hat. Zane ev filîtiye û dîsa mecbûrê ber derê wan bûye. Guh nedayêkê çû kete hundir û pişt xwe dayê. Zane wê dawiyê here ba wê.

Bavê Xezal wana hatine pêşiyê got Serxweş te xêrê tu hatî, ser çavan ra hatî. Got xêre gidî nebê Zîn filîtî! Serxweş hustiyê xwe xwar kir û got belê weleh filitî. Ê got mal mîrat me ji te ra negot. Me temî li te nekir. Me negot durûm¹³ ev e, ev e, ev e. Gere ev şilhik nekeve desta. Got welleh ne cara em digêjinê, ne jî kes ji me dikare

¹³ Durum: rewş, peyv bi tirkî ye.

here. Ne erê, ne jî ji me kes dikare bikeve mewqiyê periyên. Got welleh bi Xwedê çû çû. Ey emman zeman ji bona Xwedê, hev du birin û anîn.

Xezal li ber xwe got, welleh ez dikarim lê belê min nekî. Bila awa li wê halî da be. Deng çû bavê wê got, qîzam tu çawa dikarî? Em nikarin. Got welleh bawo ez dikarim lê bila awa li wê halê da be. Te dî min çî kir min ev qas welat cî wî anî pê xwe û ji bona xwe û paşî rabû a wiha anî serê min. Got min zanî bû ev ê dîsa hewcê ber vî destê be.

Wana li ber Xezal dan kirin nekî Xezal got tu alaka min jê tunê. Serxweş hat ser pî û destê Xezal çû hat xwe avitêkê. Got Xezal heyran min kir tu nekî ji bo Xwedê. Got tu wîsa nekî. Min kirîy tu nekî. Hey xwe avetêkê. Çû hat Xezal got na. Carekî got ez nakim. Got te dî min çî kir li te û min te gihand çî meqamî tu hat li min a wiha kir. Berê dan diya wê, bavê wê, mileta wê got alaka min jê tune ye. Dikare bila here ji xwe re bîne. Serxweş xwe avêt ser dest û piyê wê got, Xezal tiştek tu bêjî ez ji gotina te der nayêm. Tu çî dikî bike tu destê min û wê bigihîne hev du.

Xezal bala xwe dayêkê ehh êdî çî bêje wê bike. Xezal got Serxweş soz bide min. Gava ku em herin wê bînin ku tu min jî bi xwe ra bibî, em ê hernekê êdî şans e me, me qefalt qefalt. Em ê tiştekî ji milê me bê bi cî bînin. Serxweş dibê Xezal ez xwe qûrbana serê te dikim. Soza Xwedê û peyxamber nava min û te da, ez wê bînim ez heta te nebim ez wê nabim.

Xezal çû ba bavê xwe got bawo. Got ha. Got ka wê gustîlka xwe bide min. Gustîlka bavê xwe jê send, çû ba diya xwe, got dayê. Got ha! Got ka wê gustîlka xwe bide min. Gustîlka diya xwe jî jê send. Got Serxweş haydê, got haydê em herin serserê şikeftê. Hatin serserê şikeftê Xezal gustîlka bavê xwe bada. Bada û du heb efrûtê cina derketin.

Gotin Xezal em dinya xera bikin yan awa bikin. Xezal got ne dinya xera bikin ne jî qe. Got me ada heft behran mewqiyê Zîna mîra periyên daynin. Wan efrûtan her du hilanîn here ku tu nagehî. Çar adê behran derbaz bûn, sê ad man ev ji ser ketin. Ê wana anikê çep bada û kir gustîlkê. A diya xwe bada du efrûtên din derketin gotin Xezal tu çî dixwazî em dinyayê xera kin an awa kin. Got ne dinya xera bikin ne jî awa

bikin me li mewqiyê Zînê mîra periyân ada heft behran daynin. Dibê her du wan hilanîn û avêt ev ada heft behran. Gustîlkê çep bada û her du efrûtê kire şuna wan. Got Serxweş, got ha! Got a ji te ra ev kumê anikayî bi serê xwe ke. Got tu herî nava wan da bigerî çî bikî kes te nabîne. Got ji vira pê da tu zêran jî birjinî ez hindî nikarim werim. Ev ada anikayîn ada wan e, de îcar here bigere. Ez ê li vir bim, ber vê kema dirîyê. Ez ê li vir rûnim kengî te wê dît wê bînê û were. Êdî tu bi çî avayî tînî bîne ez li vir hêviya te me. Ê got tamam. Fekat got mêze te wê qefalt însan haliye tu ketî zevk û sefayê min ji bîr nekî, ez ji vir naçim, ez li vir hêviya te me. Got tamam Xezal ma tu eyb nakî tu ji min ra wisa dibêyî. Rabû kumik da serê xwe, çû geriya geriya geriya. Rojekî du roj mehekî gerîya nav şehre di ku dere nan dixwe xelk tê lê diqelibe. Bala xwe dide bi rastî jî wî nabînin. Wisa digeriya dibê rojekî ara du sokaxe de nav bînyan da êvare jî êdî dema şîvêye jî yekî ji bînyaya¹⁴ wî alî gazî ji bînyaya vî alî dike. Zilamekî gazî dike dibê Zînê qîza min, ka îşev şîva min bû çî tê şîva min nehanî. Go bavo ez vay tînim.

Serxweş sekinî got welleh viya Zîn e, ka ez li vir bisekinim ji wî binahiyê bah vî binahiyê kir. Li wê derê sekinî bala xwe dayê way Zîn hat. Ew e teyfkî li ser destê wê ye. Şîv kutlik in. Kutlik li gorê bavê wê bixwe ser destê wê ne û şîva wê anî. Anî hate kişya Serxweş jî da pê wê. Ev Serxweş nabîne. Da pê, da pê. Li nerdivana çû jor got ha ji te ra şîva te, te me xwar. Te mê gêj kir ka şîva min û şîva min. Got qîza min ez ixtiyar im gune me şîva min tu naynî nade min. Hema serê gotina te û binê gotina te tu dibê Serxweş, Serxweş û Serxweş... Serrxweş go ha hayy demek ev jî ji min poşman bûye. Dengê xwe nake. Ev ya anikayî şîva wî dayekê û derî lêxist û çû. Ev ya jî çû ser sifrê ba wî. Heta ku ev dudo xwar ev jî dudo xwar. Bala xwe daye ku kutlik qediyaye. Dibê carek din gazî Zînê dike. Got heyra hûn îşev gêj bûne çî bûye ji we. Got we şîva min hindik hanî min têr nexwar. Got bawo welleh wekî her şev me aniye. Got her şev we heft heyşt heb dianîn îro sê çar heb bûn. Got welleh min têr nexwar şîvê ji min ra bînin. Carekî din şîvê jê ra anî, dîsa ew qas li ber wî danî û çû. Serxweş dîsa li ber wî runişt. Her du ya jî têr xwar. Şîv qediya gazî kir got qîza min here teyfkê bibe Zîn hat. Zîn hate wê derê Serxweş rakire wê kumika xwe a wiha xwe nîşanê Zîn da, xwe nîşanê Zîn da. Zîn got a ha bawo way Serxweş. Kumikê xwe berda ha vî alî

¹⁴ Bîna: avahî.

ha wî alî got lawo ma tu dîn buyî, tu har bûyî? Got qîza min madem ku tu hikmê anikayî dikî, tu çima terka wî kir û tu hatî? Tu pêra zewiciye jî.

Dora xwe mêze kir Serxeşê çî halê çî îcar kete şermê, fedî kir. Carekî din xeber dan Serxweş dîsa kumê xwe bilind kir xwe nîşanê Zînê da got welleh vay Serxweş. Bavê wê berê xwe dayê pêra xeyidî. Got lawo ji bona Xwedê te kiriye xewnê şevan ji bo me bûye hesret. Tu nahelî em razên ka Serxweşê çî halê çî! Serxweş bala xwe daya ku heger xwe li wan azlû bike û Zînê ji wan bixwaze ewê bidenêkê kumê xwe ji serê xwe kir azlû bû eh welleh Serxweş e. Bavê Zîn jî mêze kir got viya ye Serxweş? Got, ê. Got ê baş e qîza min way li pê te hatiye van deran. Wisa kêf kete nava wan şahî kete nava wan, welleh waye zîlamê wê hatiye pê. Zîn çend sala hatibû me ji qulikê çavan kir hinê got Serxweş û Serxweş daweta wa çêkirin û heft def û heft zirne anîn xweş kirin.

Wiya ket qesr û konaxa Xezal hîç nehate bîra wî. Li wê derê ma. Heft sala li we derê dimîne Serxweş. Got carekî Xezal kete bîra wî, got Zîn got ha! Got welleh hal û hiqayet ev e. Got hevaleyê min heye. Got hevala te kiye Serxweş? Got Xezal e qîza mîrê cinan e. Got wê min anî vê dera. Got em zûda ne li vê derê ne? Got mal mîrat ev heft sale ku tu li vê derêyî. Got wey wey aniha heft salê min qediya ez li vir im. Got ev heft sale ku tu li ba minî em li vê derê gihiştîne hev du zewka xwe dane. Hay te jê tune bû. Got wellehî min gotiye hê hefta me, du roj sê roja me neqediyaye. Min nizanî bû heft salê me ye. Got wellehî li wê derê li hêviya me ye. Got ka Xezal heye heft sal? Got welleh em ê herin. Got welleh ne Xezal be em ê çawa herin? Dibê wana anikayîn hatin.

Rabûn tedarekê xwe kirin êdî eşyayê¹⁵ wan hebû tune bû. Zînê Xatirê xwe ji diya xwe, bavê xwe, milletê xwe xwast ew û Serxweş hatin. Hat hat ber wê kema Xezal li ber bû. Hatê ber wê kema diriyê bala xwe dayêkê, tedî berê lawir pûrta xwe diweşand îcar şûna wan dima. Ew pûrta zêde salê carekê xwe teze dike. Bala xwe danê way pûrta Xezal li wir e Xezal ne li wir e. Serxweş li xwe xist û bû barîna wî got eywaaax eywax! Got eve anika hestî jê nemaye pûrta wê li vir e û Xezal ne li vir e. Li wî alî li wê alî geriyan çûn ber kemekî din. Mêze dikin way destek pûrt li wir heye. Kema çara pênc

¹⁵ Eşya: alav, amûr.

şeşa hefta. Çûne ku way Xezal pûrta xwe berdaye xwe nû kiriye we rabe xwe degîş¹⁶ bike. Wana tê da derketin Xezal wiha li Serxweş nêrî, kenîya. Got Serxweş, got ha! Got maşallah te ne hîşt heft roja te biqede tu çiqas zû hatî lo! Got Xezal qe bahs neke. Got bine way tu belki li ji şopa min, hatî ne wisa? Got ê, got ez zanim welleh heft sal e. Got binêre min bi cî cî bizanibe min terka te nedayî dîsa. Got ew heft sal e ez li hêviya te me, tu jî di wê derê da kêfa xwe da yî. Got Xezal tu çi dikî bike tu a min î. Ez Zînê li vir bihêlim jî, ez heta te nebim wê nabim.

Welleh rabûn, rabûn tederekê xwe kirin, ew Zîn û Xezal. Xezal dîsa carekê da gustîlka bavê xwe bada. Efrûtê wanê cinan derketin. Got me li ada heft behran deyne. Sê çar ada derbaz kirin carekê wan li wir danîn. Ew betilînîn wanê anika avête gustîlkê. Gustîlka diya xwe bada dudo jî ji vir derketin. Gotin Xezal em dinyayê xera bikin ava bikin tu çi dixwazî. Got ne dinyayê xera bikin ne ava bikin. Got me ada heft behran deynin. Wan her sêya anin ji adê derbaz kirin. Anîne serserê şikevtê danîn.

Şahî kete nava wan. Got welleh way Serxweş û Xezal hatin, Zîn jî anîn. Kêf û şahî kete nava cinan kêf kirin hatine peşî. Li wê derê dîsa heft def û heft zirna anîn daweta wî û Xezal jî kirin. Xezal jî lê mahr kirin bavê Xezal wana. Ka çi qas indî li wir man. Bêhna wan derket bêhna wan fireh bû. Got welleh îcar hûn tedarekê me bikin em ê herin malê. Wana anikayîn rabûn dîsa tedarekê wan kirin. Wan anikayîn jî ji wan xatirê xwe xwestin, lê xistin hatin. Bi hefa gundê xwe ketin millet pê hesiya got way Serxweş hat û dudo pêrane îcar. Millet hat pêşiya wan tevê Bengî û diya wî û bavê wî, milletê wî. Wisa kêf û şahî kete nava wan. Li wê dere jî daveta wan li darêxistin. Kêf û zewq û safa kirin, nanê xwe û her tiştê xwe bicî anîn wekî dawetan.

Dibê rabûn ew Bengî, Xezal û Zîn gihîştîne hev du. Bengî got Serxweş tu ser çavên min ra hatî. Tu min ji ber bela wê malê, wê halê derxistî. Lawo ma min nizani bû ez çawa bikim. Axirê baş e way tu hatî. Got way tu yeka dinê jî aniye. Got Bengî viya anikê ev Xezala ez û te em çûne nêçîrê ji ber me rabû, min da piştê. Du roj çûm roja sisêyan gihîştim şikevta wan. Min birin çûne ber hewûzê. Got min wê qayîl nebû min nehanî. Got min Zîna mîra periya anî wê nanî, dîsa hewceyê ber destê Xezal bûm. Got welleh min dîsa lêxist ez çûm ber Xezal. Me kir nekir Xezal nedihate rê. Axirê me

¹⁶ Değiştirme: guherandin. Peyv bi tirkî ye.

soz bi wê ra jî da û way em hatin. Êdî ew dîsa bû serokê mala xwe. Xezal û Zîn her dû jî bûne pîrekê wî. Êdî şil hik mil hik îcab nekir. Êdî li wê derê man.

Xwedê tuela miradê wan li wir kir, ê me jî li vir bi îman ke.

Çîrokbêj: Qutbetînê Farqîn

Sal: 71

Dîroka Berhevkariyê: 05.10.2018

Herêm: Amed- Farqîn

Xwendina wî: Nexwenda

Cihê tomarkirinê: Li ber çemê Dijleyê.

2. Hesenê Kilindar û Şahê Maran

Hebû û tune bû go seydvane kî hebû. Navê wî Hesenê Kilindar bû. Hesenê Kilindar, her sal li buharê cilika tajiye xwe li piştê dikir û diçû seyde û bi rojan nedihat malê. Hesenê Kilindar dema ku ji seyde vedigeriya mal, der û cîran dihatin lê dibûn mêvan, civat digeriya û hal û hewalên gundên li der û dorê ji Hesenê Kilindar dipirsîn.

Hesenê Kilindar, wê salê jî seyda xwe kiribû û ketibû rêya malê. Di rê de li ser kaniyekî av vexwar û hinekî bêhna xwe veda. Piştî ser û çavên xwe şuşt û bala xwe dayê ku du heb mar li hev piçikî ne. Marê yek, mahrek kesk û xweşik bû, mahrê din mahrekî reşê keftarî bû. Hesenê kilindar, kevirek girt û got:

Ev î mahrê reşê keftarî, çima xwe li vê mahra xweşik pêça yî?

Çaxa ku kevir avêt, kevir çima neçû li serê mahra xweşik neket. Hesenê Kilindar pir li ber ket. Tu nabêjî qey ew mahra xweşik, qîza şahê mahran bû. Şahê mahran jî pê hesiya ku Hesenê Kilindar, serê qîza wê şikandiye. Şahê mahran, gazî du mahrên li ber destê xwe kir û got:

“Divê hûn a niha herin mala Hesenê Kilindar û hûn ê bikevin sola Hesenê Kilindar. Piştî ku şev pîr bû û civata wî belav bû, ew ê Hesenê Kilindar here ser avê. Hûn ê jî wê çaxê bi nigên wî ve bidin û wî jahrdayî bikin.”

Piştî ku Hesenê Kilindar hat mala xwe, êvarê civat geriya, heta derengê şevê û her kesê ji Hesenê Kilindar li ser hal û hewalê dinyayê û dinyaligê tiştekan dipirsî. Lê kêfa Hesenê Kilindar tûne bû ji ber ku serê wê mahra xweşik şikandî bû. Civatê jî fam kir ku kêfa Hesenê Kilindar tûne ye, jê pirsîn û gotin; "Hesen! Xêr e, wer mirov dibê, qey kêfa te tune ye?"

Hesenê Kilindar jî got; "Hal û hewal ev e, piştî ku min seyda xwe qedand, ez ketim ser rê û ez çûm ser kaniyekî. Min li ser kaniyê bala xwe dayê û mahrekî reşê keftarî xwe li mahrekî keskê ku mirov qêmiş nabe ku li mêze bike, piçikandî bû. Min jî kevirek girt ku ez li wî mahrê reş xim; ji bo ku ji wê mahra xweşik biqetînim, lê kevirek min bi xeletî çû, li serê wê mahra xweşik ket, her du mahr xuşikîn û çûn ketin qelişetekekî. Ev çend roj in ku di bîra min de ye û loma kêfa min jî tune ye."

Piştî van gotinan her du mahrên ku ketibûn sola Hesenê Kilindar, ji sola wî derketin û çûn ji şahê mahran re gotin; hal û hewal ev e û Hesenê Kilindar ji civata xwe re awa dibêje. Şahê Mahran ji wan mahran re dibêje:

Herin, Hesenê Kilindar bidin dû xwe û bînin vir. Eger got ez nayê hûn ê bibêjin ku; tu neyê em ê bi te ve bidin û tu yê bimirî. Her du Mahr, dîsa vegeriyên mala Hesenê Kilindar. Piştî civat belav bû Hesenê Kilindar misînê xwe girt ku biçê ser avê. Her du mahr kelimîn û gotin;

Te serê qîz şahê me şikandiye û em hatine ku te bibin cem şahê xwe. Hesenê Kilindar got; Hey be, hey nebe! Ka hûn mahr in, ma ez çawa bi were werim? Min kevirek avêt wî mahrê reş, bi xeletî ve çû û li serê wê mahra xweşik ket. Her du mahran Got; Na! Ku tu neyê, em ê jixwe bi te ve bidin û tu yê bimirî; lê tu werî û çî qewimî be tu yê ji şahê me re bibêjî. Hesenê Kilindar, kir û ne kir, a xwe tê nedî ji mejbûrî da dû her du maran û çû cem şahê maran. Her du maran Hesenê Kilindar birin ber devê şikeftekê û Hesenê Kilindar bala xwe dayê ku şikefteke wisa ye, ne serî ye û ne binî ye. Şikeftê tije mahr in û mahran serî daye ser hev. Di dawiyê şikeftê de Şahê Mahra yê ku bi qiloç gazî Hesenê Kilindar dike û dibêje; Netirse, pêlê bike û were. Hesenê Kilindar pêlê piştî mahran kir û çû pêş Şahê Mahran. Şahê Mahran got; Çima te serê qîza min şikand? Hesenê Kilindar got hal û hewal ev e; Min bi xeletî serê wê şikandiye. Şahê

Mahran got; Ku te bi xeletî serê wê şikandi be, a niha tu wî mahrê reş bibinî û tu yê wî nas bikî?" Hesenê Kilindar got; Erê, ez wî mahrî li ku bibînim ez ê nas dikim.

Şahê Mahran, ferman da ku li wî welatî çî mahrên reş hebin, divê a niha tavilê teva bînin vir. Kîjan mahr anîn lê Hesenê Kilindar got; na va ya nîn e. Şahê Mahran pirs kir ku; Wekî din Mahr ma ne an na? Her du Mahran got; Wekî din mahr neman şahê min! Lê hew yek tenê di binê şikeftê de ma û wî jî ji me re got; ez pîr im her du çavên min nabînin. Loma me jî neanî. Şahê Mahran got, zû herin û wî a niha bînin. Her du mahr, çûn ew di nav hev re kirin û anîn cem Şahê mahran. Şahê Mahran got; Hesenê Kilindar!

Ev bû yê ku li qîza min piçikî bû? Hesenê Kilindar got; Erê ev bi xwe bû. Şahê mahran, ew mahrê pîr avêt nav mahran û mahran jî ew ji hev piçî, piçî kirin. Şahê mahran zivirî ser Hesenê Kilindar û got:

De bibêje, tu ji malê dinê çî dixwazî ji min bixwaze. Hesenê Kilindar go; Ez, malê dinê tişteke naxwazim; lê ez moriya di bin zimanê te de dixwazim. Şahê Mahran got; Hey be, hey nebe! We mirovan şîrê xag vexwariye û hûn nikarin her tiştî bihemilinin. Lê kir û nekir, Hesenê Kilindar digot; Ez moriya di bin zimanê te de dixwazim. Şahê Mahran hêviya xwe jê birrî û got; Ez ê moriya di bin zimanê xwe de bidim te; lê ku tu ji evdekî xwedê re bibêjî tu yê bimirî. Hesenê kilindar, piştî moriya ku di bin zimanê şahê mahran de girt, vegeriya û çû mala xwe. Hesenê Kilindar, ji ber ku bi hemû zimanê teyr û tilûra bi zimanê hemû lawiran dizanîbû êdî miyek bimehriya, kerek biziriya hema pê dikeniya. Rojek, du roj û sê roj awa, jina Hesenê Kilindar jê ket şikê. Jina wî got; Ker dizire, mî dimare û mirîşk diqare tu çima dikenî? Divê tu ji min re jî bibêjî. Hesenê Kilindar got:

Jinik! Ez hima ji xwe re dikenim, ma ez ê bi çî bikenim. Lê jina Hesenê Kilindar got; Na! hitil û mitil divê tu ji min re jî bêjî ka tu çima tu dikenî? Hesenê Kilindar, piştî hêvî û gumana xwe birrî ji jina xwe re got:

Erê, ez ê ji te re bêjim ka ji bo çî dikenim; lê tu here û a niha sîtîlek ava min bide ser û qaluyek sabûna min jî bide ber. Eger ez ji ter a bibêjim ez ê tavilê bimrim. Ez ê a niha pezê me bibim serav bikim, ez ê bêm û ji te re bêjim. Jina wî çû, sîtîlek av

da ser êr û qaluyek sabûn jî da ber. Hesenê kilindar jî pezê xwe bir besta avê û ji bo seravê. Dema pezê xwe serav kir, beranê wî baz da ser miyekê; lê miyê xwe çittî wî aliyê din kir. Beran got; Ma ez jî bûm Hesenê Kilindar, ku li dû te bêm û tu nebî yekî din e. Piştî dengê berîn, ket kerrika goyê Hesenê Kilindar, rabû pezê xwe serav kir û çû malê. Jina wî got; av û sabûna te hazir e, de ka bêje tu ji bo çi dikenî. Hesenê Kilindar, rabû sê kevirên jina xwe avêt û ew berda.

Çîroka me li diyaran rehmet li dê û bavên godaran.

Çîrokbêj: Ülkü Bingöl

Sal: 38

Herêm: Amed- Erxani Gundê Pîrahmedê

Dîroka Berhevkariyê: 12.08. 1018

Xwendina wî: Zanîngeh

Cihê tomarkirinê: Amed

Yên jê hilkiriye: Ji pîra xwe

3. Giloka Şev û Royê

Got; axakik hebû, hertim meraqdarê seydê bû. Payizê hertim dere seyda xezalan. Rokê diwê ez jî bi xwe re xulamkî bigrim, bi min tenê nawe. Em ê jixwe ra herin seydê. Xizmekarkî diwîne diwê; De hedê em ji xwe ra herin seydê. Xizmekar, bi vî ra dere. Wê royê derin û ji xwe ra seyda xwe dikin. Xezala xwe dirên û tînin, serjê dikin û çatmekî çêdikin. Te dît arê berê were bû, tînin û xezala xwe ser ra digerrîn. Sor diwê û diwe wek dendik. Her ro, wer kîno evarê tînin û dixwin. Xizmekar jî êvarê şîva wî tîne û dide ber axê. Axa diwê: Xulam, tu jî were, çoli diwê tu jî were û em bi hev ra ji xwi ra nanê xwe bixwin. Diwê xulam tê ew jî li ser rûdine dixwe. Tê ser rûdine dixwe xulam nakeve serê axê. Diwê, wele ez ê vî ya têkim der û ez ê ji xwe ra yekî din birêm. Wê rowê, axa wî dike der, yekî di tîne û car dere seyda xwe dike. Seyda xwe tîni û sor dike. Xulam tîne, nanê axê û şîva axê dide ber. Axa diwê; xulam, diwê werî, çoli ma û ez û te ji xwe ra bi hev ra bixwin. Tu tenê nexwî nawi û diwê em tev bixwin. Xulam jî deri û vêra dixwe. Wele diwê; va jî nawi û ez vî ya jî qebûl nakim. Ez ê ji xwe ra yekî di car birêm. Ji wî ra jî diwê; xulam, tu ji min ra nawî. Wî jî dike der û deri yekî di tîne. Deri, yekî di dirê, car deri seyda xwe weke her car sor dikin. Bi

êvarê re xulam, tîne û nanê wî dide ber. Axa diwê; xulam! Tu jî were, çoli diwê tu jî were, em bi hev ra bixwin. Xulam jî diwê; tu bixwe, ez naxwim tu axayî û ez xulam im. Ez bi te ra nan naxwim. Law diwê; wer bixwe, em tenê ne çoli. Xulam jî diwê, naa qethan ez tiştên wer nakanim, tu yê nanê xwe bixwî. Ez ê dawiyê ji xwe ra nanê xwe bixwim. Axa diwê; tamam va meriya ket serê min û ez ê vî meriya ji cem xwe bernedim. Bira va li hinda min bi. Rokî û dida, edî hertim bi royê deri seyde û êvarî tê. Çoli welatê germani germ e. Çi seyda wan çî be êdî digirin, tînin; yanî ji kergûyan, ji xezalan ji çî be, hertim tînin û dixwin. Çaya xwe ya çolê jî germ dikin û bi ser da dixwin.

Êvarê jî betaniyê xwe dikşînin xwe û radikevin. Wî zemanî, wê çaxa ku êvarê arê xwe dadidin û nan û şîva xwe dixwarin. Dawî yê, wexta raketina dirê koziyek biçûk a çêdike ariyê davê ser û vedişêri. Vedişêrê, diwê; Ez, arê xwe reş nekim û ez di wî serî da, car pê dadim û taştêya axayê xwe pê çêkim. Bi wî awayî dewam dike. Siwekî radiwi, meze dike û wayy arê wî reş e biye. Xulam radiwi, taştê ji axa xwe ra çêbike û mêze dike ar tine ar reş e. Diwê; hayloo! Welehîn ar tine û de ka ez ê ar ji kê rê bînim. Xulam derdikeve û li dora xwe mêze dike. Mêze dike, mêze dike, dere dûr û gelekî cikî dûr. Ku way arek, di devê mixarekî da way diçirûskî. Wele diwê; ez ê xwe bigînim wî arî û hingî axa ranewiye. Ez ê birim, taştêya wî çêkim û bidim ber. Baz didi, bi şev baz dide, baz dide, baz dide, dikeve newalkî bi serjêr û dikeve. Awa lê mêze dike, pîrikik way rûniştiye, egik golikek reş û hema pir hindik di dest da maye. Yek spî, awa bi mezin jî li kêleka wê ye. Diwê; Pîrê, Pîrê, va çî ye, vê şeva çî ye tu vê guloka hildikî? Diwê, lawê min mêze va golika reş, a şevê yi, va spî jî a royê yi. Tu way diwînî, şev hindik maye û ek a reş biqedî. Îjo ez jî dest bi a royê dikim. Karê min ev in. Diwê, pîrê heyran pîrê qurban! tu viya bisekinine, heya ez derim a wê mixarekik, çî ye li wir û way arik li wê diçirûski. Ez ê herim, wî arî bînim û axayê min hinkî ji xewê ranewî ye. Ez xwe digînim axayê xwe û di wextê da ez taştîya wî çêbikim. Ava wî, misînê wî germ dikim û bisekîni heya ez tîm. Pîrê diwê, na lawê min! Çer dikanim bisekinim. Şevên payizê dirêjin û kêlekê nexweşa gi li erdê rizyani. Nawi û ez nakanim bisekinim nawi. Pîrê heyran pîrê qurban! Diki û naki, li ser digeri û li ber digeri pîrê diwê; naa bi qisa wî naki. Hema pîrê, bilind diki, diwê li wî yalî datîne, dest û nigê pîrê dide ser hev û eşq girêdide. Li bayê xwe deri û diwê, ez ê girê bidim, ez ê herim arê xwe bînim û ez hîna pîrê vekim.

Deri, bi ecele deri, awa dikevi li deriyê mixarê û mêze dike. Way sîtilik mezin çel û qulp lê ye. Çel hew qulpê wê ni û tije goşt û qelî tê da dikeli, kelyayi û hazir î. Awa lê mêze dike, çel û hew keleş di mixarê da ye, betaniyê kişandine serê xwe û raketine. Raketine, hema her deri sîtil, bi qulpê wê digri, tenê datîne erdê, goştê xwe derdixe û dixwi. Li tê da hin keleş heni, payîni diwînin, meze dikin tîne stîl rakir, bilind kir çend cêtî goştê xwe xwar û cardin stîl girt; bilind kir û danî ser ciyê wê.

Bi ecele arê xwe dirê û derdikeve. Ew keleşêki ê hevalekî din e, serê xwe radikin û diwê, law filankes te ew meriya dî? Diwê, erê wele, min jî dî. Ba wan hevalên xwe dina jî dike û diwê; law rawin, rawin! Hal û mersele, me merîkî awa jêhatî me dî. A va sîtila tenê bilind kir, danî erdê, çend cêtî goşt jê xwar û car di bi tenê danî ser êr. Em çel hew nikanin bilind bikin law! Keleşbaşiyê wan jî di navda yî, keleşbaşiyê wan diwê:

Law! zû para bidin pê wî merî, ew meriya heyfa me nerê, em li darê dinê nikanin heyfa xwe birin zû wî merî bernedin. Vana hema bi şev li dû wî meriya rêz diwin, li dû vî xulamî, ba dikin û diwên:

Law birak, birak! Hela bisekîni. Vaya bi ser wan de vedigere û diwê, law çi ye law, min di cî goştê we xwariyê, hûn dikin heyfa xwe bigrin û hûn sewa goşt wer dikin çi ye law! Vana vedigerînin û diwên;

Na law! goştê çi halê çi law bira! Goşt bi qurbana te wi lê serkeleşê me diwê bira bisekîni û ez ê xwe biginimê. Ew ê gotinkî qisekî ji te ra biki. Tê, tê û diwê;

Law birao! Heyf me heye, em dikin û nakin û çend sal in em li bendeni. Em nikanin wê heyfa xwe birên, diwê û tu merîkî pirî jêhatî ye. Te bi tenê va sîtila bilind kir û te danî ser êr. Demek kî tu pir jêhatî ye, eger tu vê heyfa me nerêyî û wele em nikanin birên. Diwê; Heyfa we çi ye law?

Diwê, heyfa me te dî, qonaxik ku tu ji wê da hatî, li wî alî qonaxik heye ku qonixik di qat diwê û ew paşayi têdayi. Xwarina wî, tiştê wî, hemû îdara mala wî û lazimiyê wî giş têdayi. Bêderî ye, em dikin û nakin qîzik wî heye û em herin ji keleşbaşiyê xwe ra bînin birên werin. Ji bela wê, çend sal in em ba lê naynin, em qîza wî birên û werin.

Diwê, tamam, ew hêsan e, ez ê ji we ra bînim. Diwê, de bîni. Xulam diwê, de ji min ra hûn çel hew sîrkê hespan bînin. Te dî sîrkên hespan berê dikutan pê hesp girêdidan. Diwê, çel hew sîrkê hespan birên. Bira ma qe qapî lê tinewi. Van a çend hew sîrkê hespan jê ra tînin. Diwê, ez lê dixim, derim hûn jî li pê mi werin û tek û tek werin diwê. Vana wan sîrkên hespa digrin, dikê cêwa xwe didi ser dîwêr, tek û tek digiri, kefa destên xwe lê dixi û tê da çik diki. Deri kefa destê xwe lê dixi, pêlê diki û nerdan. Lêdixê deri û diyêr. Deri diyêrî, dikevi hewşa paşê, dikevi hewşa paşê û dikevi hewşa qesrê. Diwê, de hûn jî tek, tek werin. De îda sîrken biye nerdan, van a jî tek, tek destên xwe davên wan sîrkan, pê dirên û derin û pê dirên û derin. Kîjan tê dikevi wê hewşê, vava dûzanê xwe dirê davê qirêkê serjê dike. Kaş diki, laşên wan gişî diave wê rê, dismala xwe radixi, poz û goyê wan jê dike û diavêje nav dismala xwe. Gişî bi carê tek, tek lê dixi, bi carê diqedîne û wa çel hewa gişî di hewşa paşê da laşê wan diavêje ser hev. Dismala xwe dirê qat diki, girê dide û didi piştî xwe. Hema bi şev xwe berdidê û tê. Berdidê tê meze diki, eh pîrik way hîna girêdayî ye li ser piştê û diwê; pîrê, pîrê! Li qusûrê min mêze meki û min ef biki. Pîrê diwê; Law, law, lawê min! Te ez girêdam min û way şev sekiniyi. Ka tu dizanî ji çî çax da şev sekiniyi û xelkê ji mi ra nifira bike law, te li min wa kir. Ez ana te berdidim. Pîrê, hema giloka xwe ya reş hema bi ecele, ecele hildiki holdiki û ew jî bi xwe dihese. Baz didê, tê lê meze diki û hîna axayê wî di xew da yi. Hema zûzûka arê xwe dadi, taştê xwe hazir diki û çaya xwe didi ser. Ava misînê axê jî didi ber û germ diki.

Ba diki û diwê, axa! taştêya te haziri. Axa radiwi, dest û serçavê xwe dişo, nanê xwe dixwin û car dî derin seyda xwi dewam dikin. Serê siwê, car siwar diwin û derin seyda xwe dewam dikin. Serê siwê paşa derdikevi hewşa xwe awa lê mêze diki, çel hew va dijminê mi wan gi anîne avitine hewşê, gi şerjê kirin û poz û goyê wa tineni. Diwê, law va kê wer kir, va kî bû, va çî bû law? Diwê, biwên, paşa emir kiriyî, bira li welêt kesek nemîne û bira giş werin li vira top bin. Tiştik heye, hadîseke heye em ji wan ra biwên. Cendirme derin, însîn gişî top dikin, dirên, tîn û paşa tek tek ji wan dipirsê. Diwê; law awakîna va hadîsa çêbûye û wa çel kelaşanan te kûştîye?

Diwê na wele paşa, Xwedê emrê dirêj bidê te, ez nîn im û ka ez nikanim xalif biwêm. Ê di ra diwê, ê di ra diwê û ji kê ra diwê, ez nîn im. Paşa diwê; "Law, kî mayî, kî nemayî? Giş diwên; wele kes nemayî. Yek diwê; paşa îro çendi, axak û xulamê xwe

li filan derê ji xwa seydê dikin û ew mani. Diwê, bişîni pê wa jî, bira ew jî werin. Cotik cendirme, hema derin hinda axê û bi qirika axê jî dirên. Paşa te dixwazi, hema diwê; bira ecele neseşîni û weri. Axa ditirsi û diwê, law heyra, em xerîw in, ji xwe ra neçîrê dikin û ji vî welatî nîn in. Paşa ji me ra diwê; çî? Ji me çî dixwazi? Cendirme diwên, wele em nizanin, hema diwê bira neseşîni û bira weri." Axa digrin diwin hinda paşê.

Paşa diwê law axa, xelkê kêriyî? Diwê ê filan memleketî mi û paşa dîsa diwê; axa hal û mesele a hedîsik awa qewimiyî û haya te jê heye, tine. Axa diwê, xwedê emirkî dirêj bidi te û ez ji xwa ra hatime seydê dikim. Ez yekê feqîr im, tişkî min di vî îşa da tîni û hay û baya min jê tîni. Vedigire ser xulam û diwê, law xulam haya te ji vî îşa heye, tûni? Va çel hew keleşan dijminê min bû û anî nê di vir ra da kuştîni." Xulam diwê; "Paşa! Haya min jê heye û mêze nîşanên wan hene. Paşa diwê, ez zanim nîşanên wan hene. Diwê, derxi nîşanê wan. Wê çaxa diwê, haya min jê heye. Axa ditirsi diwê, law ez û vî ya şev û ro bi hev ra ne, aw! Çer diwê, haya mi ji vî îşa heye? Axa ditirsi û hema diwê, wele ji bela wî, ew ê paşa li serê me jî xi. Hema ji piştî xwe vediki û davê ber paşê. Paşa diwê, law helal bi ji te ra. Qîza xwe tîni, didi wî xulamî. Mersela min li vî ra qediya û rehmet li dê û bavên gudarî.

Çîrokbêj: Nejdîtê Tilxûmê

Sal: 66

Herêm: Amed- Erxênî gundê Tilxûmê

Dîroka Berhevkariyê: 10. 10.2018

Xwendina wî: Nexwenda

Cihê tomarkirinê: Li şikeftên Hîlarê

Yên jê hilkiyê: ji kalê xwe yê Evdil

4. Birakose

Carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran. Rokî ji royan bav û lawên xwe hene. Bav ba lawê xwe dike. Lawê wî çardeh panzeh salî ye. Diwê lawê min vî gayê me bibe bajêr bifroşe, em pê îdara xwe bikin. Lawik diwê tamam bawo. Lawik, serê gayê xwe digrê û dide ser rêya bajêr.

Dere dere rê de sê merî rastî wî tên. Her sê merî jî dişibin hev. Meriyê ewilî diwê birazî, va tana te bi çi ye? Lawik diwêje, xalo ne tane ye, ga ye tana çi xalo. Meriyê di diwê birazî, va golika te bi çi ye? Lawik diwê heyra va ga ye ne golik e, ne jî tane ye. Meriyê sisêyan diwê birazî, vê golika ber dê, ber şîr tu dibî difroşî. Vaye ne gaye. Aqil û heşê lêwik li nav hev dikeve. Ê tamam diwê hûnê çi qas ji bo golika mi bidin? Dêrdixin perekî hindik didin lêwik û lawik rêya mala xwe dirê lêdixe tê malê.

Bavê wî wexta wî dibîne. Diwê, kurê min tu zû hatî te çer kir? Lawik pere derdixe dide bavê xwe, bav li pere mêzedike. Bavê wî diwê lawê mi va çi ye, çima perê te ne tamam e? Perê te pir hindik e. Lawik diwê, te bawo te golik da min, te got ga ye. Bavê lawik diwê, golika çi lawê mi min ga da te. Te ga çer kir roniyê te nerjê lawo!

Lawik diwê bawo welle di rê da sê camêr rastî min hatin. Yekî got tane ye, yekî got golik e yekî got golika şîr e, mi jî firot wan û ez hatim. Diwê Lawo, her sê mêr şekl şemalên wan bi çi qeydeyî bûn dişibyan hev ya na? Lawik diwê erê wele bawo, her sê jî wekî hev bûn, me ra ji hev dernedixistin.

Bavê kawik difikre, ji xwe ra diwêje wele hebe tune be her sê birayên min in. Welleh tu xapandine lawê mi, ez bimrim bimînim gerek heyfa lawê xwe û ê gayê xwe ji her sê birayên xwe birêm.

Radiwi ba jina xwe dike. Diwêje keçê keçê! Jinik radibe diwê xêr e te, law çer bû? Mêrê wê diwêje keçê hela kerê bîne. Her sê birayên min lawe me xapandinin, ez gerek vê heyfa bi wa ra bernedim. Jinik dere serê kerê dirê dide dest mêrê xwe diwê a ker va ye. Mêrik dere sê zêrê mezin tîne dixê tawita kerê û rêya her sê birayên xwe dirê. Her sê bira mêze dikan, birayê wa ê mezin serê kerê di destdaye diwêjin; lo birawo tu vê kera çer dikî, te awa bi serê kerê girtiye tu kuda derî? Ka kerê bide me, em jiwe ra barên xwe lêkin.

Merik diwê: Law kera min her ro dinyak zêra dike, ez kera xwe çer didim we hun dînin çi ne, we aqilê xwe bi nan û pîvazê xwariye. Her sê bira ji birayên xwe yê mezin ra diwêjin. Welle birayê me te aqil wenda kiriye, ker tew zêra dikan, li darê dinê kê diye ku kerê zêr kirine. Birayên wa ê mezin diwêje welle kera min zêra dike. Ker

wexta bişkulê xwe dike zêrek jî pê ra li erdê dikeve. Birayê mezin diwêje hûn bawer nakin bi çavê serê xwe mêze kin. Heger hûn pênce zêrî bidin mi ez ê kêra xwe bidim we.

Her sê bira diwêjin ka em ji te ra pênce zêrî ji ku bînin ji boyê xwedê, em birayê hev in û tu bi me zanî, em tev di halê xwe da ne xizan in, feqîriya dinyayê histûyê me xwar kiriye jixwe. Birayê mezin diwêje heger kera min zêr nekir çoyê xwe birên û werin ber derê min. Lê belê ez vîya jî biwêrm gerek zêrê we li erdê nekevin ha! Eger zêr li erdê bikevin xira diwin ji zêr bûnê derdikevin. Gerek hûn doşegê paqij a pîr û pak bidin binê kerê, çimkî hûn bibin odê û pelûlê çê bikin bidin kerê bila zikê kerê têr bibe bişkula bike, bi bişkulan ra jî zêran bike. Roya sisiyan ez têrm kera xwe dîsa ji we digrim. Bila ji we ra zêran bike em birayê hev dû ne, da feqîriya dinê ye, hun jî xizanin.

Her sê bira diwêjin tamam, eger tu vê çeyiyê bi me bikî hema carekî ne hezar carî xwedê ji te razî be. Yek diwê ez îşev dibim mala xwe, ê di diwê ez îşev dibim mala xwe. Her sê dikevin qirika hev û din. Di wî xirecira wa, ka te dî birakose nin, bi hev îtbar nakin, baweriya wan bi hev tune ye. Peşkê davêjin, şeva pêşiyê para birayê mezin dikeve, dû ra ê ortê, dû ra jî ê biçûk.

Birayê mezin serê kerê digrê û berê xwe dide malê, lê dixê deri. Deri rê da ker bişkulê xwe dike û zêrek dikeve erdê. Birayên mezin diwê welle birayê me rast gotiye xalifî tune ye. Kêfa wî tê, ji kêfa dike bifire. Digê malê, hema ba jina xwe dike, kerê diwe odê ji jina xwe ra diwêje keçê zû zû doşeg, orxan çi heye bide bin kerê kera me zêra dike. Mi birayên xwe xapandiye bi pence zêra. Ker zêra dike, kera me bişkul zêrîn e, me belaş jê girtiye. Jinik orxan û dişega li bin kerê radixe, pelûlê çêdikin didin kerê. Ker hûrê xwe tije diki, zikê xwe têr diki. Wê gavê ker dîsa bişkul dike zêr li ser doşegê dikeve. Jinik û mêrik ji kêfan li nav çavê hev û di mêze dikan, per tune ye ku pê bifirin. Mêrik diwêje keçê em ji odê derkevin bira kera me rehet rehet heta siwê zêra bike. Em kera xwe eciz nekin. Jinik û mêrik ji odê derdikevin. Sibê her dû ji xew radibin, derê odê vedikin ku çi bibinîn. Weylooo her derik di vîjika kêrê da maye, çi zêr e çi hal e ode orxan, doşek giş tev da di vîjikê da mane.

Dinya hîn zelal nebiye birayên ortê bazdide tê mala birayê mezin. Diwê kerê zêr kirin ya na? Birayê mezin bi derewa diwêje welle kera me heta serê siwê zêr kirin.

Me çewal, torbe, tenke giş tije zêr kirine. Cî tuneysi em îda zêra têkinê. De ka birakose ne birayê mezin ji birayên xwe ê ortê ra rast nawêje.

Birayê ortê serê kerê dirê lê dixê dere malê. Ew jî ba jina xwe diki diwê keçê zû orxan û doşek çi hene bîne bide bin kerê. Kera me heta serê siwê zêra diki. Kerê dibin odê doşeg û orxana li binê kerê radixin. Genim, ce didin kerê, ji kerê ra pelûlê çê dikin, zikê kerê têr diwe. Ker bişkula dike zêra nake, birayê ortê diwêje keçê em derkevin der belkî kera me ji me eciz diwe, fedî dike belkî ji ber wê zêra nake. Her dû derin der, dêrî ser kera xwe da dirên. Diwe siwe derin li kerê mêze dikin. Waweylê, destê xwe dixin kêleka piştê xwe her dû, çi zêr e, çi hal e. Ode, orxan, doşek, cil giş di vîjika kerê da mane.

Îjar birayê biçûk tê, diwê we çer kir, kerê zêr kir ya na? Birayên ortê diwê, herê ma îşê zêra ye, lê çawa îda heta serê siwê cî tunebû em zêra têkinê, kera me heta sibê zêr kirine. Me çuwal mewalên xwe heta ber dêv tije zêr kirine. Birakose nin, ji hev û din ra rast ninin, rastî li dora wa jixwe peyda nabe.

Îjarê dora birayê biçûk e. Birayên biçûk serê kera xwe dirê û deri malê. Kera xwe diwe mal, ba jina xwe dike, diwê keçê zû orxan, doşek çi heye bîne bide bin kera me, kera me zêra dike. Jinik deri doşek û orxana li binê kerê radixe. Bi gorana çar pênc seat derbaz diwe nabe. Birayê biçûk diwê keçê em herin mêze kin, kera me nika zêr kirine. Derin derê odê vedikin. Weyyyyy bavooo çi bibînin, ker mirar biye. De sê roye pelûlê çêdikin didin kerê. Ker ji qewetê ji taqetê da ketiye û gewer biye çiyê. Dere cem her dû birayê xwe; diwêje, birayên me ê mezin em xapandin. Her sê dest hev da sond dixwin soz û qirara xwe dikin yek, diwêjin em gerek îja birayê xwe yê mezin bikujin. Her sê riya birayên xwe digrên, lêdixin derin gundê birayê xwe.

Birayê mezin wexta kerê difroşe her sê birayên xwe, ji jina xwe ra diwêje, keçê birayên min ew ê sê royê din werin ber derê me, ew dixwazin mi bikujin. Birayên mi birakose ne. Pêşiyê ferq kirine kerê zêr nekiriye jî dîsa jî ji hev ra nawêjin kerê zêr nekiriye. Ji bela wê birayê mezin bi xûy û xisletê wan zane, diwê ew ê sê ro şûn da werin ber derê me. Birayê mezin diwê jinik em ancax dek û dolaban bifikirin û em fenekî di li serê wa çê bikin. Jinik diwê hay hay. Deri rovîkî tîne, boça rêvî der û dorê, rêvî bi zêran dexemlîne. Rêvîkî di jî rût e, tu tişetekî pê ve nake. Ji jina xwe ra diwêje:

Keçê sê ro derbaz biye birayên min ewê vê seatê da werin. Ez way derim ser êrd, wexta hatin tu ji wan ra biwê birayê we çiyê ser êrd cot dike. Ji xwe ew nizanin erdên me li ku ye. Tu biwêji hun bisekinin ez rêvî dişînim bira ba birayê we bike. Lê belê gerek tu rêviyê tazî bişînî, vî rêviyê min bi zêra xemilandiye ez bi xwe ra dibim. Jinik diwê tamam, mêrik de tu zanî.

Çend seat derbaz diwe birakose tên gondê birayên xwe û derin mala wan Li deryên birayê xwe dixin. Jina wî derî vedike. Jinik diwê, hûn bi xêr hatin ji wê derê heta vira ser sera û ser çavan ra hatin. Birakose diwên birayên me li ku derê ye, em ewqas cî hatine me beriya birayê xwe kiriye, hema me gotiye bi çavê dinyayê em car din birayê xwe biwînin. De çar ro dinyaye çî dibi çî nabe mera nizanin. Jinik diwê weleh birayên we çûyi cot. Birakose diwêjin ew ê çî wextê were gelo?

Jinik diwê hûn bisekinin ez xeberê bidimê bira were, hûn ji wê derê heya vira ji boy wî hatine. Hûn ji xwe ra rûnin, bîna xwe birên, çaykî avkî bidim we. Jinik deri roviyê rût û tazî ê bê pûrt tîni û ber dide, diwê de way min şiyand. Rêviyê me anka deri ba birayê we dike, hema ew pê bihese, ew ê lêxe nesekini weri. Her sê birakose şaş û metal dimînin. Diwên ma rêvî çer mîna însana dere ba birayê me diki. Jinik diwê, wîî, ma hûn nizanin rêviyê me wek meriya ye pir baqil e.

Dibe nîvro, rêviyê xemilandî di hembêza birayê mezin da ye tê malê. Birakose çav li birayê xwe dixin mêze dikin rovî hemû zêr e, şaş dimînin. Birakose law birayê me rêviyê te hemû zêr e. Te va rêviya ji ku aniye? Birayên mezin diwê wexta jina mi rêvî dişîne pê mi. Ciyek heye rêviyê me di wî ciyê dike hemû diwi zêr.

Birakose çav li zêra dixin tew ji bîr dikin ku ji bo kuştina birayê xwe hatine. Birakose diwên law birayê me tu vî rêviyê xwe nadî me, me çiqajî vîya hez kir, hema wer bi emrê Xwedê xûna me lê keliya. Birayên mezin diwê law welle tiştêkî min tune ye, ez û vî rêvî yê xwe ne ji xwe lawkî mi heye ew jî zaro ye hîna. Ez bidim we ez çer bikim, ê sebra mi bi çî were, kar û barê me pirr e.

Birakose diwên lelaw birayê me! Ê te lawikkî te heye ê me ew jî tune yi. Te bida me, bira ji me ra jî çendakî zêra bîne bes e, em car di ji te ra birên bînin. Birayê mezin diwê tamam ez bidim we; lê gerek hûn sê royê din dîsa rêviyên mi bidin mi ha!

Her sê bira diwêjin temam. Birayê mezin zêrên xwe ji rêvî jê dike û rêviyê rût tazî digrê û dide her sê birayên xwe. Birakose wexta bi rê dikevin birayê mezin diwêje:

Keçê welle her sê ew ê sê royê di car werin ber derê me. Îjar bixwedê heta min nekujin venagerin narin malê. Wexta hatin tu şîne dayne bêje hahoo bavoo, hahoo bavoo, hun li ku man. Birayê we wexta hun çûn şûn da ji nişka ve ket û mir. Bigrî, bigrî bê birayê we mir, mir ez û lawê wî man li ber dîwara, mal û milkê mi bêxwedî, zariyê mi êtam man. Ter û can bû mir em histûxwar hiştin û çû. Dû ra jî bibe ser mezelê min, biwê werin bîna birayê xwe bikşînin. Min jî têxe mezel û dûzanê mi jî bi min ra têxe mezel. Wexta bîna min kaşt pozê xwe kirin, ez ê pozê wan jê bikim. Jina wî diwê temam, de tu zanî birayê te ne, çawa dixwazî bira wek te bi.

Her sê bira roya sisêya dirên û lê dixin derin mala xwe. Dibi sibe birakose ji jina xwe ra diwêjin, vay em derin ser êrd, wexta nivro bû hun rêvî bişîne pê me, bira were ba me bike. Jinên wa diwêjin law heyra qurba ma rêvî însan e were ba we bike, hun tiştên wer diwêjin, ji xwe ra we aqilê xwe bi sîr û pîvazê xwariye?

Êê ê, diwêjin heyra îşê we pê tune yi em diwêjin çi hun jî wer bikin. Qey em tişkî zanin em diwêjin. Jinê wan diwêjin heyra de hun zanin, de way me ji we ra go, ji me gotin. Dibe nivro jinê wan rêvî ber didin ku bişînin pê mêrê xwi na. Vana çer ber didin rêvî direve ji ber çava wenda diwe.

Bira kosê me jî li ser erd li benda rêvî nin. Bi deqa bi seata li benda rêvî disekin. Mêze dikin rêviye çi hale, hesa tu tişkî naye. Fam dikin ku birayên wa dîsa ew xapandine dîsa dek û dolap li serê wa gerandine. Sê royê wan diqedin vana cardin di dest hev da sond dixwin soz û bextê xwe dikin yek û birê dikevin, lê dixin derin mala birayê xweyê mezin.

Derin ber deriyê birayê xwe yê mezin û teq teq li derî dixin. Wexta digên mala birayên xwe. Ba birayên xwe dikin ji nişka ve jina birayên wa derdikeve der û hahoo bavoo bavoo diki, por û porçikê xwe dirûçikîni li çogê xwe dixi. Jina wî diwêje hun li ku bûn, mala we neşewite, birayê we mir çû, em bê xwedî bê war hiştin li ber dîwara. Ka birayê we lawooo, çavê me birjê, hahoo bavoo, hahoo bavoo. Birakose diwêjin da me biwe ser mezelê birayê me, qe ne em jê ra fatîhekî bixwînin. Jina wî her sê bira

digrê û diwe ser mezelê birayê wan. Wexta derin ser mezelê birayê xwe her sê bi hev ra dikin hawar û qîrîn diwên hahooo, bavoo. Diwên birayê me, birayê me, bi çavê dinyayê me birayê xwe têr nedî, me bîna birayên xwe têr nekşand, wey li min, hey li min, xwelî li serê me. Me bîna birayên xwe têr nekşand mala me mîrat bû.

Jina mêrik diwêje de werin pozê xwe têxin vê qula bîna birayên xwe bikşînin. Birakosê mezin pozê xwe dixê qula di mezel da vebûyê diwêje: Weyyy bîna birayê mi çi xweş e, weyyyy bîna birayên mi çi xweş e, wey birawoo, wey birawo. Birayê mezin pozê xwe dikiyê diwê weylo weylo ez bimirim, ez bimirim bîna birayê mi çi xweş e, birawooo çi xweş e, birawo, oyy, oyy. Ê mezel da ye ji nişkave pozê wî jê dike vava ji her dû birayên xwe yê di ra nabêje pozê min jêkiriye.

Dû ra birayê ortê pozê xwe dixê qula mezel diwêje: Weyy bîna birayê mi çi xweş e, weyy bîna birayê mi çi xweş e, wey birawo wey birawo. Ew jî ji nişka ve bi pozê wî digrê dibêje weylo weylo, ez bimirim, ez bimirim, bîna birayê mi çi xweş e, birawooo çi xweş e birawo, oyy ooyy. Pozê wî jî jêdike. Ew jî nabêje pozê min jêkiriye. Dû ra birayê biçûk pozê xwe dixê mezel, ew çer dixiyê hema bi pozê xwe digrê, diwêje weyy pozê min çû, pozê min çû, bêbextno, xayîno, mala we xira bibe weyy bavoo pozên mi çû.

Çîroka me li diyara rehmet li dê û bavê guhdaran ji xeynî mişkê qulê dîwaran.

Çîrokbêj: Şanê Bingol

Sal: 70

Herêm: Amed- Erxenî gundê Pîrahmedê

Dema tomarkirinê: 10. 01.2018

Xwendina wê: Nexwenda

Cihê tomarkirinê: Li navçe Erxenî/ mala wê

Yên jê hilkiyê: Ji kal û pîrên xwe

5. Keçelok

Hebû sofîyek û pîreka xwe. Sofî serê sibe destmêj digirt diçû camiyê li pişt mele nimêj dikir. Hatina wî beylo bû, kîjan saete bihata malê pîreka wî jî taştiya wî hazir dikir. Wexta ku sofî were wê taştiya wî hazir bû li ber doşekê. Dihata taştêya xwe dixwar. Gava ku dixwar pîreka wî firaxên wî radikir.

Serê sibê sofî rabû destmêjê girt çû camiyê, pîreka wî jî ma kû wexta wî hat taştêya wî hazir bike. Saeta wî tamam bû, taştêya wî hazir li ber doşekê bû, sofî got teq derî vekir hat û li ciyê xwe rûnişt û taştê xwar. Du sê kevçî lê xist sofîyek din jî hat. Sofiyê din derî vekir bala xwe dayê sofîyek rûniştiye nan dixwe. Selamualeykum, aleykumselam bira tu bi xêr hatî, ser çavan ra hatî, tu ji kû da tê bi kû da diçî. Sofiyê din kenîya got tu kî ye tu ji kû tê bi ku da derî, tu bi xêr hatî ser çavan ra hatî ez xwediyê malê me. Sofiyê ji camiyê tê evana zane mala wî ye.

Go heyran ev mala min e, ez şîyarim ne di xew da me, ez ji camiyê tîm ez li ser mîjê hatime wexta xwarina min e waye tu li ser rûniştîye tu dixwî, ser çavan ra tu mêvan î kerem ke bixwe. Sofiyê din go ez ji camiyê tîm, nanê min hazir bû, go ez bixwim waye ez rûniştim tu hatî.

Her du di hev da mane asê yek dibê pîreka min û mala min e, ê din dibê pîreka min û mala min e. Gazî kirin pîrekê, go ka were li me binere tu me nas naki em kîjan zilamê tene, em di hev mane asê. Pîreka wî hat li vî nihêrt li wî nihêrt, kir ne kir sifetê wan, bejna wan hereketê, wan her tişt bi milîm bi milîm wek hev in. Ji hev dû nehatine naskirin. Pîreka wî milê xwe wiha kir û got ez we ji hev dû nas nakim. Sofîyek got anha tu me nas nakî, em kîjan mîrê te ne. Hûn wek hev in sîmayê we mîlim bi mîlim wek hev in. Go welleh ez we ji hev dû dernaxim. Li xwe mane xeyirî, go em ê çawa ji hev biqetin. Go em herin ba Qazî. Bila Qazî me ji hev biqetîne.

Her du sofî go ya Allah rahiştin pîrekê, tedarîkê xwe kirin, berê xwe dan mala Qazî. Mala Sofî li gund bû. Pir çûn, hindik çûn, gihiştin bajarê Qazî lê bû. Qazî go hûn bi xêr hatin, ser çavan ra hatin, we xêre. Sofî go şerîetek me heye em hatine ba te, tu me ji hev biqetînî. Qazî go ser çavan. Sofîya derdê xwe go em her du li ser wê pîrekê mane asê. Ez dibêm pîreka min e, ew dibê pîreka min e. Sofiyê din jî wisa got. Qazî li

wî nihêrt li ê din nihêrt kir ne kir wan ji hev dernexist. Tiştêkî wan ji hev cuda tine. Qazî go ez ê çawa wana ji hev du biqetînim.

Qazî go vî sofî têxin vê odê û sofîyê din texin oda din û pîrekê jî têxin odeyek din. Her yek xistin odeyekê. Go herin sofîyekî bînin ez îfada wî bigrim. Çûn sofîkî anîn. Go kerem bike rûnê. Go sofî, ev pîreka te be gerekê malê we hedîyek we xeberdanek we bi hev ra tineye. Sofî go belê heye hediya me heye. Go hediya we çi ye? Sofî go mecidekî pere di potikek sor da ye li cem pîreka min e. Qazî go tamam wî derxin, sofîyê din bînin. Sofîyê din jî anîn îfada wî girt. Qazî go sofî ixtiyacîk we xeberdanek we malek we li cem hev tine ye. Sofî go belê heye. Qazî go çi ye? Sofî go mecidekî pere di potikek sor da ye li ba pîreka min e. Qazî şeqqîtî ma. Ji hev nehatine veqetandin.

Go tamam wê sofî jî bibin têxin oda wî. Sofî xistin odê. Qazî gazî kir pîrekê ji bo îfada wê bistîne. Go anha tu zîlamê xwe nas nakî? Pîrekê go Qazî li her duya binerê te ji hev derxist ez jî nas dikim. Te ji hev dernexist rebena xwedê ez ê çawa nas bikim. Anha yek ji wan zîlamê te be dibê hedîyek we xeberdanek we ixtiyacîk we li ba hev hebe. Pîrekê go erê heye mecidekî pere di potikek sor da ye li ba min e. Qazî go bi Xwedê ji hev nehatin qetandin ez çawa bikim, her du sofîyan jî wisa got. Qazî ma sekinî, di xwe ra xeyirî. Qazî go heyran ji hev qetandina we ji min zêde ye herin ba dewletê. Dewlet we ji hev du neqetîne ez nikarim. Herin ba dewletê belkî ew we ji hev du biqetîni.

Rabûn sitûyên xwe xwar kirin berê xwe dan riya bajarê dewletê. Çûn ba dewletê xulaman got we xêre hûn hatine çi? Go em hatine ba dewletê şerîetek me heye bila dewlet şerîeta me bi cîh bîne. Xulaman got ka em ji dewletê ra bêjin. Çûn ji dewletê ra gotin. Du heb Sofî û pîrekek hatiye dibêjin em hatine ba dewletê bila me ji hev biqetîne. Dewletê go ka gazî wan bikin bila werin. Hatî ba dewletê go xêr e ji bo çi hûn di hev da mane asê? Ji her du sofîyan jî pirsî bersiv eynî. Yek dibê pîreka min e, mala min e. Yê din dibê pîreka min e, mala min e. Dewletê li her duka jî nihêrt, sifetê wan wek hevin, dewletê ew ji hev du dernexist. Dewletê jî wek Qazî kir. Her yek kire odeyek e. Yanî anîn ji bo îfadê go pîreka te ye, go belê pîreka min e. Go pîreka te be dibê hedîyek we xeberdanek we ixtiyacîk we li ba hev hebe. Go belê heye mecidekî pere di potikek sor da ye li ba pîreka min e. Dewletê go tamam wisa be wê

derê. Dewletê go vî sofîyî têxin şûna wî. Sofîyê din jî anin ji wî jî pîrsîn. Go pîreka te ye, go erê pîreka min e. Go pîreka te be dibê hedîyek we xeberdanek we ixtiyacîk we li ba hev hebe. Go erê heye mecedekî pere di potikek sor da ye li ba pîreka min e. Li wan dinêre sîfetê wan jî eynî ye. Go wî jî bibin têxin oda wî. Pîrekê anîn îfada wê jî girtin. Wê jî eynî tişt got, mecedekî pere di potikek sor da ye, li ba min e. Dewletê go ma tu wan ji hev du nas nakî, kîjan zilamê te ye? Pîrekê go Xwedê ji te razî, gazî bike bila her du bîn ku te sîfetê wan mîlim bi mîlim degîşik¹⁷ dît, ez jê wek te, em ê wana çawa ji hev derxin tiştê ku li ba min ev e. Dewlet ma heyirî.

Dewlet nikare bira wan ji hev du derxe, lê herî dawî li ba dewletê ne. Mecbûr wan bisekinîne, çawa wana ji hev biqetîne. Dibê dewlet kete duşuncê. Ka bê heftîke ka bê deh roja li ba dewletê man. Dewletê nikarî bû wan ji hev du biqetîne, ne kare wan ji ber deriyê xwe bide alî. Lê gerek e ji hev bîn qetandin.

Wezîrê dewletê wexta ku êvarê meclîs bela dibe ji wê da tê ku here mala xwe, li ser riya wî tendûr hebû. Hat çû malê. Bû sibe xwe girêda wê here saraya dewletê. Hate ber tendûrê, sê çar heb zarok bi lîstika kapa dilîzin. Wezîr bala xwe dayê wa zarok li wir kapa dilîzin, bala xwe dayê yekî keçelok li ser tendûrê razaye. Keçelok rabû, serê xwe rakir deqê xwe û teqiland û hate ba xêzka wan zarokan, go ka xwe hilînin qey ez jî bûme dewlet; ku nikare du zilam û pîrekekê ji hev biqetîne. Deqê xwe avêt kapa. Wezîr go wî tişteke go. Hate ba Keçelok, go Keçelok! Keçelok go ha. Wezîr go tu dikarî wan ji hev biqetîne.

Keçelok go uff çawa ez nikarim weke mûyekî ji nava mast bikîşînim karim. Wezîr go tu karî bî bi min ra were em hatin ba dewletê, tu wan ji hev biqetîni malê tu bixwazî wê dewlet bide te. Keçelok go wezîr mala min ev tendûr e. Ez bêkes im bê xwedî me. Xelk xêra xwe nan didin min. Mala min ev tendûr e. Eger ixtiyaca dewletê bi min hebe wa tu ji xwe mala min zanî ez li ser riya te me. Bila dewlet were ba min ez ê wan ji hev biqetînim. Ixtiyaca dewletê bi min tine be, ixtiyaca min jî bi dewletê tine ye. Heta îro bi wî awayî min derbaz kir û ez ê ji xwe wa derbaz bikim. Kir nekir got ez nayê, ixtiyaca dewletê hebe bila ew were. Wezîr dî nedî nayê da rê û çû.

¹⁷ Değışik: peyv bi tirkî ye, cuda.

Çû saraya xwe ya dewleta min hal û meslekî awa heye. Dewletê go çiye wezîr? Wezîr go ez ji ba filan maltendûrê da hatim Keçelokekî rahişt deqê xwe û go ma ez bûm dewlet nikare du zilam û pîrekekê ji hev biqetîne û deqê xwe avêt rêza kapa. Go min jê pirsî tu ji heqê wî tiştî tîyî, go e uff wekî mûyekî ji nav mast bikşînim. Go min kir nekîr bi min ra nehatiye. Keçelok go welleh mala min wira ye. Ez jî ji xwe ra maltendûrê da radizem, eger ixtiyaca dewletê bi min hebe bila ew were û ixtiyaca wî bi min tine be a min jî bi wî tine, ez ji xwe ra maltendûrê da razayime.

Dewletê go ka em herin bila me ji vî halî derxîne. Em jî tê de mane heyirî, dinya alem pê hesiyan, em nikarin du zilam û pîrekekê ji hev biqetînin. Dewletê rabû xwe girêda û cilê xwe li xwe kir, wezîrê wî gîşa da pey û hatin ber maltendûrê. Go wezîr ka gazî bike bê wa dewlet hatiye were ba lê. Wezîr go Keçelok, dewlet hatiye wa li wir e, dibê gazî bike bila were. Keçelok rabû xwe toz û dûmanê da dawşand û hate ba dewletê, patek jê ra avêt go dewleta min tu bi xêr hatî ser çavan ra hatî, kerem ke ixtiyaciya te heye. Dewletê go belê ixtiyaca min heye hal û meselek wiha heye, tu ji heq tîyî der, dikarî wan ji hev biqetîni. Keçelok go dewleta min ez çawa ji heq nayem, ez karim wek mûyekî ji nava mast bikşînim, ez ji heq tême. Dewletê go kerem ke em herin. Keçelok da pey dewletê. Hatin saraya dewletê.

Keçelok go ka li ku derê ne bila werin ba min. Wî jî li wana nihêrt sifetê wan wek hev in, ji hev du nayê veqetandin. Wî jî wek dewletê ew ji hev cuda kir. Her yek xiste odekê. Ji her yekî pirsî. Her du sofîyan jî wisa got mecidekî pere di potikek sor da ye li ba pîreka min e. Keçelok go dewleta min ji min ra misînekî, teyfiyek arvan, hêkekê û ewqas şima bînin. Gazî kirin sofîyekî go bila were, ez ê îfada wî bistînim. Sofîkî anîn hatin. Keçelok go sofî pîreka te ye? Go erê, pîreka min e. Keçelok go sofî tu pêl hêkê ke neşkêne, tu pêl teyfiya arvan bikî cihê pîye te çênebe, tu xwe sê caran devê misîn bixî têkeve hundirê misîn ji qulika misîn derkevî. Rast e ew pîreka te ye. Sofî lê nihêrt û got ez pêl hêkê kim wê bişkê, ez pêl arvan kim wê lingê min here xwarê, û ne ez karim xwe li devê misîn xim, û ne ez karim xwe ji qulika misîn derxim. Keçelok go de here îşê te nîne, be pîreka te ye wisa be. Go sofî bibin têxin oda wî.

Go sofîyê din bînin. Keçelok go sofî tu dibêjî pîreka min e. Sofî go belê pîreka min e. Keçelok go sofî tu pêl vê hêkê ke hêk neşkê, tu pêl teyfiya arvan bikî cihê pîye te çênebe, tu xwe sê caran devê misîn bixwî û li qulika misîn ra derkevî pîreka te ye.

Sofi pêl hêkê kir hêk nêşikest, pêl teyfiya arvan kir şopa piyê wî çênebû, carekê xwe li devê misîn xist û qulika misîn ra derket. Millet dev da şaş man. Cara diduyan xwe li devê misîn xist ku wê di qulika misîn ra derkevê, Keçelok destê xwe danî ser qulika misîn û destê din danî ser devê misîn. Sofi ma di zikê misîn da. Keçelok go şimayê bînin werin. Şima anîn parçeyek li devê misîn xistin û parçeyek li qula misîn xistin. Keçelok go vî misînî bibin bavêjin binê bahrê. Misîn birin avêtin binê bahrê û gazî bikin sofiyê din û pîreka wî.

Go sofî ha ji te ra pîreka te, sofiyê din sihirbaz bû. Tu û wî ji hev filitîn. Sofî go mala dewletê hezar carî ava. Wana dan rê vegeriyan şopa xwe wê vegerin mala xwe.

Dewletê go Keçelok, lawo tu çi bixwazî ez ê bidime te, tiştêkî tu bêjî ez ê bidime te. Keçelok go karekî tu bide min ne zehmet be. Dewletê go ez te bernadim, tu yê li ba min bî, tu çi bixwazî ez ê bidim te. Keçelok go hema karek ez ji xwe ra pê mijûl bibim hebe tu bide min baş e mala te ava. Dewletê go ka ez çi karî bidim te. Keçelok go dewleta min, min seh kiriye du heb hespê te hene. Ez ê seyisiya wan hespan bikim, ez ê li ba te bim ixtiyaca te çebibe tê bang min bikî. Ez ê seyisiya her du hespên te bikim ya dewleta min. Dewletê go tu qiyma xwe pê binî ser sera ser çavan, tu bêjî çi ez ê weke te bikim. Keçelok go ji min ra jî enzêlekê di hundirê tewla hespan da çebikî ez ê li ser enzêla xwe li her du hespên te binerim, seyisiya wan bikim. Rabûn jê ra enzêlek çêkirin di tewla her du hespan da. Hespê boz û hespê qelp. Enzêla wî di zikê tewlê da ye ji xwe ra seyisiya hespan dike.

Dewletê kengî ji saraya xwe ji meclisa xwe derkeve here ba pîreka xwe, riya wî di ba wê tewlê da derbaz dibe. Pacek biçûk di navbera tewlê û riya wî da ye. Çiqas êvarî meclisa wî bela dibe wê ew here aliyê pîreka xwe, tê li pacê ewil î. Gazî dike Keçelok. Keçelok dibê emir bide dewleta min. Dewlet dibêje kêfa te, kêfa hespê boz, kêfa hespê qelp çawa ye? Dibê welleh baş e. Kêfa min jî xweş e, kêfa hespê boz jî xweş e, kêfa hespê qelp jî xweş e. Dewlet derbaz dibe diçe aliyê pîreka xwe. Gava ku serê sibe radibe tedarîkê xwe dike wê were meclisa xwe, li ser textê rûnê, dîsa eynî di ber wê pacê da, tê disekine vê pirsê jê dike. Keçelok kêfa te, kêfa hespê boz, kêfa hespê qelp çawa ye? Keçelok dibê kêfa me her sêyan jî baş e. Dewlet lê dixê tê meclisa xwe.

Wezirê wî yê milê rastê hinekî aciz e. Dewlet dibê Keçelok wa û Keçelok wa. Wezîr rojekê wê were sarayê di çarşiyê da bala xwe dayê ku gogoke dirr di destê delîlî da ye digêrîne û fiyeta wî dibêje. Wezîr li pey geriya go ev dirr pirr xweşikê, pirr parlaq e, ku ez bistînim bibim herim ji dewletê ra belkî dewlet parîkî li min binere û çaven xwe ji min ra bigire, kêfa wî ji min ra bê. Wezîr li ser dirr sekinî. Dirr di mazatê da ye kî tê fiyetê dibêje. Li ser hev du biha dikin hema li ser kê bimîne. Çiqas fiyet lê ket wezîr zêde kir. Wezirê dewletê ye dewlemend e. Çiqas fiyet lê ket wezîr zêde kir. Çaryeka malê xwe da ber çavên xwe heta ku dirr li ser wezîr sekinî. Wezîr dirr kirî.

Dirr anî hate saraya dewletê. Go ya dewleta min, îro min hedîyek xweşik ji te ra aniye. Dewletê go çiyê wezîr ka derxe ez bibînim. Wezîr dirr derxist go aha ev dirrê han e. Danî ser masa dewletê. Dewletê li dirr nehirt go wezîr ji vî dirrî li ba min hene, ne ku tine ne lê belê evana zêde parlaq e. Tiştêk xweşik te aniye. Wezîr go dewleta min ez pirr li pey geriyam bi perekî pirr min stend. Min go ez ê bibim ji dewleta xwe ra.

Dewletê gazî xulaman kir. Go xulam ka gazî bikin Keçelok bila were. Xulam bazda çû go Keçelok dewlet dibê bila were, îşê min pê heye. Keçelok rabû xwe ediland çû, patek jê ra avêt ya dewleta min emir bike, xêr e te şandiye pey min, waye ez hatim. Dewletê go ka were li vî hedîya han biner. Ew jî hat li vî alî nihêrt li aliyê din nihêrt. Go dewleta min hedîya te hedîyekî pirr xweşik e. Dewletê go biner Keçelok rast bêj. Dewletê go heqê wî çi be, wê bêje. Tu çawa zanî wisa bêje. Keçelok go dewleta min dirr baş e delal e. Keçelok dikeve tereddutê ku ne wisa ye. Dewletê go Keçelok heqê wê çi be wê bêje. Keçelok go dewleta min ez nikarim heqê wî bêjim. Go çima nikarî heqê wî bêje, ez emir didim bêje. Keçelok go ez heqê wî bêjim xerab e ne baş e. Dewletê go baş be, ne baş be tê bêjî. Go dewleta min dirrê we xweşik e lê belê kurmî ye, nava dirr kurmî ye. Anha jî qelema xwe lêxe, wê qelem tê da here xwarê. Gava ku qelem kişandin wê kurmê spi serî reş wê serê xwe di şûna qelemê ra derxe. Dewletê go Keçelok ne wisa be ez ê serê te jêkim. Keçelok go dewleta min te go bêje min jî got, îca tu dibêjî ez ê serê te jêkim, welleh heqê wî ev e. Qelem da Keçelok go tê qelemê lêxî. Go ne wisa be ez ê serê te jêkim. Wezîr ricifî, Keçelok bikim adamiye dibe ku wisa be, eger wisa be mala min xera bû. Keçelok go dewleta min ez ê lêxim, tu serê min jêkî tê jêkî tu efû bike jî tê bike. Qelem go teq li dirr xist, qelem tê da çû

xwarê. Çawa qelem jê kişand kurmê spi serî reş serê xwe di şûna qelemê da derxist. Keçelok go dewleta min, min ji te ra got te yeqîn nedikir awa, te bi çavên xwe dît ne wisa. Dewletê go erê law min dît. Go bi her du destan bi keçel girt go keçelê min tu here cihê xwe, tu filitî. Wezîr mala wê xera bû çaryeka malê xwe dabû wî dirrî û ew dirr kurmî derket. Tu qiymet nema ji dirr e. Wezîr ponijî, dewlet pirr zêde ji wezîr hez nake.

Rojekê disa wezîr ji mal derket wê here sarayê bala xwe dide, dibîne hespek di mazatê da ye û sê seyisa bi serê hesp girtiye. Hespek heta tu bêjî xweşik e, heta tu bê jî bi cisne. Wezîr li pey hespê geriya. Go gerekê ez wê hespê ji dewletê ra bikirim. Li pey geriya xelkê fiyet lêxistin, çiqas lêxistin wezîr zêde kir. Çaryeka malê xwe da ser hespê û fiyet li ser ma. Wezîr hespê kirî. Seyisa rakirin serê hespê û anîn hatin.

Wezîr hat rûnişt go ya dewleta min îro min hediyakî pirr xweşik ji te ra aniye. Dewletê go çi ye. Wezîr go ka tu derkeve derve lê binere bê min çi aniye. Go min hespek aniye çi hesp ji her du hespên te li ber çi ne. Dewlet li dora hespê çû û hat. Heta tu bêjî xweşik e, delal e, temîz e. Wezîr di dilê xwe da dibêje xwezî gazî Keçelok neke.

Dewletê ji xulamekî ra go gazî Keçelok bike bila were. Xulam hat gotin Keçelok dewletê go bila were îşê wî heye. Rabû xwe ediland û çû. Hat potekî avêt, go kerem bike dewleta min emir bike, te şandiye pey min waye ez hatim. Dewletê go Keçelokê min ka li vî hespî binere bê çawa ye. Cinsî wî hereketê wî çawa ye. Keçelok go dewleta min hesp heta tu bêjî xweşik e. Go Keçelok rastiya wê bêje ji min ra. Go dewleta min ez nikarim bêjim. Go wa dirr min wisa got rast jî derket û hindik ma bû te serê min jêbikira. Dewletê go welleh tê bêjî, rastî çi be tê bêjî. Go dewleta min hesp heta tu bêjî hêja ye lê belê siwarkuj e, siwarê xwe dikuje. Go çawa siwarê xwe dikuje. Go ew hespê hanê têkeve meydanê, gava ku sor bibe, germ bibe ji bazdanê go gol be bahr be av be xwe digihîne xwe dike nav avê û siwarê xwe difetisîne.

Dewletê go ez ê te lê siwar bikim tê wî bide ciridan. Keçelok go dewleta min qey tu ji min aciz î. Hey ez ê herim dû re tê bêjî haho min çawa keçekê xwe ji destê xwe kir. Emir emrê Xwedê ye, yê te ye, kes li ber te ranabe. Keçelok li hespê siwar bû û hesp bir û anî. Hesp hêdî hêdî sor dibe, germ dibe. Gava ku tam germ bû berê xwe da bahrê. Hesp wek ba diçe bahrê. Keçelok xwe bavêje jî wê li erdê bikeve çixne çixne

bibe. Bû qir û wira dewletê û wezîra. Dewletê go ji boy xwedê keçelê min çû. Çawa ku hesp ghiştî bahrê Keçelok zane xwe bavêje wê li avê bikeve. Keçelok xwe ji ser pişta hespê virvirand. Hesp çû di bahrê da winda bû. Keçelok hat vî alî çep û rep, hat vî alî çep û rep, ji xwe ra sobedariyê kir, dewlet û wezîrên wî ghiştin wî. Keçelok xwe xelas kir nefetisî. Dewlet li wê şil bûna wî da ber dilê xwe. Dewletê go wey Keçelokê min îcar jî tu ji mirinê filitî. Min ji te ra got te înat kir, te min lê siwar kir.

Wezîr bû go mêş li pozê wî bikeve bibe hejdeh wesla, qeheriye, aciz bûye. Min mal bi xwe ve nehişt, min xwe feqîr xist, xiste binê feqiriyê. Ez wan tiştan tînim û ev keçelê hanê çî tîne serê min, ez çawa bikim ji vîya, ez nikarim wî winda jî bikim. Wezîr pir li ber xwe ket. Perê wî çûye, malî wî çûye. Wezîr zeîf bû rih tê da nema.

Rojekê qîza wî çav lê ket, go bavo çî hatiye serê te. Go lawo çî hatiye serê min, hal û hikayek wisa bûye. Keçelokek dewletê heye ewana malik li me mirat kir. Go çawa? Go min dirrek kirî çaryeka malê da û dirr kurmî derket, min hespek anî û ew hesp jî wisa çû. Mal bi min ve nemaye û ez nizanîm bê ez ê çawa bikim. Dewlet poz bi min naynî.

Qîzkê go bavo tu izna min bidî ez ê keçel winda bikim. Wezîr go tu karîbî winda bikî tu serbest î. Qîzê gazî qewraşka xwe kir û got qazekê me bîne, şerjê bik, hundirê wê tijî birinç bik û bide ser sênîke bibe bipêje. Qewraşkê bazda çû qaz anîn û hatin ji hev du xistin, nava wê tijî birinç kirin û sor kir û anî hat. Da ser sênîkê, go qewraşk wê sêniye hewlikê bide ser, tê wê sêniye bide ser serê xwe. Tê filan saetê here axur cihe li Keçelok lê ye. Gava tu çû wê dere li ser enzêla xwe ye. Li derî bixe. Gava ku derî vekir, tê vê sêniyê bide, ku ji te pirsî ev çî ye kê şandiye. Tê bêjî qîza wezîr ji te ra şandiye. Go bila nexwe, deyne ser enzêla xwe, di filan saeta şevê da ez mêvanê wî me. Di saeta xwe da lêxist rahişt sêniyê çû. Li derî xist. Keçelok bazda derî vekir. Lê nerî pîrekek e, sênî li ser serê wê ye. Sênî da Keçelok û got Keçelok ha ji te ra vê sêniye. Keçelok go ev çî ye, dewletê ji min ra şandiye? Qewraşkê go na na, qîzekê ji te ra şandiye, go bila deyne ser enzêla xwe di filan saeta şevê da ez mêvanê wî me. Keçelok rahişt sêniye çû bir danî ser enzêla xwe. Li bendî ma. Tarî kete erdê, bala xwe dayê derî lê ket. Bazda çû derî vekir lê nerî qîzek xemilandî, mala bavê wê neşewite, cilî ku li xwe kirye, dermanê ku li xwe daye, meriv çav lê dikeve bêhemd hema dilê meriv dibijê. Hiş di serê Keçelok da nema.

Go tu kî ye çi kesekî? Qîza wezîr go haydê ser enzêlê, min ew qaz ji te ra şandiye, em herin ji xwe ra sohbeta xwe bikin, nanê xwe bixwin. Go Keçelok tu min nas dikî. Keçelok go na welleh ez te nas nakim. Ez çav bi te ketim, hiş û mejî bi min ra nemaye. Go ez qîza wezîrê dewletê me. Bavê min nexweş e. Di ber mirinê da ye. Çiqas textor û cerrah me, kê aniye ser wî j ime re gotin gerek perçeyek ji kezeba hespê qelp ji bavê te ra were, bavê te wê sipî sax bibî û ku jê ra neyê bavê te ê çûyinê ye. Îcar go Keçelok hesp pirin ji dewletê ra, wezîr bi dest dewletê nakeve. Ez hatime ji bo perçeyek ji kezeba hespê qelp, tu bide min ez ê ji bavê xwe ra bibim baş e. Jixwe iş û mejî di serê keçel da nemaye. Hema rakire qamê ji ber xwe kişand û dirêj kir hespê qelp. Li binê zikê wî xist, hûr û rovî bera erdê da, hesp li erdê ket. Wexta li erdê ket çira tefiya bû tarî. Keçel go ev xewn bû min dît baz da vir de çû wir de çû çira pê xist. Li vî alî nerî li wî alî berî, qîzik tine. Go suphanallah nebê min hesp kuşt. Carekê bala xwe dayê hesp li erdê ye, hişk bûye mirî ye. Wisa li ber xwe ket go îcar ez çûm. Hindik maye wê dewlet ji saraya xwe derkeve bide rê wê here ba pîreka xwe. Wê were ber vê pacê û pîrsa her duyan jî bike. Îcar ka ez ê çi bersivê bidime. Ez bêjim çi. Ez bêjim hespê boz sekwa xwe rakiriye wî û hespê qelp li hev xistine û sekwa wî li binê zikê hespê qelp ketiye. Wê herkes were ser lê binere cihe wanê beylo ye. Na welleh vir e. Ez wisa nebêjim. Min wisa kiriye hal û mesele min ev e û wisa çê bûye. Ez rastiye bêjim. Nizanim wê dewlet serê min jêke. Ava ez zanim serê min çû lê ez ê rast bêjim. Dewlet çawa dike ew zane.

Dewlet hate ber pacê wê bêje Keçelokê min, wê Keçelok bêje ha dewleta min emir bike. Wê bêje kêfa te, kêfa hespê boz û kêfa hespê qelp çawa ye. Dewletê bala xwe dayê ku Keçelok bi xwe ra xeber dide. Keçelok behsa hespê qelp dike. Dewletê lê guhdarî kir, dengê xwe nekir. Keçelok behsa hespê qelp û kuştinê dike, ka bê çi bûye. Keçelok rabû kumê xwe danî aliyekî go ew Keçelok ez jî dewlet. Wê ew anha were ber pacê. Wê ji min bipirse. Kêfa te kêfa hespê boz û kêfa hespê qelp çawa ye. Ez ê bêjim ya dewleta min kêfa min jî xweş e kêfa hespê boz jî xweş e lê kambaxê hespê boz sekwa xwe rakiriye, wî û hespê qelp li hev xistine û sekwa wî li binê zikê hespê qelp ketiye û hespê qelp miriye. Sekinî destê xwe da kum go welleh derew e. Wê herkes were lê binere cihe cihê qamê beylo ye.

Dewlet lê guhdarî dike û go te wiya hespê qelp kuştiye. Keçel go ez ê rast bêjim temama meselê bêjim, îcar dewletê serê min jê dike ew zane, min bera dide ew zane. Go gava ku were ber pacê û ji min bipirse bê kêfa te, kêfa hespê boz, kêfa hespê qelp çawa ye. Ez ê bêjim ya dewleta min kêfa min jî xweş e, kêfa hespê boz jî xweş e, kêfa hespê qelp na. Gava ku go çima na. Ez ê bêjim ya dewleta min, di filan saeta rojê da min dî deriyê axur lê ket. Min derî vekir, bala xwe dayê ku pîrekek waye sênîkek li ser serê wê ye, li ser sênîyê qazeke hişandî û xevlî li ser qazê ye û daye min û go nexwe deyn ser enzêla xwe di filan saeta şevê da mêvanê te wê werin. Welleh ya dewleta min, min jî sênî danî ser enzêlê û ez li bendî wê sekinîm, heta ku wextê wê be. Wextê wê hatiye û derê axur lê ket ya dewleta min. Min baz da derî vekir. Bala xwe dayê ku qîzîkek xemilandî, hey hewara Xwedê, meriv çav lê dikeve mero xera dibe. Welleh hiş û mejî di serê min da nema. Min go tu çi kes î. Gote kerem ke em herin nanê xwe bixwin ez ê ji te ra bêjim. Em hatine li ser enzêlê rûniştine, me nanê xwe xwariye. Ji min ra gotiye tu zanî ez kî me. Min go na welleh ez nizanim. Waye te ev xwarina hanê ji min û xwe ra şandiye û waye tu hatiye sohbetê ku em ê ji xwe ra sohbetê bikin. Go belê min şandiye. Ez qîza wezîrê dewletê me. Min go ser çavan, xêr e. Go welleh bavê min nexweş e, di ber mirinê da ye. Me çiqas textor aniye ser, ji me ra gotine perçekî ji kezeba hespê qelp bigihijê wê pê baş bibe û ku negihijê wê wezîr here. Welleh ya dewleta min û wiha gotiye hesp pirin ji dewletê ra, lê wezîr bi destê dewletê nakeve. Tu peçekî ji kezeba hespê qelp bidî min ez bibim ji bavê xwe ra bavê min baş bibe. Ê go ez, go ya dewleta min hiş û mejî di serê min da nema bû. Ez çawa çav qîzîkê ketim, ez ketibûm haletê dîna. Min jî qamê ji ber xwe kişand û kişyame ber hespê qelp. Min çawa qamê avêt binê zîkê wî hesp li erdê ket û lerizî. Hûr û roviyên wî tew ketin erdê. Wê wextê çira min tefiya, ez li xwe siridîm. Min go ew ne xewn e ez şiyarim. Ez hatim min çira xwe pê xist li dora xwe nerî qîzîk tine. Nebe min hesp kuştiye. Ez li xwe digirim hesp li erdê ye. Welleh ya dewleta min ew qîzîk a wezîr be jî ez nizanim û ne a wezîr be jî ez nizanim. Ji min ra wiha gotiye û min jî wiha kirye. Aha rastiya wê ev e. Waye serê min li ber te ye. Tu min xelat dikî tu zanî, tu min celat jî dikî tu zanî. Dewletê tewî fahm kir, lê guhdarî dike li ber pace yê. Dewletê di dilê xwe da got wî bikşînim îfadê eger weka pêşî rast bêjî difilite, rast nebêje ez serê wî jê dikim. Dewletê lê xist ne jê nepirsî ku kêfa te kêfa hespê boz û kêfa hespê qelp çawa ye. Lê xist çû aliyê pîreka xwe.

Serê sibe rabû tedarîkê xwe kir wê here saraya xwe di ber pacê da derbaz bû dîsa jê nepirsî. Çû saraya xwe li ser textê xwe rûnişt. Ji xulamekî ra go here gazî bike Keçelok, bêje dewlet dibê bila were. Xulamek hat gazî kir go Keçelok dewlet dibê bila were vir. Çîmikê rebeno lerizî. Keçelok go wê dewlet serê min jêke, pê hisîyaye, an dîtiye. Keçelok hat patek jê ra avêt, go ya dewleta min emir bike. Te şandiye pey min waye ez hatim.

Dewletê go Keçelokê min, min seh kiriye te hespê qelp kuştiye. Ka bêje ji min ra te bi çi şiklî kuşt, te bi çi awayî kuşt? Keçelok go ya dewleta min ez ê rast bêjim, ê dî berat kirin û celat kirin di destê te da ye. Ez ê rastiya wê bêjim êdî tu çi dikî tê bikî. Dewletê go ka bêje, îfada xwe bide. Keçelok ya dewleta min hal û hikayeta min ev e. Ez li ser enzêla xwe rûniştî bûm. Derî lê ket. Min çû derî vekir, bala xwe dayê ku pîrekekê sênî li ser serê wê ye. Go qîzekê daye min go tê bidî Keçelok bila nexwe di filan saeta şevê da ez mêvanê wî me. Ez ê werim em ê ji xwe ra sohbetê bikin. Min jî go ser çavan. Min qaz daniye ser enzêlê, çavên min li riya deriyê. Saeta wê tamam bû, derî lê ket. Ez çûm min derî vekir, bala xwe dayê ku qîzikek xemilandî ye. Çavên me li berê venabe. Hiş û mejî di serê min da nema. Go me bi destê hev girt em hatine li ser enzêlê. Go Keçelok ka nanê me bîne em nanê xwe bixwin. Min go tu kî ye, çi kes e, ka bêje ji min ra. Go em nanê xwe bixwin ez ê ji te ra bêjim. Me nanê xwe xwar. Min go te xêr e tu hatiye çi. Go Keçelok ez qîza wezîrê dewletê me. Wezîr nexweşe, li ber mirinê ye. Me çiqas textor û cerrah û pirofesor aniye ser wî û teşhîsa wî da gotine gerek perçeyek ji kezeba hespê qelp ji bavê te ra were, wê baş bibe û go jê ra neyê wê baş nebe wê here. Welleh ez hatime ba te, hesp pirin ji dewletê ra, wezîr bi destê dewletê nakeve. Tu perçekî ji kezeba hespê qelp bide min ez ji bavê xwe ra bibim. Bavê min pê baş bibe. Hesp pirin ji dewletê ra. Dewlet dewlemend e, kare ji xwe ra hespa bîne. Ez bi çav qîzikê ketim hiş û mejî di serê min da nemaye. Hema min qame ji ber xwe kişand û min dirêj kir hespê qelp. Çawa min qame avête zikê hespê qelp hûr û rovî rijîyan erdê. Hesp kete erdê, lerizî û lerizî û wê wextê çira min tefiya. Min go ev ne xewn e, ez şiyarim. Min çira xwe pêxist. Li vî alî nihêrt li wî alî nihêrt qîzik tine. Ez dageriyam hespê qelp li erdê ye.

Go ya dewleta min aha kuştina hespê qelp bi vî şiklî ye. Êdî tu min berat dikî tu zan î, celat dikî tu zan î. Dewletê go tamam min fahm kir. Go here cihê xwe. Keçelok

lê xist hate cihê xwe. Dewletê bi heft zirne û heft defa daweta Keçelok û qîza wezîr kir. Ji dewletê ra rast gotibû. Qîza wezîr jê ra mahr kir, qesr û qonaxek jê ra çêkir û wan xiste wê qesr û qonaxê û go dev ji seyisîyê berde. Go ji xwe ra kêfa xwe binere. Lê belê tê li ba min î, çi bibe tu li ba min î.

Wezîr go wî ya mal bi min ve nehîşt îcar qîzik jî bir. Kes nikare li ber dewletê xeber bide. Keçelok bû zafê wezîr. Wisa ji xwe ra berdewam kirin di qesr û qonaxên xwe da ne. Keçelok rojekê derengê şevê da meclîs li bela bûye, li ber pace xwe ji xwe ra derve dinêre ka bê xewa keçel nayê. Bala xwe dayê ku dewlet û wezîr ji hundir derketin. Fanosek di destê wan da ye. Ji sarayê dertên berê xwe bi sûkê ber jê kirin, lê xistin çûn. Keçelok ma û ma go ka ku da çûn, ev çi ye. Heta ber destê sibê ma.

Bala xwe dayê ku wa hatin, fanos di destê wan da ye. Kete şeva diduyan. Keçelok takîba wan dike. Bala xwe dayê ku eynî di wê saetê da dîsa dewlet û wezîr fanos di destê wan da ye, waye derketin û çûn. Keçelok jî da pey wan. Evana çûn ber malekê, malek du kat e. Kişyane zikê eywanê. Bala xwe daye ku maseyek di nîvê eywanê da danîne. Kursîyek li vî alî kursîyek li aliyê din e. Dewlet li ser yekê, wezîr li ser yekê rûnişt. Destên xwe dane ber ruyê xwe li masê dinerin. Li ser vê masê kafekî serê mirova, metrekî capûn, şûr û kalibek sabûn li ser e. Dewlet û wezîr ji xwe ra lê dinerin. Tiştêkî jê fahm nakin. Keçel lê xist çû hundir, dewlet û wezîr rûniştine. Dibê çû hundir serî danî ser maseyê, şûr danî ser serê mirov, kalibê sabûnê danî ser şûr, û capûn jî danî ser wan. Wexta ku giş danî ser hev, qîzekê gazî keçel kir go were jor. Keçel lê xist çû jor ba qîzikê. Dewlet û wezîr berê xwe dane malê. Keçelok li ba qîzkê heta serê sibe ma. Sibê zelal bû nebû gewr bû keçel lê xist hate malê. Serê sibê dewlet li cihê xwe rûniştiye.

Ji xulamekî ra go here gazî bike Keçelok bila were. Xulamek hat gazî Keçelok kir. Keçelok hat patekê jê ra avêt, go ya dewleta min emir bike, te şandiye pey min waye ez hatim. Dewletê go Keçelok tu şev li ku derê bû yî. Keçelok go dewleta min te bi çavên xwe dit, cihê ku hûn lê bûn ez jî li wir bûm. Dewletê go rast bêje tu şev li ku bûyî. Go welleh cihê ku hûn lê bûn ez jî li wir bûm. Çiqas lê dubare kir cidî jê ra got. Go rast bêje an ez ê serê te jêkim. Keçelok ya dewleta min cihê ku hûn lê bûn ez jî li wir bûm. Dewletê go keçel biner ez ê te erewat bikim, ez ê te mahf bikim, ez ê serê te jêkim. Go dewleta min cihê ku hûn lê bûn ez jî li wir bûm.

Dewletê keçel da îşkencê, da îşkencê. Pişt ra da îfadê, kir nekir îfada xwe neguhert. Digo cihê kû hûn lê bûn ez jî li wir bûm. Îfada wî ew gotinin. Keçel bi berêpaşkî li kerekê siwar kir û def û zirnekê anî. Got hûnê li pey wî def û zirnê lêxin. Zarokê bajêr gişan da pey Keçelok. Bi vî awayî keçel da îşkencê. Di nava bajêr da gerandin, gerandin, gerandin.

Ew cihê ku çibû ba qîzikê, hatin wê kûçê. Kelebalixe, wîr wîra zarokan, def û zirne lê dikeve. Qîzkê serê xwe kire pacê, bala xwe dayê ku heylo heylo dewlet li Keçelok hatiye xezebê, çi aniye serê wî. Qîzikê hinarek ji kata diduyan avête ser cadê, pêşiya Keçelok. Hinar çawa li erdê ket ji hev dû bela wela bû, her libek hinarê li aliyekî ve çû.

Keçelok ji seyis ra go serê kerê dagerîne min bibe ba dewletê. Dagerandin ew anîn ba dewletê. Peya bû hat patekî avêt go ya dewleta min, emir bike, bipirse. Te ji min pirsek fikir, min jî ji te ra wiha digot. Dewlet go belê tê rast bêje. Keçel go belê ez ê rast bêjim. Dewletê go tu wê şevê li ku bûyî. Go ya dewleta min tu û wezîr hûn diçûn ser wê derê, hûn ji bo çi diçûn. Dewletê go welleh em diçûn, seriyek mirov li wê derê bû, capûnek li wê derê bû, şûrek li wê derê bû, kalibek sabûn li wê derê bû. Me tiştêk jê fahm nedikir. Me dît tu hatî, em nizanin te çawa çêkir, me zanî bû qîzik li jor bû gazî me ne fikir, em diman heta ber destê sibê me tiştêk jê fahm nekir. Me sitûyên xwe dixurand, em dihatin malê. Tu ew şev hatî nizamim te çavan kir ji wana , qîzkê gazî te kir, te bire ba xwe. Keçel go belê wisa bû. Dewletê go belê, ew çi bû.

Keçelok go ya dewleta min hûn zanin mana wê çi bû. Go ew serê han serê min be, ev ser bi wî şûrî jê bibe, ez bi vê sabûnê bêm şuştin, min sabûn jî da serê. Min bi vî capûnê hanê kefen biki, gotina te ji devê min dernayê ku ez hatime ba te. Go te dît tu li min hate xezebê, te min da îşkencê min ji te ra nedigot. Min dîsa şîfra xwe girt, ez dîsa hatim ba te.

Ez li ser kerê bûm, di ber mala wê qîzkê ra derbaz bûm, qey wê min dît ku tu li min hatiye xezebê. Hinarek di paca xwe da avêt li pêşiya min erdê ket, hinar ji hev du bela wela bû. Min zanî bû ku ew mana wê jî mesela min û xwe ji dewletê ra bêje, bila navê min û te li bajêr û cihanê da bela bibe, ez destûr didim. Eger wê destûr nedana, min digot? Welleh serê min bi wî şûrî jêbiba û bi wê sabûnê bihatima şuştin û

bi wî capûnê hanê bihatima kefen kirin û ez daxilî qebrê bibûma min jî nedigot. Lê belê ji ba wê ji min ra şîfre hat. Awa hinar avêt min jî fahm kir. Go here bêje bila navê min û te wek libê wê hinarê bela wela bibe, herkes bila pê bihise. Ez hatime min ji te ra got. Dewletê go weyla helal be ji te ra.

Heft zirne û heft defa daweta Keçelok û wê qîzkê çêkir. Ew jî xiste milê qîza wezîr. Wezîr li ba dewleta xwe dimîne.

Çîroka min çû diyara, rehme li dê û bavê hazir û guhdara.

Çîrokbêj: Qutbetînê Farqînî

Sal: 71

Dîroka Berhevkarîyê: 13.9.2018

Herêm: Amed- Farqîn

Xwendina wî: Nexwenda

Cihê tomarkirinê: Li ber çemê Dijleyê

6. Heca Rêvî

Hebû tune bû carek ji caran rihmet li dê û bavê hazir û guhdaran. Rêvîkek hebû rojekî bizina gundîkî mirar dibe, gundî jî bizina xwe digre davêje paş gund. Rovî dere wê bizinê dixwe, dixwe têr dixwe, zikê xwe dike meşk. Ka Rêvî koneye ye hezar fen û fûtî wî hene, wexta zikê xwe têr dike. Dibêje:

Law welle bese, ez ê îda hew malê xelkê bixwim, malê xelkê heram e û gune ye. Ez vî malê xelkê ewqa dixwim gelo ji min ra helal e, ne helal e? Mirin heye, axret heye, sox û sewal heye, ez malê xelkê naxwim îda.

Rêviyê me birê dikeve dere, heger pir dere heger hindik dere, dere rastî dîkekî tê. Dîk diwêje birayê, rêvî hevalê rêvî tu ji ku da têtî bi ku da derî? Rovî cuwabê¹⁸ dide diwêje:

Ez derim hec, derim mala Xwedê, bes e min pir gune kirine; va gunana ji me ra namînin birayê dîk, ewê Xwedê di pozê me ra bîne rokî. Em ji dêya xwe bûne

¹⁸ Cevap: Bersiv

nebûne, me tim malê xelkê xwariye em bi malê xelkê xwedî bûne tim çavê me li deriyê feqîr û fiqareya bûye. Xwedê wahiy şandiye, xeber şandiye dibêje heram e, gune ye. Em ji xwe ra herin hec û em li ber destê Xwedê tobe bikin, bira xwedê gunê me ef ki, em tobe bikin belkî xwedê toba me jî qebûl biki.

Dîk diwê ê welle hewalê rovî dilê mi heye ez jî bi te ra werim hec; eger tu jî qebûl bikî, min jî pir gune kirine. Min xew li milletê pir herimandiyê. Min nivê şevê merî bi çolê ve dişandin, bê wext. Millet li çol û çepela ji sermana mir, ew ê gura xwar in ê mirin. Ew ê serê xwe girtin terkî dinya bûn, çûn îda venegeriyan. Bes e îda eger tu jî bibêjî erê, ez ê jî bi te ra werim. Ez ê jî werim li mala Xwedê tobe bikim belkî Xwedê mi jî ef biki, em jî ne qûlê wî evdê wî ne qey.

Rêvî diwê:

Ê tamam hevalê dîk de tu jî were em bi hev ra herin. Da rêya dûr e, di rêyên dûr da rêwîti bi tenê nawe rê ne diqede ne jî bi dawî dibe. Rovî û dîk bi rê dikevin rê derin, derin derin, eger pir derin eger hindik derin, derin rastî kewekê tîn. Kew ba her duyan dike.

Kew bi dengê hêlê diwêje:

Birayê rêvî, birayê dîk hûn awa bi hev ketine ku da derin? We xwe xemelandiyê xwe paqij kiriye hûn derin şahiyê, derin şînê, hûn bi ku da derin, we xêr e heyra vê siwê?

Rêvî diwêje, welle em derin hec havala kew. Me pir gune kiriye xwişka kew, bese dawiya malê dinyayê nayê, axret heye binê erdê heye! Em ewqas guna dîkin dîkin ma soxîna guna, dibe ku vaya ji me ra nemîne. Xwedê ba kiriye dibêje kî were hec tobe bike ez gunê wan gişta ef dikim.

Kew diwêje, eger awa be bi sond, bi qesem gere hûn mi jî bi xwe ra biwin, qe newêjin na, de zirara mi nagê we ez li ser we nawim bar û piştî, weleh de hema ez jî bi we ra tîn.

Rêvî diwê, tu çima têyî çî gunê te heye xwişka kew? Ê tu ji xwe ra di halê xwe da yî ez yêqin nakim mîna me gunê te hewin ma ew ê te çî gune kiriwin?

Kew diwêje, law wer newêjin ma îşê guna ye, weleh qantir jî nikane gunê mi bikşîne. Ez derim berf dibare berf tê çogê, feqîr û fiqare tên diwêjin em ji xwe ra kewekî birên em zivistanê van şevê dirêj pê hedûrya xwe bînin bira ji me ra bixwîne. Ez jî li wir difirim dibêjim qaçibûk qaçibûk qaçibûk, dû ra difirim derim derik din. Disekinim dîsa dibêjim qaçibûk qaçibûk qaçibûk, ew ê meriv hemû li dû min bazdin. Bikevin mil û pêyen xwi serên xwi bişkînin. Ka awa dibe çî heqê min heye ez li wa meriya wer dikim ez ewqas bi wa ezyetê dikim. Welle ez jî tîm gunên min hîna ji ê we pirtirin. Em li mala xwedê tobe bikin belkî mi jî ef bike dilî wî bi me bişewite weleh heyra hema ez jî bi we ra tîm ji xwi ra.

Rêvî û dîk dibêjin: ê tamam tu jî were heyra ne lazim e, de rêwîtiye rê ya me dûr e hezar bela û bobelatê dinyayê hene, ew ê di rê da hedûrya me jî bi hev weri. Belkî xwedê gunên te jî ef bike.

Her sê heval bi rê dikevin. Dimeşin dimeşin dimeşin, eger pir derin eger hindik derin. Kund mezê dike rêvî şarek kesk dayê serê xwe, li serê xwe piçaye, dîk bi cende rovî ketiye dîk xwe tixozî kiriye, nikilê kewê sor kiriye û ji wê da çer tîm. Kund meraq dike diwêjê:

Birayên rêvî, birayên dîk, xwişka kew hûn derin kêrê vê kelkela nava royê, we xêr e çî tawa ye? Rêvî diwê, welle em derin hec havalê kund. Me pir gune kirine, em ketine ber gunê am û tama. Bese dawiya malê dinyayê nayê, axret heye binê erdê heye. Em guna dikin û dikin. Em diwên belkî vava ji me ra bimîne. Xwedê ba kiriyê gotiyê evdê min ê gunehkar kî were hec tobe bike ez ê gunên wan gişta ef bikim.

Kund diwêjê, law welle ez jî tîm min jî bi xwe ra bibin, gunê min jî pir in. Rêvî diwê law te çî gune kiriye tu çima tîm heyra qurba, ti dawa çî li xwe dikî?

Kund diwê lalaw gunê min tew ji ê we bêtir e. Ew ê zarok serê siwê da heta êvarê li dû min bazdin ji ser taht û zinaran da bikevin serên wan nigên wan bişkê. Weleh hema ez jî bi we ra tîm eger bi razaiya we be jî.

Rêvî û dîk û kew giş bi hev ra diwêjin tamam di rêwîtiyê da hevaltiya bi hev ra xweş e, sebra me ra bi hev tê. Tu jî were, ma qey tu li ser me diwî bar û piştî, ma em te li piştta xwe dikin, tu jî were, belkî Xwedê gunê te jî ef bike.

Her çar bi rê dikevin, eger pir derin, eger hindik derin, de sê royê bê navber di deşt û zozanan derbaz dibin li ser çiya baniyan ra dibihurin. Eee de germa havînê yi, giş ji tîna telaqreşî bûne, ji birçîna rêviyê wa bi hev ve zeliqîne. Sê roj e rêviyê me tiştekek nexwariye devê rovî bi goşt nebiye, qur qura zikê rovî ye diki tê da weri. Rêvî koneye fen û fûtê wî pir in, dide ser hev, dide ber hev, davêje aqilê dawîn, difikire dibê gelo ez çêr zikê xwe têr bikim. Dû ra tiştekek tê bîrê. Dibê ê wele tamam e, hema ezê dîk, kew û kund bixwim de way ji xwedê ve eyani ma ez dikim ji birçîna bimirim. Ma qey ez ji kefa xwi dixwim de ji mejbûrî yi heyra; lê ka ez ê vana çer bixapînim, ez ê çer bînim hesêw.

Rêvî diwê hevala kew, hevalê dîk, hevalê kund, şev ket ser me. Em sê şev û sê ro ye dimeşin, em tam westiyane, ji xwedê ve eyan e em ji kastîna da ketine. Em ji xwe ra cîkî biwînin, em rakevin, hindîk bîna xwe bigrin ez yextiyar im, îda çogê min nagirin. Her sê heval diwêjin wele were ye, eynî em jî mîna te westiyane, em giş ji hal da ketine; lê ka em herin li ku rakevin. Were be em ji xwe ra cîkî bi keys biwînin.

Rêviyê me diwê teww, eger wer bi hûn giş bidin dû min xwe eciz mekin, ez cîkî xweş ji me ra biwînim. Rêvî diwê ez van deran mîna mala xwe zanim wextekî mi li van deran mahkûmî dikir, ez qulik û pilikê vira gişî mîna kefa destê xwe zanim. Diwê mala Tûsikê heye hema a li vê newalê ye em herin mala Tûsikê. Tûsik meriya min e. Ew ê me bihewîne. Em herin mala Tûsikê, em biwên nîvanên Tûsikê. Tûsik ji hazira ne çêtir be pir nîvanperwere.

Her sê dibêjin law birayê rêvî em çar hebin Tûsik belkî bi me gişa razi newi. Ew ê me qebûl bike gelo? Şerm nine em her çar herin mala Tûsikê, em Tûsikê eciz mekin?

Rêvî diwê wîîî hevalno! Tûsik nîvanperwere, xwediyê êl û eşîra yi çer me naxwazi, me qebûl naki, ew jî gotine. Rêvî diwê hadê bikşin em herin. Her sê dibêjin tamam û bi dû rêvî dikevin, lê dixin derin. Derin derin rêvî diwêje mala Tûsikê avaya ye. Her sê mêze dikin, qulek dirêj e dawiya qulê nexuyaye. Qulek sor e û dirêj e binê zinarekî mezin daye. Ji her sê hevalên xwe ra dibêje mala Tûsikê wek mala min e.

Rêvî diwê da hadê hevalno kerem kin, derbaz bin, fedî mekin, mal mala we ye ha hûn fedî û şerm bikin hûnê dilê min bihêlin, bikşên herin. Her sê diwêjin wî birayê rêvî tu bide pêşiya me, Xwedê mezin tu mezinê me yî.

Rêvî diwêje, na hevalno mêvan pêşiye derin, ez ne mêvan im, ez xwedyê malê me. Ez li dû we tîm. Her sê dibêjin ê da madem awa ye tamam em ê pêş ve biçin tu dû me ra were. Kew dere, dîk dere, kund dere, rovî jî li dû wan dikşê dere.

Rêvî xwe dide ber devê qulê. Eee de rêvî birçîna çavên wî tarî bû ne. Nizane çer bike, sê şev û sê roye zikê rêvî bi piştta wî ve zeliqî ye. Hevalên rêvî giş davên ji îmana xewê da, radikevin pîxîna wa ne. Rêvî jî birçîna xew nakeve çavên wî. Rêvî mêze dike diwê pir pira dîk.

Rêvî diwê law xêr e te, tu çer dikî birayê dîk? Dîk diwê, ê siwe ye ez ê meriya ji xew şiyar kim, bira di wextê da rawin her in ser kar û barê xwi.

Rêvî diwê, law tu ji xwedê natirsî, tu fedî û ar nakî, tu miletê di vê seatê da ji xew radikî. Giş li çol û çepelan mirin, gura kerên wan xwarin, ji sermanan qefilîn. Tew imana te tune ye, hey bê îman û bê wijdan tu fedî û heya nakî, tu orta şevê ba vê miletê dikî gişa ji xewa wa ya şêrîn radikî.

Wer dibêje û hema xwe davêje serê dîk, dîk dike nav qîlê xwe û dixwe. Tew dîk nikani biwêje qirt, tew nayli devê xwe veke. Zikên xwe hinkî têr diki, berkela xwe dike. Radikeve, ber destê siwê dîsa bi xwe dihesê; car dibe qur qura zike rêvî. Awa mêze dike pir pira kewê ye îja.

Rêvî diwêje xwişka kew tu çer dikî pir pira te ye vê zûtika serê siwê, te xêre? Kew diwê birayê rêvî, siwe ye. Ez derdikevim derve qijanya berfê li erdê ye, seyidvan dikin derkevin devre, ez ê jî ji xwe ra derkevim.

Rêvî diwêje, tu fedî û heya nakî, tu jî xwedî nav û namûsî, tu bang miletê dikî, tu dibêjî qaqûbûk qaqûbûk qaqûbûk. Tu dibêjî dêya we, jina we zarokên we, bavên we, tu tiştêkî ji miletê ra naylî, tu fedî û heya nakî, tu ji miletê ra xeberên pîs, nebaş didî.

Kew diwê law na law wele bile ez xebera nadim xeberê çî halê çî, şaşîya te heye law. Ez tiştê bi vî away nakim birayê rêvî ne xûy û xisletê min e. Rêvî me diwê na, hutil mitul tu xeberên nebaş didî ji milletê ra, ez zanim.

Rêvî hema xwe davêje ji kewê da, kewê jî li wêrê dikirtîne di peritîne û datîne wêrê. Zikê xwe têr dike, diwi siwê îja dere dora kund digere. Kund mêze dike rêvî li der û dora wî digere.

Kund diwê, te xêr e birayê rêvî, tu çîma li dora min derî têyî, li dora mi digerî? Rêvî diwê wele ez te dixwim, hew biratiya min û te qedya îda. Kund diwê na weleh tu nikarî min bixwî, ma ne me got em birayê hev du ne, hevalê hev du ne. Rêvî diwê kê va tiştê gotiye, mi qisek awa nekiriye, me sozek awa nedaye hev. Kund diwê ê tamam heyra, tu min çîma dixwî sûc û gunê mi çî ye; ji mi ra biwê gene ez jî zaniwim?

Rêvî diwêjê law tew tirsê te ji xwedê tune ye. Tu vê sermê tu nê herî li ser sergoya bikevî zarokê ew ê li dû te kevin, xwasî bazdin nexweş bikevin, li ser kevir û zinaran da laşên xwe birîn bikin. Heqê te ne mirin e hiii! Tu bibêje bê îmanê bê wijdan!

Kund diwê welle tu neheqî birayê rêvî. Ez li ser sergo û zinaran difirim derim va heqê min e. Heger tu ji min bawer nakî ez ba şahidê xwe bikim bira werin di nava me kevin hela kî ji me neheqe.

Rêvî diwê law şahdên te kî nin. Kund diwêje şahdên min qaz û bet e. Rêvî difikre dibêje law welle kund pariyek e, ber didinê mi tije nake; gene ez qaz û betê jî bixwim ji xwi ra ez heft roya jî birçî nabim.

Rêvî diwê ê da hadê ba şahdê şihûdê xwe bike, kî ne bira werin hela diwêjin çî. Kund difire û rovî jî dide dû kund. Kund li wir dikeve, li vir bilind diwê hevraza dide xwe û difire. Difire û her difire rêvî jî li dû ye. Şivan li ber pez û bizanan in. Berf li erdê ye seyidwanan jî tajiyên xwe girtinin derin seydê. Kund dere ser qûçekî dikevi. Rovî jî tê bin quçê ve hilma xwe digrê.

Kund diwê emê li vir bisekinin qaz û bet li ku win ewê werin. Rêviyê me diwêje tamam da bira ew jî werin em ê li benda wan bisekinin. Rêvî me li wêrê di xew ve dere, radikeve. Wexta rêvî radikeve seyidvan û tajiyên xwe tên tên nêzîka quçê.

Kund diwê birayê rêvî, birayê rêvî! Rêvî diwêje ha! Kund diwê da rabe birayê rêvî şahidên min waye hatin. Rêvî awa radibe serê xwe bilind dike, mêze dike weyy bavoo, ku çi bibwêne tajiyan dor lê girtiye.

Kund diwê birayên rêvî te şahidên min qewul kirin gelo?

Rêvî diwê, ek ez bifilitim ez şahidên te qewul dikim; lê belê ez nefilitim jixwe ez ji kîsê dê û bavê xwe derim. Seyidvan û tajî hemû didin dû rêvî, dibe ewte ewt û hilo hiloya wa.

Seyidvan diwêjin: Law rêvî çû, law rêvî çû, ha bernedin, ha bernedin. Ha belek, ha belek, sor tê ne wekî belekî, ha belek ha belek...

Xevrîşoka me li diyara rihme li dê û bavên guhdaran ji xeynî beqçî û muxtaran.

Çîrokbêj: Tûlay Bingol

Sal:30

Herêm: Amed- Erxenî Gundê Pîrahmedê

Dema tomarkirinê: 10.01.2018

Xwendina wê: Zanîngeh/ Civaknasî

Cihê tomarkirinê: Li navçe Erxenî/ mala wê

Yên jê hilkiyê: Ji diya xwe Şanê

7. Mala Kulfikê

Go malik hebû, go qîzik wa hebû. Qîza wa mezin bû, tamam bû, berzewac bû. Go, go rokê xwazgîniyê qîza wa hatin.

Go xwazgîniyê qîza wa hatin, go diya qîzikê; go, qîza min xwazgîniyê te wayi hatine. Go êvar e, me dîk serjê kirî, ancax em êvarê bi şîvê ra bighîninê. Go ava me tune, tu here kaniya paş gund avê bîne. Go zû here, satila xwe bigrê here. Avê zû bîne di wextê da em şîva nîvanê xwe zû hazirkin.

Go qîzikê satila xwe girt û serjêrê kaniyê bû, avê bû, çû. Serjêrê avê bû çû, keçik çû, keçikê satila xwe di avê da kir, derket der. Ji nişkava ket aqilê wê, awa li kaniyê mêze kir, ehe! Go welle vaye xwazgîniyê min hatine, go welle ew ê diya min û bavê min ê bidinê, ez ê herim mala mêrê xwe û Xwedê zarokî bidi min, zeman hebû ew ê mezin biwe, ez ê werim cem mala bavê xwe, zemankî va zaroya min jî bi min ra were ser vê kaniyê, a ew ê destê xwe bavêje vê kulîlkê û ew ê jor da bikevi vê kaniyê û bixeniqe û ew ê here.

Go wey hahoo haho, haho li min ê, haho li min ê, va çi bû! Go, şîna xwe danî û li wê derê xwe di çamûrê da hilda û xwe li erdê bor kir û neçû mal. Ya hewl û belaa. Jinik, diya wê jî destê wê di ewa dîk da ye, law diwê va qîzka çû û nehat, law qîzka gere bihatana, va a pê hinka ket, însan halî, va ket kaniyê, xeniqî, va çer bû?

Hima diya wê destê xwe, naşo û hima ew jî serjêr dibe, berjêr dibe ser kaniyê. Tê ser kaniyê awa mêze dike bavoo qîza wê waye li ser kaniyê xwe bor dike û çamûrê da xwe hildayi. Ba dike, keçê qîza min, çer bû, çer bû? Dayê dayê tu hîna diwêjî çer bû, ma hala were çer bû! Tê hindê, çi ye qîza? Ê diwê dayê waye xwazgîniyê min hatin û min didinê û diwê ez ê herim mala mêrê xwe û Xwedê zarokî bide min û zaroyê min mezin bibe, car di ez ê bi xwe ra bînim, ew jî bi min ra were ser vê kaniyê, destê xwe bavêje vê kulîlka û têkeve vê kaniyê bixeniqe, ka em ê çi xweliyê li serê xwe kin. Way qîza min gi serê diya te ye, û hahoo hahoo haho. Ew jî xwe davêje ser, ew jî nare. Dê ji keçikê xirabtir e, ew jî nare.

Bavê wa li cem nîvana rûniştiye. Mêrik mêze dike, xwediyê malê ha, mêze dike deng ji aliyê malê deng tê birîn, deng tune ye. Teyî wer mal kerr bûye. Law diwê qey vana kuda çûn, vana çer bûne, çima wer bêdeng bûne. Ji nîvanê xwe ra diwêje hela hun musahde bikin, ez derkevim der hela ez jî herim derve. Misafir diwêje ser çahva, here diwê lawirê we heye, karê we heye, îşê we heye bikin.

Diwê hîn wext heye tişt nabe, here îş mîşê xwe bibîne car were, diwê em ji xwe ra wa ye galgala dikin, rûniştine. Va deri diwê çi heyi, vana li ser kaniyê tişteke bûyi. Va qîzka çûye ketiyi bîrê, va pê hinka ket, va çer bû diya wê çûyi, dê jî natîyi, hele diwê ez jî herim. Va bavê qîzkê dikeve riya kaniyê ew jî deri ser kaniyê. Ba dike; keçê qîza min çer bûye, çi tawa ye? Diwê, hela were were pîreka wî ba diki, ma hîn tu diwêy

ma hîn çer bûye hal mesele awa awa. Wey diwê giş serê bavê we, hahoo hao haho. Ew jî xwe davê ser wan, şîne datîne, nare.

Lawikikê wa jî heye xort e, tamam e îda. Lawik tenê dimîne, ew deri hinda nîvanê xwe rûdini, mêze dike mal bêxwedî mayi, la vana giş li ki ni lawik jî; apo musahda we heye ez gavê derkevîm devre. Diwê her oxil tu jî here, diwê here ji xwe ra îşê xwe mêze ke, lawirê xwe mêze ke, diwê di wextê da em ji xwe ra rûniştine, here.

Lawik çoyê xwe digrê, ew jî serjêrê kaniyê dibe. Deri ser kaniyê, awa mêze dike baavoo! Hela helayê wan e, şînik dani ni, qîr qîrê wa yi, hawo hawoya wa yi, law va çer bûye hîna dûr e; dayê bawo çi ye, çi tawa yi? Law hela oxil were hela tu hîn diwêjî çito bûyi! Hal mesele wa ye, xweya te vaye xwazgîniyê wê hatiye em didinê û deri mala mêrê xwe û diwê Xwedê zarokî bidyê û ro hewe ewê were mala me, zarya wê jî pê ra were, destê xwe bavê vê kulîlka û têkeve vê bîra û bixeniqe, em ê çi xweliyê li xwe kin lawoo! Wey diwê aqilê çûçikê jî di serê we de tune kêma aqilana. Lawik ço di desta ye û lawik davêyê, davê ser hev, davêyê, davêyê li gişa dixê wer dike tamamiya wan dike.

Lawik bi bayê bezê tê mal ji xwazgîniya ra diwêje apo diwê ewa ki hun hatine îşê me nabe, qusûrê me mêze nekin, hun kanin rabin. Vana diwê êlese qîzîk pê hinka ket û çû. Ê diwê ser çava Xwedê teala qîsmet nekirî, nekiriye. Xwazgîniyê wê radibin derin. Ê vana tîm mal. Lawê wa jê ra diwê; dayê, bawo diwê bi erd û esman, diwê gereke ez serê xwe bigrêm ji malê ez herim, ez gere ez nêma, eger ji we ahmaqîr, ez meriya bibînim wele ez ê vegerim malê, wele ez nebînim ez car din nayêma vê mala we û lê dixê deri.

Ji welatê xwe derdikeve deri. Di de rê, ha li vir, ha li wir, rokê mêze dike êvar e, ber gundkî şên ra deri, awa mêze dike qîz û bûk li ser kaniyê ni. Ê ki feray xwe tije kirine dibin mal, gi bi hev henaka dikin, teraqa dikin, pirr in. Lawik jî ji xwe ra ber wa ra derbaz dibi, deri riya wî jî ber bîrê ra deri. Hew mêze dike hema bûkîk ji nav qefle derdikeve, va hat pêşiya lêwik. Diwê keko keko! Diwê hay. Lêwik ra diwê ji ku têyê? Lawik diwê ez ji dinya wî alî tîm. Heh diwê, diwê te filankesê me nedî. Ma diwê ez ji cem wî tîm. Diwê ne go çi?

Diwê gotiye wele ji ji mala me re biwmje ji min ra zêra, pera bişîne. A din diwê te ê me nedî. A din tê, ê din tê, lê top dibin. Lawik gişî dide nav xwe, topê hev dike û ji gişa zêr û pera dixwaze. Û lêwik didin nav xwe derin, dibin nava gund. Gund gişî lê top dibe û jê ra zêr û pera, tişt û tê heqîwa lawik tînin tije dikin. Lawik heqîwê davêje ser pîyê xwe, diwêje de hadê bi xatirê we, ez emanetê we dibim teslîmê miriyê we dikim. Diwê here oxir be.

Lawik diwê wele îlle ew ê yekî baqil di vana da derkeve, îlla yekî baqil di vî gundî da derkeve, ew ê pa ra pê min keve û lawik deri. Lawik bi rastê dikeve deri. Pêra deri muxtar jî ji bajêr tê. Baz didin pêşiya muxtar, diwê îro yek ji aliyê cem filankesê me hatibû, ji cem miriyê me hatibû. Keçê çer dibe ji cem miriya tê. Wele diwê hatibû diwê me pere dayê, me zêr dayê, diwê mala filankesê, mala kê ewqas, waqasana zêr û pera dayê. Wey diwê min dihestiyê bavê we kiro, hela weri va bêaqilana, diwê hun dînin, hun çî nin hun însanê vê dinyayê ninin lê dixeyîde, hêrs dibe. Muxtar diwê ji min ra wê hespa min bînin hema derin hespa wî tînin. Diwê ket kîjan rê. A diwên vê riya. Hema hespê jê ra tînin, muxtar lê siwar dibe, muxtar berê xwe didiyê dike ser wê rê.

Lawik awa mêze dike siwarek jî para dayi dû, toz û dûman bi ser xwe xistiyû û tê. Çer tê lawik diwê wele aqilliyê wa waye tê, lawik vedigeri beyarê. Hema ji rê derdikevi, deri nav beyarê dike nav pelaxê, vedişêre û dikeve riya xwe dewam dike deri. Siwarê, muxtar tê taxê, law diwê selam û aleykûm xorto, diwê aleykûm selam apo. Law diwê xorto yek aniha vê riya da hat, heqîwek li ser piyê wî bû diwê qe te nedî, ha diwê wele apo min dî, aniha pêşiya me ket vî serjêrî wî rûbelê wî alî bû û diçû. Û diwê tamam û hespê zengû dike, hespê zengû dike, çer hespê zengû dike lawik ba dike; apo apo! Apo diwê ha. Ma diwê apo Xwedê ji te razî tu çima wer derî?

Diwê ka ez çer herim. Diwê ma Xwedê ji te ra razî bo ma diwê ê wî du nigê wî ne; yek du, yek du. Diwê ê te çar nigê hespa te ne diwê heta tu bibê yek didu sisê çar, diwê tu nagiyê wakîna bi hespê. Heh wele diwê tu baqilî. Muxtar jî dixapîne. Muxtar dibê tu vê hespa min bigrê, ez xwe para bigînimê. Muxtar çer dikeve neqewê, kortê, vaya hespa wî digrê heqîwa zêrê xwe davê paş xwe û berê xwe dide malê. Welleh diwê min ji mala xwe ahmaqtir merî dîn ez ê vegerim herim mala xwe û vedigere.

Wê şevê tê tê, rê da tê serê sibê dibe birçî ye, birçî dibe mêze dike waye feqîrek way ji xwe bi ga cot dike bi halet deri tê, durima wî ne xweş e. Tê taxê diwê law qewet be cotkaro! Diwê xêrhatî silamet. Law diwê cotkaryo law wele ez pir birçî bû me diwê tu kanî ji min ra tasek şorbe û nankî bîne diwê wele ez ê vê heqîwa zêrê xwe, vê hespa xwe tev hev teslîmê te bikim. Cotkar jî feqîr e, tiştêkî wî tune û çer wer diwê gayê xwe disekinîne. De diwê tu a li vira rûni. Lawik diwê ez ê li serdora te rûnim heta tu derî ji min ra tînî û hima cotkarî li baye bezê baz dide tê mal, ba jinikê dike. Diwê jinik jinik, waye yekî dîn hatiye serdora min, birçî bûye diwê gotiye tu tasek şorbe û nankî bîne welle ez ê vê heqîwa zêrê xwe û vê hespa xwe teslîmê te bikim.

Diwê zû şorbê bide ser ez bidimê. Jinik diwê welle şorba me tune mêrik. Eheh diwê wele ka em çer bikin. Diwê jinik hela here mala bavê xwe tasek şorbe bîne. Û hima jinik baz dide deri hinda mala diya xwe. Diwê day dayê, diwê welle waye mêrikê min way hatiye gotiye yekî dîn hatiye birçîye serdora cotê min rûniştiye, diwê heqîwa wî tije zêr e hespik rind pêra ye, diwê gotiye bîne ez ê heqîwa zêra û hespê giş teslîmê te dikim. Diwê qîza min birê here hima tasa şorbê tê da dike û de zû bibe, bikelîne. Tasek şorbe jinik ji mala diya xwe tîne dikelîne berdide beroşa xwe dikelîne.

Diwê jinik, jinik diwê hay, diwê jinik heta şorba me bikele diwê em afirê hespê xwe çêkin jî, diwê erê. Hima çamûrê li hev dixin û di ber derî da kevira datînin, dorê lê dikin çamûr mamûrê li dorê dixin û aha diwê me yanliş kir, diwê çima. Diwê welle vira pir ber qêpî da ye diwê em paş hespê ra derbaz bin, diwê hesp pînê bavê, diwê hespê pînê li me xe. Ê diwê ka em çer bikin ê diwê jinik ez hespim tu jî merî yî diwê awa paş min da derbaz bibe, hela pîna min digê te ya nagê te. Jinik diwê bira be. Ew dikeve, xwe dide hinda afir, jinik jî paş ra derbaz dibe. Jinik jî îda li roaroya ye, hemle ye.

Wê çaxa ki jinik paş ra derbaz dibe, mêrik pîna xwe çer davêje, ser dilê jinikê dixê, jinikê ser hev da diqeliwîne. Jinik dikeve erdê û zaroya jinikê ji ber deri û neyse tîn şorba xwe dikelînin şorbê dirê tasa mangedoş, nanê xwe dide ser şorba xwe, awa destê xwe bin tasê deri, jorda xwe ji sergoda ber dide, jinik jî darbe xwariye, feqîrê perîşan bîye. Ew jî xwe li pê kaş dike, kaş dike xwe digîne ser sergo. Law diwê mêrik mêrik, diwê hay diwê mêrik welleh mêze min şorbe ji mala bavê xwe aniye, diwê mêze coniya zikê hespê ji mala bavê min ra ye, wê çaxa diwê çavê wî bar nabe. Xwarê erdê

dibe, diwê ez vî qırşa nadim mala bavê te, xwarê erdê dibe şorba germ paş hustiyê wî da dikeve giş diperte, ew jî dişewite. Car din tê şorba din diwe, heta deri mêze dike çi gay e, ga jî çûye; ne mêrik e, ne hesp e ne zêr e. Çû lêxist, lêwik ew jî xapand, ser xwe ra avêt derbaz bû hat mal.

Hat mala xwe, hat mala diya xwe û bavê xwe. Diwê welle ez nedihatim vê mala, diwê min ji we ahmaqtir dî. A va heqîwa tije zêr e, a va hespa difindûz ji we ra anî, diwê ez hinkî rihet bû me. Diwê ji we dîntir min merî dî ez hatim mala xwe.

Çîrokbêj: Nejdetê Tilxûmê

Sal: 66

Herêm: Amed- Erxenî gundê Tilxûmê

Dîroka Berhevkarîyê: 10.10.2018

Xendina wî: Nexwenda

Cihê tomarkirinê: Li şikeftên Hîlarê

Yên jê hilkerîye: Ji kalê xwe yê Evdil

8. Mîrza Mihemed

Çi hebû, çi tune bû, axaki hebû, ew û jina xwe û sê heb kurê xwe hebûn. Dewlemend in, zarê wî mezin dibin, her yek bîst pênc sî salî ne, kes nezewicîne. Îcomê dê jî jina axê ye, bav axa ye. Ma karê malê giş di hustiyê birayê biçûk da dimîne. Navê wî jî Mehemed e. Salkê du sala wa Mehemeda karê malê dike, îcomê hew debar dike, rokê dere ba bavê xwe; dibê bi Xwedê wa çend sal e karê malê ez dikim, ji min bes. Em sê heb bira ne, du ji min mezintir in. Dibê birayê mezin bizewicîne, bira karê malê jina wî bike.

Bavê wî dibê kurê min, dibê ba birayê xwe bikin. Dere ba her du birayê xwe dike, dibê bêje. Dibê ez niha kanim we hersêya bi hev ra bizewicînim. Lê mixabin şertekî min heye, hûn kî vê şertê min bînin cî, ez ê wî bizewicînim.

Ê dibê kerem ke şertê xwe bibêje. Dibê şertê min, teyrê Ababîl heye, kes nizane li ku derê ye, hema dibê li çiyayekî pirr asê, dest keleşan da ye, ew kesên ku rêbiriyê

dikin, serokê wan jî heye. Bi sedan keleş wî diparêzin, di şikeftê da, li wê hêlê ye. Kî jêhatî be here wî teyrê Ababîl bîne, em ê daweta wî bikin. Wele, dibê ser sera, ser çavan.

Her sê bira nan û ava xwe didin piştê xwe, ji gund derdikevin. Dibê derin, derin, gellek ji gund dûr dikevin. Carê mêze dikin sê heb rê li pêşiya wa vebûn. Dibê li ser rêkê nivîsandiye *çûn heye, veger tune* birayê mezin û navîn xwe didin ser rêyên din. Ew rêya ku çûn heye, veger tune ji birayê biçûk ra dimîne. Mêze dike mecbûr e, dibê qay vayîn qedera min e, para min ketiye. Va ez ê jî di vê rêya da herim. Birayê wî dibêje law tu jî bi me ra were. Law dibê ez ê herim. Vayin dide ser rêya xwe dere. Mehîmed hewkî dûr ket şûn da, du birayê din jî bi hev ra bi rêkê da derin. Va birayê wa yê biçûk gellek ro dere, çolê mêze dike, di orta çolê da qonaxek wa mezin heye û dorê da digere nagare derî, tişteke tune merî bikeve qonaxê. Vir da, wir da mêze dike ban dike, diqîre carê mêze dike paca wê pîr bilind qîzîkek derket pacê. Yaw, dibê rê mê tune, derî tune, ez çawa werim jor?

Bi Xwedê dibê rê mê tunin. Dibê zîlamê min çûye çolê, zîlamê min jî dêwek e. Ew jî her ro diçe çolê, dema dere nêrdanê bi xwe ra dibe. Dibê em çawa bikin. Qîzîk bend bera jêr dide, werisa bi hev girê dike û vayîn pê hildikişê jor. Xwarin marinê jê ra çêdike. Hev û din pîrs dikin. Hûn kî nin? Tu çawa yî falan. Lawik, mesela xwe jê ra dibêje; wellehîn a wa a wa, hal mesela me awakîne ye. Bavê me tişteke gotiye em jî li ser wî ketine rê. Ji qîzîkê ra dibêje; tu çi yî, çerkîna hatiyî vir.

Dibê ez ji falan bajarî, keça filan kesê, axa bû dewlemend bû bavê min. Dibê dêw ez revandim, ez anîme vê dera. Çend sale jî ez li vir hepsî me. Ê dibê baş e. Wa êvar dibe, jinik dibê law Mihemed, dibê bi Xwedê niha wê dêw were mal, eger di vir da te bibîne, dibê ew ê te parçe parçe bike. Dibê rabe ji xwe ra here. Vayîn dibê wellehî ez narim. Law diwê here, wê te bikuje. Dibê ez narim, bira were, Xwedê ya ê bide min ya ê bide wî. Mêrik xwe di cîkî da vedişîre, li alî nivînan.

Dêw êvarê tê mal, hinkî bêhna xwe digrê, dibe hum huma wî. Ji jina xwe diqahire, dibê kes di mala me da heye, dibê kî ye? Jinik dibê kes tune. Vir da wê da, va hum hum bi dêw dikeve, kef bi devê wî dikeve, dibê bibêje ez ê te bukujim. Lawik mêze dike wê li keçikê xe.

Mehemed ji paş nivîna derdikeve, şûrkî wî heye. Vana di hundir da davêjin hev. Yek ji wî yek ji wî, welhasil dêwê heft serî dikuje. Wê şevê li wêrê dibe, serê sibê dibe, xatir ji jinikê dixwaze, dibê ez ê herim. Yaw tu ku da derî, bimîne, an min jî bi xwe ra bibe. Dibê wellehî ez nikanim bimînim ne jî kanim te bi xwe ra bibim. Şertekî bavê min heye, heta ez nehînim cî ez venagerim.

Ê baş e dibê va Mihemed gellek dere û ro derbaz dibe. Dîsa li deştekê bi wî şiklî qonaxek din jî dibîne, eynî qîzikek, eynî dêw. Li wê derê jî şerê dêw dike, dêw dikuje û serê sibê dibe, xatir jê dixwaze. Qîzik dîsa dibê min jî bibe. Dibê na şertê min heye. Çend rojê din jî dere, dere qonaxa sisiyan, eynî şeklî, eynî li wê derê jî eynî hadîse çêdibe. Wî dêwî jî dikuje. Sê heb qîzên bedew di qonaxan da dimînin. A sisêyan bi şev wa derdikeve der, mêzedike bi çavan agirek diçurise, bi jinikê ra dibêje ew agira pirr dûr e, pirr nêz e, çi agir e? Bi Xwedê dibê em nizanin, berê digotin li wê derê keleş henin, dibê li wê derê, li wî çiyayî şikeftê diparêzin. Ê kes jî newêre here wê mintîqa wan.

Vayîn difikire dibê her hal tiştê bavê min gotiye her hal ew e. Serê sibê xatir ji qîzikê dixwaze, lêdixe, heftêkê filan dimeşe, xwe digîne wî çirûska arî. Bi şev digê wê derê. Mêzedike bavooo! Şikeftek devê wê pir mezin e, lê belê li der û dora şikeftê jî çel hew beroşê kergê, agir danîne binî, goşt moşt, şîv li ser dikele. Li ber her beroşkê jî keleşek razaye. Dibê vayîn mêzedike, wana di xew da ne. Vayîn hêdî hêdî, yek bi yek serê gişa jêdike. Jêdike derbazê şikeftê dibe.

Li wê şikeftê mêze dike di hundirê şikeftê da paceka mezin heye, ciyê wê jî fereye û hinek kes jî di şikeftê da razane. Vayîn li kesê razayî dinêre, li pacê dinêre, mêze dike teyrek di hundirê pacê da ye, lê teyr bêdeng e. Dibê wa di hundirê pacê da dide dû teyr, dide dû teyr bi satan, teyr diweste, teyrê pêdigrê. Dibê teyr diweste hîn pênegirtiye, yekî ku li wê derê raketiye xwe dike paşla wî, dere destê xwe davê paşla wî, hima teyrê digrê, mêze dike kitêbek heye. Wê kitêbê jî digrê. Ji wê derê derdikeve.

Va Mihemeda ew qonaxê destpêkê li wê bû nîvan ya, şûn da vedigere, yek bi yek wa jina digrê, mal û milkê dêwan hene, zêr û zîvê wana gişa bar dikin. Li deveyan, li hêstiran û keran û dere hersê qonaxan tiştê xwe gişa bar dike, lêdixin derin.

Dibê em herin memleketê bavê xwe. Gellek zeman derbaz dibe, em bibên wek bajarek biçûk, di ber ra derbaz dibin, nanê wan qediyaye. Dibê wa Mihemeda ji hersê qîzan ra dibêje, hûn li vir bin, ez ê herim bajêr ji me ra hinek tiştê xwarinê bigrêm û werim. Dibên tamam. Vayîn dere bajêr tişt miştê xwarinê digrê.

Ew ê êdî ji bajêr derkeve, carê mêzedike du kes, du hagê rêxê li pišta wan e, vîjik paş hustiyê wan ra dave ser solê wan ra derdikeve. Ruyê wan pîs, simbêlê wan giş li nav hev ketine, awa xweş mêzedike, law dibê vana birê min in. Neyse dibê hela werin, bang dike, we xêr e, hûn bi çi dişuxilin. Dibê em bi qurişekê dişuxilin. Dibê werin ez ê royê serê merî zêrekî bidim we, werin cem min bişuxilin. Vana jî feqîro ji birçîna dimirin, hima yekser dibên tamam. Hagan hima li wir davên, dibên em tên. Va Mehemed ji wan ra nabê ez birayê we me, ew jî nas nakin. Sal zeman derbaz bûye. Wana dibe hemamê wa xweş dişo, ji wêrê dibe berber rî û simbilê wan jêdike, diqusînin, kincê wa xweşik lêdike, tam qeşeng dibin. Wana digrin dibin cem karwanê xwe. Vana mêzedikin bavo! Terş û zêr û zîv û deve û hêstir gi barê xweşik in. Dibê vana giş ê min in.

Wana neyse lêdixin derin. Bi rê da Mehemed ji vana pirs dike; hûn çi kes in, ji ku derê ne, kuda derin? Welehîn dibê bira qe pirs neke; bavê me axayê filan derê bû, mal û milkê me pir bû. Hal mesala me awa bû, awa bû. Em sê bira bûn, birayê me yê biçûk di rêkê da çû *çûyîn heye veqer tune* em jî li vê dera xulamtiyê dikin ji xelkê ra, ew jî çû. Mesela me vayîn e. Pekî dibê, hûn wî birayê xwe bibînin qe nas nakin. Welehîn dibên ka çend sal derbaz bûye, wê çaxê ciwan bû niha mezin bûye, feqet dibê hewkî dişibû we jî. Neyse vayîn mêze dike, dernaxin, Mehemed li wir xwe ji wan ra dide naskirin.

Diwê ji nû ve derin rû û lepên hev û xêrşayê tînin. Rêya wan dûr e, Mehemed dibê keko. Dibê hay. Dibê van karwanana me anîne, em ê zatî niha herin qonaxa bavê xwe, wa jinana jî a mezin ji birayê mezin ra, a ortê ji birayê ortê ra, a biçûk ji birayê biçûk ra. Ê mal jî em ê bibin teslîmê bavê xwe kin, bavê me çi da kê. Ê dibê ser sera ser çavan. Dibê vana derin rê da ew her dû birayê mezin û ê ortê carna şûn da dimînin. Law diwê va birayê me yê biçûk waqasana tiştên jêhatî çêkin, ê diwê niha em herin mal, ka em bi çi rûyî ji bavê xwe ra em ê biwêjin me awa awa kiriye, va tiştina me anîne, qîmeta me ne li cem bavê me, ne li cem miletê me namîne. Dibên em çawa

bikin, law dibê em birê da tişteki bînin serê vî birayê xwe. Dibên em terşên xwe avdin. Ji bo vexwarinê avê bînin. Her du bira gotina xwe yek kirine.

Birayê mezin dibê bend bi bejna min ve girêdin, ez herim avê derxim. Çer wî berdidin dere nîvê bîrê diwê aman yaman min derxin, bîna min teng bû. Birayê ortê, dibê vayîn ji berê da tirsonek e, ez ê herim. Birayê ortê girê didin, ew jî dere nîvê bîrê, ez dimirim, ez dişewitim, nefesa min teng dibe, dibê min derxin. Wî derdixin. Birayê biçûk berdidin, dere digê avê, avê dikşînin. Law ka we go germ e, bîna me dernakeve, tişteki awa tune ye. Neyse awa xwe gişkî dikşînin, terşê xwe avdidin, wa meşkê xwe tije dikin, dewarê xwe giştî av didin. Hîna ew ê birayê xwe ji bîrê derxînin, a dolima dawî da birakî wa yek bend kaş dîke, ê di jî bi dizî kêrê derdixê hebin dibire. Dema ku hebin dibire Mehemed dikeve binê bîrê, ama dibê ew jina biçûk Mehemed gotiye bira ji min ra be, ew wî tiştî dibîne, bi bêbextî bend birîne. Ji tirsana deng jî nake. Biryên xwe di binê bîrê de dihêlin û terşên xwe digirin, lêdixin derin. Feqet dema Mehemed dikeve bîrê ew kitêba ku teyr dabû ser ya, ew di berîka wî da ye, teyr jî em bibên wek kirine çatûkê teyr jî li wê derê bi wan re dere. Vana Mehemed li binê bîrê dihêlin.

Wa her dû birana terş û her sê qîzika digrên derin mala bavê xwe. Pêşiya ku nêzîkê mal bibin, şivan mivan, gavan dibînin, xeberê didin axê; lawên te, her dû lawên te bi terşên mezin wan tîn. Pêşwazîkê pira mezin dikin. Sal zemam derbaz bûne hev û din xêr û şayê tînin.

Êdî nîvan mêvanê wan jî diqede, bavê wa dibê de kurên min werin, we va teyrê ababil kê girt, li ku girt, çawa girt? Birê mezin dibê, davê yanê, wellehîn li filan cî xwe dabû ser quntara çiyakî wer mezin bû. Dibê min da pê, da pê heftêkê bi zorê girt. Bavê wî deng nake, bang lawê xwe yê din dîke, were dibê hela te çawa girt? Ew jî dibê ez çûm daristanekê wer mezin hebû, me ra nikanîbû di nav da bimeşiyana. Welhasil çû ser hezar darî, min li derkê qefiland. Li filan derê girt. Ê dibê tamam. Hema ji wê rojê da jî, heya roja ku Mehemed wenda bûye, gelek zeman derbaz bûye ew teyra qe naxwîne. Wek nona tim di şînê da be. Vana dibên ya wella ya sebir. Bav dibê bira em ê demekî sebir kin, belkî deng ji Mehemedê min jî were.

Va Mehemed jî di binê bîrê da ye, demek her hal av hindik e, ser mera ra navê. Dibê vayîn mêzedike, di berîka wî da kêrek biçûk heye, bi wê kêrê erdê vedide, carê

mêzedike kunek pir mezin çebû. Xwe di wê da bera derve dide, tarî ye, bin erdê ye, di wê derê da mîna ku çû be dinyayek din. Digere, digere, dere dere, carê mêze dike gundekî dibîne. Hima di kêleka gund da cihekî xewle dibîne, nizane xwe davê malkê, xwe davê malkê mêze dike pîrikek tenê ye, pîrika heftê heystê salî. Vayîn dibê pîrê, dayê dibê ez ji tîna dikim bibihecim, gelek zeman derbaz bûye min av venexwariye. Pîrik dibê oxil, wele dibê ava me jî tune ye, hela mêze kim hindik av di firaşoyê me da hebe qultkê bidim te. Dibê pîrê mêzedike av tune ye, dere paş kewara taskê da mîza xwe dike tîne dide lêwik. Mehemed qultkê dike devê xwe, ev şor e, nayê xwarin. Dibê pîrê ev ava we çiqas şor e yaw. Dibê oxil mesela ava me jî ew tiştêkî din e, dibê niha kaniyek li gundê me heye dibê hujdiyahek, marek tim xwe dike devê çaviya kaniyê nahêle av were. Dibê axkê me jî heye, her serê mehê em qîzikekê dixemilînin wek nona bikin bûk, em dibin didin mar, ew mara dema ku heya wê qîzîkê dixwe, xwe dide kêlekê av tê. Da kê ji xwe ra di wê demê da av zêde girt. A dibê rewşa me jî wakîno ye. Halla hala, difikire, ê dibê ew ê çawa bibe. Bi Xwedê dibê ez nizanîm. Dibê di gundê me da jî qîz giş qediyên, sira hatiye ser qîza axê.

Ê dibê gelo çi wext ê bibin. Vayîn dibê ew ê du royê din şûn da bibin îkramê marê hujdiyayê bikin. Mehemed dibê ez jî kanîm werim, werim temaşe bikim, wê qîzkê bidim wî marî, ez werim tiştêk dibe? Dibê na. Tu jî were.

Dibê roya ku qîzîkê biwin bidin wî marî hujdiya qîzîkê dixemilînin, tevahî jin û mêr û ciwan giş top bûnin û her kes dibên ez qîzîkê bidim mar. Mihemd jî dibê ez lawê pîrikê me, ez bidimê hema dibê mar bikujim, qîzîkê bixelisînim. Dibên eger tu wa jêhatî yî tu bidyê. Dibê alîkî viya şûr e, aliyê di jî qîzîk xemilandine. Destê xwe di para dibin guliyê qîzîkê girtiye, wa dibe ciyê çavkaniyê. Dema ku serê qîzîkê dirêjî mar dike ya mar serê xwe hewkî ji qulikê derdixe. Wa carê da şûrê xwe li serê wî dixwe, serê mar dibê jêdibe. Xwîn û av bi hev ra diherike. Dibê qîzîk jî di wê navberê da destê xwe li xwînê dixwe û li piştê Mehemed dixwe.

Îcomê xeber dere dibê mar kuştin. Ciwanên gund derin cem axê dibên min kuşt, me kuştîye, min kuştîye. Axa dibê law we kê kuştî be bi soz ez ê qîza xwe bidim wî. Qîzîkê dibin mal, dibên de hela werin we kê kuştîye, ew dibê ez im, ew dibê ez im. Qîzîk dibê bawo, dibê ha. Dibê bi Xwedê vana kes ninin, dibê tu ba xortê gund gişa

ke, yek bi yek bira di ber paca me ra derbaz bibin, ez ê temaşe bikim, min nîşana destê xwe lê xistiye, ez zanim kiye. Yaw tevahî gênc derin, ew tu ne, ew nîşan tu ne.

Law dibê kî ma, kî nema, law dibê kes nemaye. Car di derin sê çar qoran derin û tîn. Law dibê kî maye, kî nemaye di gund da, dibê mala ku we mêzenikiriye kes heye tune, yek dibê pîrika yextiyar heye, lawkî wê heye. Dibê hela ba wî kin jî. Ban wî dikin, ew di wê ra derbaz dibe, mêze dikin li piştta wî destê xwînê tevahî beleye, keçik dibê avayîn e. Dibê ser seran ser çavan. Va ba lêwik dikin. Law dibê hela were, te çawa wa kir, va cesareta, va xurtbûna çî bû. Wele dibê awa min awa awa kiriye. Ê baş e, tu çî ji min dixwazî, bibê. Ez ji te tenê yek tiştêkî dixwazim, dibê tu min kanî bigîni dinya ronî ya nikanî. Dibê ez ji te viyan dixwazim. Dibê axa difikire law bi Xwedê tiştêkî pir zor e, vayîn dibê qertelekî me yê pir mezin heye, hewkî yextiyare jî, ê ku kanibe ew kane te bigîne dinya ronî. Ew jî dibê li pêşiya mizgefta me darek qewaxê heye. Ew teyra ew ê her sal hêlîna xwe çêke, hêka bike, çêlikên wê nêzîka bi firêkevin, marek dibê tim dere çêlikên wî dixwe. Eger dibê tu kanîbî wî marî jî bikujî ew ê ji te ra tiştêkî bike. Dibê tamam.

Dibê va Mihemeda şûrê xwe digrê her roj li bin dara qewaxê nobetê digrê. Carê dibê dema nobetê digrê, xwe dirêj kiriye, di xew ra çûye. Dema ku bi xew dere, di wê navberê da mar xwe bi qewaxê pêçikî qame dere. Waj waj bi çêlikê teyr ketiye. Teyr jî di wê navberê da ji wê da tê, mêzedike mar nabîne, mêzedike yek li binê darê dirêj e. Dibê ewê her sal çêlikê min dikuje, vayîn e. Ew dibê hima dere kevirkî pir mezin dike pencê xwe û bera ser wî zilamî de bikuje. Nêzî hêlîna xwe dibe, dibê çêlikê wî bi zimanê hev fahm dikin, qey ba diya xwe dikin, dibê werin ne ew e, di wê teqreqê da Mehemed bi xwe dihesê.

Carê mêze dike markê wa bi qewaxê ve hildikşê. Dibê şûrê xwe lêdixê, lêdixê mar parçe parçe dike û car xwe dirêj dike. Di wê navênê da kevîrê ku kiriye devê xwe diwe datîne. Dibê hewkî ro jî dayi ser Mihemed, raketiye. Teyr tê li kêleka wî datîne, qanatî xwe yekî fereh dike, jê ra dike sî. Dibê heta şiyar dibe. Çiqa zeman dere Mehemed şiyar dibe, carê mêze dike teyrêkî pîrî mezin baskê xwe jê ra kiriye sî, li ser sekiniye. Radibe hev û din pîrs dikin.

Dibê bixwaze, tu ji min çi dixwazî? Weleyîn dibê hal û mesela min a wa ye. Eger tu kanî min bigînî dinya ronî. Vayîn dibê welehîn ez yextiyar im, hema dibê ez ji bo te, bimrim jî gerek ez vî tiştê bikim. Dibê baş e. Ê dibê yalniz ji min ra çel meşk av, çel laş jî goşt lazime. Dibê çel meşk av li vê hêla, çel laş goşt jî li hêla din tu bar kî, li qorika min siwar bibî em ê herin. Dere ji axê ra dibê hal û mesela min jî a wa ye. Dibê vayîn hêsan e. Dibê goşt jê ra çêdike, çel laş goşt, çel meşk avê tije dike, tîne li wê teyrê bar dike. Xatir ji axê, ji gişka dixwaze. Teyr bi hewa dikeve.

Teyr dibê min devê xwe bervê avê kir, tu yê avê têkî devê min, min bervê goşt kir tu yê goşt têkî devê min. Vayîn bi hewa dikeve, vayîn devê xwe bervê ku dike wî dike devê wê. Dibê hêdî hêdî Mehemed mêze dike fena ki dinya ronî dibe ya, her ro dibê pir maye? Teyr diwê qasê pelek cixarê maye, hindik maye. Dibê devê xwe bervê goşt dike, mêze dike goşt qediyaye. Dibê hima kêrê davê çîpa xwe, jê dike, dide teyr. Teyr dibê goştê lawiran û însanan ji hev nas dike. Dibê goştê wî naxwe, dike bin zimanê xwe û derdikevin dinya ronî.

Dibê de em xatir ji hev bixwazin. Mehemed dibê tu here, ez ê dû ra herim. Teyr dibê na, tu here. Vir da wê da Mehemed nare. Dibê bira teyr nizanibe nigê min ew bûye, dikulim. Dibê Mehemed dema radibe dikule. Dibê were were, ew goştê te dayi min, di bin zimanê min da ye, min nexwariye. Dibê goşt pêve dikû, xweziya xwe tê dide çîpa wî xweş dibe û dimeşe. Teyr şûn da vedigere welatê xwe.

Dibê Mehemed jî wek derwêşan çol bi çol, gund bi gund, pirs bi pirs ew ê here mala bavê xwe. Dibê dere kêleka gundê bavê xwe, mêze dike bavo! Şahiyek heye heft def, heft zurne lêdikeve, di kêlekê ra dere mala pîrikekê, dibê pîrê xêr e! Va çi şahî ye, va xweşiya çi ye? Pîrik mesela axê û hersê lawê wî jê ra dibê. Hal mesele a wa ye. Dibê Mihemed çû nat, bavê wa çel roj muhlet dayê. Dibê çel rojê wa tije bûye, Mehemed natiye. Dibê daweta her dû lawê xwe dike. Ê dibê baş e. Dibê pîrê ez jî êvarê werim dawetê, tişt dibe. Dibê ma çer dibe, tu jî were, herkes dere, em gi dawetîne.

Mehemed jî êvarê dere dawetê. Qey demekê dema xwarinê ye, nan ew ê bidin, Mehemed jî dere odê, nêzî şekala rûdine. Teyrê ehabîl di wê çakûya xwe da heta wê çaxê nexwendiyê. Dibê Mihemed wê kitêba xwe hewkî derdixê, di carê da teyr dixwîne. Dema ku teyr dixwîne, cimhat û derdora axê giş mat dimînin. Law ewqas

viyan nexwendiyê, viya çawa xwend. Nan manê xwe dixwin. Bavê Mehemed medlîsa xwe top dike, dibê wellehîn, bîllehîn herhal kurê min ê Mehemed hatiye, wer neba dibê vî teyra nedixwend. Dibê Mehemed jî deng nake. Car di bang kurê xwe dike, cimhata wî jî giş rûniştiye, hela bibên va teyra we çawa girt. Birê mezin eynî wek berê, min bi wî şiklî girt. Bang birê ortê dikin, birê ortê jî dibê awakîno awakîno min pêgirt. Û carê mêze dikin ewê di nav şekalan da dibê min girt. Dibê tu kî yî çi tawa yî. Diwê ez lawê te nê Mihemed im.

Diwê de hela tu were, te çawa girt. Dibê hal û mesela xwe gişî jê ra dibê, ew sê rêkên hatine ber, ew mesela qonaxa gişa dibê. Ez çûm ciyê ku teyrê ababil lê bû, filan derê bû, min bi keleşan ra şer kir, min waqasana keleş kuştin û min teyr girt. Dibê ew kitêba jî di berîka min da bû, ji bela wê heta niha teyr nexwendiyê. Dibê bavê wî û cimhata xwe zaten hazir e, dibê gelê cimhatê. Dibê hay. Dibê heqî û neheqî tevahî me gi fahm kir. Tabî ew neheqîya birayê wan lêkiriye wê jî dibê, dibê halmesele bi wî şiklî ez hatim. Bavê wî dibê ser seran, ser çavan. Yalnız dibê wan du heba kurê min in. Dibê ez ê tenê jinê wan bidimê, ew jî biryara kurê min ê biçûk e. Mal û milkê tişteki nadimê. Dibê wan dişîne gundekî cîran, her dû lawê xwe. Ji nû ve çel ro û çel şeva dawetê dike. Mehemedê xwe û jina wî bi hev ra dizewicînin.

Dibê ew bi miradê xwe şa dibin, ê din jî guhdarê me jî bi miradê xwe şa bin.

Çîrokbêj: Şehmûs Doku

Sal: 55

Herêm: Amed- Erxenî Gundê Sincikê

Dîroka Berhevkariyê: 14. 08.2018

Xwendina wî: Dibistana Navîn

Cihê tomarkirinê: Li Navçeya Erxenî

Yên jê hilkiriye: Di Şevbihêrkan de

9. Miya Topal

Yek hebû, yek tunebû. Xencê Xwedê kes tunebû.

Li gundkî şivanek hebû. Xwediyê kerîkî pez bû. Şivan her royên Xwedê wexta şefeqê radibû. Heta kî wî pez ji gomê derdixist, pîreka wî jî malhazirî çî hebana dixist tûrikê peyayê xwe û bi rê dikir. Şivan tevî kûçikê xwe pez dajot û dibir çêrê. Nêzî gund li hinda şikeftan hingî diçêrand û dibir çiyê.

Digo nav pezê wî da miyek gelekî nehs û ziyankar hebû. Heta pez digiyand çiyê, di ber ziyanan ra derbaz dibû. Ew miya hema direviya diket ziyane gundiyan. Şivan bi qasî ki ber wê miyê ve diwestiya ewqasî ber kerê da nediwestiya.

Li çiyê havînan pûş û palax, biharan jî giyayên teze besî pezê wî bû. Pez li wê derê têra xwe diçêriyan. Carinan çêre kêmbana, pez di neqeba çiyê ra derbazî hêla paşî çiyê dikir û ber bi gundekî din ve dibir. Wexta taştê û berêvarê jî bo bêriyê pezê xwe dihanî hinda derimên pêş gund. Li çiyê zinarek qefekirî hebû. Havînan ji germê, şiliyan jî ji ber baranê xwe dispêrt bin zinêr. Li roavayê çiyê qula gur hebû. Gur çiqas firsend bidiyana ji pezan yek dixeniqand û dikşand qula xwe. Ji ber tirsê vî gurî şivan û gavanan bi qasî gavekî jî terş û dewarên xwe bêxwedî nedihîştin. Lê şivanê me xêra kûçikê xwe ra heger biwestiyana bêqesawet bîna xwe digirt û radiket. Kûçikê wî gurxenêq bû. Gava ki şivan raketana wî nedihîşt miyek jî ji keriyê xwe dûr keve.

Digo şivan jî kûçikê wî jî ji ber nerehetiya vê miya nehs aciz bibûn. Lê bo şîrê wê heyfa wî pê dihat, şerjênedikir. Ge xwe dikşand alê qulla gur, ge direviya diket ziyanan. Şivan tim ser da diqêrriya carcaran jî çoyê xwe tê werdikir, pir caran jî kûçik diçû pêşiyê vedigerand. Rokî şivan dike pêz ji çiyê bîne bêriyê, li paş şikeftan ew miya car xwe dikşîne ziyanan. Şivan jî ji hêrsan çoyê xwe davêjîyê. Ço li ningê miyê dikeve û dişkîne. Şivan ningê miyê girê dide û diwê heta ki ningê wê rehet be bira li vir biçêre. Şivan kûçik li ber miyê dihêle û pêz tîne bêriyê. Wê royê gava jina şivîn tê bêriyê, mêze dike mirûzê mêrê wê tahl e, ser da kûçik û wê miyê nabîne. Fahm dike tiştêk heye. Ji mêrê xwe dipirse:

– Kanê kûçik û ew miya; guran xwar?

Mêrê wê diwê:

– Naa! Naa! Car beziya ziyanan min jî ço tê werkir, ningê wê şikiya. Way li paş şikeftê kûçik li ber e.

Êdî navê wê miyê dibe Miya Topal. Şikeft ji dereman hinekî wê da bû û çêre li wê derê jî hebû.

Şivanê me her tim di şikeftê ra pezan dibe tîne û Miya Topal sax dike. Jina şivîn jî deri li wê derê Miya Topal didoşi. Ningê wê hinekî rehet dibe û şivan êdî kûçik ji ber digrê û bi pêz ra dibe tîne. Gelek zeman bi vî awayî derbaz dibe. Rokê roviyek li alê şikeftê rastî Miya Topal tê. Mêze dike ki ningê wê seqet e û nikane birevi. Devê wî ditahmijê, çahvê xwe lê pîs dike. Lê bayê wî li miyê nayê. Difikire, difikire, ji xwe ra diwê “ezê çer ba lê bînim û goştê vê miya topal bixwum?” Çend royan pê dikeve. Dibîne ki şivan pêz di wêrê ra dibe tîne û miyê sax dike. Wexta taştê û bervî êvarê jî jina şivîn tê didoşe. Wekî din bêxwedî ye. Gur dikeve bîra wî. Ji miyê ra diwê:

– Hey topalê topal! Va mêrga mêrga min e, tu dibînî ki xwediyê va deran ez im. Ji vira here.

Miya Topal diwê:

– Mêrg mêrga Xwedê ye û a gundiyan e. Ez tew narim derkê jî.

Rovî diwê: Zêde qise meke! Gerek tu heqê min bidî.

Miya Topal diwê: Tu heqek te li min tune.

Rovî diwê: Tu bisekine, ez ê ji birakê xwe yê gur ra bibêjim bira ji heqê te weri der. Û dide rê, lê dixê deri ber qulla gur. Ban dikiyê:

– Birakê delal, birakê delal hela weri der.

Gur diwê, çiye law qeşmer?

Rovî diwê: Îro tertele ye, tertele!

Gur diwê: Terteleya çi?

Rovî diwê: Îro eydiya me ye.

Gur diwê: Zû biwêje, zêde qise meke!

Rovî: Min miyek diye, bêxwedî ye. Ê ser da seqet e jî, nikane bireve.

Gur diwê: Li ku derê ye.

Rovî diwê: Li paş şikeftê ye.

Gur diwê: A wî şivanê ki xwediyê kûçikê gurxenêq nebe?

Rovî diwê: Na looo. A kê dibe bira bibe, min taqîbat kirî; hew çaxa bêriyê jinikek tê didoşe û deri. Em ê kelkela nîvro herinê. Bê Xwedê tu kesek tuneye.

Gur diwê: Heger tu derewan bikî ez ê dewsa wê da te bixwum ha, te fahm kir?

Rovî: Temaam tamam, min fahm kirî, heger ne werre bû hema min bixwu.

Em werin hêla din, ji tirsan gurpegurpa dilê miyê ye. Wexta taştê gava ki şivan pêz tîne bêriyê, Miya Topal digirî, dimahre û giliyê rovî bi şivîn dike. Diwê hal û hewala rovî awa ye. Şivan diwê tu qet meraqan meke, ez ê dek û dolabên rovî di serê wî da biteqînim. Di hefsoyê da wek qûçekê çend keviran dide ser hevûdin, gurzek sap jî dide alê pêşîn. Ji Miya Topal ra diwê:

– Gava ki gur û rovî hatin, tu yê biwêjî, eger va mêrga mêrga we ye, sond bixwun û ber bi vê ziyaretê sê gavan bavêjin.

Ji kûçik ra jî diwê:

– Kîjanî sond xwar û bervî te hat, li qirrikê siwar be bixeniqîne!

Kûçik diwê:

– Ser çahvê min. Zû da ye min gurik neqefilandî. E jî li tiştê awa digeriyam.

Ê di hundirê kevirên qefekirî da li paş gurza sapê xwe vedişêre. Miya Topal jî li kêleka wî mexel dibe.

Diwê kelkela nîvro, mî mêze dike gur û rovî bi racemê hev ketine û bervî wê tîn. Wexta digînê rovî ji Miya Topal ra diwê:

– Min ji te ra nego va mêrga a me ye, gerek tu heqê wê bidî?

Miya Topal diwê:

– Ez ji we bawer nakim. Eger va mêrga a we ye, bi vê ziyaretê sond bixwun û sê gavan bervî wê bavêjin. Ez ê zanibim ki hun rast diwêjin û va mêrga mêrga we ye, heqê we jî li ser min heye.

Rovî ecele dike û diwê:

– Ez bi vê ziyaretê sond dixwum ki va mêrga a me ye û ber bi qûçê ve diçe û diwê a yek, a didû û mêze dike di hundirê qûçê da di nav tîlên sapê da çahvên kûçik diçirûske. Çogên wî dilerzi û cî da disekini, dikevi heyecanê. Vedigeri ser gur:

– Kekê gur, ez xwedî zar û zêç im, welleh ji ziyaretan ditirsim. Heger tiştêk bê serê min zarokên min bêxwedî dimînin.

Gur pîrr hêrs dibe ji rovî ra diwê:

– Wê da herre law qeşmerê qeşmer, tirsonekê tirsonek!

Pencên xwe radike û bervî qûçê deri. Diwê “ a yek, a didû û a sisê”! Çer digê ber qûçê kûçik diwê eww û xwe davêje ser gur. Bi qirpîka gur digirê û digewixîne. Rovî tew li paş xwe mêze nake, toz û dûmanê bi ser xwe dixê, heta ki jê tê zûzûka direve. Bi zor canê xwe xelas dike. Şivan tê ki kûçik gur xeniqandiye. Pezkî şerjê dike û davê ber.

Miya Topal êdî bêtirs li wir diçêre. Çendek derbaz dibe Miya Topal rehet dibe. Şivan jî wê dixê tev pezan. Êdî ew bi pezan ra deri çêrê û tu caran ziyanan nake û ji keriyê jî naqete.

Mersela min li diyara, rehme li dê û bavê guhdara.

Çîrokbêj: Dawûdê Bagûrî (Gûlsûn)

Sal: 66

Herêm: Amed- Erxenî

Dîroka Berhevkariyê: 12. 04.2018

Xwendina wî: Zanîngeh /Ziman û Dîrok

Cihê tomarkirinê: Li Mala wî

Yên jê girtiye: Diya wî ya Wesîla

10. Eysê Qotê

Padîşahê bajarê wê derê, ciyê ku Eysê Qotê teda ye ji wezîrê xwe ra dibêje: Wezîr dibê: ha. Berê wisa biye yanî. Evê ku padîşahê bajara bûne xwe tevdîr dikirin. Nava milletê xwe digeriyan, çika kî tedê zilmê li kê dike, kî mesele çawa ne, rewşa wan fam dikirin. Kesî wan nas nedikir çimkî xwe tevdîr dikirin, cilê babadewrêşa li xwe dikirin ku kes wan nas neke o pisgirêkên nava bajêr ji gel dipirsîn.

Îja dibê evanîkayîn, paşa dibê wezîrê xwe ra go: Wezîr go ha! Go ka rabe em ê xwe tevdîr bikin cilê babadewrêşa li xwekin emê nava bajarê xwe bigerin. Çika kî tedê tadê li kê dike, kî di ezîyetê de ye, kî di xweşiyê de ye, kî di rehetiyê de ye, kî çi dike, em fam bikin. Go keremke ya padîşahê min. Go emr bike go emir emrê xwedê ye emrê te ye, bêje em herin bigerin. Dibe rabûn cilê babadewrêşan li xwe kirin o derketin.

Derketin nava bajêr geriyan, geriyan, geriyan eger rojkî eger dido eger sisê. Dibê evênîkayîn paşa ji wezîrê xwe ra go wezîr go ha! Go wele çika em herin ser rêya kaniyê go pîrek tîn diçine avê go çika hal û wextê wan çawa ye. Go tevdîrê wana mesele çûndin û hatinê wan a, çika ew çawa ne. Ê go keremke bêje go em herin. Dibê paşa û wezîrê xwe hatine ser rêya kanîyê. Hatine ser rêya kaniyê sekinîn bala xwe danêkê, pîrek diçine avê cêrê wan li milê wanin wisa bi terbiye wisa bi tertibatekî xweş, rehet diçin tîn û cerê xwe dadigirin, ê ku vala diçin, ê ku tijê ten ji kaniyê. Vana bala xwe danê ku pîrekekê wa sê heb cer li ser milê wê ne o seqete jî. Seqete jî dilicime qote o wisa bi bezekî, bi ecelekî tê diçe kaniyê ku tiştêkî degîşîk e, ne wekî wan evê ku wisa hedî hedî bi pî o merîfet diçin o tîn. Ew bi ecele diçe. Wisa bi ecele o zû diçe. Dibê çû cerê xwe dagirt ji kaniyê hat çû weke ku çû zikê şeer (bajar) vala kir carka dinê eynî sê cer li ser milê wê ne o dîsa eynî bi wî şeklê hat çû kaniyê dibê dîsa cerê xwe dagirt bir û çû vala kir cara dîdîya ku ji wê da vala hat.

Paşa go: wezîr çika here pêşiya vê pîrekê. Go çika hal û wextê wê bipirse. Ka çi hewalê wê heye? Pîrek te diye way tev bi tertîbat bi edeb wisa bi merîfet diçine kaniyê tîn evêya hanêkayîn sê cêr sê cêr li ser milê wê ne o seqete jî o bi ecele diçe û tîn. Sekin tine. Ka lê bipirse çi hewalê wê heye? Dibê wezîr jî hat ser rê. E pîrek ji wê

de hat. Go, xwa min. Go ha çika deqekî go misade bike. Viya jî sekinî. Go ka bêje birê min. Xêre? Go: Xwa min go çima pîrek wayê go gi diçin o tèn em li vir derê ne em dibînin go wisa hêdî hêdî bi pîl bi merîfet bi edep diçin o tèn go ê te go tu sê cêr sê cêr didî ser milê xwe o tu seqetî jî o go tu nasekinî jî go çi hewalê te ye? Go çi hatiye serê te? Ê go wele birao zilamê min rehmet kiriye tineye. Go: Sê çar heb sêwîyê min hene o hê îş bi wan nabe. Go jixwe ra ez mecbûrim ku wan xweyî bikim. Ê go ka îşkî ku ez bikim tîne ê me pîreka ewe îşê me av e û mesele nava malê ye û ewkin.

Go min ji xwe ra ava mehelê girtiye, ava mehela ku mala min tê da ye. Go min jî xwe ra avê wana girtiye. Ez avê wana dikşînim heqê min didine min, pê zarokê xwe xweyî dikim sêwîyê xwe. Îja go ez mecbûrim bi bazdanê herim werim ecele bikim dibêjim bila avê wana dereng nemînin, ji min aciz nebin, ji bûnî ku heqê min jî bidine min, dilê wan xweş be. Ji ber wê yekê ez sê cêran dibim û ecele dikim, ji bûnî ku avê wan kêmbin. Ez pê wan sêwîyên xwe xweyî dikim.

Pekî dibê de here oxir be ji te ra. Go pîrek çû kaniyê cerê xwe dagirt hat çû ku valake. Wezîr hate ba paşa go paşa yê min go hal û hikayeta wê wele ev e awa ye. Go bi vî şeklê ye. Dibê sêwîyên min hene û min ji xwe ra ava mehlê girtiye, ez mecbûrî bûm ku waya zû herim bînim werim ku ji bûnî ji min aciz nebin, ava wan kêmasî nekevêkê û heqê min bidine min pê zarokê xwe xweyîkim. Dibê paşa jî destê xwe kire berîka xwe tizbîkî jê derxist. Go: Wezîr. Go ha. Go wayê çû malê wê carê xwe vala bike ji wê da were. Go gava ku ji w de hat go tu yê a vê tizbiya min bidiyêkê, tê bêjî xwa min a vê tizbiyê bibe here bal tucarekî bifroşe o pê zarokê xwe xweyî bike. Paşa tizbî ji berîka xwe derxist da wezîr. Ê li qarşî wezîr e jî li qarşî paşa ye jî rê. Dibê Eyşe qotê ji wê da hat eveyanikahanê go xwa min deqekî bisekine evyanika go birayê min çika bisekine dev ji min berde ez zû herim pekî zûtir ez herim ava xwe binim. Go: Deqekî hema. Go xwa min. Go ha? Go ha ji ter vê tizbiya hanikayîn. Go gava ku îşê te qediya. Go dibe here çarşiyê ba tucarekî û pê zarokê xwe xweyî bike. Ê wê jî gote xwedê ji te razî be, mala te ava. Tizbî kir berîka xwe û lêxist çû ava xwe hanî. Evana nikayîn çûn. Paşa û wezîr çûn. Digerin, digerin nava bajêr. Evya jî tizbî bir çû ka esir bu ka êvar bû ka çi wextî bû dibê ava wê qedîya îşê wê nema. Go wele çika wî babadewrêşê tizbîkî da min go çika ez herim ew jî çend qurişa girê nade belkî hema şîvekî ji zarokê xwe ra binim. Dibê çû leqayê dikana ticar Elî hat. Çû balê, go, Ticar Elî got keremke.

Wele tizbîkî bi min ra heye go çika xêra xwe ezê bidime te go çend quriş dike go ti bistîmî ez ji zarokê xwe ra bibime herime bidime bi tiştêkî. Go:

Çika derxe, dibê tizbiyê derxist da Ticar Elî, Ticar Elî tizbiyê nêrî tizbî ne bi kirîne tê ne bi firotinê. De tizbiya paşa ye ne bi kirîne tê ne bi firotinê. Qîmeta wî ew qas pir e. Go: Eyşe te vê tizbiyê ji kur anîye? Go wele ez îsal çendik û çend sal e ez teqîba vê tizbiyê da me. Vîya tizbiya bavê min e. Bavê min baş bazirgan başî bû keleşa avête pêşiya bavê min. Bazirganiya wî şelandîna bavê min kuştin vê tizbiyê ji bêrîka wî

derxistine birine çend sal e ez teqîba vê tizbiyê dikim vay hat ket destê min. Heyra! go bavê min birayê min go wele babadewrêşeke xêra xwe daye min ser rêya kaniyê hal o mesele wiha wiha wiha.

Go e nizanim go tizbî way bi te ra derketiye. Go vê tizbiya nika ya bavê min e eyn bi vî şeklî ji berîka wî derxistine û birine. Dibê ji xulamê xwe wan ra go gelî xulama go herin çî di mala Eyşe qotê de be temam, paqijkin, ji min ra binin werin. Ê hatin ketin mala Eyşe Qota reben qir û qafê wê cilikê wê potikê wê û zarûkê wê mala wê. Dibê ew jî tev dan ser milên xwe vana birin û çûn. Viya giriya li xwe xist hey eman, hey zeman. Eyb e eyb! Ka bi Ticar Elî nikare.

Dibê birin çûn. Yarebî! Go Evî dewrêşê çî anî serê min. Ev tizbî ya hanê kir stûyê min. Pel û potikê ku zarokê min ji xwe ra tê da ditebitîn tê da razan jî go ev nivîkê min cilikê min û qir û qafê min jî tev birin hundir li min paqij kirin. Neyse, ji xwe ra ava xwe dewam kir. Ava xwe dewam kir, paşa û wezîr hê digerin. Dîsa pêlekî geriyên hatin dîsa ser rêya kaniyê. Go çika ka dîsa em çavê xwe bi rêya kaniyê xin çawa ne. Dibê dîsa hatin ser rêya kaniyê bala xwe danêkê haylê lê lê lê Eyşe Qotê eynî weke ewilî dewam dike. Ala hala? Paşa go, wezîr, go: Ha.

Qey te tizbî nedayêkê? Go: paşayê min min li ber çavê te, te dî mi tizbî derxist da destê wê. Go: çawa min nedayêkê. Go çika here pêşiyê jê bipirse çî biye? Ev çî halê wê ye. Gere dev ji vê îşê berdana. Ev tizbî gava ku bifrotana besî zariyê zariyê wê bû. Ê go baş e.

Dibê Eyşe Qotê li wê derê hat dîsa ku here kaniyê ev babadewrêş hate pêşiyê go, xwa min go çika bisekine pênc deqa. Go: dûrê min here! Dûrî min here! Ê jî ji bona xwedê tu dûrî min herî! Ê go çima ez ê dûrê te herim heyra ka min çî kiriye? Ka çika ez ê ji te pîrsekî bikim. Go, Xwedê te bihêle tu ji min dûr herî, tu dev ji min berdî, ez ji xwe ra îşê xwe bikim. Ala halla! E go ka xwa min çika ez ê wê pîrsê ji te bikim ji min ra bêje. Go, birê min, go yekî babaderwêşkî weke te, wê tiz bîkî hebû hanî da min. Go min lê xist ez çûm ba dikana Ticar Elî. Go min bir û çû tizbiyê da Ticar Elî go min go belkî çend qurişa bike ez ji zarokê xwe ji sêwiyê xwe ra bînim werim bidme bi şîvekî bixwin. Go evî malik mîratê Ticar Elî, te nebî go tizbiya bavê wî bû. Ji min ra gotiye Eyşe Qotê te vê tizbiyê ji kur anîye? Go: Min gotiye heyra wele babaderwêşkî daye min. Go:

Naaa va go tizbî bi te ra derketiye go ev çend sal e go ez di teqîba vê tizbiyê da me. Ticar Elî ji min ra wisa go. Go, bavê min başbazirganbaşî biye, keleşa avêtiye pêşiya bazirganiya wî, şêlandine, bazirganiya wî şixwir tev birine, bavê min jî kuştine, go a ev tizbî di berîka bavê min da biye go ewan keleşa derxistiye, ka mîrê te ye birayê te ye ka çiyê te ye go va tizbî bi te ra derket. Hey eman, zeman, ji boy Xwedê wele babadewrêşkî ku ez wî nas nakim daye min. Eyb e eyb! Go wele Ticar Elî ji xulamên xwe ra go. Go hatin ketin hindirikê min go pel o potikê ku zarokê min sêwiyên min pê ji xwe ra disitirî ew jî tev ji hundir paqij kirin birin û çûn. Wezîr go wiha? Go, Erê

wele waha. Ê go tamam. Wele dibê dev jê berda ew çû. Hate da paşa go wele haleyket wiha hatiye serê wê.

Go: tu ji dil dibê jî? Go erê welle. Ê go tamam. Dibê hatine nava bajêr geriyan. Êvar e. Paşa ji wezîrê xwe ra go: wezîr. Go, ha. Go bese êdî em nava bajêr geriyan. Go ti lêxe here di miqamê xwe da rûnê, go ez ê îşev jî hetanî derengê şevê çika ez ê tenê bigerim o ez ê jî werim. Go, tamam bixatirê te, xatir ji hev xwestin û wezîr hate miqamê xwe Paşa nava bajêr geriya. Bû êvar, şev e, dereng e. Qesabekî li vir derê heye dibê wisa sekinî û li qesab nihêrt, qesab ji xwe ra alişvêrişxa xwe dike dibê êvarê teq û dikana xwe girt hat bala xwe dayêkê go: babadewrêş. Go ha, tu çi dikî. Go, wele ez merivekî xerîbim, kes nenasim, kesê nas nakim, ez jî hema ji xwer li vir sekinî me. Go, madem wisan e go tu xebatê nakî? Go, ku tu xebatê dikî xebat li ba min heye. Go, lê wele ku xebat li ba te hebe e dikim. Çima nakim? paşa jê ra go. Ez dikim xebatê çima nakim? Go, tamam. Go: haydê em ê lê xin herine malê. Dibê wî hanî hate malê. Qesab paşa hanî malê. Go, babadewrêş. Go, ha. Go tiştê ku e ji te ra bêjim tê weke min bikî. Go: hetta devê te digere bixwaze ez ê bidme te. Go: tiştê ku ez ê bêjim eynî tev weke min bikî, go heta devê te digere jî bixwaze ez ê jî bidme te. Paşa dilê xwe da go: quran tiştê di vî da heye, ka çika ev çiyê. Bira be go. Go: bi heqê xwe ye? Go: ee. Dibê evyahanikaan rabû wisa kir wî bir û çû malê şîvê xwarin. Piştî ku şîva xwe xwarin, sekinîfîm şev ker bû. Kes şiyar tinebû.

Go babadewrêş Go, ha. Go, rabe. Wele dibê wî rakir. Rakir e bêrekî, qazmekî o werîsekî o darekî.

Go: babadewrêş a rake van hersêyekan o bide pêşiya min û xwe girê da şûrê xwe jî kire destê xwe û wî da pêşiya xwe. Wî da pêşiya xwe. Paşa go evî kurê malikmîrata go şûr jî destê wî da vana da min berê me dide kuderê? Bi quran ev tiştêkî telûke ye, ew ê çi bê serê me? Ketiyêkê nikare bireve jî, şûr destê viya da ye. Go: em ê çawa bikin? Go: bikşe ez jî ra bi bêjim! Dibê viya kişiya kişiya go ha li vê soqaqê ha li wê soqaqê her, hêta wî ji şêher derxist. Go: A bide ser vê şiverêya ha nikan. Dibê da ser wê şiverêkê wî bir û çû nava mezelan. Bir û çû nava mezela, nava mezela geriya, meyîtekî ew ro defin kirine hê mezelê wê tezeze.

Go: a li wê mezelê xe. Go veke. Evanikayîn go agir bi mala te keto, malik mîratko ti çi dikî? Go: ti miriyan ji mezelan derdixî? Go: e ji te ra dibêjim! Ê şûr di destê wî da û li ser sekiniye go: haydê tiştê ku e dibê go min gotiye tiştê ku ez ê bêjim weke min bikî ti jî heta devê te bigere ez ê bidme te. Paşa go bi quran ez çûm, ketiyêkê êdî. Herneyse mecbûre. Dibê mezela veda veda veda veda û kevira jî avêt û go wî meyîtî derxe deyne ser mezela. Dibê meyît derxist danî ser mezela, go bide ser werîs. Da ser werîs go haydê bide ser piştaxwe û bide pêşiya min. Êdî bûye niv şevê bêtir çiyê êdî millet razaye. Viya nikayîn nikare xwe vir da wêda bide, mecbûr e, da pêşiyê. Da pêşiyê wî hahî hanî malê. Hanî malê kire hindir û derê ku ewil da ketinêkê û derê

diduyan dibê wî hanî kir hindir û odê bala xwe xwe dayêkê ha ha way qoçek li wê derê ye û teyşt li wê derê ne o.

Go: haydê viya nikayîn ji nava kefen derxe, go temmam hûr hûr bike. Go agir bi mala bavê te keto. Go ti çawa dikî bona Xwedê? Ti yê çawa bikî ji vê meytê mirî? Haydê! Go ji te ra dibêjim. Go ez ê kêşekî pere ji te jî derxim ji wî jî derxim. Paşa, quran go ez jî çûm. Go Anaa ti yê perçe bikî gava te wî qedand, go ez yek şûreke davême serê te serê te jî jê dikim, go ez yê te jî bi ser da hûr dikim, dibim diçime loqintê nava goştê pez û dawara dixim. Kêşekî pere di wê da heye law! Ev ya nikayîn lerizî rebeno çawa bike? Quren go e çûm wezîr filitî ez ketim lepê viya nikayîn quren go evê çawa çêbibe? Go heya dikî ji bo Xwedê agir bi mala tekeve şixwe (jixwe) te wekî xwekiriye. Go ez dikim destava minî biçûk dike bi min da here, ez vê destava xwe bikim serê te nexwo dîsa serê min jê dikî çawa dikî. Dibê derê ku biriye çûye kiriye wê derê wî derî vekir go a li piştê vê deriyê hanê bike û were. Eviya mikayîn ku ji wê deriyê derket baz da derê derva. Baz da derê derva ew şev nebî pîreka wî qesabî derê derva ji bîr kiriye, ranedaye û derî vebû. Derî vebû lê paşa êdî te jî û diqefêle dibê kete soqaqê û here ku ti naçî teqîn bi derê derva ket qesab baz da li vî alî wî alî eyb e eyb ti êdî wî diqefêlî? Ma ne ji ber rih filitî ka tê zeftê? Çû, hinda bû. Hat şûr bilind kir ku sitûyê pîreka xwe go, heqê te niha ez te biser viya da şerjê bikim bibim herim bidme xelkê goştê te.

Go: qey te derê derva negirtibû? Go wellehî îşev min ji bîra kiriye natiye neketiye fikra min. Go derê derva vekirî maye. Quran go viya kî be wê sibê here ba paşa û go şikayeta me bike. Îşê me qediya! Wê giliyê me bike. Eviya nikayîn ew ma dihalê xwe da eviya filitî ji destê wan. Ji wê da filitî hat berê xwe da sereya xwe ku wê here sereya xwe di ara soqaqekî da hat bala xwe dayêkê xaneka bêxeweyî li wê derê ye kes têd tuneke xanekî valaye û agirekî way tê da dibe, sê meriv û kûçekî li ber wî agirî ne. Paşa go weleh çika ez herim ba evyanekayîn çika ev kîne çi kesin li virê? Hat ba wan, silamû elêkim elêkime selam. Wele go: Ya bira hûn çi kesin li vê dera win çi dikin?

Go: Wile em sê heb diz in go em xerab in, go em diziyê dikin em li ber vê agirê şêwra xwe dikin, ka emê îşev malê kî xin? O go em li vêderêne lê ti çi kesî? Ew jî bişirî, keniya paşa go eynî ez jî yekî mîna we me. Go îşev ez geriyame tişkî bi destê min neketiye go away ez hatime ba we wusa be em ê tevîhev da lêxin herin. Go, pekî baş e. Divê paşa ji wan pirsî go gelo quwetê we çawanin? Mesele me malê yekî bir û eger ku pê hesiyan o ji te ra bêjim şikayet bû filan bêvan yekî go wele heval go ê min, go tişteki wisa heye bi min ra go hevalê min li ku derê têkeve tengîyê gava go bêje heval eynî deqê da e li balê hazir im.

Yekî jî go wile îsmekî di devê min da heye ez dixweyînim çiqê devê min kilîftin, çi dibin bi qeyd û lele bin bi çibin, ku ez wî îsmê dixweyînim û tozkî xweliyê

tînim eger nobetçî jî hebin ez li wî îsmê dixweynim wê xweliyê davêm wan nobetçiya ew temamî wî hinda dibin û ew qefil vedi be. Go em diçin diziya wê derê.

Yekî jî go wile a viya kûçkê min e, rêya ku em pê da herin ku qenc bê jî ji me ra divê û xerab be jî ji me ra divêje. Îja hersiya ji wî ra go: Lê ti çawanî go qeweta te çi heye? Go: Wile law ê min jî go ku qirika wî di kindirda be jî go hima ez bigijimêkê go ez karim efya wî derxim o neyêlim bê xenqandinê.

Wele go ê te jî baş e, lê go em îşev li malê kî xin. Paşa go ku, teyî cilê babadewrêşa lê ne li ba wan e, go law ka em ê li malê kê xin. Feqîr û fiqare gune ne em ê herin li xizna paşa xin ji xizna paşê û bêtir û çêtir em ê li zêrê wî xin vana hinkî teng sistiyê kirin go wile paşa pê bihese ê serê me jê bike, go paşa zor e.

Go law van tiştê ku di devê me da ne o bi me ra ne go, min ji we ra gotiye ku qirika wî di kindirda be jî hima bigihîjimêkê ez dikarim wî ji kindir xelaskim, wa ti jî dibêy îsmekî waha heye ku çîqa nobetçî hebin û derî vedibe. Ê din ka go mesele hevalê min li ku têkeve tengiyê hima ku bêje gidî ez keti me tengiyê go ez eynî deqê da xwe digijînimêkê wê ji tengasiyê wêderê xilas dikim. Ê dinê kuçikê wî heye û awa dibê go wile em ê herin li xizna paşê xin. Çima em ê li ê feqîr û fiqara xin. Kirin nekirin vana hinkî tengistiya kirin. Go em ê herin li xizna paşê xin.

Ê go de hadê, dibên wisa şêwra xwe kirin o hatin. Hatin her çar rabûn û kişîyan kûçik ji ciyê xwe ranebû xweyiyê kûçikê go rêya ku em pê da herin go qenc be jî kûçikê me ji me ra divê û xerab be jî ji me ra divê. Kûçik ji ciyê xwe ranebû, ew her çar kişîyan kûçikê gazî wan kir go paşa bi we ra ye! Paşa bi we ra ye! Vana go gir gir hatin ber agir rûniştin. Li ber agir rûniştin wî li wî nihêrt, û wî li wî nihêrt, o wî li wî nihêrt, go law ka kî ji me paşa ye ku kûçik waha dibê. Go wele kûçikê me ti şevê jî vira nedikir. Go evanaka hersiya li wî ya nihêrt, go ne ti paşa bî? Go malik mîratno go çika bidne hişê xwe go paşa ana di koşk û sereya xwe da ye, li miqamê xwe da ye, li ser ciyê xwe raza ye û cilê ewaya lê ne gelo? Ka win çi halê paşatiyê di min da divînin? Go heyra wile em di te da navînin. Weke berê wisa ne lê heya ti şeva kûçikê me jî vira nekiriye. Go belkî îşev kûçikê we vira dike lo, go em herin. Dibê kişîyan dîsa jî kûçik ji ciyê xwe ranebû cardin go paşa bi we ra ye, paşa bi we ra ye, dîsa go gir gir hatne ber agir.

Ew li wî nihêrt wî li wî nihêrt ê hersiya ji hev ra go go wile law ava kes jî me paşa tine go heyra wile kûçikê me tu şevî vira nekiriye go çawa îşev tu dibêy e ne paşa me? Erê go ma agir bi mala we keve go ka ka paşa û vî halê haw ba we û diziyê û ji te ra bêjim vî vê selteneî? Dibê dîsa serê wan ewk kir, ê wele nakeve serê wan jî, paşa çima were bi wî halê feqîriyê cilê pertî lê û were diziyê bi wan ra û di we niv şevê da? Dibê carka dinka rabûn kişîyan dîsa kûçikê gazî wan kir go paşa bi we ra ye, paşa bi we ra ye. Xweyîyê kûçkê lê fetilî go vira neke! Go paşa di ku da vî şeva hanêkayî were têkeve nava me. Kûçik jî ciyê xwe ranebû ew her çara lêxist çûn. Lê xistin çûn dibê

çûne ber derê xizna dewletê eviyê ku digo îsmê devê min da ye ku ez xweliyê hil tînim lê dixweyînim û davêjim ew nobetçî hinda dibin.

Dibê ew xwelî derxist lê xwend û avêt, dibê nobetçî hinda bû. Û derê xiznê vebû, derê xizna dewletê. Wele her çar çûn ketne zikê odê û xurçik bi wan ra bû. Xurçika xwe dane ber zêra. Paşa li terezî jî jixwe li wire ba zêra ye. Paşa li ser terezîyê sekinî go de bînin werin zêra bînin em ê bikşînin ji bûnî xatirê ku em li hevdûnî heremsiya nekin. Çiqa kîlo çiqa xiram be, ji bûnî xatirê gava ku em li hev parî kin em heramtiya li hev nekin xayintiyê bi hev ra nekin ji hevdû nedizin.

Ê go tamam ê ku ji xwe wisane. Paşa li ser terezîyê sekinî go ez na û wan jî hanî ber destê wî kîlo bi kîlo bi xiram bi xiram heta xûrçika xwe tije kirin paşa tamam qeyd kir. Tevî nivisand ewqa kîlo, ewqa xiram, go de haydê em herin. Dibê derketin derê xiznê girtin. Derketin paşa go:

Gelî bira hevala! Go ha way nêzî destê sibê ye, go wext nemaye em nikarin vî ya hanîka li cîkî li hev parê bikin. Go mala kî ji we nêz be vay devê xûrçikê dirûtiye o way ji xwe kîloy wî me kişandiyê em zanin ku çend kîlo xirame mala kî ji we nêzbe bira xûrçik ew bi xwe ra bibe mala xwe şevkanekayîn di vê seeta ku em hatine giştine hevûneka di wê seetê da li ber wî agirî em ê vî malî li hev parê bikin. Go wele ew jî xebera te ye, heta em li hev parêkin heta ewk bikin sibê zelal bibe xelqê ê me bibîne yekî go mala min vay li vira nêze divê xûrçikê teslîmê wî kirin o xatira ji hevûdinka xwestin.

Paşa berê xwe da sera (seraya) xwe ku wê were here sera xwe dibê hat wisa di ara soqaqekî da hat hewşekî li wêderê bû dîwarê hewşê ewqa bilind bû bala xwe dayikê ku were wera qîzikekî li destê deheba da tê, deheb sêhebin eger çine destê wan da tê, dibê eviya jî serê xwe wisa di ser dîwar da bilind dike bala xwe daykê bela xwe di qîzîkê didin. Go kuro hûn kîne, Win çi dikin? Win çi dewê li wê qîzîkê dikin? Ku wisa go hema van herdûya hanêkayîn. Dibê yekê xwe serê ewkê da havêt? Yekê xwe di binî de havêt o şûr kişandin o hatine paşa. Îş te çi bi me ketiye? Diben, go hatinêkê, paşa go heywax heywax! Go min çi kir bi xwe. Go serê cedê o binê cedê tev li min girtin. Cîkî ku pêda herin viyali bînayî ne, viyali bînayî ne o nikare bi çîkîda jî bireve. Ew ê bigîjînekê, serê wî jêkin dibe ewî hevalê wî yê ku go ez eynî deqe saniyê da xwu digihînimê hevalê xwe bala xwe daykê ku hevalê wî way şûr pêra ye jêrda hat go heval xwe bigre go ez gihîştîme te, ji paşa ra gava ku wisa go dibê ev ê ku ji aliyê wî da dihat ev nêhakayîn bazda reviya û peyinkî ye be eger çibû havête paşa û xericî û herdiya da peyhûnekayîn çûn reviyay ewan herdiyê ku bela xwe di wê qîzîkê didan dibê dibê eviya jî hate balê go heval go ha.

Go, ev çi bû te hanî serê xwe? Go: Heyra wele go xîreta min teemûl nekir go a qîzîkekî li vê hewşê bû go bela xwe têdidan go min jî tiştêkî ji wan ra jî wisa zêde nego min go kuro win çi dewê li wê qîzîkê dikin? Go hima min dî yekê xwe li serê kuçê da havêt û yekê jî xwe di binê kuçê da havêt serî û binî tev ji min sandin quran go ti negîştana

min ana serê min jê kiribûn. Go heval eleqa xwe ji îşê xelqê neyne mesleka me çibe ji xwe em mesleka xwe dikin, çî îşê me bi xelqê ketiye kî çî dike here ji xwe ra here mala xwe hetanî sibê, wî çaxê em ê herin zêrê xwe li hev parêkin.

Dibê paşa hat gihîşte sera xwe, cilê xwe degîş¹⁹ kir û li ser yataxa²⁰ xwe ket û bê hemd û bê hiş, de ji êvar da xebitiye û ranezaye û evan serçûcekê ha tev hatine serê wî û betlandî ye û bê xew e, dibê raza hetanî nêzê nîvro şiyar nebû. Wezîr wîzarê wî jî gazî nakinêkê heta ku ew bi xwe rabe. Paşa, wer hasil nêzê nîvro wan da şiyar bû, eşeda xwe hanî: La îlahe îlalah mûhemedden resûllûlah ez filitîm, way hat me ciyê xwe. Wezîr wîzare hatne dorê ji xwe ra suhbet kirin. Eger taştêya wî çibû, dibên hanîne hat nanê xwe xwar. Dibê paşa kûrsiyê xezebê go ji min re bînin. Kûrsiyê xezebê hanîn, paşa li ser kûrsiyê xezebê rûnişt o reş û terî bû û kete hêrseke wisa go gazîkne beqçî û polêsa gazî kirne beqçî û polêsa dibê hatin. Ya padîşahê me emir bike go emir emrê xwedê emrê te bêjê ka em çî bikin.

Go law herin filan semtî filan nimre filan mehele go yeka seqet li wê derê navê wê Eyşe Qotê ye go, herin wê bînin werin. Wile dibê beqçî û polêsa bazda çûn pirsîn pirsîn Eyşe Qotê wê derxistin wile dibê wê hılanîn. Xêre law ji bûna xwedê win dawa çî li min dikin? Ez sêwiyê xwe ji xwe ra xweyî dikim. Go wile paşa emir kiriye, gotiye gere ila were vê dera nakayîn. Eyşe Qotê go bi quran qey serê min jî çû? Miheqeq Ticar Elî çiyê şikayeta min balê kiriye, tizbiya bavê wî bi min ra derket go îja serê min çû.

Ji xwe ra hat, hanîn hatne balê go: Ya Padîşahê me vay me wê hanî. Go a vê odanekayîn derê wê odê vekin go wê têxne wê odê û derî bigrin. Wele odê derî vekirin Eyşe Qotê xistine wê odê o derî girtin. Go herin filan çarşî filan semtê go Ticar Elî heye go herinTicar Elî jî bigrin bînin werin. Wile dibê beqçî û polêsa bazdan çûn bi milê Ticar Elî jî girtin. Dibê Ticar Elî go xêre çî biye çî biye go Paşa go ketiye hêrseka wisa go gotiye herin gazîknêkê mecbûrî tê werî. Wile dibê hat. Wî jî hanîn hatin. E go ya Padîşahê me emir bike va me Ticar Elî haniye. Go derê wê oda nekayîn vekin go wî jî têxine wê odê derî bigrin. Dibê wî jî xistin wê odê derî girtin.

Go herin filan çarşî filan semt filan dikanî Qesab li wê derê heye go herne wê derê wî Qesab ê jî bigrin bînin werin. Dibê evanekayîn hatin hatin bi milê Qesab jî girtin Qesab go xêre ji bûna çiyê gidî jî bû çiyê xêre go wile em nizanin go Paşa emir kiriye gotiye herin bînin werin, im im Qesab çokê wî sist bûn û pêlkî davê yek ji pêra yek ji para, reh tê da nema go quran ew meriv kî be çiyê şikayeta min kiriye go Paşa gazî min dike. Dibê wî jî hanîn hatin balê çarşî wî go ya padîşahê me emir bike go va me Qesab jî haniye go ha deriyê oda dinekayîn vekin go wî jî têxne wê oda, dibê wî jî xistin wê derê.

¹⁹ Değîştirme: guherandin

²⁰ Yatak : livîn.

Go herin filan nimre filan soqaq filan nimre filan soqaq filan nimre filan soqaq go sê heb xweyiyê wan mala, go hersiya jî go bigrin bînin werin dibê çûn hersiya jî top kirin o dibê anîn hatin. Anîn hatin go ya Padişayê me emir bike way me wan hersiya jî hanî go derê hoo wê oda nekayîn vekin go wan jî têxne wê odê dibê wan jî xistin wê odê. Go ji min ra gazîkne celadçî, dibê gazî kirin celatçî celatçî jî hat wê derê, ê ku seriya dibre. Dibê go herin derê Eyşe Qotê vekin. Go Eyşe Qotê bînin werin ber îfada, dibê çûn derî vekirin Eyşe Qotê go were keremke go Paşa gotiye bila were îfada. Wile dibê hat û destê xwe da serhevnekayîn ya Padişayê me emir bike te şandiye pey min go xêre gelo? Go jê ra sandalîkî bînin a li vira nikayîn deynin go bira Eşe Qotê ji xwur li ser wê sandalyê rûnê. Wele sandalîkî hanîn, li binê Eyşe Qotê danîn, Eyşe Qotê rûnişt Paşa dengê xwe nekir. Paşa go herin Ticar Elî go ji min ra derxin bînin werin îfada min. Dibê Ticar Elî derxistin hanîne îfada, Ticar Elî go ya Padişahê min emir bike te şandiye pey min go xêre? Paşa go Ticar Elî go ha!

Go: Weke ku min seh kiriye qisasê bavê te derketiye. Ticar Elî go: Wile tişkî wisa heye. Go çika tizbiya bavê te ez bivînim, go weke ku mesele hinka bavê te şelandiye malê wî tev bîrine wî kûştin e tizbiya wî ji berîka wî derxistine birine, çika ez bivînim tizbîya bavê te? Derxist, tizbî di berîka wî da bû, derxist danî ser masa Paşa, paşa destê xwe kir berîkê xwe kulmekî tizbiyê eynen jê eynen tizbî weke wê dibê hanî danî serê li hev xist, li hev xist, li hev xist go Ticar Elî, go ka tizbiya bavê xwe ji nav derxe.

Ticar Elî, tizbî eynî tev yek e, sekinî sekinî go derxe çima tizbiya bavê te be gere ti nas kî tizbiya bavê xwe nas bikî go derxe lê nihêrt nikare tizbîyê derxe eynen yekin, sekinî matma sekinî ji qesab ra go serê Ticar Elî jêke dibê Ticar Elî kişandin qesab lêxist serê Ticar Elî jê kir.

Go çiq malê Ticar Elî heye go bînin li ser Eyşe Qotê xweşkin. Eyşe Qotê wisa kêfekî hatêkê go wilehî evenekayîn baş bû, paşî ku bi xêr be go viya baş bû. Dibê malê Ticar Elî çi hebû hanîn tamam li ser Eyşe Qotê xweş kirin. Go herin vî deriyakayîn vekin, Qesab bînin. Dibê çûn derî vekirin Qesab hanîn hatin go ya Paşay min emir bike go te şandiye pey min min hanîne. Paşa lê nihêrt go: Qesab. Go: Ha. Go: Hey agir bi mala bavê te keto go ewqa jî zalimî, ewqa jî yanî nebaşî, ewqa jî bê însafî go meriv goştê însana dide însana? haşa haşa go. Paşayê min çawa go ka li wê derê li nava ti dewletê çênabe wisa. Na na go, weke ku ez pê hesiyame go te wisa dikir. Go stexfirelah e reca dikim ka bipirse, ka kesê ku wisa bike heye yek jê jî hima bira ez bim. Go belê belê wile go heye go ti bi xwe yî go ez ew bi xwe bûm babadewrêş, go te min bir û çû nava mezela, go ku te cenazê wî bi min derxist, go te hanî hat hûndir û bi min te yê hûr bikirana û go te yê paşiyê seriyê min jî jêbikirana, te me ê her diya bi serhev de hûr bikra, banya loqintê nava goştê pez û heywana bixistana bidana însana. Ha! go derê derva go pîreka te xwe ji bîr kiribû, go ranedabû go destava min a piçûk hat go ku ez derêm min bazda ber derî min dî derî vekiriye go ez filitîm.

Go evîya ez bi xwe bûm. Go ku eger derê derva jî raday bûna go ana xelqê goştê min dixwar. Ana Paşa tinebû, go te min hûr bikirana. Go serê wî jêkin! serê Qesab dibê celatçî lêxist serê Qesab jêkir go çîqa malê Qesab heye bînin li ser Eyşe Qotê xweşkin. Eyşe Qotê ser kûrsiyê xwe dihejîne kêfa wê hat, zengîn bû. Malê Qesab ê Ticar Elî tev gihîştêkê. Go herin filan qapî go wan hersê merivê hanêkayîn derxin bînin werin. Dibê ew hersê dizê hevalê wî ne, îca dibê hanîn hatin go sêheb kûrsî bidne wan bira çîka rûnên dibê sêheb kûrsî dane wan ê dibê çav bi serê Ticar Elî û Qesab ketine dicirifin go bi quran Paşa wê serê me jêke.

Dibê awa li wan fetilî go: Kuro. Go: Ha. Go hûn dizin? Ê ku wisa go, evenekayîn wele go Paşa zane, mil mitandin go na na go e zanim win sêheb dizê menşûr in go pekî go meriv diziyê dike go meriv garanê da diçe li kera xwe dixê. Go we hatiye li xizna paşê xistiye biriye çîye. Dibê van hersê hanêkayîn hêdî zen kirin, kûçkê ji wan ra digo ya Paşa bi we ra ye, zenkirin bi xwedê ew Paşa bûye raste, kûçkê rast gotiye. Dibê hersiya ciret hanîne xwe go: Paşayê min. Go ha go em tişkî dikarin îfadê xwe nuqtekî bidin? Go: Hay hay bêjin. Go wile ku em ketibinêkê go ti jî bi me ra bûy. Dibê Paşa kenîya go ka mala we li kê derê ye, ew ê ku me xurcîkê daykê go hûn hersê li virbin bira ew meriv here xurcîkê bîne. Wile yekî go nimra deriyê me ev e, dibê lêxistin çûn xurcîkê hanîn hatin. Go ji min ra tereziyê jî bînin dibê tereziyê jî hanîn, Paşa li ser tereziyê sekinî û go xurcîkê vekin dibê vekirin bi xiram bi xiram, kîlo bi kîlo kişande. Kîloyê ku hêvarê kişandiye yek derhemekî jê kê mîne, devê xurcîkê venebiye. Dibê evyanekayîn ji wan ra go law wele kûçkê we rast digo ez bûm, lê go dîsa jî go vay hûn bi hev ra rastin eger hûn dizbin jî go vay min bi destê xwe min kişandiye xistiye xurcîkê a vay min bi destê xwe jî kişandiye jê vala kir derhemek jê kê mînebiye eger win dizbin jî sê dizê bi hev ra rastin.

Dibê yekî kire beqçî yekî kire polês yekî kire mesele belediyê go her yekî îşkê bikin go dev ji wî sinetê xwe berdîn. Dibê evahanekayîn tev bûn xweyiyê îş ewênekayîn ev jî ji xwe ra xilas bûn û malê Qesab û Ticar Elî jî tev teslîmê Eyşe Qotê kir. Kêfa Eyşe Qotê jî hat û Eyşe Qotê hate malê de îja zengîn bû, bû ku naleqe û Xwedê teela miradê wan li wê derê li hev kir. Ê me jî bide îmanê.

Çîrokbêj: Qutbetînê Farqînî

Sal: 71

Dîroka Berhevkarîyê: 05.10.2018

Herêm: Amed- Farqîn

Xwendina wî: Nexwende

Cihê Tomarkirinê: Li ber çemê Dijleyê